
# berbang

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê



71-72

www.arsivakurdi.org

# BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê

*Ansvarigutgivare/Berpirsiyar:*
**N. Kirîv**

*Redaktion/Redaksiyon:*
**A. Tîgrîs, Cemşîd Heyderî, Dîlan Dersîm, L.Cengîn, Xorto, Xebat Arif, Sîyamend Şêxaxayî**

*Amadekarê Beşa Zazakî:*
**H. Diljen**

*Sättning och Layout:*
**A. Tîgrîs, Dîlan Dersîm, N. Kirîv**

*Adress:*
**Box 45 205**
**104 30 Stockholm/Sweden**

**Telefon: 08/668 60 60**

**Postgiro: 64 38 80-8**

*Prenumeration/ Abonetî:*
**Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år**
**Meqam/Myndigheter:200 Skr/år**

*Annons/Îlan:*
**Rûpelên navîn/Insidor:1000 Skr**

*Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên bi îmze an nivîs û gotinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegerandin.*

**ISSN - 0281-5699**
**Sal: 10, Hejmar: 3-4/91 (71-72)**
**April/Maj-1991**

*Apec Tryck-Stockholm*


## Naverok

**Beşa kurmanciya jorîn** ........ **Rûpel**


*Pirsa kurd dunyayê îmtîhan dike! Loran Cengîn* .......... 3
*Bi Bexdare pêwendî. Loran Cengîn* .......... 8
*Careke din di riya penaberiyê de. Xorto* .......... 9
*Roj bi roj. Amadekar: Amed Tîgrîs* .......... 10
*Li ber konsolosxana Amerikayê. Xorto* .......... 33
*Mêvanê ne mêvan(hevpeyvîn).* .......... 34
*"Qanûna li dij terorîzmê" (semîner)* .......... 36
*Konferansa Stockholmê. Amadekar: Amed Tîgrîs* .......... 38


**Beşa zazakî (dimilî)**


*Newrozê û Jewbiyayeni. H. Diljen* .......... 46
*Neco'yrê neheqéy mekerê! Lejwan Büyükkaya* .......... 47


**Beşa kurmanciya jêrîn**


*Konferansî Stockholm. Amedakar: A. Tîgrîs* .......... 89
*Beyanamey Konferansî Stockholm. Wergêr: Hesenê Qazî* .......... 82
*Rojmêrê Rûdawekan* .......... 78
*Le yadî Helepçeda. Sîyamend* .......... 67
*Koşey edeb* .......... 63
*Çarpaçe şiîr. Heme Saîd Hesen* .......... 63
*Kulîl (Şiîr). Necîbe Ehmed* .......... 60
*Xemperst (Şiîr). Frix Firx* .......... 55
*Be şeney çawiyan derdênim (çîrok). Siyamend* .......... 54


*Wêneyên bergê (Foto):* **Stefan Hagberg**

www.arsivakurdi.org

# Pirsa Kurd, Dunyayê îmtîhan dike !

**Amadekar : Loran Cengîn**

*** Pirs,ne pirsa nan û avê ye, pirsa neteweki ye!**

*** Dunya divê bi berpirsiyariya xwe ya pêwist rabe!**

*** "Sîstema nu" ji çareserkirina pirsa Kurd derbas dibe!**

Ji 8-mehan zêdetire,ku rojeva siyaseta cîhanê bi buyerên Rojhilata Navîn ve girêdayne.Du babetên bingehîn ji nav pirsên heremê,bûn ên dayikî,ku bala tevayiya cîhanê kişandin ser xwe. Ya yekem-piştî îlhakkirina wê-Pirsa Kuweytê û ya duwem piştî "rawestandina" şerê Xelîc - Pirsa Kurdî.

Pirsa Kuweyt bi mehan di nuçeyên danezanên ragihandinê de,aktuelîta xwe ya yekem parast-heta çareserkirina wê. Di demên dawî de,tevayiya ajansên dunyayê,rojname,televîzyon û radyo bi taybetî,li ser pirsa Kurdî nuçeyên xwe yên yekem dixemilînin.Lê,gava mirov li siyaseta cîhanê,li ser van her du pirsan temaşe dike,ferqa mezin jî di navbera wan de keşf dike.Gerek,li her du pirsan,bi çavekî rastane û bê mêl,bê meyze kirin û lêkolîn kirin.Gava di 2-ê tebax a 1990-î de hêzên leşkerî yên Bexdayê,Kuweyt wergirtin,tevayiya dunyayê rabû ser piyan û bangkir:"Em neheqîke wusa qebul nakin!"Ev biryara xwe xistin pratîkê de jî.Di navbera çend rojan de Yekîtiya Netewan biryar li pey biryara,pêşberê Iraqê wergirtin. Pêwendiyên aborî yên rejîma Bexdayê bi weletên derve re birin.Embargoya aborî danîn ser tiştên,ku Iraq difroşe dunya derve.Dîroka reş a BAAS a faşî û serokê wê yê xwînxwar Saddam El-Tekrîtî kete devên dîplomatên dunyayê. Bush ,Major ,Shevardnadze, Teatcher û gelek serok û wezîrên derve yên navdar, perwerdebûna dîplomasî dane alîkî û bi xeberên herî dijwar Saddam binav kirin.Nêzîkî 30-dewletan leşkerên xwe rêkirin heremê-ji bo rizgariya Kuweytê. Piştî şerekî ezmana bi meh û nîvan û şerê erdê ya 100-saetan serxwebûna Kuweytê careke dî pekanîn.Her,di pêvajok û di encamê Şerê Xelîc,gelekî gelekî li ser "Sîstema nu" ya cîhanê xeberdan,a ku Serokê DYA Bush pêşengî kir.Tebîî bû,ku her kes bawer bike - pratîka "Sîstema nu" wê ji Rojhilata Navîn birêve biçe."Sîstema nu" dihate mana demokrasiyê,dihate mana mafê netewan, dihate mana mafê mirovan,dihate mana ...hêviyên milyonên insanan,ji bo dunyake adîl,di nav aştî û ewleyiyê de... Wek peyv-her tişt gelek xweş bû,xweş dihat guhan û qebuliyek xweş jî didît. Lê,pirsa Netewê Kurd,bi serfirazî û trajediya xwe bi yekcarî - ev hemu peyv û sozên Yekîtiya Netewan,Hêzên Hevkar û di serî de Amerîka,xiste îmtîxanê de. Ev zêdetirê du mehane,ku telaş a bersivê xwediyê "Sîstema nu" ya dunyayê girtiye.Her kes nuha li hêviyê ye, gelo sozên dewletên xwedî giranî wekî DYA, YKSS, Brîtanya Mezin,Fransa, Çîn û yên din tenê peyvên vala bûne, yan wê derbasê jiyana bibin,Hemu dunya ji îro ve dizane - bê çareserkirina pirsa Kurdî,ya ku di rojeva siyaseta cîhanê de,giringtirin pirsa netewiye,wê "Sîstema nu" tenê wekî hîleyeke taktîkî bimîne...

## Serfiraziya Netewê Kurd û Berpirsiyariya Cîhanê

Netewê Kurd,ji bo bidestxistina mafên xwe yên netewî li hember rejîmên Bexda yên faşî,ji 30-salan zêdetire,şerekî adîl - ê ji bo jiyaneke aştî û serbixwe dide.Ev rastî ji bal tevayiya dunyayê tê naskirin.Lê,tu caran menfaatên dewletên super û xwedî giranî,bi daxwazên Tevgera rizgarîxwaz a Netewê Kurd re nebûne yek.Eger, carna pêwendî yên taktîkî jî hatibine danîn,di dawî de Kurd dîsa bi tenê man e.Cara yekem di dîroka tekoşîna Kurdistanê de,tevayiya cîhanê bi yekdengî,ji bo pirseke din,pêşberê dewleteke degirker a Kurdistanê rawesta.Heta,şer bi xwe jî,li dij bikaranîn.Iraq,a ku sîstemeke çekdarî ya giran pêkanîbû,xesareke mezin a leşkerî dît.Lê,bi rawestandina şer re,hat



www.arsivakurdi.org

dîtin ku peyv û sozên hatibûna dan di dema şer de,tu giraniyan wan nemaye. Li gor axaftina Bush û gelek serokên din:"Gerek Saddam berpirsiyariya xwe ya xwînrêjiyê û sedema derketina şer dabane,di dadgeheke navnetewî de cezayê xwe dîtibane".Wusa çênebû!Dîsa li gor gotinên Hêzên Hevkar "Heta Saddam li ser hukim ba,tu îmkanên levhatin û pêwendiyan bi Bexda re çênedibûn".Wusa nebû!..Di biryara xwe di 11 ê nîsanê de Yekîtiya Netewan,biryara rawestandina şer bi giştî,erê kir.

Miletê Kurd û pêşmergeyên wî yên qehreman,hîn berê danîna çekan di navbera Hêzên Hevkar û Îraqê de tekoşîna xwe li dijê Bexdayê bihêz kirin.Bi taybetî piştî danîna çekan di Şerê Xelîc de,tevayiya Netewê Kurd li Başurê Kurdistan rabû ser piyan.Her roj,wan mizgîniyên rizgariya xaka Kurd,gihandin,gişayiya hemwelatiyên xwe-ji 30-milyonî.Bi rastî jî,ferqek mezin di navbera serxwebûna Kuweyt û Kurdistanê de hebû.Ya yekem-Kuweyt,ne tenê bi alîkarî,lê bi amadebûna hêzên leşkerî yên bi dehan dewletan hate xelaskirin. Xwîn li Kuweytê,zêde nehate rejandin. Pêşberê Saddam dîsa Ereb hebûn û wî destên xwe bi celadî dirêjî xwîna Kuweytiyan nekir.Armanca Bexda petrol bû,bihêzbûna aborî bû...Û dunyayê musaeda vî tiştî neda.Sîstemeke aborî di vê herema dewlemend de hatibû danîn û kesî nekarîbû,destên xwe dirêjî xerakirina vê sîstemê bike.Saddam dixwest destdirêjiyan bike...Ew dest hate jêkirin!..Lê,gava`Kurdistan hate rizgarkirin,tu leşkerên dewletan bi alîkariya gelê Kurd nebezan.Yêkîtiya Netewan çavên xwe girtin.Tu dewletên xwedî giranî yan zeîf,piştgiriya xwe bi vê serfiraziyê re ne anî ziman.Hêzên Saddam ên xwînxwar dest pê kirin,ku çekên giran hemberê Kurdên siwîl-jin,pîr û zaroyan bikan bênin...Deng ji tu dewletan nehat.Yekîtiya Netewan Bexda protesto nekir...Gava 11-raketên Scud,di yek şevê de ber bi Kerkukê ve hatin teqandin,sîstemên Amerîkî û Sovyetî,di ezmanan de ev êrîş tesbît "nekirin".Serokê leşkerî yê Hêzên Hevkar,Norman Sharzkopf,rejîma Bexda ji ber van êrîşan mehkum nekir û ne got-Hun nikarin belafirên êrîşan,helîkopteran û çekên din ên giran,peşberê insanên Kurd ên siwîl bikar bênin!Heta da diyarkirin ku "generalên Saddam,ew xapandin e" (!).Qesra Spî ya Waşîngtonê,tehdîdên xwe nîşanî Îraqê nekirin,wan gotin ku :"Ev şerekî hundurî ye û em nikarin bi vê pirsê mijulbin û mudaxele bikin!" Rewşa Brîtanya ji xwe diyar bû,hevalbendiya Amerîka dîsa xwe dida axaftintawrê wan bi yê Amerîka re bû yek. Dîtina Sovyet li ser pirsê,bi naveroka xwe ve negatîv bû.Yên Çînê hîn zêdetir bû - Welatên ,ku problemên wan ên millî hebûn,eciziya xwe ji Kurdan derdixistin(!)

---

**Kanî wijdanê dunyayê !**
**Kanî wijdanê YN !**
**Kanî wijdanê M-r Bush !**

---

Bi encamên van hemû tiştên jorîn û gelekên din - wekî tawrê Ereban,li ser pirsa Netewî Kurdî- lempa kesk ji Saddam re hat pêxistin.4-milyon runiştvanên Başurê Kurdistanê,yên ku bi dest û hêza xwe,xaka welatê xwe girtibûn,bi tenêbûnê de hatibûn hiştin.Serfiraziya wan,ji alî dunyayê ve bi bêdengiyek şermî û bêprensîpiyek dihate taqîb kirin.Diyarbû-axaftinên li ser wekheviya netewan,tenê li ser zimanan dimînin... Ev rastî ji bal Saddam jî hate dîtin...û. ..wî jî...hemu giraniya xwe ya çekdarî, bi alîkariya amadebûna Filistîniyan, "Mucahidîn"ê xelk,Urdiniyan û hwd.re bire ser tevayiya runiştvanên Başurê Kurdistanê.Li gor daxuyaniya Eniya Kurdistana Îraqê,tenê li cihekî 3000 - Kurd,dihatin gulebarankirin.Bi dehên malbatan bi saxî dihatin şewitandin.Lê vê carê,ne tenê Kurdan behsa van qetlîaman dikirin.Bi sedên rojnamevanên biyanî,yên ku ji bo rizgariya xaka Ne-

## BİRYARA 688 A YEKİTİYA NETEWAN

* *Komîta Ewleyî ya Rêxistina Yekîtiya Netewan êrîşên Îraqê pêşberê gelê Kurd ê siwil protesto dike.*

* *Ew êrîşên hemberê gelê Kurd,xetereke mezinin ji bo aştiya dunyayê û ewleyiya herema Rojhilata Navîn.*

* *Dunya divê alîkariyek mezin ji bo,bi milyonan penaberên Kurd rê bike.*

* *Êrîşên hemberê siwilan pêwiste bêne sekinandin û tu êrîş neyên ser alîkariya ku dibe,ji bo penaberên Kurd.*

*Li hember biryara 688 a YN sê dewlet - Kuba,Zîmbabwe û Yemen rabûn û dengên xwe li dij bikaranîn.*
*Du dewlet - Çîn û Hindistan,bedeng man.*
*Deh dewlet jî,di nav wan de DYA,YKSS,Fransa,Brîtanya Mezin,Ekwador û hwd. li gel biryarê deng dan.Her wusa rê,ji bo biryarên nu li ser pirsê vekirî hat hiştin.*

---

## DİTİNA NATO

*Dewletên endamên rêxistina leşkerî - NATO,demeke kurt paşî êrîşên neinsanî yên Îraqê pêşberê xelkê siwil ê Kurd li Başurê Kurdistan civînek bidarxistin.Bi awakî giştî NATO êrîşên Îraqê pêşberê gelê Kurd protesto kir û nerazîbûna xwe anî ziman.Wan dan diyarkirin,ku ev êrîş pêwiste bêne rawestan,ji ber ku, ew tevayiya aştî û ewleyiya heremê dixe bin tehdîdek mezin.Weke daxuyaniyek resmî jî ev tişt hate belavkirin.*

tewê Kurd bibînin li Kurdistan bûn,ev êrîş bi çavên xwe di dîtin.Yek ji wan-rojnamevanekî BBC-wusa buyerên pêkhatî di anî zimên:"Leşkerên Iraqê, gava êrîşên xwe anîn ser Kurdan,wusa qîr dikirin-Van bikujin!Bikujin!Hemuyan bikujin!..Û kuştine-zarok kuştine, jin kuştine,pîr kuştune...Her tişte Kurd bê û girêdayiya Kurdistanê hebe, dane ber fîşekan...Rojnamevanê BBC dipirse-Kanî wijdanê Dunyayê,kanî wijdanê Yekîtiya Netewan,kanî wijdanê Mîstir Bush...Netewê Kurd ê ku di vê realîte û rastiyê de dijê û li ber her êrîşên neinsanî yên dagirkerên Kurdistanê, bi hezar û deh hezaran zarokên xwe şehîd dide,carek dî dipirse:Kanî wijdanê te,ey dunya!!!

Cara yekem, di dîroka tekoşîna rizgariya Kurdistanê de,hemu danezanên ragihandinên cîhanî,bi awakî gelek fereh pirsa Kurdî girtin destan.Li ser rupelên rojnaman,di mîkrofonên radyoyan û di ekranên televizyonan de,rastiya Kurdan hate ber çavên dunyayê.Her kesî dît,ku di çi warî de,Neteweyek dijê,li ber xwe dide...û çi metod hemberê wî tê bikaranîn.Di demeke kurt de,van tiştan tesîra xwe jî dan nîşandan.Serokê DYA Bush,ê ku di dema Şerê Xelîc de pişgiriyek xurt ji gelê Amerîkî girtibû, ev populerîta xwe roj li pey rojan ji bo rewş û pirsa Kurdan wendakir.Di îstatîstîkên, ku hatin çêkirin ji bal Enstîyan cuda ve,derket ku ji % 74 xelkê DYA li gel siyasetek aktîvtire ji bo pirsa Kurd.Li gelek welatên Ewropa, rêxistinên ji bo piştgiriya Kurdan hatin damezrandin.Bi sedhezaran Kurd ê ku li derveyî welat dijin,bi yekdestî xwediyê buyerên Başurê Kurdistan derketin û bi çalakiyên cur be cur tesîr li raya giştî,li welatên ku dimînin kirin.Tiştekî xerîb, ji bo Ewropayiyan,hema hema li hemu welatên Rojava,grevên birçîbûnê pêkhatin.

Bi kombûna van numuneyên jorîn, di rojeva siyasî de pirsa Kurdan, roj li pey roj bi zêdetirin hat axaftin û muqeşe kirin.Di destpêkê de,ji Fransa wezîrê berpirsiyar li ser mafê mirovan Koucher çû gel sedhezarên "penaberên" Kurd,di navbera sînorê Başur û Bakurê Kurdistan de (Iraq û Turkiye).Piştî ku wî dît bê rewş di çi warî de ye,ji bal Fransa ve siyasetek aktîvtir,destpêkir ku bê meşandin.Di siya vê de Fransa pêşniyar ji bo Yekîtiya Netewan,li ser pirsa Kurdan anî û biryara 688 a YN hate girtin.Cara pêşîn,eger zêdeyiya naveroka wê li ser pirsa penaberî û protestoya êrîşan jî be,Komîta Ewleyî ya YN biryarak li ser Kurdan digirt.Ji dervî wê pirs weke-Pirsa Kurdî-dihat rojevê û rê ji bo girtina biryarên nu jî vekirî dihat hiştin.

Bejker,wezîrê derve yê DYA jî dihat ser sînorê navbera Başur û Bakurê Kurdistanê.Wî, tiştên dîtin wekî- Trajediya

## Daxuyaniya Civîna Luksemburgê ya welatên Civata Aborî ya Ewropa (CAE)

**Welatên,endamê Civata Aborî ya Ewropa (CAE) di 8-ê nisanê de li Luksemburgê,ji bo ku dîtina Civatê beramberê Pirsa Kurdî,li Başurê Kurdistanê (Iraq),bidin diyarkirin civiyan.Bi tawreke giştî Serokkomar,Serokwezîr û wezîrên derve-yên amadeyî kombûna Luksemburgê daxuyaniyek belav kirin.Her wusa noxteyên ku di daxuyaniyê de cî girtine wekî pêşniyar,ji bo qebulkirinê birin Komîta Ewleyî ya Yekîtiya Netewan.**

*** Li Iraqê,li ser xaka Kurdan,ji bo bi milyonên insanên siwîl,ên ku ji ber zordariya Saddam reviyane ber bi sînorê Turkiye û Iranê de,pêwiste - Heremên Ewleyiyê - bêne sazkirin.Ew gerek ji bal Yekîtiya Netewan bêne parastin.**

*** Mafên netewî yên Kurdan pêwiste bêne qebulkirin.**

*** Penaberên Kurd,pêwiste garantiyan bigrin, ji bo ku bikarin vegerin ser erd û malên xwe.**

*** Embargoya aborî,hemberê Iraqê pêwiste dom bike,heta ku Iraq,van nuxtên jorîn pêk bêne.**

**Ev biryarên Civata Aborî ya Ewropa-ya ku ji 12 welatan pêk tê-têne rêkirin ji Komîta Ewleyî ya Rêxistina Yekîtiya Netewan ji bo munaqeşe û biryargirtinê.Her wusa CAE nerazîbûna xwe pêşberê êrîşên Iraqê li ser xelkê siwîl ê Kurd anî ziman û diyarkir ku amadeye bi alîkariyek xurt a insanî rabe.Ji bo vê çendê wekî destpêk, rêkirina alîkariya pêwistiyên yekem û dermanan ji bal welatên endam hate qebulkirin. Rêya qebulkirina biryarên nu li ser babetê vekirî hat hiştin,heta pirs bê çareserkirin.Girêdayî wê di Civîna Bruksel (Belçika) de,ya ku piştî ya Luksemburgê hate bidar xistin.Biryarek nu li ser Pirsa Kurdî hate girtin.Di biryarê de tê daxuyanîkirin,ku-Pirsa Kurdî pêwiste ji bal dewletên ku Kurd dijin,bê girtina dest bi awakî demokratî.Mafê Kurdan ji bo xwemuxtarî li ser xaka ku dijin hebe.Bê vê îmkana çareserkirina pirsa Kurd nîne-tê gotin di biryarê de.Hemberê vê biryara CAE,wezareta derve ya Turkiye nerazîbûna xwe anî zimên,ku Civata Ewropa bi pirsên hundurî yê welatan mijul dibe.**

insanî - binav kirin.Piştê vegera Bejker,ji sînor,wekî ku dîplomatên dunyayê dibêjin -Pira alîkariyê - hate çêkirin.Ji welatên Ewropa û ji DYA her roj qala rêkirina dehên belafiran bi xwarin,cil û dermanan tê kirin.Hatina nêzîkî 500.000 insanan ser sînor di navbera Turkiye û Iraqê de,li gel xwe problemên nu jî anîn.Enqere beyan da ku nikare xwedî hevqas zêde xelk bibe û daxwaza çareserkirina pirsê ji YN û dezgehên din ên navnetewî kir.Rewşa Iranê hîn jî tarîtir bû,zêdeyî 1,5 milyon insan ber bi sînorê Iranê bûn.Çareke navnetewî Tehranê jî anî rojevê.Li aliyên din milyonên Kurdan,digotin ku bê garantiya navnetewî û heta Saddam li ser hukim be ewê nevegerin mal û bajarên xwe.Di nav wan de bi dehan kesan,ên ku zarokên xwe binax dikirin,digotin rojnamevanên dunyayê- "Pêwistiya me ne nan û av e,pêwistiya me azadî ye"...

### Pirsa Kurd
### Pirsa man an nemana Netewekî ye

Her kes dizanê,bê xaka Kurdistan çi dewlemende.Eger li ser xaka xwe di nav aştî û ewleyi de bijî,eger serbixwe be li ser erdên xwe - Kurd dikarin,alîkariya aborî ji bo welat û insanên xewce bikin.Pirsa Kurdanpirseke Netewî ye û ji bo vê çendê bi xwe,Saddamê xwînxwar van êrîşên xwe bê xesab û kitab dibe ser wan.Zarok,jin û pîrên Kurd,ji bo vê çendê bi çekên kîmyewî têne jehrkirin.Na xwe eger pirs - pirsa hundurî ya Iraqê bane,ne ev zulm dihate kirin,ne xak dihatin jehrkirin, ne ev trajedî derbasî jiyanê dibû.Ne bi sedan zarokên Qaladizê di bin bombên napalm de dan didan,ne Helepçe bi 5000 insanan ve dihat şehîdkirin...

Pirsa Kurdî - pirsên demokrasiyê,parastina mafên mirovan,mafê çarenusa netewan... wijdanê tevayiya dunyayê,aniye ser masê,ku bi berpirsiyariya xwe rabin.Du rê di vê babetê de nînin.Pirs,pirsa man an nemana netewekî ye.Yan dunya wê bi berpirsiyariya xwe ya pêwist rabe,yan jî wê bibe xwediyê ruyekî derewîn...Hilbejartin di destên wan de ye...

# Gelek welatan dîtinên xwe, li ser bûyerên Başûrê Kurdistanê dan diyarkirin.

## FRANSA

**Serokkomar Francois MİTTERAND :** YN divê bi pêwistiya xwe,ku êrîşên Iraqê rawestêne rabe.Ev zulm û zordarî gerek bête sekinandin.Êrîşên Iraqê pêşberê Kurdan aştiya navnetewî û ewleyiya heremê dixe xeterek mezin.Heta ku êrîş neyên rawestandin hemu embargoyên dijê Iraqê gerek berdewambin.Komîta Ewleyî li ser vê babetê giringe,ku biryar bigre.

## BRİTANYA MEZİN

**Serokwezîr John MAJOR :** Pêwiste êrîşên xwînrêjê Saddam,pêşberê gelê Kurd bi awakî bêne rawestandin.Em gerek bêjin Bexda - Bese!Di bin parastina YN de,Kurd gerek vegerin ser xakên xwe.Li ser erdên xwe di nav aştî û ewleyî de bijin.Ger me dît, wê Bexda mafên Kurdan qebulbike,wê demê parastina YN jî li ser van xakan dikare rabe.

Her wusa,ji bo dîtin û daxwazên Eniya Kurdistana Iraqê li ser pirsê bizanibe Serokwezîr J.Major,bi nuneriyek Eniya Kurdistan re,civînek bi darxist.Piştî ku dîtina Brîtanya Mezin bi awakî eşkere hate belavkirin,li ser pêşniyara wê di navbera pênc dewletên daîmî yê Yekîtiya Netewan - DYA,YKSS,Brîtanya Mezin,Fransa û Çîn-de hevdîtin û muneqeşe li ser pirsa -Herema Ewleyiyê-destpêkirin.

## DYA

**Serokdewlet George BUSH :** Ev şerê ku li Iraqê dibe,şerekî hunduriye.Ez naxwazim yek leşkerê Amerîkî bekeve nav vî şerê,ku bi dehên salan berdewam e.Lê,em ê alîkariya insanî bi şêwekî fereh bikin.Em ê li aliyê sînor ê Iraqê ji wan re xaniyan avabikin.Ji bo penaberên Kurd ji êrîşên mumkun biparêzin,wê 8000 leşkerên me bikevin heremê.Gava,em bawerbûn ew insan di nav ewleyî de,wê bikaribin jiyana xwe bidomînin,dikarin vegerin ser erd û malên xwe.

**Nunerê DYA,di Komîta Ewleyî ya YN de,Thomas PICKERING:** Em, li gor biryara 688 a YN û biryarên Civata Aborî ya Ewropa, dixwazin - Zonên Bufer (parastinê) ,ji Kurdan re pêk bênin.Daxwaza me ew e ku alîkariyek mezin ji Kurdan re bête nîşandan.Ji ber vê yekê,em bangdikin hemu welatên xwedî îmkan,ku di planên alîkariyê de cî bigrin.

## ALMANYA

**Wezîrê derve Hans Dietrich GENSCHER :** Saddam,pêşberê gelê Kurd sucekî navnetewî dike.Ew gerek di dadgehek navnetewî de cezayê vî sucê xwe bikşêne.Ji Şerê Duwemin ê Cîhanê,heta nuha jenosîd û sucek insanî di vê ferehiya mezin de nehatiye kirin.Ne em û ne tevayiya dunyayê,li ber vî tiştî çavên xwe nikare miç bike.Hemberê Bexda pêwiste biryarên hişk bêne girtin.Mafên gelê Kurd jî,yê ku bu hedefa van jenosîdan pêwiste bêne parastin û di bin şemsîke navnetewî de bên garantî kirin.

www.arsivakurdi.org

## DANİMARKA

Saddam êrîşên neinsanî û dijwar dibe ser gelê Kurd.Bi hezarên siwîlan di bin vê terorê de hatin kuştin.Pirsa Kuweytê çawa bi beşdariyek dîrekt û pratîk ji bal YN ve hate çareserkirin,ya Kurdî jî,wusa gerek bê xelkirin.Yn bi hêzên leşkerî bikeve İraqê û van êrîşan rawestêne.

## SWED

**Nunerê di YN de,Jan ELİASSON :** Berpirsiyariya YN piştî rawestana Şerê Xelîc gerek dombike.Em, êrîşên İraqê pêşberê gelê Kurd bi awakî dijwar protesto dikin.Buyerên,ku li İraqê dibin,pirs ji pirsa hundurî derxistiye.Pirs bûye-pirsek navnetewî.Eger çareseriyek neye dîtin, ewleyiya heremê dikeve bin xeterek mezin de.Alîkariya dunyayê jî pêwiste mîne ku ya Filistînî em ê nuha bikaribin çareser bikin.di du aliyan de bê - Alîkariya insanî û alîkariya siyasî.Jenosîda pêşberê miletekî tu caran ne mumkune bê efu kirin.Mafên kurdan pêwiste bêne parastin.Di nav dewleta İraqê de,ew gerek xwedî mafên insanî û netewî bin.

## İSRAİL

**Wezîrê derve David LEVY :** Em nikarin qebul bikin,çawa dunya bi çavên girtî,jenosîda İraqê peşberê Kurdan derbas dike.Çawa,ku ji bo Kuweytê hemu dewletên dunyayê,rabûn ser piyan û bi hêzên leşkerî pirs çareser kirin a Kurdan jî wusa pêwiste çareser bibe.Wekî dî gerek tu kes li hêviyê nemîne ku nuha mumkune pirsa Filistînî bê helkirin.

## TURKİYE

**Serokkomar Turgut OZAL :** Turkiye nikare barê 400-500 hezar penaberan bikşêne.Ev pirs ji pirseke hundurî derketiye bûye pirseke navnetewî.Nuha sînorên me di bin tehdîdê de ne.Eger Saddam êrîşên xwe ne rawestêne,em dizanin çawa wî rawestênin.Ji bo van insanan YN gerek rêyekê bibîne.Heremên Ewleyiyê-ji wan re pêwiste bêne danîn.Hingê em dikarin bêhêlin ku alîkarî ji wan re,ji ser xakên me ve derbas bibin.

## İRAN

**Serokkomar Haşimî RAFSANDJANİ :** Ji milyonekê zêdetir Kurd û Şîî ji zordariya Saddam reviyan û ketin sînorên me.İmkanên me li meyizandina hevqas zêde insan nîne.YN bere dest deyne ser pirsê.Herema Ewleyiyê ji Kurdan û Şîî yan re bêne danîn.Em,alîkariya dunyayê ji bo wan dixwazin.

## İRAQ

**Serokwezîr Sadun HAMMADİ :** Pêşniyara avakirina,heremên parastinê yan ên ewleyiyê li ser xakên welatê me,leyistikek pêşberê İraqê ye.Em vê pêşniyarê qebul nakin û em ê bi hemu imkanên xwe hemberê derkevin.Ev mudaxela pirsên hundurî yê welatekî ye.Di peyrêya (destur) YN de rê ji karekî wusa re tune ye.Bê daxwaza me tiştek wusa nabe û em jî li dijin.

# Li gelek welatên dunyayê, dîplomatên İraqê yên terorîst hatin derxistin !

* Li paytexta Swêd,Stockholm,terorîstên-dîplomat ên sefareta İraqê,cerculek Kalaşînkofê (çekek Sovyetî),berdan nêzîkî 50-kurdên,ku xwestin sefaretxana İraqê bidest bixin.Ji wan kesên ku êrîş birine ser sefaretê 32 kes hatin girtin.Lê,li hember bikaranîna çekan pêşberê demonstrantan,bi taybetî di dezgehên ragihandinê de,reaksiyonek xurt derket xolê.Her wusa,piştî protestoyek dijwar hemberê İraqê,Dewleta Swêd biryar da,ku dîplomatek bi navê-Fadhil S.Hasan,ji Swêd berdiyê.Her wusa hat zanîn,ku bi çekê fîşek jê hatine berdan,agahdariya polîsê Swêd nîne.Çêk bê izna Swêd di sefaretê de bûyê.Ji ber wê Swêd dest danî ser çek.Federasyona Komelên Kurdistanê,li ser vê babetê daxuyaniyek dijê sefaretxana terorîst a İraqê bi zimanê Swêdî belavkir.

* Li paytexta Fînlanda,Helsînkî,dîplomatekî İraqê,ku fîşek berdan,bi dehên Kurdan,ku xwepêşandan li pêşya sefareta İraqê dikirin,ji Fînlanda hate derxistin.Her wusa protestoyek hemberê karên wusa ji bo İra¨ê hate nîşandan.

* Li paytexta Çekoslovakya,Prag,çar dîplomatên İraqê,yên ku çek berdan,bi dehên xwendevanên Kurd,ên ku pêşberê sefareta İraqê xwepêşandan dikirin,hatin derxistin.Wezareta derve ya Çekoslovakya protestoyek dijwar da sefaretxwana İraqî.

* Li paytexta Almanya,Bonn,dîplomatek Kuba,yê ku çek berda amadekarên xwepêşandeneke Kurdan pêşberê sefareta Kuba,ji Almanya hat derxistin Her wusa dîplomatek İraqê,yê ku berê çek berdabû kurdên, ku protesto li ber sefareta İraqê kiribûn,ji Almanya hate derxistin.

* Li paytexta Turkiyê,Enqera û li İstanbolê ji sefareta İraqê çek berdan kesên ku protestoya İraqê dikin.2 kes hatin kuştin û gelek brîndarbûn.



www.arsivakurd.org

# Bi Bexda re pêwendî

Di 19-ê nîsanê de agahdariya senzasyonel,ku çend rêberên Kurdan bi Bexda re pêwendî danîne, ji alî buroyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê,li Şamê û Londrayê hate belavkirin.Wekî, ku paşê diyarbû,pêwendî berîtir jî-li bajarê Kerkukê û Erbîlê hatibûne danîn.Piştî-di gelek babetan de aliyan li hevdu kirine,vê carê cihê hevdîtinan, biryar hatiye dan,ku li Bexda berdewambin.Nuneriya Eniya Kurdistana Îraqê,ya ji bo bidestgirtina otonomiya rastî,bi nunerên rejîma BAAS re û bi Saddam re runiştin,ji çar kesan pêk tê. Celal Talabanî-serokê Yekîtiya Niştiman a Kurdistanê,Nêçîrvan Barzanî-endamê Polît Buro ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê,Resul Mamend-sekreterê giştî ya Xizba Sosyalîst a Kurdistana Îraqê û Samî Abdulrahman-sekreterê giştî ya Partiya Demokrat a Gelê Kurdistana Îraqê.

Heta nuha nayê zanîn,gelo welatên di Hêzên Hevkar de cî girtibûn,bi pêwendiyên di navbera Kurdan û Îraqê de,tu girêdayî heye an na.Lê,buyerên, pêk tên resmekî tênin ber çavên mirov ku,bi awakî mantiqî bersiva tiştan derxîne.Di 27-ê nîsanê de piştî derxistina hêzên Îraqê ji bajarê Zaxo,agahdariyek ji bal BBC ve hate belavkirin,ku berpirsiyarên pêşmergan û nunerên leşkerî yên Îraqê,di meqerekî Hêzên Hevkar de hevdu dîtine.Li ser naveroka hevdîtinê tiştek nehatiye diyarkirin.Her çend li Bexdayê nuneriya Eniya Kurdistana Îraqê berdewamê pêwendiya bi BAAS re bû jî,xebata Hêzên Hevkar di çerçora-xeta 36 de-dom kir.Di vê pêvajokê de nuçek hat weşandin,ku di navbera hêzên Brîtanya Mezin û hezên Îraqê ên leşkerî de,buyerek xeter jî derbasbûye. Serokatiya Leşkerî ya Brîtanya Mezin, di xeta 36-an de diyarkir,ku Îraq dev ji provakasyonan ne berdê,wê bersivek hişk bigre.Her di vê pêvajokê de,çend welatên din,wekî Îspanya,Almanya, Kanada û hwd. diyarkirin,ku wê leşkeran rêbikin Kurdistana Îraqê,ji bo damezrandina-Heremên Ewleyiyê.Daxuyaniya dawîn li ser pirsa-Heremên Ewleyiyê di 28-ê nîsanê de hat.Hêzên Hevkar soz dan,ku-Heremên Ewleyiyê pêk bênin û van erdan ji êrîşên mumkun jî biparêzin.Di 27-ê nîsanê de Wezareta Derve ya Brîtanya Mezin bi daxuyaniyek resmî nîşan da,ku wê Komîta Ewleyî ya YN bangî civîneke taybetî bike.Wê naveroka civîna li ser,sazkirina Hêzên Polîsan ên YN be,ku bêne bicihkirin li Kurdistana Îraqê.Ji bo,ku Kurd ji êrîşên mumkun ên Bexdayê bêne parastin.Ev pirs di 28-ê nîsanê de,di civîna Civata Aborî ya Ewropa li Luksemburgê jî wê bibe rojev.Douglas Hurd-Wezirê derve yê Brîtanya Mezin diyarkir,ku ji alî wan ve hemu tişt wê bê kirin,ji bo qebulkirina vê babetê.

Civînên Bexda,yên ku heta 25-ê nîsanê berdewam kirin,bi Konferanseke ji bo danezanên ragihandinê hatin daxuyanîkirin.Celal Talabanî,yê ku li ser navê Eniya Kurdistanê,babetên ku li ser wan hatiye lihevkirin,diyardan wusa got:

"Heta nuha me li ser çar nuxteyên giring lihev kiriye.1-Pêkanîna demokrasiyê li Îraqê.2-Naskirina mafên netewî yên Kurdan.3-Normalîzekirina rewşa jiyana siyasî û aborî li Îraqê.4-Yekîtiya Îraqê.Evan tiştan bi awakî prensîp hatine qebulkirin.Hemu hemwelatiyên me ,ku dev ji erd û malên xwe berdane û reviyane,nuha dikarin vegerin erd û malên xwe".

Lê,her wekî,ku ji alî C.Talabanî ve jî hate nîşandan,îmzaya dawîn a lihevhatinê,gerek ji bal Serokê Eniya Kurdistana Îraqê û Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê,Mesud Barzanî ve bê avêtin.Di dema pêwendiyên li Bexdayê de, Nunerê Partiya Demokrat a Kurdistana Îraqê li derveyî welat,Hoşyar Zebarî di hevpeyvina xwe bi televizyona BBC re da diyarkirin,ku "Baweriya me bi Saddam tuneye.Lê,em siyaseteke rastiyan dajon.Gava mirov siyasetê dike,gerek carnan pêl hisên xwe jî bike.Em,dizanin,ku ji Kurdan re gelek zexmete rêberên xwe bi Saddam re bibînin.Lê,bê garantiyek navnetewî, em nikarin îmza bavêjin ser lihevhatinekê di navbera me û Bexdayê de".

Di vê pêvajokê de,her wusa hate diyarkirin,ku nuneriyek ji Weqfa mafên insanî,di bin serokatiya Sitî Danielle Mitterand-xanima Serokkomarê Fransayê F.Mitterand-û Enstîtuya Kurdî li Parîsê,çûye Kurdistanê.Armanca çûna wan hevdîtina bi Serokê Eniya Kurdistana Îraqê û PDK-Îraqê,Mesud Barzanî re ye.Di 27-ê nîsanê de jî ,Wezîrê Derve yê Fransa,Rolland Dumma daxuyanîkir,ku "Fransa bangî,pênc dewletên endamên daîmî yên Komîta Ewleyî ya YN-DYA,YKSS,Brîtanya Mezin,Fransa û Çînê-dike ku li ser buyera pêwendiya di navbera Kurdan û Îraqê de,munaqeşe bikin.Eger pêwistbe biryarên navnetewî li ser vê babetê bêne girtin û parastina Kurdan bê kirin."

Weke,ku tê xuyakirin heta nuha di navbera nuneriya Eniya Kurdistana Îraqê û BAAS de,hîn li ser pir babetên giring,ên ku hemu Kurd meraq dikin û berdikevin nehatine axaftin.Yek ji wan pirsên herî giring,bê guman pirsa Kerkuk û Musulê ye.Ev pirs weke tê zanîn,a ku zêdetirîn Turkiyê dixe xesaban de ye.Ji nuha ve,bi devên Turkmenan,dewleta Turkiyê nîşan da,ku li dije Kerkuk bikeve sînorên Kurdistanek Otonom de.Lê,Kurd jî bê Kerkukê , ku parçeyek ji Kurdistanê ye,îmkan nayê dîtin îmzayê bavêjin,bin otonomiyekê de.Diyare li ser vê babetê diplomasiyek germ dîsa di navbera Turkiyê,Îranê û Suriyê de destpêkir. Serokkomarê Dewleta Îslamî ya Îranê Rafsandjanî hate Şamê û diçe Enqerê.Alîkarê serokwezîrê Îraqê tê Enqera.Di van rojan de li derdora pirsa Netewî Kurdî gelek tişt wê diyarbibin.Ev,çend mehan e,ku pirsa Kurdan bi awakî pozîtîv bala dunyayê kişand ser xwe.Gerek pirsa Kurdan jî, bi awakî pozîtîv bê çareserkirin.Daxwaza milyonan Kurd ev e...

# CAREKE DIN DI RIYA PENABERIYÊ DE

*Xorto*

"Serhildana dînî hat pelaxtin. Niha wexta reformên demokratî û avakirina welat e." Di 30'ê Adarê, şeva Şemiyê de, di radyoya Bexdayê de wisa digot serokvezîrê Iraqê, Sadûn Hamadî.

Li ber çavên dinê, li ber pozê general Norman Schwarzkopfê ku li ser biryara KN (FN'ê) û daxwaza Bush wê Kuveyt xelas bikira û li Îraqê demokrasî bida avakirin, tanq, top û helîkopterên Saddam agir dibarand li ser Kurdan. Kuveyt hat rizgarkirin, lê belê, avakirina demokrasiya Îraqê, her çawan bû ez nizanim, hewalê Saddam kirin.

Saddam dixwaze demokrasiyê û welatê xwe avabike (!) Ji bo wî jî, divê berî her tiştî muxalefeta Îraqê û bi taybetî Kurdên reben û bê xwedî bên pelaxtin, kuştin û ji welatên xwe yên bav û kalan bên avêtin. Pêşî mirovan bikuje û bi pişt re demokrasiyê avabike!

Di van rojan de, nûçeyên Rojname, televîzyon û radyoyên dinê di der heqê penaberên Kurd de sefalet û trajedîya mirovên Kurd ve dagirtî ne. Muxabîrên gelek rojnaman li ser sînorê Tirkîyê, Irak û Îranê, di nav penaberan de nûçeyan didin. Nûçeyên di derheqê penaberan de, nîşan didin, ku Saddam û generalên wî, wê demokrasîyek û pêşerojek çawa ji bo Kurdan ava bikin.

Di 2'yê Nîsanê de, helîkopterên Saddam 500 penaber li ber çavên rojnamevanan, bi bombeyên fosfor qetil dikir. Bi hezaran penaberên Kurd, di bin agir û gulebarandina helîkopteran de, ber bi sînorê Tirkîyê, Îranê û çiyayên Kurdîstanê ve dimeşîyan. Zarokên bi kiras û xwas yên ku ji bombeyên Saddam rizgar dibûn, îcar, di hemêzên dayikên xwe de, ji sermayê û ji birçîbûnê dimirîn û dimirin...

Bi sed hezaran penaberên kud di 4'ê Nîsanê de, xwe digîhandin ber sînorê Tirkîyê, bi gulebarandina eskerên sînor dihatin rawestandin. Li gor Wezareta Derveyî yê Tirkiyê 250 hezar penaber li ba sînor kom bûbû û îmkanên Tirkîyê tune bûn, ku hewqas penaberan qebûl bike. Sînorê Îranê carek din wisa li rûyê penaberan hatibû girtin.

Di 4'ê Nîsanê de, Îranê jî, wekî Tirkiyê digot, em nikarin bi sed hezaran penaber qebûl bikin. Li gor Ajansa Nûçeyê Îranê milyonek penaber li ber sînorê Îranê rawestabûn. Îranê digot," ji bo qebulkirina hemû penaberan em amadene, lê belê, îmkanên me tune ne". Îran û Tirkiyê, ji KN, ji Xaça Sor û ji dewletên din alîkarî dixwestin.

Di 5 Nîsanê de, "Komîta Şoreşê" ya Îraqê carekî din digot; " serhildan hat pelaxtin." Li gor Komîta Şoreşê, yên ku îcar hatibûn pelaxtin peşmergeyên Kurd bûn. Lê, di rastî de wisa ne bû! Pêşmerge ji bajaran paşve vekişyabûn. Yên ku hatibûn pelaxtin Kurdên sivîl û bêparastin bûn. Saddam û generalên wî, ji derveyî banga jorîn, efûyeke giştî jî, ji bo Kurdan îlan dikirin. Lê, Kurdên ku zor bikaranîne, Kurdên ku mal û tiştên xelkê talan kirîne û Kurdên ku tecawuzî pîrekan kirine li derveyî afûyê diman (!) Roja, ku Saddam ji bo Kurdan efû îlan dikir, hêjmarên penaberan digihîşt 2 milyonî. 2 milyon mirovên Kurd, jin, mêr, pîr û zarokên xwas, bi zêkên tî û birçî, ji ber xezeba Saddam direviyan, nexweş dibûn, dimirin û dihatin kuştin.

Di 5'ê Nîsanê de NATO, 6'ê Nîsanê de KN'ê ji bo trajedîya Kurdan, Îraqê lanet dikir. Lê, ne NATO û ne jî KN zêde nikari bûn tiştek bikirana. Ji ber ku mesela Kurd meseleyeke hundirîn bû (!) Serokê Amerîkayê Bush di bahrê de masî digirt û digot; "ev meselê, meselekî hundirî ye. Em nikarin tiştek bikin." Li nav KN, Sovyet, Çîn, Hîndistan û Kuba nedihîştin ku biryarek pozitîf ji bo alîkarîya Kurdan bê girtin.

Lê, bi sed hezaran penaber, bi trajedîya xwe, mesela Kurd kirin meseleyeke hemû dinê, hemû însanan û însaniyetê. Êdî li hember vê trajedîyê çavgirtin û kerrbûyin ne mumkun bû. Di 7'ê Nîsanê de, balafirên Amerîkayê xwarin, vexwarin, betanîye û hwd. Bi paraşûtan re, ji penaberan re davêtin. Di vê rojê de, Vezîrê Derveyî yê Amerîkayê, J. Baker, ji bo penaberan diçû Tirkiyê.

Di 9'ê Nîsanê de Civata Bazara Ewropê (EG) li Luxemburgê, ji bo Kurdan, biryara avakirina herêmeke azad digirt.

Li gor texmîna Komîsyona Penabera ya KN; herî dawî, 715 hezar penaber derbasî Îranê û 280 hezar penaber jî derbasî Tirkiyê bûbûn. Û bi sed hezaran penaber li ber sinorê Tirkîyê û Îranê, di bin sar û sermayê de diqefilin, nexweş dibûn û dimirin. Li gor nûçekanîyên Tirkiyê, heta niha 1500 kes mirine, piranîya wan jî zarok in.

Xwarin, vexwarin, derman, betanîye û tiştên ku bi balafiran tên balfirgeha Dîyarbekirê, bi qamyonên mezin neqlî ser sînor dibin. Piştî 12 saet rê, qamyon digîhîjin ber sinor, lê belê, barên qamyonan nagîhîje alîyê din ê sînor. Çiyayên bilind û asê, rêyên bi ax îmkan nadin, ku xwarin û vexwarin bigîhîje penaberan. Divê helîkopter bibin û helîkopter jî tune ne.

Li vî alîyê sînor, gava mirovên birçî û tî, ji bo nanek, batanîyek û tasek av bihev dikevin, li wî alîyê sînorê, zar û zêç, kal û pîrên çav li rê, nan û tasek av dipên. Zarokên ku di hemêzên dayik û bavikan de, diqefilin û dilerizin, laşê wan ên teze û bêteqet mor dibe û deng ji wan tê birîn. Êdî ew ne nan û ne jî av dixwazin...

Volkmar Schultz-Igast, ji Xaça Sorê Almanî yê ku hate heremê, ba penaberan, ji rojnamevanekî re wisa digot.

- Ji 10 zarokan 9 nexweş in, di laşê wan de av nemaye. Hêjmarên zarokên nexweş ji 10 hezarî zêdetir in û salê wan di bin 5'an de ne.

Do min jinikek dît. Zarokek di hemêza wê de bû. Piştî sermayê, sê roj li ser çîyê, zarok mirîbû.

10.04.1991



www.arsivakurdi.org

# ROJ BI ROJ

Amadekar: Amed Tîgrîs

Di roja 26'ê sibata 1991'ê de Amerîka pişta ordiya Saddam a Ewlekara Komarî şikest. Amerîka, bi yek alî şer da rawestandin. Bi rawestina şer re, li Kurdistanê di bin pêşengiya Kurdan de, Kurd, Asûrî, Tirkmen û li Başûrê Iraqê ve jî Arabên Şîî li dij rejîma Saddam dest bi serhildanên çekdarî kirin. Min xwest van bûyer û nûçeyên ku li Kurdistanê û li derê welat pêk hatin, roj bi roj bi awayekî bê şirove (bê komentar) binivîsim. Şirovekirina wê jî xwendevanên dilovan re dihêlim!

## 11'ê Adarê 1991

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal çû Moskovayê. T. Özal di balafirê de, ji rojnamevan re got ku "di vê heftê de Celal Talabanî û temsîlvanê Mesûd Barzanî hatin Tirkiyê."

Li ser pirsên rojnamevanan, Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal, weha bersiv dida:

- Kurd di herêma me de dijîn. Ingiliz, Amerîka û dewletên din yên Rojava wan bi resmî qeûl dikin û bi wan re rûdinin, lê çima em bi Kurdan re rûnenin? Em dixwazin li bakurê Iraqê dewleteke federatîf avabibe û Kurd û Tirkmen jî di nav vê federasiyonê de bin. Garantoriya vê dewleta han jî, yek jê Tirkiye be; an jî Tirkiye, Suriye û Iran bin. Li Tirkiyê jî, 12 milyon Kurd hene. Kurd neteweyek in. Divê Tirkiyê hamîtî li Kurdan bike. Lê, em li dij dewleteke serbixwe ya Kurdan in. Em bi qetûyet, li bakurê Iraqê dewleteke Kurd ya serbixwe naxwazin. Heger çêbibe jî, em dê bi xwe mudaxelê wê bikin.

Ev nûçe li Tirkiyê wekî bombeke teqîya. Muxalefet li dij hatin û hevdîtina Tirkiyê û Kurdan derket. Muxalefetê, Turgut Özal bi xaîntiyê îtham kir.

Li gor nûçeyan, Kurd li Kurdistana Iraqê gelek herêman girtine bin kontrola xwe. Di nav de bajarê Silêmaniyê jî heye. Li gor nûçeyan, Iro jî hêzên Kurd derdor li bajarê Hewlêrê girtine û hewlêr li ser ketinê ye.

## 12'ê Adarê

Li gor nûçeyên ku ji Kurdistana Başûr tên, gelê Kurd i dij rejîma Saddam serîhilda. Li Başûrê Iraqê jî, li bajarên Basra, Necef, Kerbela û li hinek bajarên din yên ku Şîî lê dijîn li dij rejîma Saddam serîhildan her ku diçe geş û berfireh dibe. Lê, yek bi rastiyê nizane, ku li herêmê çi dibe û diqewime. Imkanên masmediya cîhanê tuneye, ku nûçeyên rast û teze bigire û belav bike.

## 13'ê Adarê

Bereyê Kurdistanê bi gelê Kurd re bû yek û pêşengiya serhildanê girt destê xwe. Ew Kurdên ku heta niha bê teref bûn û yên ku di ordiya Iraqê de leşker bûn, dest dan ser cek û cebilxanên ordiya Iraqê. Wan ji bo serîhildanê bangê partî û hêzên Kurd kirin, ku werin û bi hevdu re, li dij rejîma Saddam şer bikin. Mesûd Barzanî bi pêşmêrgan ve kete Kurdistanê.

## 14 ê Adarê

Li bakur û başûrê Iraqê Kurd û Şîî şerê berxwedanê berfireh kirin. Li Kurdistanê çend bajarên biçûk ketin destê hêzên Kurd. Bereyê Kurdistanê bi pêşmêrgeyên xwe ve li Kurdistanê cîh dibe û xwe ji şerê mezin û giran re amade dike.

## 15'ê Adar ê

Li Kurdistana Başûr, gelê Kurd serî hilda. Silêmaniye, Helepçe û Xaniqîn ketin destê pêşmêrge. Ordiya Iraqê li Kurdistanê belav dibe.

Di 15-17 Adarê de Konferansa Parastina Mafê Gelê Kurd li Stockholmê civîya. Konferansê, bi dilşahî û germî silav li şoreşê kir.

## 16'ê Adarê

Hewlêr rizgar bû. Pêşmêrge derdor li Kerkûk û Zaxoyê girtin. Ordiya Saddam li Kurdistanê bi çekên xwe yên giran ve teslîmê hêzên pêşmêrge dibe. Balafirên Saddam hêzên pêşmêrge bombabaran kirin. Amerîka, 2 balafirên Iraqê xistin. Û komûtanê Amerîa yê hêzên Xalîcê ultîmotomek da Iraqê û got ku :

- Li gor peymana şêrê, Iraq nikare balafir û heîkopterên xwe rabike û bikar bîne. Heger Iraq balafir û helîkopterên xwe bikar bîne, ev îhlala peymanê ye û em dê dest bi şer bikin.

Hêzên Amerîka bi vê ultomatonê re 50 km ber bi Baxdayê ve meşîya. Iraq tirsa û dev ji bikaranîna balafir û helîkopteran berda.

Piştî şer, îro çara yekem Saddam Huseyîn derket TV ya Iraqê û gelek firehî li ser pirsa Kurd rawesta û banga Kurdan kir:

- Piştî şer ez dê demokrasiyeke rastîn bînim Iraqê û dê Kurdên bira yên me jî, di nav vê demokrasiyê de otonomiya xwe û heqên xwe yên netewî û demokratîk bigrin...

Parlementoya Belçîkayê biryar girt ku pirsa Kurd bibin Koma Neteweyan û heta ku pirsa Kurd çareser nebe, dê Belçîka nehêle Tirkiye bibe Endamê Civata Bazara Ewropê.

16 Adarê di dîroka Kurd de, rojeke tarî û şîn e. Roja qetlîama Helebçeyê ye. Piştî 3 salan îro Helepçe rizgar e û di destê hêzên Kurd de ye. Di serî de li bajarê Helebçê li her derê Kurdistanê û li seranserê Ewropa Kurdan qetlîama Helebçê bi civîn, mîtîng û meşan bi bîr anîn. Li Stockholmê di roja 16 Adarê de,bi însîyatîfa Fedrasyoana Komeleyên Kurd li Swêdê, qasî 3500 kesî bi meş û mitîngeke, qetlîama Helepçê bi bîranî. Konferansa Stock-

www.arsivakurdi.org

holmê saetek nabeyn da civîna xwe û gelek nûnerên Konferansê beşdarê meş û mitîngê bûn. Dr. Mahmûd Osman li ser navê Bereyê (cephe) Kurdistanê di derheqê rizgarakirina axa Kurdistanê û rewşa Saddam de agahdarî da beşdaran. Televîzyon, radyo û rojnameyên Swêdî gelek cîh dan meş, mitîng û nûçeyên Konferansa Stockholmê.

## *17'ê Adarê*

Kerkûk û Zaxo ketin bindestê pêşmêrge. Ala Kurd li her derê Kurdistanê li ba dibe.

Mesûd Barzanî nûçevan û rojnamevanên Ewropî vexwend Kurdisatnê. Rojnamevan û nûçegîhanên Ewropî ji bo çûndina Kurdistanê, diçin Suriyê, İran û Tirkiyê. Van hersê dewletan sînorên xwe ji bo rojnamevanan jî girtin. Konferansa Stockholmê 3 roj dom kir û îro dawiya wê hat. Ji bo bi destxistina mafê gelê Kurd biryarên hêja girt. Ji bo pêkanîna van biryaran komîte pêk anîn û deklerasyonek belav kir.

Hemû partî û hêzên Kurd li Stockholmê bi civîneke taybetî silav û rêzên xwe pêşkêş kirin û heta dawî pişgiriya xwe ji serhildanê re dan dîyar kirin.

## *18'ê Adarê*

Pêşmêrge êrîşeke mezin bir ser bajarê Mûsilê. Ji derî Mûsilê hemû bajarên Kurdistanê yên mezin rizgar bûn. Mesûd Barzanî li Bajarê Silêmaniyê bi milyonan re mîtîngeke pêk anî. Li herêmê hemû dezgehên dewletê ketine destê Bereyê Kurdistanê. Li Kurdistana Başûr dewleta İraqê hildiweşe.

## *19'ê Adarê*

Celal Talabanî li Şamê daxuyanîyek da ku bi hemû hêzên oposîzyona İraqê re, amadeye ku herin Kurdistanê û di nav şer de hukumetekê saz bikin. Talabanî xwe bi çûndina Kurdistanê re amade dike.

## *20'ê Adarê*

Celal Talabanî di sînorê Suriyê de, bi hinek serokên oposîzyonê û hêzek pêşmêrge ve çû Kurdistana Başûr. Li gel wî gelek rojnamevan û nûçegîhanên Ewropî jî çûn Kurdistanê.

## *21'ê Adarê*

Talabanî bi heyeta xwe ve gehêşt bajarê Dihokê. Li Dihokê mîtîngek pêk anîn. Bi hezaran kes beşdarê mîtîngê bûn. Talabanî di mîtîngê de axaft.

## *22'ê Adarê*

Li gor nûçeyan, hêzên Saddam ên Parastvanên Komarî li Başûr bi barbarî Şîîyan dikujin û serhildana Şîîyan li ber têkçûnê ye. Ji bo êrîşkirina Kurdistanê jî, xwe ji şereke gelek giran û dijwar re amade kirin. Ji bo êrîşa mezin û dijwar Kurd çeperên şerê dikolin. Kozikan çêdikin.

Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal piştî vegera Sovyetê, îro jî çû Amerîkayê.

## *23'ê Adarê*

Saddam giraniya xwe da eniya Kurdistanê. Şer di navbera hêzên pêşmêrge û yên Saddam de dom dike. Lê, ji % 90 axa Kurdistanê di bin kontrola pêşmêrge de ye.

Turgut Özal, li Camp David li ser pirsên Rojhilata Navîn bi Bush re civînek pêk anî. Yek bi naveroka civînê nizane. Li gor texmînan pirsa Kurdan ya sereke ye.

## 24'ê Adarê

Bush û T. Özal piştî hevdîtinê presskonferansek pêk anîn. Bush got em mudaxeleyê karê nav İraqê nakin. Nûçegîhanê CNN ê ji Turgut Özal pirsî:

- Hûn İraqeke bê Saddam dixwazin?

Bersiva Turgut Özal:

- Em mudexela hundirê İraqê nakin.

Çapemeniya cîhanê û ya Tirkiyê bi xwe nivîsandin, ku "Turgut Özal mesaja Saddam ji Bush re birîye ku Bush bihêle ku balafir û helîkopterên xwe li dij Kurdan bikarbîne. Bush û Turgut Özal li ser wê pêşniyariya Saddam li hevdu kirine."

## *25'ê Adarê*

Şer di nav hêzên pêşmerge û Saddam de dom dike. Ji ber ku rojnamevan û nûçegîhanên bîyanî li Kurdistanê û İraqê tune ne, kes baş nizane ka rewş çi ye. Her du alî jî dibêjin, ango hem Kurd û hem jî İraq dibêjin ku " em bi pêş ve diçin. Hêzên me bi ser dikevin."

## *26'ê Adarê*

Li gor CNN hêzên Saddan êrîşeke mezin birin ser bajarê Kerkûkê ku di bin kontrola Kurdan de ye. Şerekî gelek dijwar di nav hêzên Kurd û Saddam de heye.

Li gor nûçeya İranê İRA hêzên Şîî xwe berhev dikin û dixwazin êrîşekî mezin bibin ser bajarê Bexdayê.

**Kroll CBS TV** lêkolînek çêkir û li gor vê lêkolînê Saddam Huseyîn bi wesîta zirbirayê xwe **Barzan el Tikritî 10 milyar dolar** pere li ser hesabê xwe derxistiye der û birîye Amerîka. Barzan el Tikritî niha li ser navê Iraqê li Cenevrê, di Buroya Koma Netewan ya Mafê Mirovî de nûnerê İraqê ye. Ev pereyên wî niha li ser navê birayê wî di şirketên Amerîka de ne. Ev pere ji %5 petrola İraqê hatiye girtin. Herweha Saddam di dinyayê de dewlemendê yekemîn e.

## 27'ê Adarê

Di riya Mûsil û Dihokê de, di navbera Kurd û hêzên Saddam de şerên dijwar pêk tên. Herdu alî jî, dibêjin "em bi serketin". Hêzên Saddam çekên giran û dûrmenzîl bikar tînin.

## *28'ê Adarê*

Şer berdewam e. Kes baş nizane ka li İraqê rewş çawan e. Lê, Saddam hemû çekên xwe yên giran yên ku nikaribûn li dij hêzên hevkar bikar bîne, li dij Kurdan bikar tîne. Li gor Bexdayê paqijkirina Kurdan çend roj digire. Hema hema li Kurdistanê kontrolê girtiye destê xwe.

Kurd, İraqê bi derewan îtham dikin û "dibêjin şer berdewam e û di bin kontrola me de ye."

www.arsivakurdi.org

## 29'ê Adarê

Şer her berdewan e û tû kes nikare ji Kurdistanê û Iraqê nûçeyên rastîn bigire. Iraqê bi tevayî serhildana li Başûr ya Şîîyan şikestandiye û hemû giraniya xwe daye Kurdisatanê. Hêzên pêşmêrge di berxwe dide. Nûçegîhanên Rojava dibêjin plana Saddam ew e, ku ji Kerkûkê heta Zaxo şerîta sînorê Kurdistanê û Suriyê bigire. Heger hêzên Saddam riya Suriyê li Kurdan bigre, êdî Kurd nikarin alîkariya xwarinê ji derve bigrin û dê di çend rojan de teslîm bibin. Ji ber vê yekê ordiya Saddam a Parastvanê Komarê ber bi sînorê Suriyê û Tirkiyê ve diçin.

## 30'ê Adarê

Saddam dest bi karanîna balafir û helîkopteran kiriye. Li dij Topên dûrdirêj bi kartîne. Çekên kîmyewî û napalm bi kartîne. Skûdan (Scud) davêjin bajarên Kurdistanê. 11 skûd bi tenê avêtiye bajarê Kerkûkê. Şer bi dijwarî di nav hêzên Saddam û pêşmêrge de dom dike. Amerika û hêzên Hevkar ji bo bikaranîna balafir, helîkopter û çekên kîmyewî Saddam re çavên xwe digrin. Çendek berê, dema Saddam balafirên xwe bi kar anî, Amerîka ji wan balafiran dudoyan xist û Iraqê tehdît kir ku "heger ew balafir û helîkopterên xwe bikar bîne, dê Amerîka hingê peymana şer a rawestandinê ji navê rabike û dîsa dest bi şer bike." Lê, Saddam niha balafir, helîkopter û skûd li dij Kurdan bi kar tîne û Amerîka û hevalbendên xwe jê re tamaşevan in. Bi satelîtan lê temaşe dikin.

## 31'ê Adarê

Li gor nûçeyan hêzên Saddam bi balafir û helîkopteran li Kurdistanê gav bi gav pêşve diçin. Hêzên Saddam bi topên dûrmenzîl û skûdan Kurdistanê wêran dikin. Bajarê Kerkûkê bi paş ve ketiye destê hêzên Iraqê. Êrîş dibin ser bajarên din. Li gor nûçegîhanên CNN, li Kerkûk, Hewlêr, Silêmaniyê kevir li ser kevir nemane. Saddam ew teknîka ku nikaribûn li hember hêzên Hevkar û Amerîka bikarbîne, li dij Kurdan bi kartîne. Bajar hema hema li ber ketinê ne. Xelk ji bajaran derdikeve. Bajar ji dûxan û agir nexuyane. Hêzên pêşmêrge, li hember çekên modern, kîmyewî û bîyolîk bi qehremanî li ber xwe didin.

## 1'ê Nîsanê

Beyanî (sibehê zû) berey ê Kurdistanî hemû rêxistinên xwe yên Ewropa agahdar kir, ku ji ber êrîşên balafir, helîkopter û skûdên Saddam bi hezaran xelkê sivîl bajar û gundê xwe hiştin û ber bi sînorê Tirkiyê, Suriyê û Iranê ve direvin. Qasî milyonek kes ji malên xwe derketine û li rê ne. Ji ber neqetilkirina xelkê sivîl, pêşmerge xwe ji hinek bajaran paşve kişand. Li derê bajaran şer dom dike. Ji bo pêkanîna raya giştiya cîhanê û bi taybetî ya Ewropa, Kurdên li derê welêt divê xwe bi hemû îmkanên xwe ve amade bikin.

Rêxistinên Kurd û Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, bi hevdu re komîteya çalakiyan pêk anîn û dest bi çalakiyan kirin. Xwepêşandanek li hember konsolosxana Amerîka ya li Stockholmê pêk anîn. Qasî 700 kesî beşdarî xwe pêşandinê bûn.Xwepêşandanan xwestin ku hêzên hevkar, Amerîka û Koma Neteweyan qetlîama ku li Kurdistanê dibe, mudaxeleyê wê bikin. Welatên Hevkar û Koma Neteweyan divê li ser soz û peymana xwe rawestin û li gor peymana ku di nav hêzên Hevkar û Iraqê de pêk hatibû, divê Iraq balafir, helîkopter, skûd û çekên kîmyewî û bîyolojîk li hember Kurdan jî, bikar neyîne. Bila Koma Neteweyan û hêzên Hevkar rê nedin bikaranîna wan çekan. Pêşî li qetlîama faşîstê Bexdayê bigrin.

## 2'ê Nîsanê

Kurdan li seran serê Ewropayê dest bi meş, mîtîng û grevên birçîbûniyê kirin. Li Stockholmê Komela Jinan li ba konsolosa Amerîka dest bi greva birçîbûniyê kir. Gelek komele û kesên din jî beşdarê çalakiyên birçîbûniyê bûn. Bi sedan kes bi şev û roj li ba Konsolosa Amerîka civiyan. Kon vegirtin. Ji bajarên din Kurd hatin Stockholmê. Hema hema her Kurdekî dest ji kar û mala xwe berda û şev û roj li ba Konsolosê beşdarê çalakiyan bû.

Televîzyon û radyoyên cîhanê dest pê kirin nûçeyên li ser Kurdan di rêza yekemîn de dan. Ew Kurdên ku ji ber barbariya Saddam tengezar û derbeder dibûn, fotografên wan hatin ekranên TV û rûpelên rojmameyan.

Bush di tatîla xwe ya Paskalyê de bû û masî digirt. Nûçegîhanên TV qetlîama Kurdan jê pirsîn. Bê dil bersiv da û got:

-Me eleqeder nake. Ew karê nav Iraqê ye. Em mudaxela nav Iraqê nakin.

## 3'ê Nîsanê

Li Stockholmê, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, li Stockholmê, li dij konsolosxana Iraqê meş û mîtîngeke protestoyî pêk anî. Bi hezaran kes beşdarê meş û mîtîngê bûn. Li ba Kosolosxana Iraqê çend xortan xwestin êrîş bibin ser konsolos



www.arsivakurd.org

xanê. Şer di nav polîs û wan kesan de derket. Polîs bi hesp û kûçikan êrîşî beşdaran kir. Gelek kes birîndar bûn. 33 kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li ba Konsolosxaneya Amerîka greva birçîbûniyê dom kir. Bi hezaran Kurd û Swêdî birçiyan zîyaret kirin û gul dane wan û piştgiriya xwe dîyar kirin.

Di eynî rojê de, li Çekoslovakyê jî, li dij konsolosxana Iraqê meşek û mîtîngek pêk hat.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê, Hêzên sîyasî yên Kurdistanê û Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê di nav xwe de komîteyeke çalakîyan pêk anîn û dê ji vir şûn ve, ev komîte çalakîyan bi plan û program bimeşîne.

## 4'ê Nîsanê

Komek Kurd bi çek konsolosxana Belçîkayê îşgal kirin. Personalên wê dîl girtin. Ala Iraqê daxistin û ala Kurdistanê dakişandin ser konsolosxanê.

Kurdan li Londrayê meş û mitîngeke çekirin. Ji jin û zarokan komek, serokwezîra kevin Margereta Theacher zîyaret kirin û pişgirî jê xwestin. M. Theacher, wan qebûl kir û soz da ku ew dê bi hukimeta Ingiliztanê re têkiliyan dayne, ji bo alîkariya Kurdan.

Li Almanya li dij konsolosxana Iraqê meşek çêbû. Konsolosê bi çekên otomatîk meşvanan gulebaran kir. Kuştin çênebû. Gelek Kurd ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li Amerîka bûyereke mezin çêbû. Li ba Qesra Spî mîtîngeke pêk hat. Bêdengiya FN (Koma Neteweyan) û Amerîka hat protestokirin.

Dewleta Fransê pirsa Kurd bir Koma Neteweyan. Tirkiyê û Swêdê xwestin piştgiriya pêşniyariya Fransê bikin. Di civîna FN de Sovyet, Çîn û Kuba, Hîndistan û Zimbaw li dij pêşnîyariyê derketin. Pêşnîyarî nehate qebûl kirin.

Senatoya Amerîka rexneyên tûj û dijwar li Bush girtin. Li dij tewrê Bush muxalefet bi hêz bû. Bush, di TV de axaftinek kir û gotinên xwe yên berê dûbare kir:

- Em nikarin mudaxeleyê nav Iraqê bikin. Ev karê wan yê hundirî ye.

Rojnamevanê Kurd Eşref Okumuş û fotografvanê Norveçî Georg Kristiansen di dema rizgarkirina bajarên Kurdistanê de, di riyên îllegan de çûbûn




Foto: Stefan Hagberg

Kurdistanê. Herdu ji Kurdistanê vegeriyan Swêdê. Di rojnameya êvarê Aftonbaldet de, li ser Kurdan dest bi weşandina fotograf û nivîsaran kirin. Aftonbladet, di rûpelên yekemîn de, fotografên zarokên birîndar û seqet pêşkêş kir û 3 roj li duv hev dom kir.

TV ya Swêdê, bi Eşref Okumuş, berpirsîyarê Bereyê Kurdistanê Dr. Mecîd Cafer û bi navê Şêrîn keçikeka Kurd re programek çêkir. Rojnamevanê Kurd Eref Okumuş, behsa kirinên rejîma Saddam kir û li ser rewşa Kurdan a nû agahdarî da. Ji wehşeta rejîma Saddam çend fotograf û hevpeyvîn pêşkêş kir.

Spîkerê swêdî; pirsa "gelo hûn Kurdistaneke serbixwe dixwazin?" ji berpirsiyarê Bereyê Kurdistanê Dr. Mecîd Cafer kir. Bersiva Dr. Mecîd Cafer:

- Kurdistaneke serbixwe xeyal e. Ev daxwazeke reel nîne. Kî bixwaze, dikare ji xwe re xeyal bibîne, xeyal dîtin belaş e.

## 5'ê Nîsanê

Koma Neteweyan, Pirsa Kurd dîsan girt rojeva xwe. Di pêşnîyara Fransê de guhartin çêkirin. Naverokê hîn jî nerm û vala kirin. "Bi tenê Iraq divê êrîşê ser ew kesên sivîl û bi taybetî yên ku di rê de, ji ber rejîmê direvin neke. Di nav 15 dewletên endam de dengdan çêbû. Kuba, Yemen û Zîmbaw li dij derketin, Hîndîstan û Çin bê deng man. Cara yekem pirsa Kurd di Koma Neteweyan de hate gotûbêj kirin û biryar li ser hat girtin.

Li Wîyanê, li dij Iraqê meş û mîtîngek pêk hat. Iraqê Protesto kirin. Kurt Waldheim jî, Rejîma Saddam bi tûndî suçdar kir.

Li seran serê Almanyayê Kurdan dest bi xebatên protestoyî kirin û têkiliyên xwe bi rêxistinên navnetwî

yên polîtîk û humanîst re geş kirin. Li Bonn û Hamburgê gelek meş û mîtîng pêk hatin. Xaniyê Xaça Sora Hamburgê hat îşgal kirin. Xaça Sor soz da, ku 500.000 mark ji bo alîkariya Kurdan dê bişêne.

Li Cenewrê Kurdan li ba KN (Koma Neteweyan) meş û mîtîngeke protestoyî pêk anîn. Li Bajarê Bernê jî meşeke girsî çêbû.

Li bajarê Warşowê, xwendekarên Kurd û dostên Kurdan ên Polonî, li dij rejîma Iraqê meşeke protestoyî pêk anîn û ji hukimeta Polonyayê daxwaza protestokirina rejîma Iraqê kirin. Di 6'ê nîsanê de, parlementoya Polonyayê û Wezereta Karûbarê Derveyî ya Polonyayê bi daxuyaniyek rejîma Iraqê, bi qetilkirina Kurdan sûcdar kir.

Xwendekarên Kurd li Sofyayê 5 rojan ketin xwepêşandana birçîbûniyê. Li dij rejîma Iraqê qasî 40 hezarî îmze berhev kirin.

Folk Partiya Swêdê, pêşnîyarî ji parlementoya Swêdê re bir, ku pirsa Kurd wek ya netewî bibe KN.

Li Amerîka li Qesra Spî û li derê wê opozîsyoneke mezin û berfireh li dij îdareya Bush çêbû. Di pirsa Kurd û Iraqê de rexneyên tûj li Bush girtin. Bush ket tengasiyê. Piçek xwe guhart. Ji bo alîkariyê biryara 60 milyon kronî da. Soz da, ku dê, di hewa de pireyek pêkbîne û xwarin, vexwarin û cil û bergan bigîhîne Kurdistana Iraqê, ew cihên ku penaber li wir in.

Li Swêdê li bajarên Stockholm, Göteborg û Uppsalê grevên rûniştinê, meş û mîtîng her berdewam dikin.




*Foto: Serko Amîn*

## *6'ê Nîsanê*

Pêşniyariya Fransê hat guhartin û naveroka wê hat vala kirin. Pêşnîyar weha hat formile kirin: **"Divê Iraq li ew kesên ku ji ber şer direvin bombe neke..."** bi şêweke weha dîsan hat rojeva KN. Dîsan Kuba, Yemen û Zîmbawe li dij derketin û Çîn û Hîndistan bêdeng man. Ji 15 endamên daîmî 10-an ji pêşniyarê re gotin "belê." û hat qebûl kirin.

NATO li Brukselê civiya û Rejîma Saddam bi tûndî protesto kir û ji KN xwest, ku qetlîamê bide rawestandin.

Derbeder û penaberên Kurd ber bi sînorên Tirkiyê û Iranê ve direvin. Leşkerên Saddam bi helîkopteran li ser wan gulebaran dikin. Zarok û kal û pîr di rê de dimrin. Sar e. Berf dibare. Gel tazî û birçîne. Ji birçîbûnê û sermanan di rojê de, bê hejmar dimrin. TV yên cîhanê hema serê her saetî penaber û derbederên Kurd nîşan didin. Mirî, nexweş, seqet û zarokên birçî....

Kurdan li peytextê Fînlandyayê, li Helsînkiyê li dij konsolosxana Iraqê meşek çêkirin. Kurdek xwest ala Iraqê ji dîrega konsolosxanê daxe û ya Kurdistanê bikşîne. Personalên Iraqê bi çov û çekan êrîşê Kurdan kirin. Şer derket.

Li Almanyayê Komîta Kurd, ERNK û ji çepên Tirk komîtekî çêbû. Komîtê meş û mîtîngek pêk anî. Di meş û mîtîngê de qasî 3000 kes beşdar bûn. Herweha li bajerên Bonn, Berlîn û gelek cîhên din meş û mîtîng çêbûn.

Li seran serê Almanyayê MEDICO INTERNATIONAL û komîteyên din, bi hevdu re, bi alîkariya radyoyê postgiro vekirin. Pere, derman, kinc û betaniye berhevkirin.

Parlementerên Kurd Ahmed Turk, Mehmed Alî Eren û wezîrê berê Şerefedîn Elçî, ji Tirkiyê frîn û çûn Amerîka, li ba xaniyê KN dê 3 rojan bikevine greva birçîbûniyê. Parlementerên partiya HEP jî, li Tirkiyê li ba parlementoya Tirkiyê, li Ankarê ketin greva birçîbûniyê.

## *7'ê Nîsanê*

Papa li Vatîkan daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de kuştina Kurdan protesto kir û ji cîhanê alîkariyê xwest.

Bi berbanga sibehê re, li Stock-



www.arsivakurdi.org

holmê qasî 40 Kurdî avêtin ser konsolosxana Iraqê. Agir berdan xaniyê konsolosxanê û pencere û dergehên wê şikandin. Ji konsolosxanê bi çekên otomatîk li Kurdan agir barandin. Kes nehat kuştin. 34 Kurd ji aliyê polîsê Swêdî ve hatin girtin û wan dan mehkemê.

Komîta Mafê Kurdan li Swêdê li Stockholmê meş û mîtingeke şînî pêk anî. Meşa şînê saet di 13-an de li Humlegården destpêkir. Ji 5000 î bêtir Kurd û Swêdî bi cil û bergên reş beşdarê meşê bûn. Li semta Kungsträgården mîtîngeke gelek mezin pêk hat. Di mîtîngê de parlementerê Partiya Kesk Per Garton, ji Partiya Çep Brit, û dengbêja Swêdî ya bi nav û deng Lill Lindfors û keşîşekî Swêdî axaftin. Wan di axaftinên xwe de piştgirîya xwe dan dîyar kirin. Artîstê Swêdî yê navdar Gösta Ekmen mîtîngê îdare kir.



Mesûd Barzanî û Celal Talabanî, ji Kurdistanê, ji dewleta Swêdê re telgrafek şandin û alîkarî û pişgirtiya wan xwestin. Ev telgraf di mîtîngê de jî hat xwendin.

Li gor ajansên dinyayê heta îro qasî nîv milyonî Kurd derbasê Iranê bûne û hîn koçbarî û rev dom dike. Qasî 150.000 kes jî derbasê Tirkiyê bûne û qasî 300.000 kes jî, di sînorê Tirkiyê de ji aliyê eskerên Tirk ve hatine rawestandin. Tirk bi teqandina çek wan didin rawsetandin.

Wezîrê Karûbarê Derve yê Amerîka, Baker ji bo çareserkirina pirsên Rojhilata Navîn û penaberên Kurd çû Tirkiyê.

## 8'ê Nîsanê

Wezîrê Karûbarê derve yê Amerîka J. Baker bi helîkopterê frî qeza Hekariyê Çelê ( Çukurcayê) bi çavên serê xwe rewşa penaberên Kurd dît. Baker di vegerê de li Dîyarbekir presskonferansek çêkir û got:

- Ev feleket e. Tirkiye û Amerika nikarin ji bin vê rewşa penaberên û derbederên Kurd derbikevin. Divê hemû dinya alîkariyê bike.

Li Brukselê endamên Bazara Aboriya Ewropayê (EG) civiyan. Ingiliztanê di derheqê Kurdan de pêşniyariyeke bi çar madde pêşkêşî civînê kir:

1- Li Bakurê Iraqê herêmeke cografî ji bo Kurdên penaber bêt dîyarkirin. Û penaber divê li wir bi cîh bibin, neçin Tirkiyê û Iranê.

2- Bazara Ewropê 180 milyon dolar bi lez û bez bigihîne penaberan.

3- Li ser rejîma Iraqê ambargoya çek bêt domandin.

4- Organa Yekîtiya Rojavayê Ewropa li ser vê pirsê bicive. Û KN heyetekê bi lez û bez bişêne herêma penaberên Kurd. Ji bo derengmayînê rexne li sekreterê giştiyê KN hat girtin.

Iraqê, biryara Bazara Aboriya Ewropê mudaxela hundirê xwe dît û li gel KN wê biryarê protesto kir.

Parlementerên Kurd Ahmed Turk, Mehmed Alî Eren û Wezîrê kevin Şerefetin Elçî, dawî dan greva birçîbûniya xwe ya li ba xaniyê KN li Amerîka. Alîkarê sekreterê Giştiyê KN wan ji bo hevdîtinê qebûl kir.

Swêdê, ji bo penaber û derbederên Kurd biryara şandina 40 milyon kronî da.

Rojanamevanê Kurd Ferda Turan, xwe gihêştandibû nexweşxanên Suriyê yên ku li nêzî sînorên Kurdistana Iraqê ne. Bi birîndarên Kurdên Kurdistana Iraqê re hevpeyvîn çêkiribûn û fotografên birîndaran kişandibû. TV'a Swêdê, ji wan hevpeyvîn û wênan perçek nîşanda.

## 9'ê Nîsanê

Pêşniyara Ingilîztanê ya ku di Bazara Aboriya Ewropê de hat qebûl kirin, ew çû KN. Sovyet û Çîn ji pêşnîyarê ne memnûn in. Iraqê pêşnîyarê protesto kir.

Rojnamevanên ku li herêma sînorê Tirkiyê û Iraqê ne, dibêjin ku "hîn jî alîkariya xwarin , cil û berg û îlaç nehatiye. Tirk bi zanabûn alîkariyê li paş dixin. Bi peran difroşin penaberan." Işev TV nîşanda ku penaber ji birçîbûnîyê reh û qurmê daran dixwin. Eskerên Tirk derbederên Kurd gulebaran kir û 3 kes hatin kuştin. Bi dehan birîndar bûn.

Mesûd Barzanî daxuyaniyek da çapemeniya cîhanê ku, dema hezên Saddam ketin herêma Kerkûkê gundê Karahejîn ji binî ve, ji navê rakirin. 3000 kes di gund de dijîyan, yek ji wan nehêştin hemûyan, biçûk bi mezinan ve 3000 kesî di navbera çend saetan de kuştin. Rojnameyên Swêdê Aftonbladet û Expressen di roja 9'ê nîsanê de, vê nûçeyê belav kirin.

Heta niha milyonek kes derbasî Iranê, 250 hezar jî derbasî Tirkiyê û qasî milyonek jî, li nêzî sînorê Tirkiyê di nav berfê de vekirî, tazî û birçî dimînin.

Li gor rojnamevanên BBC, Kurdên Kurdistana Tirkiyê bi kamyonan xwarin û eşyan berhev dikin û dibin herêmê, eskerên Tirk ji wan digrin û bi peran difroşin penaberan.

Kurdên Stockholmê, îro jî, li ba konsolosxana Amerîka protestoyên xwe domandin.

Hukimeta Swêdê civiya û ji bo konsolosxana Iraqê ku di roja 7ê mehê de, li Stockholmê li dij Kurdan çek bikaranîbû, wê bûyerê bê qanûnî dît. Huki-



www.arsivakurdi.org

metê 48 saet wext da konsolosxanê ku kê û kîjan çek bi kar anîye divê bêje. Çek teslîmê hukimetê bike. Konsolosê Iraqê çek bikaranînê înkar dike û dike ser Kurdan.

## *10'ê Nîsanê*

Hukimeta Finlandiyê biryara derxistina dîplomatê Iraqê yê ku li konsolosxana Helsînkî dixebitî da. Wî çend roj berê çek li dij Kurdên xwepêşand bikaranî bû.

Berdevikê Qesra Spî îro di presskonferansekê de got, ku " me Iraqê agahdar kirîye ku ji paralela 36 jor ve nikare balafir û helîkopterên xwe bifrîne û li dij penaberên Kurd bikar bîne."

Ev herêm heta 30 km başûrê Hewlêre diçe.

Ji serî ve Ingiliztan dixwaze, ku li Kurdistana Başûr herêmeke ewlekar pêk bîne û Iraq nikaribe leşkerê xwe li vê herêmê bi cîh bike da ku Kurdên derbeder bikaribin li wir bi cîh bibin. Di vê mijarê de, Amerîka dudil e. Ingilîztan dixwaze ji bo vê herêma ewlekar, Amerîka nerm bike û pê bide qebûl kirin. Lê, Sovyet, Kuba û Çîn li dij vê herêmê derdikevin û dibêjin "em nikarin mudaxeleyê nav axa Iraqê bikin."

Iran ji herêma ewlekar re pişgirî kir, lê belê, ne bi tenê ji bo Kurdan herweha ji bo Şîîyên bakur jî daxwaz kir.

Tirkiyê di derheqê herêma ewlekar de dîtina xwe guhart û got ku " heger Iraq êrîşê penaberê Kurd neke, herêma ewlekar ne pêwîst e.

Iraq, dixwaze Tirkiye boruya petrolê ku ji Kerkûkê tê û derbasî Tirkiyê dibe û li Iskenderûnê eksport dibe, vebike. Ji ber ku di dema şerê Xalîcê de, Tirkiyê wan boriyên petrolê girtibû. Ew ambargoya ku li ser Iraqê hebû heta niha dom dike. Iraq dixwaze bi petrolê devê Tirkiyê şil bike. Û ambargoyê bişkîne. Lê, Tirkiyê bersiva Iraqê neda. Iraq dibêje ku " Ji derê vê, em dixwazin têkiliyên ekonomîk jî, bi Tirkiyê re daynin."

Tarik Azîz, di TV de got ku "ev tiştên ku hate serê Kurdan ne sûcê me ye; sucê Amerîka, Rojava û Turgut Özal e. Wan, Kurdan xapandin û li dij me rakirin."

Piştî şerê Kuweytê îro cara yekemîn rojnamevanên bîyanî çûn Bexdayê. Jîyanê li Bexdayê normal dîtin û sibê jî, dê herine Kerkûk û Silêmaniyê.

Tirkiyê bi awakî resmî da xuya kirin, ku heta îro 70 hezar Kurd derbasî Tirkiyê bûne û li aliyê Iraqê jî, qasî 200 hezarî Kurd li çiya hene. Rewşa penaberan gelek xirab e. Hîn jî xwarin, cil û berg negehîştiye wan. Ji birçîbûn û sermayê dimrin. Ji birçîbûnê êrîşî erebayên xwarinê dikin û eskerên Tirk do li Çukurca 3 kes kuştin û gelek kes birîndar kirin. Li Kurdistana Bakur gelê Kurd bi fedakarî xwarin, cil û berg berhev dike, lê, esker û çaş (koricî) ji wan digrin û bi peran difroşin penaberan. Dewleta Tirk jî ew alîkariyên ku ji Ewropa tên bi zanabûn formalîte sedem şandidin û bi paş ve dixin. Rojnamevanên Tirk bi xwe van tiştan dibêjin û dinivîsînin.

Li gor Rojava şer di nav Pêşmêrge û hêzên Saddam de cîh bi cîh dom dike. Pêşmêrge têkneçûye, lê ji bo kuştina xelkê sivîl xwe ji bajaran paşve kişandiye. Ya din jî, hêzên Iraqê bi helîkopter, balafir û skûdên dûrmenzîl bajarên Kurdistanê wêran dikin. Ji ber van sedeman pêşmêrge şerê nav bajar rawestand û hêzên xwe kişand derê bajaran. Li gor nûçegîhan û rojnamevanên bîyanî, li derî bajaran hêzên pêşmêrge piraniya axa Kurdistanê kontrol dike û heger bixwaze dikare bajaran jî bigre. Gelek bajar û qeza bi roj di bin kontrola hêzên Iraqê û bi şev di bin kontrola hêzên pêşmêrge de ne.

Kurdan li ba Parlementoya Swêdê xwepêşandanek pêk anîn. Ji derî Partiya Sosyal Demokrat, ji hemû partiyên ku di parlementoyê de grûbên wan hene, yek hat, axaft û pişgiriya xwe dîyar kir. Beşdaran ji ba parlementoya Swêdê, bi gulên sor çûn ser gora Olof Palme û gul avêtin ser gora wî. Ji wir jî çûn ba ew Kurdên ku di xwepêşandana birçîbûniyê de ne û wan zîyaret kirin. Ji ber ku li Stockholmê, li dêrekê xwepêşandina birçîbûniyê domdike. Bi sedan Kurd çûn birçiyan zîyaret kirin.

Kurdên li Sovyetistanê, di nav xwe de komîtek çêkirin û komîtê dest bi karûbar kir. Kurdan presskonferensek li gel çapemenî, TV û radyoyên Sovyetê pêk anîn. Bê dengiya Sovyetê protesto kirin. Li ba Wezereta Karûbarê derveyî ya Sovyetê Kurd ketin xwepêşandanên birçîbûniyê. Herweha, Kurdan li bajarên Tîblîs, Bakû, Erîvan û Moskovayê civînên protesto kirinê çêkirin.

## *11'ê nîsanê*

Hîn jî alîkarî baş negehêştiya penaberên Kurdên ku li ser sînorên Kurdistana Tirkiyê û yê Kurdisatana Iraqê ne. TV bi dehan cesetên zarok û mezinan nîşanda. Kurd birçî û tazî ne. Êrîşê xwarinê dikin. Baran dibare. Serma bi şevan dikeve binê sifirê. Ji ber tirsa helîkopter, balafir û tanqên Iraqê Kurd ên ku li nêzî sînorên Tirkiyê ne, li serê çiyayên bilind dimînin. Newêrane dakevin cîhên rast, ku alîkarî zû bigehê wan. Çiya giş bi berf in. Derbeder,bê kon û kinc in. Piraniya wan bi cilên tenik û qetandî ne. Betanî û lehêv tunin. Ji ber vê yekê ji serma û birçînan rojê kêmasî 1000 kes dimrin. Piraniya yên ku dimrin zarok, kal û pîr in. Li gor nûçegîhanan, li ser sînorê Tirkiyê hejmara penaberên Kurd gehîşt 400 hezarî.

Cara yekem nûçehînanên cîhanê gehîştin Iranê û rewşa penaberên Kurdên li Iranû nîşandan. Rewşa wan ji yên li Tirkiyê û ji yên ser sînor xerebtir e.

Hêzên Saddam îro li herêma Kerkûkû Sulêmaniyê li dij Kurdan dîsan helîkopteran bikaranî. Lê, Amerîka hîç deng dernexist. Xwe kerr û lal kir.

Wezîrê Karûbarê Derve yê Iraqê Tarik Azîz, Tirkiyê û Iranê sûçdar kir û got: " Tirk nahêlin Kurd li Tirkiyê bi kurdî bipeyîvin û Iran jî hebûna Kurdan qebûl nake; lê, me otonomî daye Kurdan. Dîsan jî, ev herdu dewlet ji bo Kurdan li ser me komployan çêdikin."

Ji aliyê din ve, Tarik Azîz xwest were Tirkiyê û li ser pirsa Kurdan bi Tirkiyê re rûne. Tirkiye li ser vê yekê difikire.

Di ser Baxdayê re, cara yekem di bin kontrola hêzên Saddam de, 20 rojnamevanên bîyanî çûne herêma Kurdistanê. Rojnamevanê Tirk Alî Haydar Yurtsever, nûçeya xwe weha digîhandin BBC'yê:

- Iro em 20 rojnamevanên bîyanî di bin kontrola hêzên Saddam de çûne bajarên Kerkûk û Silêmaniyê. Her cîh wêran bûye.Li wan bajaran kontrol bi temamî di bin destê hêzên Iraqê de ye. Ji sivîlan bêtir esker li wan bajaran hene. Nehêştin em bi xelkê re qise bikin. Piraniya xelkê bi kurdî qise dikirin. Berê roket û topan bi çiyan ve ne. Li Silêmaniyê qetlîam heye. Bi do-

www.arsivakurdi.org

zeran ji bin erdê cesed deranîn. Bi sedan kes kuştine û kirine bin erdê. Cesedên wan nayêne naskirin. Îraq dibêje ku "Kurdan di dema bajêr girtine hemû esker, endam û kadroyên Partiya BAAS qetil kirine."

Bi Tirkmenan re peyîvim, wan digot "sûcê me tune. Berê Amerîkiyan me bomba kirin, paşê Kurd hatin û mirovên me kuştin."

Li Stockholmê konsolosxana Swêdê navê ew dîplomatê xwe yê ku bi çekê otomatîk li Kurdan çek teqandibûn da dewleta Swêdê. Hukimeta Swêdê, wî kesî ji Swêdê derxist û wê çekê otomatîkê ku bikaranî bû jî, ji konsolos dixwaze. Konsolosa Îraqê heta niha çek teslîm nekirîye.

Kurdan, li ba konsolosxana Kubayê ya li Stockholmê mîtîngek pêk anîn û tewrê Kubayê ku li KN li dij Kurdan girti bû protesto kirin.

## *12'ê Nîsanê*

Hemû TV yên cîhanê perîşanî û belengaziya derbeder û penaberên Kurd di nûçeyên xwe yên yekemîn de didin. Di rojê de, bi hezaran derbeder û penaber ji serma û birçînan dimrin. Hîn jî alîkariya navnetewî baş û têr negihîştiye wan. Tazî, birçî û pêxwas in.

Amerîka biryar girt, ku di hewa, erd û di avê de bi lez û bez alîkariyê bigîhîne penaberan. Amerîka ji bo vê yekê 100 helîkopter amade kir. Ji aliyê din ve Amerîka dîyar kir, ku "li Kurdistanê ji bo penaberan herêmeke azad pêwîst e."

Sovyet, li dij avakirna herêmeke azad derket û got:

- Em pêşnîyariyeke weha qebûl nakin, ji ber ku dê ji bo rojên pêş ev bibe mînakeke ne baş.

Îngiliztanê got:

- Herêma azad bi nîyeta Îraqê ve girêdayî ye. Em pişgiriya vê pêşnîyariyê dikin.

Koma Netewan biryar girt ku ji 50-100 kesî heyetek bişêne Îraqê û di derheqê rewşa derbeder û penaberan de bi Îraqê re bipeyîvin.

Îraqê, ew efûya ku ji bo Kurdan çend roj berê derxistibûn hefteyeke jî dirêj kir. Li gor nûçevanên Ewropî ku li Îraqê ne, kêm kes bi paş ve vegerîne cîhên xwe. Kurd, ji Saddam û efûya wî bawer nakin.

Wek tê zanîn Civata Aboriya Ewropê 180 milyon dolar ji bo penaberan dê bişêne. Ji wê 3/2 bişênin Îranê.

Kurdên Awustralyayê jî li bajarên Sydney, Briston û Melbourn li ba konsolosxanên Amerîka dest bi xwepêşanên birçîbûniyê kirin. Kurdan delegasyonek pêk anîn û delegasyon bi bi wezîrê Karûbarên Derveyî yê Awustraliyayê re têkilî danî. Wezîr delegasyonê qebûl kir û guhdariya daxwazên wan kir. Serokê kevin ê hukimetê Malcon Frosor bi însîyatîva xwe dest bi kampanyaya alîkarî ya derbederên Kurd kir. Serokwezîrê Awustralyayê jî soz da Kurdan ku pirsa Kurd bibin Koma Neteweyan.

Swêdê, mîqtara alîkariyê ji 40 milyon kronî derxist 100 milyon kronî. Balafirên Swêdê dest bi birina xwarin û eşyan kirin. Swêd naxwaze alîkariya xwe teslîmê Tirkiyê bike. Ji ber vê yekê alkariya Swêdê gelek bi derengî ket. Di vî warî de tecrûbeyên Swêdê hene. Di 1988-an de Swêdê ji bo penaberên Kurd alîkariyê şandibû Tirkiyê. Dema heyeta Swêdê çû û di cîh de alîkariya xwe kontrol kir, dît, ku Tirkiye, ji % 80 alîkariyê negîhandiye penaberên Kurd.

Konsolosê Îraqê, ew çekê otomatîkê ku li dij ew Kurdên ku êrîş biribûn ser konsolosxanê bikaranî bûn îro teslîmê dewleta Swêdê kir.

## *13'ê Nîsanê*

Oposîzyona Amerîka û cîhanê di pirsa Kurd de zorê dide Bush û îdara wî. Bush, îro presskonferansek pêk anî û bi awayekî hêrs weha got:

- Ez leşkereke xwe naşînim şer an jî herêma Kurdan. Bila vê yekê her kes bizanibe. Lê, em ji bo penaberan alîkariya cil û xwarinê dikin.

Wezîrê Karûbarê Derveyê Almanyê Gensher, îro di derheqê Saddam de daxuyaniyekî da û di daxuyaniya xwe de got:

- Saddam li dij huqûqa nav dewletan, li dij qanûna Koma Neteweyan sûcê mezin kiriye. Ew sûcdarê şer e. Ev sûç divê neyê efûkirin. Pêwîst e Koma Neteweyan Saddam mehkeme bike. Wek Hîtler û hevalên wî ku li mehkemeya Nurnbergê hatin sûcdarkirin..

Îraqê, cara duyemîn rojnamevanên bîyanî bire Hewlêrê. Rojnamevanê Tirk Alî Haydar Yurtsever di vegerê de, li ser gera Hewlêrê ji BBC re weha digot:

- Em îro di kontrola hêzên Îraqê de çûn bajarê Hewlêrê. Hewlêr wêran bûye. Şewitiye, xirabûye. Portreyên Saddam hemû hatine çirandin û li ser dîwaran sloganên hêzên Kurd hene. Bajar bi temamî di bin kontrola Îraqê de ye. Li nav bajêr û li derdor û ser xanî yên resmî bi çekên giran leşkerên Îraqê hene. Bajar bi tank û top tije ye.

Min bi serokê herêma Otonomî El Berzencî re qise kir. Wî got:

- Çete, çapûlvan û terorîst hatin bajar xirab kirin. Gelek kes kuştin. Talan kirin û çûn. Em dê cezayê wan bidin. Ji wan re efû tune. Ew hevsarkêşên dijmin in....

Li gor şirovevanên BBC, "Amerîka û hevalbendê xwe pêşî pişt li Saddam şikandin. Paşê dîtin ku Kurd li Bakurê Îraqê bi hêz bûn û li başûr jî Şiî. Ev ji bo Amerîka, Tirkiye û hevalbendên wan bû tehlîkeyeke mezin. Ji ber vê yekê rêdan ku Saddam vê tehlîkê bişkîne û yekîtiya Îrakê biparêze.. Û kirin. Saddam Kurd û Şiîyan şikand. Niha dor hatiye ser xistina Saddam. Dê di demeke gelek kin de Saddam bixin û herweha penaberên Kurd jî bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber vê yekê Amerîka niha ji penaberan re alîkariya xwarin û vexwarinê dike."

Kevneserokwezîrê Tirkiyê Suleyman Demirel îro çû Çukurcayê penaberan zîyaret kir û bi kurdî ji penaberan re got:

- Merak meke!

Û bi tirkî dom kir:

- Em, we bi tenê nahêlin. Heta niha em bi tenê bûn, lê niha dinya hat alîkariya we.Di van çend rojan de di ber xwe bidin, alîkariyeke mezin dê bigêhe we.

Li Hollandê Kurdan avêt ser konsolosxaneya Îraqê û agir berdan Konsolosxanê. Polîs 8 Kurd girtin.

Federasyon û rêxistinên Kurd li Swêdê bi hevdu re li gelek bajarên Swêdê li meydanan civînên vekirî pêkanîn. Di van civînan de li ser rewşa Kurdistanê agahdarî dan Kurd û Swêdîyan, merş û stranên şoreşgerî pêşkêş kirin, helbest xwendin, pere berhev kirin.

Îro jî hemû rojnameyên Swêdî di rûpelên xwe yên yekemîn de fotografên Kurdên penaber weşandin û li ser rewşa penaberan dûr û dirêj nivîsandin. Radyo û TV yên Swêdê jî, di serê her

www.arsivakurd.org

saetî de, li ser rewşa penaberên Kurd nûçe belav kirin.

## *14'ê Nîsanê*

Trajediya penaberên Kurd her berdewam e. Hîn jî, ji birçî, serma û nexweşiyê bê bêjmar kes dimirin. Helîkopterên Amerîka, Fransa û Îngiliztanê xwarin dawêjin serê çiyan, lê têr nake. Ji Kurdistana Îraqê ber bi sînorê Tirkiye û Îranê ve koçkirin berdewam e. Penaberên ku derbasî Tirkiyê bûne cîhwarê wan çiya ye û ji bo çûndin û hatinê ne baş e. Tirkiye destpêkir ku cîhwarên wan biguhêre û wan ber bi cîhwarê rast ve bîne.

Ji bo alîkariya xwarin û eşya 2000 leşkerê Amerîka hatin bajarê Îskenderûnê. Îngiliz 2 û Alman jî 6 helîkopter xiste xizmetê.

Îranê dîsan ji bo penaberan ji rêxistinên navnetewî alîkarî xwest.

Koma Netewa ji bo pirsa penaberan heyetek şande Baxdayê. Li gor ajansan, heyet bi wezîrê der û wezîrê agahdariyê yên Îraqê re rûniştin û pirsê gotûbêj kirin.

Saddam Huseyîn îro çû Hewlêrê. Li Hewlêrê axaftinek kir. Dîsan got ku:

- Min ji bo penaberan efû derxistiye. Ew dikarin vegerin. Lê, ji qatil, talankar, xaînan re efû tune.

Çend parlementerên Îngiliztanê li Kurdistanê bi Celal Talabanî re têkilî danîn.

Li gor nûçeyên ku BBC dide, hîn li herêma Kurdistanê Kurd û başûrê Îraqê jî Şiî cîh bi cîh li dij hêzên Saddam şer dikin.

Li Dîyarbekirê ji derê partiya ANAPê hemû partiyên legal û gelek rêxistinan bi hevdu re mîtîngeke mezin pêk anîn. Di mîtîngê de qasî 6-7 hezar kes beşdar bûn. Bi kurdî axaftin. Li dij Bush û Saddam derketin. Di dawî de, ji beşdaran hinek "bijî Kurdistan" qîrîyan. Şer derket. 10 kes birîndar bûn û gelek kes ji aliyê polîs ve hatin girtin.

Li Stockholmê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê û çend rêxistên Swêdî bi hevdu re li Sergels Torgê mîtîngek çêkirin. Qasî 4000 kesî di mîtîngê de beşdar bûn. Li ser navê Hukimetê Wezîrê Karûbarê Derve yê Sten Andersson qise kir. Wî behsa trajediya penaberên Kurd kir û got:

- Pirsa Kurd ne bi tenê pirsa penaberan e. Pirseke polîtîk e. Divê di nav Pirsên Rojhilata Navîn de pirsa Kurd jî bê çareserkirin. Divê Saddam û rejîma wî ji desthilatiyê herin. Pirsa Kurdan pirsa demokrasiyê ye. Pêwîst,e Kurdên Kurdistana Îraqê di nav Îraqê de, xwe bi xwe îdare bikin.

Niha di nav Wezîrên Karûbarên Derveyî yên Swêd, Fransa, Îtalya û Spanyê de, ji bo pirsa Kurdan hewldaneke xebatê heye, got Sten Andersson.

Serokê Partiya Folk Beng Westerberg, serokê Partiya Çep Lars Werner, ji Partiya Center parlementerek, Serokê Komîta Aştiyê û ji Komîta Parastina Mafên Mirovî ji bo Kurdan jî Thomas Hammarberg axaftin. Hemûyan di axaftinên xwe de, "bi zûtirîn alîkariya penaberan bikin û pirsa Kurd, pirseke netewî ye, polîtîk e. Divê di organên navnetewî de bê rojevê. Koma Neteweyan divê insîyatîv bigire."

Dr. Mahmûd Osman jî axaftinek kir û di axaftina xwe de ji Swêdê alîkariya navnetewî daxwaz kir.

Nazir Rezazî, çend stran û merş got û Şerko Bêkes jî çend helbest xwend û helbestvaneka swêdî ji helbestên wî wergêran swêdî.

## *15'ê Nîsanê*

Çapemeniya cîhanê îro jî bi nûçe û fotografan derbederî û perîşaniya penaberên Kurd di rûpel û rêza yekemîn de dan û belav kirin.

Serokwezîrê Tirkiyê û yê Îngiliztanê li Londrayê, li ser rewşa penaberên Kurd rawestan û li ser herêma ewlekar israr kirin. Penaberên ku li herêma Silopiyê li çiyê bûn , ji wan 20.000 î ji



*Li Stockholmê di mîtînga piştgiriyê de: Wezîrê Derveyî yê Swêdê, Mahmûd Osman û serokên partiyên Swêdê.*

cîhên wan rakirin û birin heremeke navrast ku baştir bikaribin ji wan re alîkariyê bikin. Yên din yên li vê herêmê jî, dê peyder pey bibin wê herêma nû û wan bi cîh bikin. Amerîka ji bo herêma ewlekar li Batman û Dîyarbekrê karagahek pêk anî û xebata herêma ewlekar li ser temambûnê ye. Hîn doktor û personelên tendurûstiyê negîhane herêma penaberan. Piraniya wan zarok in. Li Çukurcayê doktorekî Fransê daxuyanî da BBC ku "bi lez û bez tedbîr neyên stendin, dê ji nîvî bêtir penaber ji birçibûn, serma û bê dermaniyê bimirin."

Penaberên nû yên ku li Kurdistana Iraqê ne ber bi Iranê ve direvin, leşkerên Iraqê bi helîkopter û topan wan gulebaran kirin û li gor nûçeyan bi sedan kes kuştin.

Ingiliztanê di meclisa Avam de pirsa herêma rizgarkirî gotûbêj kirin. Gotin ku; " ev herêm nayê wê manê ku em Kurdistaneke serbixwe çêdikin, an dixwazin. Ev ji bo parastina penaberan e. Em yekîtiya axa Iraqê dixwazin. Ji ber vê yekê, em di pêşniyariya xwe ya herêma rizgarkirî de israr dikin û divê em di Koma Neteweyan de dîsan wê bînin rojevê. Heger Saddam 3 caran êrîşê herêma rizgarkirî bike, divê em li dij wî quwetê jî bikar bînin."

Wezîrên derveyên Koma Ewropayê piştgiriya pêşniyara Almanyayê kir.

Almanyayê goti bû, ku "divê mirov Saddam bide mehkemeya Koma Neteweyan, ji ber ku wî mafên mirovan îhlal kiriye. Saddam sûcdarê şer e." Fransa, Belçika û Ingiliztanê piştgiriya vê daxwazê dikin.

Celal Talabanî daxuyaniyek da:

- Pêşmergeyên ku derbasî Iranê bûbûn bi paş ve hatin Kurdistanê. Niha em gelek bi hêz in. Em dê êrîşeke mezin bibin ser bajarê Silêmaniyê. Em dikarin çend bajaran dîsan bi paş ve bigrin.

TV ya Swêdê Kanal-1 bi endamê Komîta Kurd û serokê Rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg re întervuyeke çêkir. Thomas, li dewletên Hevkar rexne girt ku ew durûti dikin:

- Ew niha li pêwendiyên aştiyê digerin. Ma kuştina 2 milyon Kurd li derî aştiyê ye?

Û Thomas, ji bo Kurdan ji Swêd û hemû cîhanê alîkari xwest.

Dîsan Endamê Komîta Kurd ji bo Mafê Mirovî Bilal Görgü daxuyaniyê da Radyoya Merhaba, wî, xebat û daxwazên Komîtê weha rêz kir:

1 - Divê Koma Neteweyan ji bo penaberan herêmeke azad û ewlekar çêbike.

2- Iran û Tirkiye sînorên xwe ji penaberan re vekin.

3- Koma Neteweyan çareserkirinên bingehîn û dûr û dirêj pêk bîne.

4- Divê oposîzyona Iraqê bê destek kirin.

5- Di pirsa Rohjilata Navîn de, pirsa Kurd jî bikeve rojevê.

Iro jî, di rojnameyên Swêdê de gelek li ser Kurdan nûçe û şirovan cîh girtin.

## *16'ê Nîsanê*

Di derheqê pirsa derbeder û penaberên Kurd de, muxalefet û raya giştiya Amerîka û ya cîhanê tesîreke mezin li Bush kir.

### Bush bi zixtan hişyar bû û bi lez û bez kete atakê

Bush nîvê şevê, di dîtinên xwe de 180 derece guhartin çêkir û kete hereketê. Wî, telefonê serokwezîrê Ingiliztanê John Major, serokkomarê Fransê François Mitterand, serokomarê Tirkiyê Turgut Özal, Şansolyê Almanyê Helmut Kohl û Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuëllar kir û li Kurdistana Iraqê di derheqê pêkanîna herêma azad û ewlekar de dîtinên wan girt. Bush, birya da ku hêzên hevkar di cîh de bikevin Kurdisatanê û alikariya penaberên Kurd bikin. Wî, emîr da ku 10 hezar leşkerên Amerîka bi helîkopter û satelîtan topografiya herêmê bikşînin û cîhê bajarên konan dîyar bikin. Bush da dîyarkirin, ku; " ev kar li gor biryara Koma Neteweyan a 688-an e. Divê hêzên hevkar li Kurdistana Iraqê ji paralela 36 jor ve bigrin garantiyê. Heger hêzên Saddam mudaxele bikin, pêwîst e, ku hêzên Hevkar bersiva wan bi çekdarî bidin. Divê di demekî gelek kin de hêzên Hevkar xwarin, kon, betaniye û îlaç bigihênîn derbeder û tengezarên Kurd."

Serokwezîrê Ingiliztanê John Major, got ku; "ev kirinên Saddam jenosîd e. Divê Koma Neteweyan li Saddam mehkeme veke."

Serokwezîrê Tirkiyê Yıldırım Akbulut, li Londrayê presskonferanseke pêk anî û di derheqê penaberan de weha got:

- Pêwîstiya derbeder û penaberan bi alikariyeke mezin heye. Divê Ewropî alîkariyê bidine Tirkiyê û Tirkiye jî rojek zûtir bigîhêne wan. Ewropî alîkariyê nakin, lê rexne li Tirkiyê digrin. Di 1988-an de jî, dîsan qasî 100 hezarî penaberên Kurd hatibûn Tirkiyê. Ewropiyan bi tenê 5 hezar girtin. Yên din di stuyê me de hiştin û rexne li me girtin û hîn jî digrin. Alîkari ne çareserkirina pirsa penaberan e. Çareserkirina bingehîn pêkanîna îmkanên bi paş ve şandina wan e.

Nûçegîhanê BBC ya beşa tirkî Timûçîn Tüzecan bi helîkoptereke Ingiliz li gelek cîhên derbeder û penaberan geriya û nûçeyên xwe gihêştan Londrayê. Wî rewşa penaberan felaketeke mezin didît. Wî, li Kampa Çukurcayê ji hemşîreke bidilxebat pirsî; hemşîrê digot:

Li vir aspirîn jî tune. Yek ji wan re alîkariyê nake. Di vê kampê de rojê bi kêmasî 40 zarok li ber çavên me dimrin. Ez bi xwe nikarim tiştekî bikim. Ev felaket e. Ez bi girînê alîkariya xwe didim xuya kirin."

### "Em pismam in, lê, ew Kurd in, ez Tirk im."

Dîsan nûçegîhanê BBC ji parezvanekî gundan (Köykoruyucusu) dipirsî:

- Hûn çi dikin?"

Parezvan:

- Em alîkariya derbeder û penaberan dikin. Ji ber ku piraniya yên ku hatine vê kampê ji eşîreta me ne. Eşîreta me nîvê wê li Iraqê û nîvê wê jî li Tirkiyê ye. Em mirovên hev in. Em Pismam in, xal û xwarz in. Lê, ew Kurd in, ez jî Tirk im. Ez hemwelatiyê Tirkiyê me. Xwedê ji dewleta me razî be, dewleta me baş e û ji wan re gelek alîkariyê dike."

## *17'ê Nîsanê*

Li ser biryara Bush, îro leşkerên Amerîka bi helîkopteran daketin ser sînorên Iraq û Tirkiyê. Berî her tiştî dest bi avakirina konên xwe kirin. Bi helîkopteran ji penaberan re xwarin avêtin. Penaberên birçî êrîşî xwarinê dikin. Gelek kes dikevine bin lingan û dimrin.

Iraqê li gel Koma Neteweyan biryar

û ketina leşkerên Amerîkî protesto kir. Tarik Azîz got ku; " ev mudaxela nav Îraqê ye û li dij destûr û prensîbên Koma Neteweyan e."

Sekreterê Giştiyê Koma Neteweyan Javier Perez de Cuellar jî, li dij biryara Bush weha got:

- Du berpirsiyarên Koma Neteweyan ji mêj ve ji bo pirsa penaberên Kurd li Baxdayê ne û bi hukimeta Baxdayê re li ser gelek tiştan li hevdu kirine. Lê, niha serok Bush rabû ji nişkan ve, vê biryara han girt. Divê em li ser vê biryarê hûr bifikirin....

Gorbaçov, li Tokyoyê pesnê Bush da. lê, hîç behsa biryara Bush nekir. Şirovevan dibêjin ku " pesindayîna raste rast piştgiriya biryarê ye."

Serokwezîrê Îngiliztanê J. Major, piştgiriya biryara Bush kir.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Almanyayê Genscher, ji ber girtina vê biryara han dilxweşiya xwe da dîyar kirin. Piştgiriya Bush kir.

Tirkiyê, vê biryar û plana Bush di cîh de dît. Û bi vê yekê re, Tirkiye dixwaze Îraq boriyên xwe yên petrolê veke û petrol bêt bajarê Îskenderûnê.

Konseya Ewropa biryar girt û heyetek şand sînorê Îraq û Tirkiyê ji bo di derheqê derbederên Kurd de raporek amade bikin û li gor wê alîkariyê bikin.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Luksenburgê daxuyaniyek da TV ku; "divê her dewlet, sazgeh û kes alîkariya Kurdên Kurdistana Îraqê bike."

Rojname û TV yên Swêdê bi wêne û nûçeyan, rewşa penaberan anîn zimên. TV kanal-2 jî, li ser navê Mehkemeya Koma Neteweyan, mehkemeyeke temsîlî çêkir û Saddam kir sûcdarê şer û Saddam mehkeme kir. Ev mehkeme dê TV ê de peryodîk dom bike.

## Parlementoya Ewropê biryar girt

### *18'ê Nîsanê*

Parlementoya Ewropê biyar girt ku li herçar perçeyên Kurdistanê jî mafê Kurdan ên kulturî bête dayîn. Divê Tirkiye, Îran, Îraq û Suriye bi Kurdan re li dora maseyek danişin. Di Konferansa Rojhilata navîn de pirsa Kurd jî bikeve rojevê.

Sibeyê dê heyetek ji serdarên Hevkar û heyetek jî ,ji serdarên Îraqê li bajarê Dihokê li ser pirsa penaberên Kurd hevdu bibînin.

Alîkariya penaberan hêdî dimeşe. Hîn jî derbeder û penaber birçî û perîşan in.

Alîkarê wezîrê Karûbarê Derveyê Îngiliztanê, ji bo dîtina rewşa penaberan çû Dîyarbekrê.

Rojname û TV yên Swêdî li ser Kurd û penaberan nûçe, nivîsar û şiroveyên xwe didomînin.

### *19'ê Nîsanê*

Ji bo alîkariya penaberan, Amerîka 5 hezar leşker daxiste Kurdistana Bakur ser sînorên Tirkiye û Îraqê. Li gor nûçegîhan û fotografên ku di rojname û TV yan de belav dibin rewşa penaberan gelek xerab e. Ji birçîbûn û sermayê bi kêmasî rojê 500 kes dimrin.

Di bin serokatiya qumandarekî Amerîkî de, heyeta dewletên Hevkar, bi 6 saatî dereng çû bajarê Dihokê û li wir bi qumandarê Îraqê re, li ser rewşa penaberan civînek pêk anîn. Îraqê paş ve gav avêt û berpirsiyarê heyeta Îraqê got ku; "em nahatine bazariyê. Em hatine guhdariya heyeta dewletên Hevkar bikin û ji wan, di derheqê penaberan de agadarî bigrin."

Rojnamevanê Kurd Tahir Hewremanî, di dema şerê pêşmerge û Îraqê de, bi xwe di nav şer de bû û fotografên şer girtibû. TV ya Swêdê ji van menzereyên şerê çend perça şan da û bi T. Hewreman re li ser rewşa şerê germ hevpeyvînek çêkir.

Serokê Parastina Rêxistina Zarokan yên kevin û endamê Komîta Kurdan ya Parstina Mafê Kurd Thomas Hammarberg, di TV a Swêdê de, li ser rewşa penaberan rawesta û daxwazeke acîl ji Swêd û cîhanê kir ku rojek berê xwe bigêhênin penaberan. Herweha Serokê Rêxistina Parastina Zarokan yê nû jî, ji Kurdistanê, ji herêma penaberan dihat û di TV de, belengazî û trajediya zarok û penaberên Kurd anî zimên.

Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, di derheqê organîzekirina rêxistin û kesên Kurd û Swêdî de, ji bo Kurdan daxuyaniyek belav kir. Di daxuyani ya xwe de, ji hemû komele, rêxistin û kesan daxwaza xebateke aktîv û rêxistî ya merkezî kir.

## Heyeta Kurd çû Baxdayê

### *20'ê Nîsanê*

Berpirsiyarên Partiya Demokrata Îraqê li Şam û Londrayê dan dîyar kirin, ku Bereyê Kurdistana Îraqê di bin serokatiya Celal Talabanî de, Nêçîrvan nûnerê PDK-Îraqê, Samî Abdurrahman serokê Partiya Gel, Resûl Mamend Serokê Partiya Sosyalîst heyetek şandine Baxdayê ku bi Saddam re danûstandinan pêk bînin. Li gor ajansan, li ser gotina Saddam heyet çûye Baxdayê. Dîsan li gor nûçeyên ajansan, Kurd dixwazin peymana 1970'î pêk bînin. Ev danûstandina Kurd û rejîma Baxdayê ji hefteyek berê ve dest pê kiriye.

Mirin û perîşaniya Kurdên penaber li ser sînorên Tirkiye - Îraq û Îraq û Îranê her berdewam e. Ji bo alîkariya penaberan leşkerên Amerîkî îro gehîştin Hekariyê. Pênc hezar leşkerên Amerîkî derbasî Kurdistana Îraqê bûn. Helîkopterên şerê, leşker û helîkopterên barkêş diparêzin. Ew dê Kurdên penaber ji çîyan daxin jêr û wan di nav bajarên kon de, bi cîh bikin. Bicîhkirina penaberan re, dê leşkerên Amerîkî ji herêmê derkevin û cîhên xwe dewrê hêzên Koma Neteweyan bikin.

Ji aliyê din ve, Amerîka pirda Xabûrê ku di dema şer de xira bûbûn, îşev temam dike û di ser riya papûrê re jî, dê alîkariya penaberan bike.

Tirkiyê biryara Parlementoya Ewropê bi tûndî protesto kir. Wek ku tê zanîn do Parlementoya Ewropê di derheqê Kurdan de 2 biryar girtibû. Yek, divê di her perçeyî de mafê Kurdan yê kulturî bêt dayîn. Dudo, divê bi lez û bez ji penaberên Kurd re alîkarî bê kirin. Di vî warî de daxuyaniya Trkiyê weha ye:

" Di qanûna me ya bingehîn de, helbijartineke azad heye. Mafê her kesî wek hev e. Lê, cîhê parvekariyê û parvekaran tune. Welatê me yek e û nayê parçe kirin. Di hêla penaberan de jî yekî qasî me wezîfeyê xwe yê humanîstiyê bi cîh ne aniye. "

Federasyona Komeleyên Kurd, Komîta Kurd ya ji bo Parastina Mafê Gelê Kurd li Swêdê û Komîta sîyasî, li Kunsträgården civînek pêk anî. Qasî 500 kes di civînê de beşdar bûn. Ji bo

www.arsivakurd.org

penaberan ji hukimeta Swêdê û gelê Swêdê alîkarîyê xwestin. Li ser rewşa penaber û Kurdistanê agahdarî dan. Ji bo alîkariyê pere berhev kirin. Li ser rewşa penaberan bi kurdî û swêdî belavok hatin belav kirin. Hinek beşdarên civînê çûndina heyeta Kurd a Baxdayê protesto kirin. Qîriyan:

- Celal û Mesûd bi Saddamê faşîst re danenişin!

## 21'ê Nîsanê

Leşkerên Amerîka û yên Iraqê li ser avakirina kampên penaberan li hevdu kirin. Lê, li gor peymanê divê Iraq leşkerên xwe ji hêla Zaxo dûr bixistan. Dema leşkerên Amerîkî ji bo avakirina kampan çûn nêzî bajarê Zaxo, li wir rastî polîsên Iraqê yên çekdar hatin. Li gor daxuyaniya leşkerên Amerîkî, li Zaxo ji 200'î bêtir polîsên Iraqê hene û li nav bajêr digerin. Dema leşkerên Amerîkî wan dîtin, matmayî man. Li gor peymanê divê li wir kesên çekdar nemana.

Li kampa Hekariyê penaberan êrîşî kamyonên nan kirin, leşkerên Tirk berê tifingên xwe dan hewa û teqandin û paşê jî dan nav penaberan û bi wan vedan. Penaberek mir û 5 kes birîndar bûn. Penaberan li ser vê bûyerê leşkerên Tirk dan ber keviran.

Leşkerên Amerîkî û yên Ingilîz Kurdan dişibînên sehoran (pilûran,simore). Dibêjin; "Kurdên penaber niha ji ser çiyê danakevin. Em dê, bi helîkopteran nan bavêjin wan û hêdî hêdî nan berjêr bavêjin, ew dê li dûv nan dakevin kontarê çiyê û pêre jî dakevin rastê."

Li gor agahdariyên leşkerên Hevkar Kurd bi Saddam bawer nakin û paşve venagerin.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Iranê Alî Ekber Welayetî, bi awayekî vekirî li dij avakirina kampên nêzî sînorê Iraq û Iranê der ket û got:

- Em naxwazin li nêzî sînorên me kampên penaberan çêbikin. Û herweha em li dij perçekirina Iraqê ne jî.

Li gor ajansan, li başûrê Iraqê Şiî bi taktîkên gerîllayî şerê xwe didomînin. Lê Kurd, ji bo lihevhatinê û peyman pêk anînê li Bexdayê ne.

Îro serokê hêzên Hevkar yê şerê Kuweyt û Iraqê General Norman Schwartzkopf Schartkopf vegeriya Amerîka mala xwe. Ew dema li Florîda ji balafirê daket jin, keç û kûçikê xwe hembêz kir û ji TV re got:

- Min pir bêriya jin, keç û kûçikê xwe kiribûn.

## 22'ê Nîsanê

Ji sînorê Tirkiyê 5 km bi hundir û 2 km re jorê Zaxo Amerîka û leşkerên Hevkar cîhên kampan çêkirin. Kamp di nav leşker û polîsên Iraqê de tên avakirin. Xelk bawer nake û naxwaze herin wan kampan..

Bi helîkopteran, ji Silopiyê rojê 40 car eşya dibin cîhê kampan. Îro bi helîkopterên Amerîkî 60 rojnamevan jî çûn cîhên avakirina kampan û paşê bi otomobîlan çûn nav bajarê Zaxo. Li gor nûçegîhanê BBC Ragıp Duran, li Zaxo polîsên Iraqê cirît davêjin. Berî şer nifûsa bajarê Zaxo 200 hezar bûn, lê, îro qasî 10 hezar kes li wir maye. Ew jî Areb, Suryanî û Tirkmen in. Ji derî çend kal û pîran hema hema Kurd tunin. Xelk ditirse, newirin qise bike.

Wezîrê Parastinê yê Amerîka Dick Cheney daxuyanîyek da TV û got:

- Ji bo alîkariya avakrina kampan û penaberan leşkerên Iraqê ji leşkerên me re gelek dibin alîkar û hemû îmkanên xwe pêk tînin. Bi kamyonên xwe ve amadene û di çiyayên bê rê de, rê şanê leşkerên Hevkar dikin.

Li gor BBC heyeteke Kurd li Amerîka û yek jî, li Ingiliztanê bi berpirsiyarên Wezîrên derveyî yên Amerîka û yên Ingiliztanê re rûniştin û li ser pirsa Kurd axaftin.

Li Tahran û Londrayê serokên Şîîyên Iraqê, çûndina Kurdan a Bexdayê protesto kirin û daxuyanî dan ku:

- Wek muxalefeta Iraqê, em du car bi Kurdan re rûnştin û me hemûyan dîyar kir ku 'bi Saddam re rûniştin nabe. Peyman nabe. Ji ber ku mirov nikare bi Saddam bawer bike. Niha serokên Kurdan rabûn çûn Bexdayê ba Saddam. Saddam ketiye tengasiyê. Ji ber vê yekê jî, ew dixwaze bi Kurdan re rûne û li hev bê û giraniya şer bide ser Şîîyan. Dema karê Şîîyan tewa bike, vê carê dê dîsan vegere ser Kurdan.

Îro çend roj in, ku Celal Talabanî bi heyeta Bereyê Kurdistanê ve li Bexadayê ne û bi Saddam re, li ser peymaneke aştiyê rûniştine. Lê, tû agahdariyek di vî warî de tune. Li gor texmînan, dibêjin "Kurd dixwazin peymana 11 Adara 1970'yî piçek berfireh bikin. Bajarê Kerkûkê jî bikin nav sînorên otonomiyê."

## 23'ê Nîsanê

Leşkerên Amerîka û yên Hevkar ji alîyekî ve xebata xwe ya çêkirina bajarên konan didomînin û ji aliyê din ve jî, dixwazin Kurdên penaber bidin bawer kirin, ku ew vegerin bajarên konan ku di nav leşkerên Saddam de çêdikin û hêzên Saddam dê zerarek nede wan. Ji ber vê yekê, li ser pêşnîyariya Tirkiyê, niha Amerîkî penaberan tespît dikin, ku kî ji Bajarê Zaxo ne wan paşve bişênin. Lê, Tirkiye di pêşniyariya xwe de dibêje ku "ew penaberên ku ji jorê paralela 36-an hatine, divê bi paş ve vegerin malên xwe. Ji ber ku ev herêm di bin kontrol û berpirsiyariya hêzên Hevkar de ye."

Lê Kurd ji rejîma Saddam bawer nakin û naxwazin paşve vegerin, an jî herin ew kampên ku Amerîka di nav leşkerên Iraqê de, an jî gelek nêzî leşkerên Iraqê çêdikin cîhwar bibin. Kurd dibêjin; "ew polîsên ku li Zaxoyêne ne, ne polîs in. Ew leşkerên Saddam ên taybetî ne û wan cilên leşkeriyê ji xwe kirine û di şûna wê de cilên polîs li xwe kirine."

Amerîkî û leşkerên hêzên Hevkar ji leşkerên Iraqê gelek razî ne.

Iraqê bi nameyekê, serî li Koma Neteweyan xist û hatina leşkerên Amerîkî û yên Hevkar protesto kir û ji Koma Neteweyan xwest, ku rojek zû ew leşker ji axa Iraqê derkevin. Iraq dibêje ku; "ev karê Amerîka û hêzên Hevkar, kerekî tecawizî ye. Welatê me perçe dikin."

Konsolosê Sovyetê yê Ankarayê daxuyaniyek da rojnama Cumhuriyetê û di daxuyaniya xwe de, li dij mudaxela Amerîkayê rawesta û got; "ev mudaxela nav karê Iraqê ye. Divê Amerîka leşkerên xwe ji Iraqê bi paş ve bikşîne û hêzên Koma Neteweyan bên şûna wan."

Heyeta Kurd li Bexdayê karûbarên hevdîtinê bi hukimeta Iraqê re didomîne. Li gor berpirsiyarê Bereyê Kurdistana Iraqê yê Londrayê, li Bexdayê danûstandin bi pêş ve diçin. Danûstandinên Kurdan li Bexdayê di sewiyeke gelek bilind de çêdibin. Lê, nabêjin heyeta Kurd dîrekt bi Saddam

www.arsivakurd.org

re danûstandin pêk tînin, an bi kesên din re. Ev ne zelal e. Dîsan Berpirsiyarê Bere dibêjin ku; " têkoşîna çekdarî pirsa me çareser nake."

Li gor gotinan, welatên Ewropa baweriyê dane heyeta Kurd ku dikarin bi selametî herin Bexdayê. Dîsan tê gotin ku Saddam li hember her 4 endamên heyeta Kurd 4 mirovên xwe yên giregir, li herêma Hewlêrê wek rehîne teslîmê hêzên Kurd kirine.

Îro jî liderên Şiîyên Îraqê rexne li lîderên Kurd girtin, ku ew çawan çûne ba Saddam û pê re guftegoyan dikin.

Wezîrê Derveyê Amerîka Baker ji bo aştiya Rojhilata Navîn xebatên hevdîtinî didomîne. Piştî çûndina Suriyê, ew dixwaze here Sovyetê. Baker, ji bo aştiya Rojhilata Navîn gelek girîngî dide Sovyet û dixwaze di maseya hevdîtinên aştiyê de, serokatiyê bide Sovyetê.

Helmut Kohl biryar girt, ku hêzên xwe yên îstîhkam ji bo alîkariya penaberên Kurd bişêne Îranê. Amerîka jî dixwaze hêzeke biçûk bişêne Îranê.

## *24'ê Nîsanê*

Di bin serokatiya Celal Talabanî de heyeta Kurd li Bexdayê bi Saddam re li ser hin maddeyan li hev kirin. TV yên cîhanê fotografên Saddam û heyeta Kurd ku dema hevdu ramîsan weşand. Ramîsana endamên heyeta Kurd û Saddam, Kurd û bîyaniyan matmayî hişt.

Celal Talabanî li Bexdayê preskonferansek çêkir. Serokê heyeta Kurd Celal Talabanî, di konferansê de, dîyar dikir ku " bi Îraqê re peymana lihevhatinê pêk anîne. Li ser gelek prensîban li hevdu kirine. Di vê peymanê de, li ser avakirina rejîmeke demokratîk li Îraqê, azadiya çapemeniyê, avakirna partiyên legal û piralî û otonomiya Kurdana 11'a Adara 1970'î li hevdu kirine. Lê, ev hîn xebatên pêş in. Dê bi firehî li ser vê peymanê xebat bikin û di dawiyê de Mesûd Barzanî jî peymanê îmza bike."

Lê, li gor ajansan, hîn sînor û çarçova otonomiyê ne dîyar e.

Berpirsiyarê hukimeta Îraqê Dr. Amelbarî jî, di derheqê peymanê de daxuyaniyek da ku; " qad û çarçova otonomî gelek demokratîk û berfireh e. Nêzî serxwebûnê ye. Divê ev ji bo Îran û Tirkiyê jî bibe mînakeke baş."

Ji aliyên din ve, Kurdên penaber ên



bi hêzên Kurd re girêdayî peymanê baş dîtin. Lê yên serbixwe yên ku ne nêzî tû rêxistinekê ne, bi Saddam bawer nakin.

Saddam, hejmareke gelek zêde polîs şandiye Kurdistanê. Polîs li Zaxo cirît davêjin. Hêzên leşkerî yên Hevkar polîsan tehlîke nabînin. Hêzên Hevkar dixwazin penaber bi wan bawer bikin û paşve vegerin cîhwarê xwe. Lê, penaber ji polîs û leşkerên Saddam bawer nakin û naxwazin herin kampên hêzên Hevkar ku li nêzî Zaxo çêdikin. Îrak dibêje ku:

- Em bi şandina polîs didin dîyarkirin ku herêma Kurdan di bin kontrola me de ye û em ewlekariya herêmê kontrol dikin.

Li gor ajansan, Amerîka ultîmatomek da Îraqê ku hêzên polîs û leşkerên Îraqê, divê di navbera 48 saetan de, ji herêmê derkevin. Lê Amerîka di derheqê rastî û çewtiya vê nûçê de, heta niha tiştekî negotiye.

Ji aliyê din ve, serokê NATO got ku:

- Armanca me rizgarkirina mirovan e. Em karê xwe didomînin heta ku kar dewirê hêzên Koma Neteweyan bikin.

Amerîka dest bi nivîsandin û tespîtkirina nav û navnîşanê penaberan kir. Piştî tespîtkirina nav û navnîşanan, Amerîka dixwaze penaberan nêzî mala wan bi cîh bike. Penaberên ku malên wan xerab nebûne divê herin mala xwe. Yên ku malên wan di dema şer de xerab bûne û şewitîne, divê bi şev di kampan de bimînin û bi roj jî herin xaniyên xwe ava bikin.

Lê, penaber ji Saddam bawer nakin û pişt bi garantiya Amerîkî û hêzên Hevkar jî girênadin. Piraniya wan dibêjin:

- Heta em herin teslîmê Saddam bibin, em li serê van çiyan bimrin bi şereftir e.

Hinek jî bêdeng in. Lê, penaberên roknakbîr dixwazin herin welatekî Ewropê.

Koma Neteweyan dixwaze îdareya Kampan bispêrin wê. Lê, sekreterê Koma Neteweyan, dixwaze berî ev biryar di Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan de bê girtin û paşê ew wezîfe bigrin ser milê xwe.

Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Tirkiyê M. Sungar dîyar kir ku; "Tirkiyê pêşnîyariyek ji Amerîka re kir, ku ew penaberên ku ji jorê paralela 36-an hatine, divê dîrekt vegerin gund û bajarên xwe; lê yên ku ji jêrî paralela 36-an hatine, bila li kampan cîhwar bibin. Amerîka vê pêşnîyariya Tirkiyê di cîh de dît û herdu dewlet li ser pêk anîna vê pêşnîyariyê xebat dikin."

Tirkiye, li ser guftûgo û peymana Kurd û Îraqê gelek radiweste. Bi awayekî balkêşî taqîb dike. Ji aliyê din ve, Tirkiye jî, ji bo bi Îraqê re têkilî danîn xwe nerm dike û riya têkiliyan vekirî dihêle. Wek tê zanîn çendek berê Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Îraqê Tarik Azîz dixwest biçe Tirkiyê, lê Tirkiye ne dixwest pê re têkiliyan dayine û ji hatina Tarik Azîz re çiv da xwe. Niha jî, ji hatina Tarik Azîz re lempa kesk pê dixin. Lê, Tirkiye dixwaze hatina Tarik Azîz bihêle piştî hatina Serokkomarê Îranê Refsancanî. Wek hat dîyarkirin dê Serokkomarê Îranê Rafsancanî di dawiya meha gulanê de here Tirkiyê. Hatina Refsancanî ya Tirkiyê ji bo pirsa Kurd e. Tirkiye, dixwaze li ser pirsa Kurd, bi Îran, Îraq û Suriyê re civînan pêk bîne û di vî warî de, dibe ku peymanên nû pêk bînin.

Îro Konseya Ewropayê, li ser jenosîda Kurdan, di derheqê Îraqê de biryara protestokirinê girt. Konseya Ewropayê ji bo alîkarîkirina penaberên Kurd jî, ji Tirkiye û Îranê re spas kir. Rexne li polîtîka Tirkiyê ya penaberan kir, ku Tirkiye ew kesên ku ji welatên Ewropê bên, wan di statûya penaberiyê de qebûl dikin û yên ku ji welatên Asya û Afrîkayê bên, wan li derê vê statûyê digrin û wan kesan penaber qebûl nakin.

www.arsivakurd.org

Konseya Ewropê xwest, ku ji bo Kurdan mijara otonomiyê bigre rojeva xwe û li ser wê gotebêj bike. Lê, Tirkiyê giraniya xwe danî û mijara otonomiyê ji rojevê derxist.

## 25'ê Nîsanê

Qesra Spî dibêje ku "Iraq aştî û ewlekariyê dixe tehlîkê. Amerîka, bala Iraqê kişand û dîyar kir ku " heger heta dawiya hefteyê, Iraq polîs û leşkerên xwe ji Zaxo bi paş ve nekşîne, dê Amerîka li hember hêzên Iraqê şîddetê bi kar bîne."

Serokê heyeta Kurd Celal Talabanî, ji peymana xwe û Saddam gelek bawer e û wê pêngaveke pozîtîv dibîne. Talabanî dibêje ku:

- Em ji bo Iraqeke demokratîk û Kurdistaneke otonom têdikoşin. Em li Iraqê dewleteke serbixwe naxwazin. Otonomiya me, di çarçoveya, otonomiya 11 Adarê 1970'î de ye. Ev peymana ku me li ser prensîbên wê yên bingehîn li hevdu kir, pêngaveke gelekî pêşketiye. Divê ji niha ve derbeder û penaberên Kurd vegerin mala xwe.

Sadûn Hamadî jî, li ser navê hukimeta Iraqê gotinên C. Talabanî rast dibîne û dom dike:

- Li Iraqê rûpeleke nû vebûye. Ev jî demokrasî ye. Polîtîkayeke bê teref e. 'Pêkanîna otonomiya 11 Adarê ye...

Kurd bi vê peymanê bawer nakin û dibêjin:

- Ev, ji dek û dolabên 1970'î perçeyek e."

Li Londrayê Serbest Aram dibêje:

- Em matmayî man! Bi Saddamê ku 23 sal in, ku Kurdan dikuje û welatê wan wêran dike re peyman çênabe.

Hoşyar Zabarî:

- Gufûgo û danûstandin tiştekî baş e, lê bi Saddam bawerî nabe. Saddam bi tenê maye, ketîye davikê. Ew dixwaze xwe ji vê davikê derbixe.

Di derheqê peymanê de dîtinên penaberên ku li ser sînorên Tirkiyê û Iraqê ne cuda ne. Ji penaberan hinek li dij peymanê û hinek jî li gel in. Ew dixwazin zû vegerin malên xwe.

Şîîyên Iraqê ku berê bi Kurdan re li dij rejîma Saddam Bereyek Iraqî çêkiribûn, ew li dij peymanê ne. Ew rexneyên tûj ji Kurdan re tînin.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Iranê, ji peymanê razîbûna xwe da dîyar kirin. Tirkiye hîn jî bêdengiya xwe didomîne.

Helîkopterên Ingiliz, îro ji Yuksekovayê xwarin, kinc û îlac kişandin Kurdistana Iraqê.

## 26'ê Nîsanê

Amerîka, zorê da Iraqê û Iraq mecbûr ma, bê şert û şût îro polîs û leşkerên xwe ji Zaxo û derdora wê bi paş ve kişand. «eta hinek leşker û polîsên Iraqê, fersenda bi otomobîlan çûndinê nedîtin, bi peyatî ji Zaxo derketin û çûn.

Celal Talabanî, li Kurdistanê daxuyaniyek da, ku :

- Hîn di navbera Bere û hukimeta Iraqê de gelek dijberî hene. Ji bo peymanekê hîn gelek ji hevdu dûr in. Bi tenê li ser hinek pirsan peyîvîne. Ev îş dê hîn bi mehan bigre.

TV ya CNN dîrekt nîşan da ku li Iraqê ji 70.000 bêtir leşkerên Yemen, Sudan û gerîllayên Filistîniyan hene. Ew li dij Kurd û Şîîyan aktîv şer dikin.

Rojnameyên Ewropî û Swêdiyan li ser goftûgoyên di navbera Kurd û Saddam de radiwestin û hema hemû bawerî bi Saddam û rejîma wî nayînin. Fotografên ramîsana Celal Talabanî û Saddam Huseyîn belav dikin. Vê ramîsan û hembêzkirinê gelek seyr dibînin. Û dinivîsin ku; "Saddam dîsan dixwaze Kurdan bixapîne. Niha li seran serê cîhanê der û dor li Saddam teng bûye, ji ber vê yekê pêwîstiya wî û rejîma wî bi Kurdan heye. Lê, piştî çendekê, dê ew dîsan li Kurdan vegere û dest bi qirkirina Kurdan bike."

## 27'ê Nîsanê

Polîs û leşkerên Iraqê li Zaxoyê neman. Lê, xelk dibêje ku; " rejîma Iraqê bi kincên sivîl gelek muxbîr li Zaxoyê bi cîh kirine."

Li gor nûçeyên nûçevanan, îro li bajarê Zaxoyê jîyana normal dest pê kir. Lê, hîn jî, li bajêr elektrîk û av tune. Dukan vekirîne, lê kêmasiyên xwarin û eşyan hene.

Hêzên Hevkar, derbeder û penaberên mêr ên ciwan bi helîkopteran dibin Zaxoyê. Ew dê li wir di avakirina bajarê kon de bixebitin.. Heta niha 750 kon hatine daçikandin.

Dewletên Fransa û Ingiliztanê, ji bo Koma Neteweyan zêde berpirsiyarî û wezîfe dixwazin. Ingiliztan ji bo civînê bangê Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan kir.

Serokê leşkerê Amerîka li Zaxoyê, 3 serokê pêşmergan ji çiya bangê Zaxo kir û bi wan re li ser çalakiyên wan axaft. Li gor nûçevan û rojnamevanan, ji bo selametiya penaberan amerîka naxwaze pêşmerge di herêmê de çalakiyan pêk bînin.

Serokkomarê Iranê Rafsancanî, îro li Şamê bi serokê Suriyê bi Hafiz Esat re rûnişt. Herdu serok li ser pirsa Kurd û Iraqê rawestan. Piştî hevdîtinê, Rafsancanî û Esat herduyan jî da dîyar kirin ku; "perçebûna Iraqê naxwazin."

Iran dixwaze bi Suudî re têkiliyên nû û germ dayine. Ji ber vê yekê, ew dixwaze Suriye û Tirkiye navcîtiyê bikin.

Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê, Komîta Parastina mafên Kurd li Swêdê û Komîta sîyasiya Kurd li Swêdê dîsan li Kungsträgården ji Kurd û Swêdiyan re civîneke vekirî çêkirin. Bi sedan kes di civînê de beşdar bûn. Ji Rêxistina Parastina Zarokan ya Swêdê, Xaça Sora Swêdê û rojnamevanên swêdî li ser rewşa Kurdan axaftin. Piştgiriya xwe dîyar kirin. Çend hunermend û dengbêjên Kurd, surûd û stranên şoreşgeriyê stran. Belavok hatin belav kirin û ji bo penaberan pere hat kom kirin.

## 28'ê Nîsanê

Wezîrên derveyî yên Konseya Ewropê, bi yek dengî biryar girtin, ku di şûna leşkerên dewletên Hevkar de Koma Neteweyan polîsên xwe pêkbîne û bişeyne Kurdistana Iraqê.

Luksenburgê, pirseke weha ji Konseyê kir:

- Heger Bexdat li gor biryara Koma Neteweyan a 688-an hêzên polîs qebûl neke, an jî paşê probleman derbixe, pêwîst e, ku Koma Neteweyan tedbîra vê yekê jî bigre.

Li gor gotûbêjan, rejîma Bexdayê li dij penaberên Kurd piçek nerm bûye, an xwe nerm nîşan dide. Penaberên ku bi paş ve vedigerin, ji wan re probleman dernaxin.

Li gor şirovevanan, êdî ji bo şandina polîsê Koma Neteweyan, ne pêwîst e, ku Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan biryar bigre. Ew dikare dîrekt polîsên xwe bişeyne herêmê.

Qumitanên hêzên Hevkar li Kurdis-



www.arsivakurd.org

tana Îraqê, qada herêma ewlekariyê fireh dikin. Nêzî sînorê Tirkiyê 40 km berfireh kirin. Ev herêm heta çend rojan digihîje sînorê Îranê.

Penaberên Kurd, ji bo vegerê bêdil û bêbawer in. Yên ku bi paş ve vedigerin ji aliyê pêşmergan ve tên rawestandin.

Hêzên Îraqê yên leşkerî hêdî hêdî ji herêma ku li ser navê ewlekariyê hatiye dîyar kirin, xwe ji wir bi paş ve dikşînin.

Hêzên dewletên Hevkar li Başûrê Îraqê jî, ji bo15 hezar Kurdên derbeder û penaber, ji konan bajarek ji wan re çêkirin. Ew Kurd, di nav Şîîyên derbeder de, li Başûrê Îraqê mane.

Amerîka û Îngilistanê, li Urdinê çend şirketên Saddam yên çekstandinê derxistin holê. Saddam li Urdinê li ser navê tiştên xwarinê û eşya, çend şirketên Urdinî çêkiriye û bi wesîta wan şirketan, ji Çîn û Koreyê eşya dikirin û tînin Urdinê. Ji wir jî bizî dibin Îraqê. Eşkere bû ku ev şirketin Urdinî yên Saddam in û ji Çîn û Koreyê li ser navê eşya çek û cebilxane dikirin. Ji ber ku ambargoya Koma Neteweyan li ser Îraqê heye, ew bi xwe nikarin dîrekt împort û eksport bikin. Bi riya Urdinê û di bin navekê sexte de, çek û malzemayên şerê dikirin.

Ev çend hefte ne, ku wezîrê Karûbarê Derveyi yê Amerîka James Baker, ji bo planeke aştiyê li Rojhilata Navîn qevz dibe. Di dawiyê de hêvîyên J. Baker ketin bin quma çolên Rojhilata Navîn. Baker bêhêvî û destvala vegeriya Amerîka.

## *29'ê Nîsanê*

Hêzên Hevkar, sînor û qada herêma ewlekar fireh dikin. Ev herêm ji Sînorê Tirkiyê 60 km dom dike. Ev firehbûn ber bi sînorê Îranê ve diçe.

Penaberên ku li ser sînorên Tirkiyê bûn û bi paş ve vegeriyan, hêzên pêşmêrge wan 4 roj li geliyekî dabûn rawestandin û nedixwestin bi paşve vegerin kampên Kurdistana Başûr yên ku hêzên Hevkar ji wan re çêkirine. Qumutanê Fransê îro bi serokê pêşmêrge general Alî re peyîvî û piştî axaftina wan, generalê Kurd rê vekir û gel ber bi kampan ve berjêr çûn. Li gor qumutanê hêzên Hevkar heta du rojan dê gelek kes vegerine kampan. Zarok, jin, kal û pîran dê bi helîkopteran bikşînin kampên cîhên ewlekar.

Wek ku tê zanîn çend roj berê, li ser pêşniyariya Îngiliz, Civata Aboriya Ewropa bi yek dengî biryara "di şûna leşkerên hêzên Hevkar de, polîsên Koma Neteweyan divê li Kurdistana Îraqê wezîfe bigrin." hatibûn standin. Îngiliz dixwazin, îro ev pêşniyariya xwe bibin Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan û li wir biryareke derkeve. Wek tê zanîn di Konseya Ewlekariyê de 5 dewletên endamên daîmî hene: Amerîka, Îngilîztan, Fransa, Sovyet û Çîn. Îngiliz hêvî dikin ku dê wan her çar endamên Konseya Ewlekar îkna bikin û biryarê ji Konseyê derbixin.

Dîtinên Kurdan li ser vê biryara Îngiliz pozîtîv in û pişgiriya wê dikin.

Berpirsiyarê Partiya Demokrata Îraqê li Londrayê, di derheqê hevdîtina Bere û hukimeta Saddam de got ku "me bi tenê li ser rojeva peymanê li hevdu kiriye. Ji derê vê yekê, heyeta me li ser tiştekî din nepeyîviye. Niha jî, em wek Bere di nav xwe de, li ser rojevê munaqeşe dikin. Di nav munaqeşeyên me de, "em bi rejîma Bexdayê re dîsan rûnin, an na" jî heye.

Serokkomarê Îranê Alî Ekbar Haşîmî Rafsancanî îro ji Suriyê çû Tirkiyê. 16 sal in ku cara yekem serokê Îranê diçe Tirkiyê. Berî ku Rafsancanî ji Suriyê here Tirkiyê, wî û serokkomarê Suriyê Hafiz Esat, li Şamê presskonferansek dan. Herdu serokan jî, ji hevdîtinên hev razî bûn. Îran dixwaze bi Suriye, Tirkiyê û bi çend dewletên herêmê re paktek pêk bînin. Dîsan Îran dixwaze bi alîkariya Tirkiyê têkiliyên xwe bi welatên Ewropa re baş bike.

## *30'ê Nîsanê*

Berpirsiyarê Îngiliztanê yê Koma Neteweyan, ji bo şandina hêzên polîs li Kurdistana Îraqê, bi Sekreterê Giştiyê Koma neteweyan Javier Perez de Cuellar re têkilî danî. Piştî hevdîtina wan, Cuellar dest bi xebata pêşnîyara polîs şandinê kir. Îngiliztan bawer e, ku vê pêşnîyariya wî, dê di Konseya Ewlekariyê de derbas bibe. Lê, endamê Konseyê yê daîmî Sovyet dilxişûş e. Îngiliztan bawer dike ku dê Sovyetê, di vî warî de îkna bike.

Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Almanyayê Gensher, daxuyaniyek da û di daxuyaniya xwe de, piştgiriya pêşnîyara Îngiliztanê kir.

Nûnerê Îraqê yê Koma Neteweyan li dij pêşnîyara Îngilistanê derket û nameyek da Koma Neteweyan û di vê nameya xwe de got:

- Ev dîrekt mudaxeleyê hundirê karûbarên Îraqê ye û li dij destûra Koma Neteweyan e.

Ji aliyê din ve, Îraqê carek din serî li Koma Neteweyan xist, ku ambargoya ku li ser Îraqê danine divê bê rakirin. Koma Neteweyan, di bersiva xwe de, "ew mercên ku Koma Neteweyan ji bo rakirina ambargoyê danîbûn, Îraqê wan pêk ne aniye û ji ber vê yekê jî, dê ambargo bê domandin; ta ku Îraq wan mercan bi cîh bîne."

Li gor dîtina PENTAGON, çareserkirina pirsa Kurdan ev e:

" Divê mirov baweriyê bide Kurdan û ew pêwîst in, ku bi rejîma Îraqê re, ji bo otonomiyê rûnin, li hevdu bikin û herweha Kurdên penaber û derbeder vegerin malên xwe."

Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Îraqê Tarik Azîz, li ser pirsekê rojnamevanan ya di derheqê sînorên otonomiya Kurdan de weha bersiv da:

- Bajarê Kerkûkê li derî plana otonomiyê ye.

Rojnamevana Alman Petra Reayner, ji Bexdayê heta Silêmaniye, Hewlêr û Zaxo geriya û hate Tirkiyê. Li gor dîtin û analîzên Petra, rewşa gelê Kurd ên sivîl ku li Kurdistanê koçbar nekirine û dev ji mala xwe bernedane, ji yên koçkirî xerabtir û perîşantir in. Xwarin, vexwarin û îlaç tune... Nexweşiyeke giştî dest pê kiriye. Di warê rewşa leşkerî de jî, Reayner weha dibêje:

- Belê, bajarên Kurdistanê di bin kontrola Îraqê de ne, lê, leşkerên Îraqê bi roj jî nedikarin ji nav tanqan derkevin der. Mesela li bajarê Silêmaniyê leşkerên Îraqê di nav tanqan de xwarina xwe dixwin. Gelekî bi stres in. Derdorên bajar di kontrola pêşmêrge de ne. Hêzên pêşmêrge heger bixwazin herdem dikarin bajaran bigrin, lê ji ber du sedeman naxwazin bajaran bigrin: Yek ji ber ew xelkên sivîl ku di bajaran de ne. Dema pêşmêrge bajar bigre, leşkerên Saddam çekên giran bikar tînin û xelk dimre. Sedema dudoyan jî, dema leşkerên Saddam bajarên Kurdistanê bi paş ve girtin, bi hezaran cîhwanên Kurd rehîne girtine û wan birine kampên leşkeriyê. Dema pêşmêrge bixwaze bajaran dîsan bi paş

www.arsivakurd.org

ve bigre, dê leşkerên Saddam wan rehînan hemû bikujin. Lê, şer ranewestiyaye. Hema hema her rojn li gelekî herêman şer di navbera hêzên pêşmêrge û yê Saddam de çêdibin.

Reayner dibêje, ku "pêşmêrge, li dij hevdîtinên serok û rejîma Iraqê nînin, lê ji Saddam û rejîma wî jî bawer nakin."

Rafsancanî cara dudoyan bi Turgut Özal re rûnişt û li ser pirsên herêmê û hevkariyê peyîvîn. Îran dixwaze bi alikariya Tirkiyê têkiliyên xwe yên derveyî bi welatên Ewropî re baş bike. Di vî warî de, ji Tirkiyê alîkariyê dixwaze. Ji aliyê din ve Iran, Suriye û Tirkiye dixwazin ji bo pirsa Kurdan peyman û paktek di nav xwe de çêbikin.

Piştî hevdîtina Özal û Rafsancanî, herduyan presskonferansek pêk anîn. Li ser pirseke rojnamevanan Turgut Özal weha got:

- Tû carî dewleteke Kurd çênabe. Ji bo avabûna dewleteke Kurd divê sînorên du dewletan bên guhartin. Ev ne mumkun e.

Herdu serokkomaran carek din dîyar kirin, ku perçebûna dewleta Iraqê naxwazin.

Parlementoya Îranê li ser alîkariya welatên Ewropa ku dişeynin Iranê munaqeşe vekir. Hinek parlementer bi taybetî li dij alikarî şandina Amerîkayê derketin û daxwaz kirin ku pêşî li alîkariya Amerîka bê girtin û yên ku şandine Iranê jî, bi paş ve bişeynin. Li gor wan bi tenê Xaça Sor dikare alîkariyê bîne Îranê. Li gor şirovevanan ev li dij Rafsancanî jestek e.

## 1'ê Gulanê

Hêzên Hevkar, penaberên Kurd bi paş ve vedigerînin kampên ku li nêzî Zaxo çêkirine. Lê, karûbarên vegerê gelek bi derengî dimeşe. Çûyîna ji kampa Işıkverenê heta Zaxo bi peyatî tam 3 roj digre. Gelek mirov jî naxwazin bi paş ve vegerin. Niha di kampa Işıkverenê de 40-50 hezar kes hene. Hîn li çiyayên Kurdistana Iraqê bi hezaran derbeder hene û ji çiyan daneketine.

Kaymakamê Şemdinliyê Erdoğan Ülker, xwest ku li kampa Yeşilovayê bigere û kampê kontrol bike. Leşkerên İngiliz rêneda kaymakamê Tirk ku kampê kontrol bike. Di dav wan de lec derket û leşkerên İngiliz lêdan û wî ji kampê derxistin der. Serokwezîrê Tirkiyê Yıldırım Akbulut gelekî tûre (hêrs) bû û got:

"Divê leşkerên İngiliz lêborîna xwe bixwazin. Ji ber ku ew di bin emrê me de ne."

Serokkomarê Iranê Rafsancanî îro li Ankarê presskonferansek pêk anî. Rafsancanî di presskonferansa xwe de got ku:

- Divê ew leşkerên biyaniyên ku li herêmê ne, ji herê derbikevin. Tahran terefdarê avakirina dewleteke Kurd nîne. Ji ber ku li Tirkiyê û li Îranê jî pirsa Kurd heye. Dewletên Rojava ji penaberan re alîkariyê nakin. Ya herî baş divê ev penaber vegerin malên xwe.

Ji aliyê din ve, li Îranê Ayahtullah Alî Hamyanî daxuyaniyek da:

- Dinya di pirsa Kurdan de rabû ser piyan; lê, çima behsa Şîîyên Iraqê nakin û ji wan re jî wek Kurdan alikariyê nakin? Ji ber ku Şîî misilman in. Dinya ji misilmaniyê ditirse, pirs ev e! Sedem ev e!

Li Swêdê gelek rêxistin cuda cuda 1 ê gulanê pîroz dikin. Lê, di nav wan rêxistinan de meş û mîtîngên herî mezin û geş yên Sosyal Demokrat û yên Partiya Komunîst ya ku niha navê xwe kiriye Partiya Çep.

Rêxistinên Kurdan yên sîyasî û demokratîk û bi taybetî Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê heta îsal di 1'ê Gulanê de, bi rêza Partiaya Çep re beşdarê meş û mîtîngê dibûn. Lê, îsal cara yekem hinek komeleyên endamên Federasyonê (ji derî Komela Kurd li Spångayê) û endamên hêzên Kurd hem bi Partiya Çep û hem jî bi ya Sosyal Demokratan re meşiyan.

Serokê Partiya Çep Lars Werner, di axaftina xwe ya 1'ê Gulanê de, li ser pirsa Kurd rawesta:

- Îro gelê Kurd di bin tade û zordestiyeke gelek mezin de ye. Pêwîstiya gelê Kurd bi alîkarî û piştgiriya navnetewî heye. Bush banga gelê Iraqê û Kurd kir ku li dij Saddam serîhildin. Kurdan serîhilda, lê Bush bêdeng ma, gotina xwe daqurtand. Saddam dest bi jenosîdê kir. Saddam sûcdarê şerê ye. Divê hukimeta Swêdê hewl bide ku Saddam wek sûcdarekî şer li mehkema navnetewî bê mehkeme kirin. Pêwîst e ku gelê Kurd mafê xwe yê netewî bigre.

Di mîtînga Partiya Çep de, Serokê Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê Vildan Tanrıkulu jî axaftinek kir:

- Îro pêwîstiya penaberên Kurd bi alîkariyeke navnetewî heye. Ji ber zilm û zordariya Saddamê faşîst, li ser çîyayên Kurdistanê, bi hezaran jin zarok, kal û pîrên Kurd ji birçîbûn û sermayê dimrin. Koma Neteweyan divê destê xwe bilvîne û bilezîne. Bawerî bi saddam nabe. Divê Koma Neteweyan, Kurdan û herêma wan bigre bin garantiyek.

Serokê Federasyonê, weha dawiya axaftina xwe anî:

- Pirsa Kurd bi tenê ne pirsa xwarin û alîkariya humanîstî ye; pirsa Kurd, pirseke polîtîk e. Pirsa welat û neteweyekî ye. Pêwîst e, ku Koma Neteweyan û hemû dewlet û sazgehên nav-



netewî bi vî awayî û çavî li pirsê binêrin. Bi vî awayî alîkarî û piştgiriyê geş bikin..

## 2'ê Gulanê

Wek tê zanîn, di bin serokatiya Celal Talabanî de heyeta Bereyê Kurdistanê, piştî hevdîtina hukimeta Iraqê û Saddam vegeriyabû Kurdistanê. Bere, di nav xwe de, li ser hevdîtinê munaqeşe kir û biryara xwe ya dawî da. Li gor nûçeyan Celal Talabanî û heyeta Bereyê Kurdistanê, dê dîsan di roja 5'ê gulanê de heyeta Kurd vegere Bexdayê û li ser prensîb û plana otonomiyê bi Saddam û hukimeta wî re guftûgo û gotûbejan bidomînin.

Li gor çavkaniyên Rojava, divê Iraq Konseya xwe ya şoreşgeriyê belav

www.arsivakurd.org

bike, di tevayîya Îraqê de, di 6 mehan de hilbijartineke serbest pêk bîne, efûyeke giştî derxe, Kurd û Şîîyên ku derketine derî welêt bi paş ve vegerin, qanûna bingehîya Iraqê bête guhartin, di wê de mafê Kurd û Areban wek hev bin. Otonomiya Rasteqîn ya 11 Adarê bidine Kurdan û herêma Kerkûkê jî di nav sînorê otonomiyê de be. Divê Koma Neteweyan û dewletên Hevkar jî garantiyê bigrin ser xwe.

Serokkomarê Îranê Rafsancanî îro hevdîtin û guftûgoyên xwe temam kir û ji Tirkiyê vegeriya Îranê. berî ku Rafsancanî bifire Îranê, wî û Turgut Özal presskonferansek pêk anîn. Herdu serokkomaran di axaftinên xwe de dan dîyar kirin, ku hevdîtinên gelek baş derbas bûne û li ser problemên herêmê û karûbarên hevkariyê gehîştine encamên pozîtîv.

Ji aliyê din ve Îranê daxuyaniyeke da ku 3 balafirên Amerîka ku ji bo derbederên Kurd eşya anîne Îranê, Îranê eşyayên balafirek qebûl nekir û balafirê bi eşyayên wê ve, bi paş ve şand. Îran dibêje ku; "heger Rojava eşyayên kevin an jî yên ku bikaratî bişênin, em qebûl nakin û dê wan bi paş ve bişeynin.

Bûyera Kaymakamê Şemdînliyê, li Tirkiyê bû bûyereke girîng û sereke. Serokwezîrê Tirkiyê yê kevin û serokê SDP Bülent Ecevit dibêje"

- Welatê me, ji aliyê hêzên Împeryalîst ve hatiye dagîrkirin. Welatên Rojava dixwazin peymana Sewrê pêk bînin û Kurdistaneke çêbikin. Pêwîst e, ku rojek zû, ev hêz bê şert û şût ji nav axa Tirkiyê derkevin. Çi karê wan li nav axa me heye. Turgut Özal û hukimeta Yıldırım Akbulut îhanetê dikin. Divê ew bên mehkeme kirin...

Serokê Partiya Sosyal Demokrat Erdal Înönü jî hema hema wek Ecevit daxuyaniyek da.

Serokwezîrê Tirkiyê Y. Akbulut dibêje:

- Ew leşkerên Îngiliz yên ku li kaymakamê Şemdînliyê dane, ji xwe niha ji Tirkiyê derketine der û li bakurê Îraqê ne. Herweha mesele nemaye. Ji ber vê bûyerê, me bala Îngiliztanê kişand. Îngiliz dibêjin ku "kaymakam sivîl bûye û leşkeran wî nasnekirine."

Rojnameyên Tirk îddîa dikin ku Rojava li gor peymana Sewrê nexşeyeke (xerîteyeke) çêkiriye û di nav sînorên wê nexşê de proja GAP jî heye.

Hêdî hêdî pirsa Kurd û derbederên Kurd di çapeniya Swêdê û cîhanê de kêm dibin. Wek nûçeyên biçûk tên belav kirin.

Li gor nûçeyan, niha Şîîyên Iraqê koçebarê Îranê dikin. Di başûrê Îraqê de qasî 500.000 hezar kes ber bi sînorên Îranê ve diçin. Heta çend rojan dê bigihêne Îranê.

## *3'ê Gulanê*

Wezîrê Karûbarên Hundirî yê Îranê Abdullah Nûrî, di presskonseransê de got ku:

- Rojava, ew xwarin û eşyayên ku ji bo derbederên Kurd dişêne, nayên xwarin û bi kar anîn. Ji ber van sedeman, me hinekî ji wan îmha kir.

Îngiliztanê pêşnîyariyeke pêşkêşî Konseya Ewropayê kir. Ji bo zûtirîn alîkarî bigehê Kurdan, hêzên çalak bişeynin herêma ewlekar. Konseya Ewropê pêşnîyara Îngiliz qebûl kir. Dê Konseya Ewropê, ji hêzên çalak çend grûb bişeyne herêma ewlekar a Kurdistana Başûr ku ew grûb bi lez û bez alîkariyê bigihêne derbederên Kurd.

Herêma ewlekar her ku diçe berfireh dibe. Ji aliyekî ve, ji Zaxo ber bi sînorê Îranê ve û ji aliyê din ve jî, ber bi hundirê Îraqê ve ber jêr bi kurahî mezin û fireh dibe. Herêma Zaxo teng hat, îro Amêdiye jî ket nav herêma ewlekar. Li gor gotinan, dê di nêz de Dihok û Hewlêr jî bikevin nav vê herêmê. Weha dîyar e, ku dê hêzên Hevkar hîn demekî gelek dûr û dirêj li Kurdistanê bimînin.

Hîn jî piraniya Kurdên derbeder ji çiya daneketine jêr. Bi rejîma Saddam bawer nakin û naxwazin herin kampên ku hêzên Hevkar çêkirine û çêdikin. Alîkariya Ewropiyan hîn jî baş negihêştiye derbederan.

Tirkiyê, rojnamevanê Îngiliz Robert Fîsk girt û avêt der. Robert Fîsk di warê rojnamegeriyê de pisporê Rojhilata Navîn e. Ew di rojnama Îndipendium de dixebite. Robert, çendekî berî, di derheqê derbederên Kurd de nivîsareke dabû Îndipendium. Di wê nivîsara xwe de leşkerên Tirk çawan eşya û betaniyên ku tên ji derbederên Kurd re didizin û difroşin nivîsandibû. Ji ber vê nivîsarê, leşkerên Tirk li herêma Hekariyê Robert Fîsk girtin û wî birin Dîyarbekirê. Li Dîyarbekirê îfadeyê wî girtin û dîrekt bi balafirê wî şandin Îstanbûl. Ji wir jî, dê wî bavêjin der.

Her ku diçe navbera Îngiliztanê û Tirkiyê nexweş dibe. Çend roj berî mesela alên hêzên Hevkar li kampan, pişt wê bûyera lêdana kaymakamê Şemdînliyê û niha jî derxistina rojnamevanê Îngiliz Robert Fîsk...

Îro Tirkiyê qasî çend saetan sînorên xwe û Îraqê girt. Li dergehê Xabûrê, bi sedan TIR ketin rêzê. Rojnamevan û nûçegîhan nikaribûn herin û werin.

Serokê Partiya Demokratîk a Çep Bülent Ecevît, rexneyên tûj anî ser hukimetê û T. Özal:

- Özal çewtî û şaşiyan dike. Başûrê rojhilat (Tirk ji Kurdistana Bakur re dibêjin; "Başûrê rojhilat") kir kamp û bassên leşkerên Amerîka û Îngiliz. Divê bi lez û bez hemû hêzên bîyanî ji herêmê derkevin. Bila herin Îraqê, li wir çi dikin, bila bikin.

Di rojnama Waşîngton Post de, bi navê Peter nivîsarek hat belav kirin. Peter, di nivîsara xwe de rexne li polîtîka Bush digere û dibêje:

" Bush, ji ber ku Tirkan netirsîne û ji xwe bi dûr nexe, ji pirsa Kurdan re çavên xwe girt, an jî pirsê avêt pişt guhê xwe."

Bereyê Kurdistana Îraqê Buroya Skandînaviyê îro cara yekem li ser guftûgoyên di navbera Bere û hukimeta Îraqê de daxuyaniyek belav kir. Em vê daxuyaniyê li jêr pêşkêş dikin:

## DAXUYANÎ

Buroya Bereyê Kurdistanê li Skandînaviyayê van zanyariyên ku li ser guftûgoyên di navbere Bere û hukimeta Îraqê de gehêştiye Buroyê, pêşkêş dike:

I - Guftûgo di pileya yekem de, li ser 4 çar bendan çêbû.

Yekem: Normalkirina rewşê li Kurdistanê... Me daxwaz ji bo rakirina hemû rewşên îstîsnayî û îcrayên raguhastin û bi arebkirin û rakirina qanûnên îstîstnayiyên zindan û surgunkirinê kir. Hukimetê hemû daxwazên me qebûl kir.

Duyem: Yekbûna nîştîmana Îraqê... Herdu aliyan behsa biratiya Kurd û Arab li alîyek û sîyaseta şovenîstî li alîyekî din kir, em li ser vê yekê li

www.arsivakurd.org

hev hatin, ku bingehê sîyaseta yekbûna nîşûmaniya Iraqê bibe wekheviyeke birayetiya herdu netewan û prensîbên demokrasiyê.

Sêyem: Demokrasî û mafê mirovî... Me dawa kir ku "Manîfestoya Navnetewî ya Mafê Mirov" bêt qebûlkirin û prensîbên wê bikevin nav hemû qanûnên Iraqê. Wan vê daxwaza me jî qebûl kir.

Li ser demokrasiyê me dawa kir ku:

A - Azadiya bîrûbawerî, çapemenî û rojnamegeriyê.

B- Azadîya Partî, rêxistin, û jîyana pirpartî (pluralis) û nemana gotina "El hizib El qaid" (Partiya Lîder).

C- Hilbijardina azad û di hilbijartinê de wekhevî ji bo hemû partiyan.

D- Jîyana parlementeriya rastî.

Wan daxwazên me qebûl kirin.

Çarem: mafên neteweyê gelê Kurd û beşdarbûna wî li biryarên sîyasîyên navendî li Bexda... "Wan got ku li ser vê xalê çi munaqeşe pêwîst nîne.Em naveroka Beyana 11 Adarê bi teks, mane û temamî qebûl dikin."

II- Biryara serokatiya sîyasî ya Bereyê Kurdistana Iraqê di roja 30.4. 1991:

Serokayetiya sîyasî ya Bereyê Kurdistanî, carek din amadeya xwe ji bo çareserkirina pirsa kurd bi aştî di çarçoweya Iraqekî demokratîk û yekgirtî de tekît dike, ji ber vê yekê ev biryarên jêr hatine girtin:

1- Şandina nûnerên xwe di van rojên nêzîk de, ji bo Bexda ku guftûgo bidomînin û pêşnîyar û projeyên xwe bidin nûnerên hukimetê.

2- Şandina spasname ji bo hemû dewlet û dezgeh û komelên ku alkariya mirovî ji bo aware û derbederên Kurd şandine. Û herweha dawa ji wan bê kirin ku heta dikarin alîkariya xwe zêde bikin.

3- Em ji dewletên Hevkar (alierande) û ji Komîsyona Ewlekariya Koma Neteweyan daxwaz dikin, ku li lihevhatinê ku di navbera me û hukimeta Iraqê de, dê çêbibin, xwedî lê derkevin û bibin garantorê bicîhanîna lihevhatinê û herweha beşdarî bikin ji bo avakirin û pêşxistina Kurdistana Iraqê. Ji ber ku ev dibe sedemê berqerarbûna aştî li Iraqa û herêmê.

4 - Tîka li dost û alîkarên gelê Kurd dikin, ku di rewşa me de bigehîn û piştgiriyek pêwîst li xebata gelê me bikin. Ji bo çareseriyekî sîyasî û demokratîk, ji bo pirsa xwe ya rewa û rizgarkirina wê ya ji vê felaketa ku hatiye serê wê.

**Bereyê Kurdistana Iraqê**
**Buroya Skandînaviyayê**
**1991.5.3**

## <u>4'ê Gulanê</u>

Li gor nûçeyan, divê heyeta Kurd 5'ê mehê, roja şemiyê biçûya Bexdayê û bi hukimeta Iraqê re dest bi guftûgoyan bikira. Ji ber hinek sedeman heyeta Kurd çûndinê bi paş ve avêtiye.

Tirkiyê biryar gir, ku ew leşkerên hêzên Hevkar ên ku li herêma sînorên Tirkiyê û Iraqê ji penaberên Kurd re alikariyê dikin 30 roj bimînin. Piştî 30 rojan, divê musaadeya xwe dirêj bikin. Heger pêwîst be dikarin dîsan wextê dirêj bikin. Çend roj berê li Bangaldeşê bagerek rabû û qasî 100 hezar kesî mirin û bi milyonan kes bê mal û birçî man. Ev bûyera ha di çapemeniya cîhanê de kete pêş pirsa derbeder û penaberên Kurd. Ji aliyê din ve, roj bi roj pirsa Kurd û derbederên Kurd di çapemenî cîhanê de kêm dibin û ev pirs welê xuya ye, êdî tê girtin.

Li Swêdê, Federasyon û Komîta Parastina Mafên Gelê Kurd roja şemiyê li Stockholmê cîvineke vekirî li Sergel Torgê pêk anî. Wek civînên şemiyên din gelek kesên Swêdî, bîyanî û Kurd di civînê de axaftin û alîkarî û piştgiriya xwe bi Kurdan re dan dîyar kirin. Ji bo derbederên Kurd pere hat berhevkirin. Lê, tiştek dîyar bû, ku hejmara Kurdên beşdar li gor civînên din gelek kêmtir bû.

## <u>5'ê Gulanê</u>

Iraqê, carek din ji Tirkiyê daxwaz kir, ku Tirkiye rê bide, ku petrola wê di boriyan de were Iskenderûnê û bifroşe der. Tirkiyê bersiva Iraqê neda.

Wezîrên dewletên Xalîcê li Suûdî civiyan û biryar girtin, ku ambargoya aborî ya ku li ser Iraqê heye, berdewam be. Hîn mercên rakirina ambargoyê nehatine cîh.

Amerîka dixwaze hêzên xwe yên şerê li Rojhilata Navîn bihêlê. Welatên Arab jî, di vî warî de dudil in. Wezîrê Parastinê yê Amerîka Dîck got ku:

- Em qasî 100 serleşkerên xwe li herêmê dihêlin."

## <u>6'ê Gulanê</u>

Hêzên Hevkar herêma ewlekariyê fireh dikin. Leşkerên hêzên Hevkar, ber bi Dihokê diçin. Leşkerên Iraqê bê deng û bê teq xwe bi paş ve dikşînin.

Ji bo guftûgoyan Heyeta Kurd di bin serokatiya Mesûd Barzanî de çû Baxdayê. Cara pêşî heyeta Kurd di bin serokatiya Celal Talabanî de çûbû Baxdayê û li ser hinek prensîban bi hevdu kiribû. Vê carê bi firehî û kûrahî dê li ser proje û programa otonomiyê rawestin. Divê heyeta Kurd çend roj berê li Bexdayê bûya, lê bi derengî ket. Li gor nûçehînan tê gotin, ku di nav Kurdan de dubendî hene û ji ber vê yekê çûndina wan li paş ket.

Di dema çûndina heyeta Kurd de, wezîrê Karûbarên Derveyî yê Iraqê Tarik Azîz, presskonferansek çêkir û



li ser 2 xalên girîng rawesta:

1- Em petrola Kerkûkê nadin Kurdan; ji ber ku hemû petrola Iraqê ya merkezî ye.

2- Em garantoriya Koma Neteweyan û navnetewî naxwazin. Qebûlkirina daxwazeke weha ne mumkun e.

Civata Aborî ya Ewropê, pirsa derbederên Kurd girt rojeva xwe û li ser peyîvî. Di civînê de, li ser curên alîkariyê rawestan. Nûnerên Civata Ewropa gotin ku :

- Alîkarî diçe, lê gehîştandina wê zahmet e. Ji ber ku rê naçin çiyayên ku derbederên Kurd li wir in.

Çapemeniya Ingiliztanê, nivîsarên tûj û tûnd li Tirkiyê girtin, ku Tirkiyê rojnamevanê Ingiliz Robert Fîsk derxist derê welêt.

Serokwezîrê Tirkiyê li Zelanda Nû presskonferansek çêkir û di presskonferansa xwe de, di derheqê derbeder û penaberên Kurd de rexne li Ewropiyan girt û weha dom kir:

- Ewropî rexne li me digrin. Bi tenê Tirkiyê ji derbeder û penaberên Kurd re destê xwe dirêjî alîkariyê kiriye. Ji 1988-an ve, hîn 27 hezar derbederên Kurd li Tirkiyê ne. Me heta niha wan xwedî kir. Niha yên nû jî hatin. Em wan jî xwedî dikin. Ewropî tiştek nakin, bi tenê rexne li me digrin.

Li Dîyarbekir waliyê kolonîyalîst Hayrî Kozakçioğlu û Tumgeneralê Amerîkî bi hevdu re presskonferansek çêkirin. Rojnamevanan ji generalê Amerîkî pirsin:

- Gelo rast e, PKK li helîkopterên we teqandiye û we jî 9 gerîllayên PKK kuştine?

Generalê Amerîkî:

- Ez ji vê yekê ne agahdar im, lê heger PKK li helîkopterên me biteqîne, ew wenda dike, ne em.

## *7'ê Gulanê*

Di bin serokatiya Mesûd Barzanî de heyeta Kurd li Bexdeyê guftûgoyan dimeşîne. Heyet û hukimeta Iraqê bi kurahî û firehî li ser otonomiya 11'ê Adarê radiwestin. Li ser navê hukimeta Iraqê Tarik Azîz û Izzet Ibrahim beşdarê guftûgoyan dibin. Li gor nûçegîhanê BBC yê li Bexdeyê, guftûyo bi awayekî pozîtîv dewam dikin. Irak pirsa Kerkûkê û garantoriya navnetewî qebûl nake.

Amerîka biryar da, ku di navbera 48 saetan de, leşkerên xwe ji başûrê Iraqê bi temamî bikşîne Kuweytê û di şûna wan de, hêzên Koma Neteweyan cîhên xwe bigrin.

Wezîrê Ewlekariyê Amerîka Dîck Cheney got ku:

- Êdî leşkerên Amerîka divê vegerin mala xwe.

Dihok ket herêma Ewlekariyê. Amerîka û hêzên Hevkar di navbera Zaxo, Amêdî û Dihokê de stasyonan pêk anîn. Di rojê de, qasî 2000 Kurdên derbeder bi helîkopteran ji çiya dikşînin warê kampan. Li gor daxuyaniya serokê hêzên Hevkar, divê heta 4 rojan Kurdên derbeder bigihên mal û kampên xwe.

## *8'ê Gulanê*

Guftûgo di navbera heyeta Kurd û hukimeta Iraqê de dom dikin. Iro piştî nîvro di bin serokatiya Mesûd Barzanî de heyeta Kurd û Saddam Huseyîn hevdu dîtin. Endamê heyeta Kurd Samî Rahman, îro li Bexdayê daxuyaniyeke gelek kurt da çapemeniya cîhanê ku " goftûgo di navbera heyeta Kurd û hukimeta Iraqê de, bi awayekî pozîtîv berdewam e."

Duh 2 balafirên Amerîka dema li ser Kurdistana Iraqê firiyan leşkerên Iraqê li wan teqandin. Balafiran îsabet negirt û gehîştin balafirgehên xwe. Wek ku qet tiştekî nebe, Amerîka deng dernanî.

Nûçegîhanê Radyoya Swêdê beşa tirkî Gönenç Erten Kurtîz, ji Kurdistana Iraqê telefonê radyoya Swêdê kir û tiştên ku bi çavên xwe dîtibû weha pêşkêş dikir:

- Li Zaxo jîyan normal e. Piraniya dukanan vekirî ne. Em bi otomobîlê ber jêr çûn heta Batûfayê. Mirov du tiştan bi çavên serê xwe, bi awayekî vekirî dibîne: Yek Bakurê Iraqê şerekî giran dîtiye û wêran bûye. Xanî nemane, yên ku li pîya mane şewitine. Li qeraxên rê traktor û otomobîlên şewitî hene. Ev dîyar e, ku dema bi erebeyên xwe xwestine birevin, balafir û helîkopteran wan gulebaran kirine û şewitandine. Ango welat bi temamî wêran bûye. Ya duyem ev welatê wêran û şewitî di bin îşgala Amerîka de ye. Mirov bi ku de diçe, ji derî leşkerên Amerîka tiştekî nabîne. Li çend ciyan me kampên pêşmêrgan jî dît. Leşkerên Iraqê li navê tunin. Bi tenê dema em ketin Iraqê, li nêzî Zaxo çend leşker di qereqoleke de hebûn. Ew jî gelek dûr bû û wan karê xwe bi tiştekî nedianî.

Qumutanê hêzên Tirkiyê yê giştî orgeneral Doğan Güreş çû herêma Hekarî û Sêrtê, hêzên xwe kontrol kir. Û di vegeride got:

Her tişt di kontrola me de ye. Divê hemû hêzên bîyanî di bin emrê me de bin."

Berdevikê Wezareta Karûbarê Derveyî Tirkiyê Murad Sungur, li ser rewşa bûyerên ku li herêma Hekariyê û Sêrtê, di navbera hêzên Tirk û yên Hevkar de, bi taybetî di nav yên Tirk û Ingiliz de pêk hatin weha anî zimên:

- Ew hêzên bîyanî ku li herêmê ne, li gor statûyeke li wir in. Ew ji bo alîkariyê li herêmê ne. Divê li gor wan prensîbên statûyê hereket bikin.

Li gor rojnameya Cumhuriyet (8 gulan) Amerîka û dewletên Hevkar Kurdistana Iraqê kirin depoya çek. Hem jî çekên giran. Ihtîmaleke mezin heye ku van çekan ji Kurdan re bihêlin.

Rojnamevanê Tirk M. Ali Birand çûbû Bexdayê û bi navê 32 Rojan Programeke çêkir. Li ser pirsa Kurdan bi Serokwezîrê Iraqê Sadûn Hamadî û wezîrê Karûbarên Derveyî Tarik Azîz re peyîvî. Li ser pirsa M. Ali Birand, Tarika azîz digot ku:

- Em demokrasiyê tînin Iraqê. Partiayan serbest dikin. Bi awayekî serbest dê hilbijartin pêk bên. Kurd jî, dikarin li ser navên partiyên xwe bikevin hilbijartinên herêmî. Helbet dê Kurdên din jî, li herêma Kurdan bikevine hilbijartinê. Êdî xelkê dengê xwe bide kî. Ji xwe niha jî otonomiya Kurdan heye. Em dê wê hinek jî fireh bikin.

Serokwezîr jî digot ku:

- Cîranên me (qesta wî Tirkiye, Suriye û Iran bû) alîkariya terorîstan dikin. Ev ji bo wan jî nebaş e. Ji aliyê din ve, ev kar têkiliyên cîrantiyê jî xirab dikin.

M. Alî Birand jê pirsî:

- Terorîst kî ne, tu dikarî navên wan bidî?

Tarik Azîz bê deng ma, lê, Sadûn

Hamadî got:

- Terorîst, Celal Talabanî û Mesûd barzanî ne.

Di eynî programê de, M. Ali Birand bi Yaser Arafat re jî hevpeyvînek kir û weşand. M. Ali Birand ji Arafat pirsî:

- Gelo piştgiriya we ya ji bo

Saddam, ji pirsa Filîstin re puanên negatîv ne anî?

Yaser Arafat:

- Na! tam ziddê wê. Me polîtîkayeke rast û durust ajot. Ma tu nabînî, heger niha pirsa Filîstîn aktuel e, ev jî, ji ber piştgiriya Saddam tê.

Îraqê carekî din serî li Tiriyê da, ku wezîrê Îraqê yê Karûbarê Derveyî Tarik Azîz here Tirkiyê. Wezîrê Tirkriyê yê Karûbarê Derveyî dixwest, berî ku welatên Rojava Kurdistaneke çêbikin, Tarik Azîz here Tirkiyê û li ser pirsa Kurd guftûgoyan bikin. Lê, serokkomar T. Özal nexwest, ku Tarik Azîz here Tirkiyê û herweha çûndina wî bi paş ve avêtin.



Amerîka dest pê kir ji başûrê Îraqê leşkerên xwe dikşîne Kuweytê û ji wir jî dibe Amerîka. Lê, Amerîka li Kurdistanê hêzên xwe zêde û bi cîh dike.

Konseya Ewlekariya Koma Neteweyan, dê li ser tazmînatdayîna Îraqê bicive. Amerîka ji hatina Îraqê ji %50 tazmînat dixwaze. Endamên din yên Konseya Ewlekariyê dixwazin ji %50'î kêmtir be. 5 dewletên daîmîyên Komîsyona Ewlekariyê, li ser vê yekê biryar bigrin.

Musteşarê maliya Tirkiyê jî, zerara ku di şerê Îraq-Kuweytê de li Tirkiyê bûye hesab kir. Li gor rapora Tirkiyê divê Îraq 6,2 milyar dolar tazmînat bide Tirkiyê. Çendekî berî, Tirkiyê zerara xwe 7,5 milyar dolar hesab kiribû û ji vî hesabî re îtîraz hebûn.

Turgut Özal îro firiya Avustraliyayê. Hukimeta Avustraliyayê nîşanek da wî. Di parlementoyê de partiyên muxalefet ji bo vê nîşandayînî, hukimetê protesto kirin. Hinek parlementerên îktîdarê jî li gel protestoyê bûn. Li der jî Kurd, Ermenî û Ruman hatina T. Özal protesto kirin. Hukimet dê zîyafetek bide T. Özal. Lê gelek parlementer û wezîran dan dîyarkirin ku dê beşdarê zîyafeta T. Özal nebin. Li gor ajansan, dê sibehê protestoyên mezin û girsî li hember T. Özal pêk bên.

Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Sovyetê Alexander Bessmertnîş, dê roja şemiyê, cara yekemîn dê Îsraîl zîyaret bike. Sovyet dixwaze di pirsên Rojhilata Navîn de, di eynî masê de, bi Amerîka û Îsraîl re rûne. Wezîrê Sovyetê, dê berê dostê xwe Suriyê zîyaret bike û paşê jî here Misirê.

Wezîrê Ewlekariyê Amerîka Dick, li Rojhilata Navîn hevdîtinên xwe didomîne. Îngiliztan dixwaze hêzekî xwe yê giran û mezin li Rojhilata Navîn bihêle û bi cîh bike. Serokê Misirê Husnî Mubarek jî, hinek hêzên xwe ji herêma Xalîcê bi paş ve kişand.

### 9'ê Gulanê

Îraq li dij bi cîhkirina polîsên Koma Neteweyan li Kurdistanê radiweste. Û dibêje:

- Ev biryar li dij prensîbên Koma Neteweyan e û dîrekt mudexela hundirê Îraqê ye.

Ji aliyê din ve, Îraqê qasî 2000 leşkerên xwe yên elît şand bajarê Dihokê. Leşkerê Amerîkî jî, li derdorê bajarê Dihokê ne, lê heta niha neketine nav bajêr. Dikare bûyerên lêdanê di navbera leşkerên Îraqê û Amerîka de derkeve.

Tarik Azîz daxuyaniyek da, ku bajarê Kerkûkê divê li derî otonomiyê bimîne.

Li Bexdayê Mesûd Barzanî, di derheqê gufûgonyan de daxuyaniyeke kurt da û got:

- Guftûgo dom dikin. Me heta niha pêngavên gelek pozîtîv û pêşketî avêtiye. Ez bawer im, dê em bi serkevin.

### 10'ê Gulanê

Derbederên Kurd bi paş ve vedigerin Kurdistana Îraqê, lê, ne bi hejmareke hewqas mezin. Piraniya wan benda encama guftûgoyan in. Bi rejîma Saddam bawer nakin. Li gor serokê hêzên Hevkar heta niha 12.443 derbederên Kurd bi paş ve vegeriyan Kurdistana Îraqê û li wir di kampande bi cîh bûne.

Li bakurê Kurdistana Îraqê 26 hezar leşkerên Amerîka û hêzên hevkar hene. Tirkiye ji vê yekê gelek fikar dike û ditirse.

Wezîrê Ewlekariyê yê Îngiliztanê Tom King li ser têkiliyên navbera xwe û Tirkiyê û pirsa Kurd daxuyaniyek da û got:

- Ji bo pirsa Kurd, Tirkiye dipelikîne ango fikar dike. Ez baş bi vê yekê dizanim û heq didime Tirkiyê. Bûyera kaymakamê Şemdiliyê ji vê yekê tê. Em wek Îngiliztanê avakirina dewleteke Kurd naxwazin. Em piştgiriya otonomiyê dikin. Em mutefîkê Tirkiyê ne. Ew çekên ku em dişeynin bakurê Îraqê ne ji bo Kurdan e; ji bo parastina leşkerên me ne. Tirkiye fikar dike ku ' dema hêzên Îngiliz û yên dewletên Hevkar ji bakurê Îraqê derkevin, dê van çekan bidin Kurdan.' Heger leşkerên min dema bi paş ve vekişin û çekên xwe bidine Kurdan, ez dê wan bidim mehkemeya leşkerî. Ji bo me jî, Kurdên çekdar tehlîke ne. Divê dostên me baş bi vê yekê bizanibin. Di pirsa penaber û derbederên Kurd de, Tirkiyê gelek alikariyê kir û dike. Ez bi xwe ji Tirkiyê re spasdar im.

### 11'ê Gulanê

Hêzên hevkar, xebata xwe bi lez û bez didomînin. Li gor daxuyaniya serokê hêzên Hevkar, îro qasî 10 hezarî derbederên Kurd bi helîkopleter û kamyonan birin cihên kampan û wan bi cîh kirin. Û divê her roj 10 hezar kes bi cîh bikin.

Heta îro, hêzên Îraqê û yê Hevkar li herêma Dihokê li hember hevdu bûn. Di nav bajêr de hêzên Îraqê û li derdorê jî yê Hevkar li hember hevdu rawestabûn. Hêzên Hevkar ji bo derketina ji bajarê Dihokê wexteke dabû hêzên Îraqê. Îro hêzên Îraqê mecbûr man û ji bajêr derketin. Lê, di şûna hêzên leşker de, vê carê Îraqê hêzên xwe yên sivîl bi cîh kiriye.

Mesûd Barzanî bi heyeta xwe ve îro cara dudoyan Saddam dîtin. Kes nizane guftûgoyên di navbera Îraq û heyeta

Kurd de çawan diçin û di çi prosesê de ne.

Londrayê, îro di derheqê Saddam de daxuyaniyeke gelek tûj û tûnd da. Serokwezîrê Îngiliztanê John Major, got ku:

- Heta ku Saddam li ser desthilatiyê (îktîdarê) be, em têkiliyên xwe bi Îraqê re tû carî danayînin. Ew pêşnîyarî û pêşnameyên ku di derheqê Îraqê de bên Koma Neteweyan, em dê wek Îngilistanê di Koma Neteweyan de, wan veto bikin û nahêlin derbikeve.

Divê mijarê de şirovevanên BBC şirove dikin ku:

"Dibe ku Kurd ji ber vê daxuyaniyê ji John Major biqaherin. Heger Kurd li ser masê, bi Îraqê re li hevdu nekin û xwe bi paş ve bikşînin, dê kêfa John Major bêt. Dewletên Hevkar dixwazin ku Kurd ji rejîma Îraqê bi dûr bikevin. Ji bo Îngilistan û dewletên Rojavayên din polîtîkayeke nû ye. Heta niha wan nedixwest,ku Saddam bikeve û ji Kurdan re jî sînyal pêdixistin ku herin bi Saddam re, di maseyeke de rûnin. Ji derî vê alternatîf tune."

Û şirovevanên Rojava didomînin:

" Saddam, ji bo mayîna rejîma xwe bi Kurdan re rûdine û dest bi guftûgoyan dike. Saddam ji 100.000 pêşmêrgeyî ditirse û dixwaze bi dek û dolaban wê hêzê mezin û giran yê li dijberê xwe rawestîne. Ji ber vê yekê jî, dixwaze dest bi guftûgoyan bike û bi rawestina Kurdan bîhneke bigre. Ji aliyê din ve, rejîma Bexdayê dixwaze bi guftûgoyên navbera xwe û Kurdan, ambargoya ku li ser Îraqê heye, wê ji navê rabike."

Wezîrê Ewlekariyê yê Îngilistanê Tom King dê here Tirkiyê. Îngilistan herweha dixwaze, ew dilsariya ku di navbera wan û Tirkiyê de çêbû bû xweş û rabike .

Serokê hêzên Hevkar ê NATO, serokê hêzên giştî yê Tirkiyê General Güreş zîyaret kir. Ew dixwaze Güreş îkna bike, ku alîkariya Kurdan nakin û alîkarî bi tenê di warê humanîstî de ye. Wî, di vê mijarê de daxuyaniyek da:

- Me çek nedaye Kurdan û nadin jî. Heger Îraq êrîşê Tirkiyê bike, em hêzên NATO amadene û dikarin di cîh de mudaxela Îraqê bikin.

Wezîrê Karûbarê Derviyê yê Amerîka J. Baker, daxuyaniyek da, ku "deriyên hêviya hevdîtinan vebû. Dewletên endamên Konseya Hevkariya Xalîcê amadene, ku bi Îsrail re di maseyeke de rûnin. Sovyet jî daxuyaniyek da ku, ew jî wek Amerîka difikirin û piştgiriya plana Baker dikin.

Li ser pirsa derbeder û penaberên Kurd, rojnamevanan pirsek ji Baker pirsîn. Baker weha bersiv da:

- Em niha meheke din jî, dema leşkerên xwe li bakurê Îraqê dirêj dikin. Heger paşê pêwîstî hebe, em dikarin pirsê bibin Konseya Ewlekariyê ya Koma Neteweyan jî.

Stranvan û hunermendên muzîka pop, dê di 12'ê meha gulanê de, li Îngilistanê ji bo alîkariya derbederên Kurd galayeke (konsereke) mezin û navnetewî çêbikin. Hatina wê ji derbederên Kurd re dîyarî bikin. TV yên gelek welatan, dê ji Gala Kurd çend saet dîrekt weşan bikin.

## *12'ê Gulanê*

Dihok ket bin kontrola hêzên Hevkar. Sibehê dê qumutanê hêzên Hevkar û berpirsiyarê Koma Neteweyan bi hevdu re herin navça Dihokê û kar û bar kontrol bikin.

Stranvan û dengbêjên muzîka pop ên cîhanê îşev li Îngiliztanê ji bo alîkariya penaberên Kurd Galayek pêk anîn. Gelek muzîzyenê muzika popê beşdarê programê bûn. Rod Stewart programa muzîkê vekir. 10 hezar kes bi bilêt beşdarê Galayê bûn. Di nav beşdaran de Prensesa Dîana û Serokwezîrê Îngiliztanê John Major jî hebûn. Televîzyonên 37 dewletan dîrekt programê weşadin. TV'ya Swêdê kanal-2 saet 21'ê dest bi weşanê kir û heta saet 02 şevê dom kir. Bi kêmasî 500 milyon kesî temaşê Gala - Kurd kir. Di nav programên muzîkê de, bi kurtasî li ser dîrok û rewşa Kurdan a îroyîn agahdarî hat dayîn. Tirkiye, Suriye, Îran û Îraqê programê neweşand. Hinek kesan ji artîsan re pêşnîyarî birin ku Galaya Alîkariyê ji bo derbederên Kurd û perîşanên Bengalîyan re pêk bînin. Artîsan pêşnîyarê qebûl nekirin û sedemên ne qebûlkirina xwe jî weha dan dîyar kirin:

- Pirsa Kurd Tiştekî din e û alîkariya maddî tiştekî din e. Alîkarî û piştgiriya me ya ji bo Kurdan, ne bi tenê ya maddî ye. Heger hûn bixwazin, em dikarin ji bo Bengaliyan jî galayeke din pêk bînin. Lê, ev divê bi tenê ji bo Kurdan be.

Ozanê Kurd yê bi nav û deng Şivan Perwer jî, bi grûba xwe ve beşdarê programa Gala Kurd bû. Şivan bi strana "Canê Canê, Were Meyanê" ve bû ozanê navnetewî. Wî, reng û bihna kurdî û Kurdistanê d aGalayê. Chris du Borge bi pêlên ala Kurdî û hemû artîstan re dawiya programê anî. Mesûd Barzanî, spasnameyek ji artîs û amadekarên Gala Kurd re şand û spasname wî dîrekt hate xwendin.

Hatina Gala Kurd 10 milyon sterlîn bû. 10 milyon sterlîn jî, hukimeta Îngiliztanê kir ser û bû 20 milyon sterlîn. Pere teslîmê Xaça Sor kirin ku bişênê Kurdistanê.

## *13'ê Gulanê*

Hêzên Hevkar, îro bi konvoyên kamyonan ve ketin Dihokê. Di hewa de jî, balafirên Amerîkî komvoyê parastin. Di nav bajêr de leşkerên Îraqê li hêzên Hevkar teqandin. Leşkerên Brîtanyayê bersiva leşkerên Îraqê dan û 2 leşkerên Îraqê birîndar bûn. Cara yekem e, ku di navbera hêzên Hevkar û yên Îraqê de şer derdikeve. Piştî vê bûyerê, leşkerên Îraqê bê deng man û xwe ji herêmê bi paş ve kişandin. Hezên Hevkar cara yekem ala Koma Neteweyan li Dihokê kişand.

Li ser pirsekî, Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Îngiliztanê got ku:

- Em, ji bo alîkariya humanîst çûne bakurê Îraqê, ne ji bo dagîr kirinê.

## *14'ê Gulanê*

Berpirsiyarê Koma Neteweyan Sadeddîn Axa Xan hate bajarê Zaxoyê û kampan zîyaret kir. Qasî 1000 kesî ji kampan dest pê kirin û ber bi Zaxo ve meşîyan û rejîma Saddam protesto kirin. Heta nav Zaxo hejmara wan ji 5000'î bêtir bû. Di nav Zaxo de meşiyan û qîriyan:

" Bimre Saddamê faşîst, me Helepçê ji bîr nekiriye, bijî Kurdistan..."

Meşvanên Kurd xwestin yekî Areb linç bikin. Bi gumana ku ew Areb sîxurê Saddam e.

Li Swêdê Radyoya Merhaba ku bi tirkî weşandike, li Bexdayê bi Mesûd Barzanî re hevpeyvînek çêkir. Mesûd Barzanî digot ku:

- Em naxwazin nêzî sînorê Tirkiyê dewleteke Kurd ava bikin. Em otonomî dixwazin. Tirkiyê gelek ji penaberên Kurd re alîkariyê kir. Em ji Tirkiyê re spas dikin. Heger Turgut

Özal bixwaze, ez bi xwe dixwazim werim Tirkiyê û wî zîyaret bikim.

Li herêma Şîîyan, li Başûrê Îraqê di nav Şîî û hêzên Saddam de şer derket. Kes bi encamê nizane.

Li herêma Kurdistanê leşkerên Îraqê, li helîkoptereke Amerîkî teqandin, lê rastê wê nehat. Lê, Amerîka di vî warî de tiştekî negot.

Îro Îraqê riya ji welêt derketinê serbest kir. Bi hezaran kes ji bo standina pasaportê serî li sazgehên pasaportê xistin. Rêz gelekî dirêj bûn. Ji wan hinek dixwazin ji Îraqê derbikevin der û hinek jî, mirovên wan wenda bûne, dixwazin li wan bigerin û bibînin.

Ji bo pêkanîna aştiya nav Areb û Îsraîl, Wezîrê Karûbarên Derveyî yê Amerîka Baker, îro di riya reş de, ji Amanê çû Qudûsê. Suriye û Îsraîl rika xwe didomînin. Wek tê zanîn Wezîrê Karûbarê Derveyî yê Sovyet jî, li Rojhilata Navîn e. Ew jî, dê bi Yaser Arafat re rûne û li ser pirsa Rojhilata Navîn qise bikin.

## 15'ê Gulanê

Navbera Îngiliz û Tirkiyê gelek ne baş e. Wezîrê Ewlekarî yê Îngiliztanê Tom King çû Tirkiyê. Turgut Özal wî derengî qebûl kir. Wezîrê Ewlekariyê yê Tirkiyê Mehmet Yazar jî, bi dilsarî Tom King qebûl kir. Dîyar e, ku Tom King piçek naberê nerm kir û di axaftina xwe de got ku:

- Leşkerên me, ji bo alîkariyê hatine herêmê. Tirkiyê, di vê babetê de alîkariyeke gelek hêja kiriye û dike. Em ji Tirkiyê re spasdar in. Divê rojek zû hêzên Koma Neteweyan were herêmê û em her tiştî teslîmê wan bikin. Divê leşker û personalên me bi paş ve vegerin.

Amerîka ji ber zerara Xalîce 200 milyon hîbe da Tirkiyê. Berê jî 50 milyon dabû. Li gor Tirkiyê, divê îsal welatên Rojava bi kêmasî 4,5 milyar dolar alîkariyê bidin Tirkiyê. Tirkiye dibeje ku; " me şerê Xalîcê de 6.2 milyar dolar zerar dîtiye. Divê Rojava vê zerara me bide."

## 16'ê Gulanê

Turgut Özal çû Kurdistanê herêma derbeder û penaberên Kurd. T. Özal li Silopiyê axaftinek kir. Wî di axaftina xwe de got ku:

- Piraniya derbeder û penaberên Kurd vegeriyane kampên ku hêzên Hevkar li bakurê Îraqê çêkirine. Divê Koma Neteweyan bi awayekî aktîv bixebite ku ev kes vegerin malên xwe.

Rojnameya Kuweytê, Sewtil Kuweyt di hejmara 16 Gulanê de dinivîse, ku "Barzanî vegeriya Kurdistanê." Rojnamê, nûçeya xwe ji ajansa Royterê digire. Li gor Royterê Celal Talabanî li ser guftûgoyan weha dibêje:

- Em hîn negehêştine encameke pozîtîv. Heyetên Kurd û ya hukimeta Îraqê li Bexdayê guftûgoyan didomînin. Pirsa me ya bingehîn li Îraqê pirsa demokrasiyê ye. Otonomî jî di nav vê pirsê de ye. Em dixwazin qanûna bingehî ya Îraqê bê guhartin. Hukimeteke azad û koalîsyon pêk bê û paşê hilbijartina giştî çêbibe. Me li ser sînorên otonomiyê û garantoriya Koma Neteweyan jî, hîn bi hevdu nekiriye.

Û li gor rojnama Sewtil Kuweyt, Saddam zû dike ku bi Kurdan re peymaneke pêk bîne û ambargoyê ji ser xwe rabike û petrola xwe bifroşe.

Ji Vîyanê delegasyonek çû Bexdayê, ku li Îraqê di derheqê çekên atomî, bîyolojîk û skûdên dûrmenzîl de lêkolîneke çêbike û di vî warî de raporeke bide Koma Neteweyan. Delegasyon dê di navbera cend hefteyan de xebata xwe ya lêkolînî temam bike û here Amerîka.

## 17'ê Gulanê

Mesûd Barzanî hîn jî, li Bexdayê ye.. Îro wî, daxuyaniyeke kurt da çapemeniya cîhanê û got; " delegasyonên me li ser peymanê dixebitin.Pêngavên pozîtîv hene. Peyman li ser temambûnê ye. Me, hîn li ser hinek xalan bi hevdu nekiriye. Ez bawer im, ku em dê di demekî gelek kurt de , peymanê îmze bikin."

Rojnamevana Tirk Nadîre Mataracı, li bajarê Şaqlawayê bi Celal Talabanî re hevpeyvînek çêkir. C. Talabanî weha digot:

- Amerîka berî ji gelê Kurd û Areb re got "serîhildin, em dê alîkariya we bikin." Lê, dema me serîhilda, Amerîka polîtîka xwe guhart. Tevgera me tevgerekî gelîrî bû. Amerîka, li dij tevgerên gelêrî ye. Ji ber vê yekê jî, li dij derket. Lê, tewrê wê yê niha baş e.

Li ser pirsa ku " gelo serhildana Kurd têkçû?", Talabanî weha bersiv da:

- Na. Rewşa me, ji 1970'î gelek baştir e. Netîce, qezenca me ye. Em xurt in.

Rojnamevanan li ser têkiliyên wan û PKKê jî pirsek ji C. Talabanî :

- PKK rêxistineke Kurd e. Apo, ji me re mesaja serkeftinê şand û piştgiriya xwe da dîyar kirin.

Li ser pirsa "gelo li Tirkiyê îdareke federatîf mumkun e?" Talabanî got ku:

- Li Tirkiyê, ji bo Kurdan îdareke federatîf munkun e. Turgut Özal jî, li rê û metodên îdareke federatîfî digere.

## 18'ê Gulanê

Îro jî , Mesûd Barzanî li Bexdayê presskonferansek çêkir. Barzanî, di derheqê guftûgoyan de weha got:

- Em, efûyeke giştî, hilbijartin û çapemeniyeke azad, li Îraqê demokratiyeke giştî, otonomiyeke rasteqîn û universiteyên kurdî dixwazin... Piştî îmzakirina peymanê divê hêzên Hevkar ji herêmê derkevin...

Li ser pirsa, "niha xebate we di kîjan prosesê de ye jî?" Barzanî:

- Wek prensib, me bi hevdu kiriye, lê, di nav me de hîn xal hene, ku me li ser wan bi hevdu nekiriye. Heyetên me xebata xwe didomînin. pêngavên pozîtîv hatine avêtin.

Lê, li gor şirovevanên Rojava, Mesûd Barzanî, ne terefdar e, ku derbeder û penaber vegerin Kurdistanê.

Serkkomarê Misirê Husnî Mubarek, berî ku here Ewropa çû Tirkiyê. Turgut Özal jê re merasimeke gelek mezin çêkir. Mubarek û Özal dê li ser dahatûya Îraqê, pirsa Filistînî û pirsa derbederên Kurd bipeyîvin.

Hêzên Hevkar îro 3700 penaberî ji hêla sînorê Tirkiyê bi kamyonan birin Kurdistana Îraqê û wan di kampan de, bi cîh kirin.

## 19'ê Gulanê

Hêzên Hevkar, bi kamyonan penaberên Kurd ji nêzî sînorê Tirkiye û Îranê ber bi Zaxo û Dihokê ve dikşînin. Ji guftûgoyan hîç nûçe tune.Dibêjin ku Îraq, bajarê Kerkûkê di nav sînorê otonomiyê de qebûl dike, lê, petrolê wî li ser hukimeta merkezî dihesibîne. Komîsyon li Bexdayê xebatên xwe didomînin.

www.arsivakurdi.org



Nûçegîhanê BBC li Londrayê pirsek ji berpirsiyarê PDK- Îraqê Hoşyar Zebarî kir; "gelo Amerîka dixwaze Kurdistanê bigre?"

Hoşyar Zebarî weha bersiva nûçegîhanê BBC da:

"Me ji %90 Kurdistanê girtibûn; heger Amerîka alîkariyê bikira Saddam nikaribû bê Kurdistanê."

Rojnamevanê Kurd Mahmûd Baksî bi Şivan Perwer re çûbûn Kurdistanê. Mahmûd vegeriya Swêdê û TV'ya Swêdê, li ser rewşa Kurdistanê programek çêkir. Di vê programê de, bi Celal Talabanî û Mesûd Barzanî re, li ser rewşa Kurdistanê hevpeyvîneke çêkiri bû. TV'ya Swêdê wê pêşkêş kir.

## *20'ê Gulanê*

Lêşkerên hêzên Hevkar, îro bajarê Dihokê bi temamî girtin bin kontrola xwe. Hêzên Hevkar dest çêkirin û tamîr kirina kanalîzasyon û elektrîkê kirin. Balafirên hêzên Hevkar jî li ser Dihokê firîn û xwestin bidin şandin, ku ewletî û parastina Dihokê di destê wan de ye û penaber ji wan bawer bikin û vegerin bajêr. Çend polîsên rejîma Îraqê hatin bajêr ku agahdariyê bidin qumûtanê hêzên Hevkar. Li gor agahdariya hêzên Hevkar, hêzên Îraqê li jêrê bajarê Dihokê û li qesebeyên wê hejmara leşkerên xwe pir dikin û mewziyan dikolin.

Konseya Ewlekarî ya Koma Neteweyan biryara firotina petrola Îraqê qebûl kir. Ji bo mesrefên şerê fondek çêkir. Biryar bi 11 dengan hat qebûl kirin. Îraq, êdî dikare petrola xwe bifroşe. Lê, Konseya Ewlekariyê biryara ji % çend prosentên petrolê ji fonda Koma Neteweyan re be, dîyar nekir. şekreterê Gistiyê Koma Neteweyan dê prosentê tespît bike. Dema Sekreterê giştî prosentê dîyar bike, Îraq dikare dest bi firotina petrolê bike. Heger Îraq, li gor wê prosentê pere neşeyne Fonda zerara Koma neteweyan, wê çaxê KN dikare ji nû ve ambargoyê bide ser petrola Iraqê. Îraqê vê biryarê protesto kir û got ku; " lê, ji ber ku alternatîfeke din nîne, em biryarê qebûl bikin."

BBC bi navê "Dosya Diziya CIA û Koza Kurd" programeke çêkir. Di vê programê de, bi gelek berpirsîyar û pisporên CIA yên kevin re hevpeyvîn çekirin û dîtinên wan girtin.

Li gor berpirsîyarên CIA yên kevin, Amerîka heta niha di 1956, 1975 û 1991 de 3 caran Kurdan bi kar anîn û wan xapandin. Di 1956-60'î de, li Kurdan teda û zordariyê zêde kirin. Di Adara 1972-an de, CIA Îranê zîyaert kir. Şah Kurdan pîj kir. Kurd û Îraq bi hevdu ketin. Kurdan bi alîkariyê xapandin. Di dawî de, Şah û Saddam hevdu ramîsan û Kurd bi serî û lingan ve têkçûn.

Niha jî, gelo serokên Kurdan hewqas bê eqil bûn, ku ji çiya dakevin bajaran û Saddam wan derbeder bike? Kurdan ji Amerîka, Fransa û Îngiliz alîkarî xwest. wan jî sozên alîkariyê dan Kurdan. Kurdan dest bi şerê Saddam kirin, piraniya Kurdistanê girtin. Lê, Amerîka dîsan xwe paş ve kişand. Kurd bi tenê man. Bi zordana Fransa û Îngilistanê, Bush mecbûr man, vê carê dest bi alîkariya însanî kir.

**Not:** ***Fotografên derbederên Kurd li Kurdistanê ji aliyê rojnamevanê Swêdî Stefan Hagberg ve hatiye kişandin.***



www.arsivakurdi.org

Ji Federasyonê re telefon dikim. Kirîv, berpirsîyarê Berbangê, tê ser telefonê. Dibêje, "ger li ber konsolosxanê (sefaretxanê) tiştekî interesant hebe, ji bo Berbangê binivîsîne.

Li ser daxwaza Enîya Kurdîstana Îrakê, Kurd ji şeva din ve, li ba konsolosxana Amerîkayê rûniştine. Gava ez diçim wir saetli der- dora 18.00'an e, êdî roj diçe ava. Li ser Stockholmê ewrên baranê hêdî hêdî berhev dibin. Pel ji daran weşyane, li vir û li wir komî ser hev bûne. Swêdî, di nav otomobîlên xwe yên nerm û germ de, bi çavên şaşmayî li porreşên li ber dîwêr dinêrin, li pankartan dinêrin û derbas dibin.

- Selamûneleykum!
- Eleykumselam.

Bi qasî deh kesên, wisa xuya ye, ku ji Kurdîstana Başûr in, li hemba konslolosxana Amerîkayê, li ber dîwarê baxçeyekî, di nav xwe de dipeyîvin. Silava min digrin û axaftina xwe didomînin. Li ser çend lewhên tirafîkê û şîşên dîwarê bêxçe, çend alên reş û çend pankart hatine daliqandin. Gava ba tê, alên reş piçekî pêl didin û pişt re, wekî zarokên stuxwar, bê hereket dimînin.

Mirovên din çûne mal, wê sibê bên. Rismên çend pankartan digrim û ji wir vediqetim. Tarîyek sivik xwe berdide ser Stockholmê.

Bi hezaran kîlometir ji Stockholmê dûr, li Kurdîstana Başûr, bi hezaran Kurd, zar û zêç, pîrek û peya cardin ketine rîya macîrtiyê.

Mutefîk li Saddam rabûn xezebê, ordîya Saddam ji hev xistin. Lê belê, Saddam ji navê ranekirin. Hesabên wan her çawa bû, hat guhertin. Saddam li cîyê xwe ma. Ev Saddam e, bi Îranê nikare, bi mutefîkan nikare, lê bi Kurdan dikare, Kurdên sivîl û bêparastin.

# Li ber konsolosxana Amerîka

**Xorto**

Ev çend roj in, ordîya ku di destê Saddam de maye, bi ser bajarên Kurdîstanê de agir dibarîne. Bi hezaran Kurdên sivîl, ji ber tirs û xezeba Saddam, bajarên xwe yên bav û kala terk dikin. Zarokên xwas, pîrekên bi tena kiras ve û kal û pîrên bê teqet, di bin bombe û gulebarandina helîkopteran de ber bi Tirkîyê û çiyayên Kurdîstanê ve dimeşin. Dimeşin û dimrin. Ji birçîbûnê, ji sermê, ji nexweşîyê û ji napalmên Saddam dimrin. Yên ku xwe ji bombeyên Saddam xelas dikin û xwe digehînin ber sinorê Tirkiyê, îcar ji alî eskerên Tirk ve gulebaran dibin.

Li gor nûçeyan, heta niha 300 000 kes li ber sînorê Tirkîyê kom bûne. Tirkiye wan bernade hundir, eskerên li ber sînor, ji bo ku kes sînor derbas neke, gulan bi ser serên wan de dibarînin. Herwiha carek din Kurd, li ber çavên dinê, li ber çavên hemû mirovên bênamûs û bi namûs macir û qetil dibin. Hawara Kurdan li esmanan diçerqe, ne deng e û ne hes e. Deng paş ve, li xwedîyê xwe vedigere.

Sibetirê, roja 2'ê Nîsanê cardin diçim ber konsolosxana Amerîkayê. Endamên Komela Jinên Kurd dest bi grewa birçîbûnê kirine. Penc, şeş endamên Komelê, li kêleka rê, li hember konsolosxana Amerîkayê, li ser erdê şil rûniştine, di grewa birçîbûnê de ne. Zîlan, endama Komîta Karger a Komela Jinan, ew jî li wir e. Dibêje; "Ger tu ji min bipirsî, divê me Amerîka ji bo durûtiyê protesto bikira. Lê. em nuha li vir in û dixwazin nîşan bidin, ku pîrekên Kurd, di bin her şert û rewşî de, wê li ba xelkê xwe cîh bigre." Grewa wan wê çend rojan bajo ne dîyar e. Lê, du rojan carê wê penç endamên wan bi dor grewê bimeşînin.

"Saddamê faşist û qatil!"

"Alîkarî ji bo Kurdan!"

"Qetlîama Kurdan bidin sekinandin!"

Bi dengên sloganan re mirovên li wir komî ser hev dibin, dengên xwe bi hev re bilind dikin. Çavên piran li xaniyê sefaretxanê ye. Di hundirê çavên wan de nîşanên kîn, qahr û hêvîyê li hev piçikî ne. Qahrek giran û kûr, di nav çavên wan de û li ser ruyê wan diçe û tê. Yên ku nû tên, bêdeng derbasî nav koma merivan dibin û dest bi sloganan dikin. Di destên piran de cixare heye. Dûxana cixarê hêdî hêdî bi hewa dikeve, bi qasî çend saniyan, weke merivê ku, nizanibe bi ku da biçe, li ser komikê digere, piştre dikeve ber bê û wenda dibe.

Şev nîvê şevê ye, naxwazim rakevim, ger bixwazim jî nikarim. Gava zarokên xwas ji ber xezeba Saddam xwe li çol û banîyan dixin, gava pîrekên Kurd li ser erdê şil, di nav cil û paçan da grewa birçîbûnê dom dikin, kîjan Kurd dikare bi rehetî û bê xem rakeve.

Saet di 01'ê de xwe digihînim ber konsolosxana Amerîkayê. Xort û pîrekên delal û dilşewitî xwe li erdê dirêj kirine. Ger yekcarna, xwe nelivînin, meriv dibêje qey ew mirî ne. Ji ber bataniyan û kumên li serên wan, meriv nizane kî kî ye. Xwenga min jî di nav wan de ye, lê belê, nizanim kîjan e. Ronahiya li der û dora wan car car dide ruyê wan. Hevalekî li wir, dibêje xwenga te va ye li wir e. Bi tiliya xwe nîşan dide. Silavê li xwenga xwe û çend pîrekên din dikim. Dibêjin; "Ji me ra tiştekî ne lazim e. Em naqefilin."

Çend çilkên baranê dikevin. Baran bibare, halê wan xirab e. Ji ber ku çadira wan tune. Polîsên ku ji bo grewa birçîbûnê destûr dane wan, destûra çadirvekirinê nedane. Divê grewa birçîbûne, di bin ba û baranê de bidomînin.

Ji wan xatir dixwazim û ji wir bi rê dikevim. Ji ber qamyonekê derbas dibim, du hevalên Kurd di nav qamyonê de bi termosên çay û qahwê ve mijûl in. Yên din jî, li ser nigan pîyase dikin.



*1'ê Nîsana 1991'ê, Stockholm*

www.arsivakurd.org

# MÊVANÊ NE MÊVAN

"Alîkariya ku xelke Dîyarbekirê ji me re kir, di dîroka Kurdan de, bê nimûne ye. Me li Dîyarbekirê welatparestîyeke pak û delal dît."

Sal 16 Adar'ê 1988, roja Çarşem, seat 11.00 ye, pîlotên Saddam bombên xwe yê kimyewî ber didin ser Helebçê. Zaro - keç, pîr û ciwan hemû xelkê Helepçê dikevin xewekî kûr. Ev ne wekî xewa her şevî ye. Ev xewa mirinê ye, ku yê dikeve vê xewê carekî din êdî şîyar nabe.

Pistî pênc mehan, paşî agir û dûya Helebçê, êrişek nû li Badînan dest pê dike. Rûpela teqwîmê 25'ê Tebaxê nîşan dide. Çekên kimyewî, bê îman tê bi kar anîn. Di 70 gundan de, bi hezaran mirov tên kuştin, bi hezaran mirov xwe li sinorê Tirkiyê dixin. Gava ev mirov sinorê Tirkiyê derbas dikin, hemû dibin penaber, êdî ew hemû penaber in. Di nav penaberan de, peşmergeyek jî heye, ku navê wî Ekrem Mayî ye. Ew dibe endamekî Komîta Penaberan. Lê belê, ji wî rojê heta niha ew ne penaber in, ew mêvan in. Mêvanên dewleta Tirk in. Gelo ma li ba malbatek, an li ba dewletek mêvanbûyin ne baş e? Bixwe, vexwe û rakeve... Ma ji vî çêtir?

"Ne wisa ye! li Tirkiyê problema me, ya herî mezin ev e, ku dewleta Tirk me wekî mêvan qebûl dike. Lê belê, em ne mêvan in, li gor Peymana Cenewrê, em penaber in." dibêje Ekrem Mayî.

Sê odeyên Federasyona Kurd heye, li odeyekî ez û Ekrem Mayî li hember hev rûniştine. Di nav zir-zira têlefûnê da bi wî re hevpeyînek çêdikim. Mirovên ku li wir di nav sê odan de diçin û tên. Ji nişkave xortekî dikeve hundir û dibêje:

"Dr. Mahmûd Osman hat, vê odê vala bikin!"

Ez û Ekrem Mayî odê terk dikin. Dr. Mahmûd Osman, wê bi ser navê eniya Kurdîstanê di konferansa Stockholmê de beşdar bibe. Ekrem Mayî jî, wê penaberên Kurd ên li Tirkîyê di konferansê de temsîl bike. Hevpeyîna min û Ekrem Mayî li oda din, di nav dûya cixaran de dom dike.

Ekrem Mayî, di sala 1955'an de, li gundê Mayê li Amadiyê tê dinê. Li Bexdayê lîse, li Basrayê fakulta zîretî dixwîne. Li Dihokê, qasî salekî û nîv wekî muhendîsê zîretê kar dike. Ji ber zilm û tade ya dewleta Iraqê, ew, dev ji muhendîsiyê ber dide û dibe pêşmerge.




*Ekrem Mayî di salvegera Helepçê de li Stockholmê di mîtînga 16 Adara 1991'ê de diaxive.*

Di sala 1988'an de, Ekrem Mayî wekî hemwelatîyên xwe yên din dibe penaber. Gava Kurdên Iraqê sinorê Tirkiyê derbas dikin. Dewlet ji bo wan, li Gewerê (Yuksekovayê) du kampên muwaqet ava dike. 35 hezar kes li vir bi cîh dibin. Piştî 2 mehan van kampan belav dikin. Hinek penaber diçin Îranê, yên ku dimînin jî, derbasî kampên nû dibin. 16 Hezar kes derbasî kampa Mêrdînê, 8 hezar û 500 kes derbasî kampa Mûşê û 13 hezar kes jî derbasî kampa Dîyarbekirê dibin.

Ekrem Mayî diçe Diyarbekirê û dibe endamê komîta penaberên kampa Dîyarbekirê. Ekrem Mayî dibêje:

"Ev du sal û nîv in, ku em li wê derê ne. Dewleta Tirk, sifatekî resmî nedaye me. Li ba hukmetê sifata me 'mêvan' e. Heq û hûqûkê mêvantîyê tune ye. Gava mirov mêvan tê qebûl kirin, nikare alîkarî tu ji derekî bigre, Ne Xaça sor û ne jî Yekîtiya Neteweyan nikare ji me re alîkarî bike. Ji ber ku em mêvan in. Heq

www.arsivakurdi.org

û hûqûkên ku Peymana Cenewrê ku ji bo penaberan nas kiriye, ji bo me derbas nabe.

Mafên me tune, ku em bixwînin, an zarokên xwe bidin xwendin. Em nikarin ne li nav Tirkiyê û ne jî li derveyî Tirkiyê bigerin, ev qedexe ye. Em nikarin kar û barekî resmî bikin, an li cîyek wekî karkerek, an jî karmendekî (memûrekî) kar bikin."

Ekrem Mayî, ji bo mêvandarîya du sal û nîvan, heta qirikê tijî bûye. Serên xwe li her kevirî xistiye, lê belê, tu encamekî (netîcekî) negirtiye. Car bi car parlementerên Kurd tên zîyareta wan. Rojnemevanên Kurd û Tirk bi wan re hevpeyvînan çê dikin. Serê her galgalî, mêvandarîya wan e. Mixabin, ku hukma parlementeran û hevpeyvînên rojnamevanan, nikare mêvanan bike penaber.

Ta berê vî du sal û nîvan Kurdên Iraqê û serokên wan li ba dewleta Tirkiyê wekî dijperest û dijmin dihatin qebûl kirin. Lê, îro dewleta Tirk ev dijperestan li Çanqayê qebûl dike û bi wan re dipeyive. Lê, penaberên ji Iraqê hatine, hîn û hîn mêvanin.

Qasî 26 hezar kesan, di her sê kampan de, di nav tunebûn, derd û kulan de mîna mêvanan dijîn, nexweş dibin û dimirin. Niha li kampa Dîyarbekirê qasî 10.750 penaber dijîn, nîvê wan zarok in. Bi kurtayî rewşa wan ne baş e, rewşa zarokan qet ne baş e. Heta niha qasî 200 zarok li kampê mirine, di her sê kampan de qasî 500-600 zarok mirine. Nîvê zarokan ji sorikê dimirin.

Sorik ne ew nexweşî ye, ku mirov pê bimire. Dermanê vê nexweşiyê erzan û hêsan e, yanî bi derziyekî 55 kronî mirov ji nexweşiya sorikê xelas dibe. Dema zarok bikevin nexweşiya sorikê, ku mirov di wexta wî de derzîya sorikê li wan bixe, xwarin û vexwarina baş bide wan, li kinc û pakijîya wan diqet bike, dê hewqas zarok nemirin.

Lê, feqîrên penaber çend dixwazin jî, ev îmkanên wan tune ne. Û dewlet jî wan îmkanan nade wan. Ekrem Mayî dibêje:

"Ev çend meh in, ku ji derveyi welêt, ji me re kinc hatîye şandin, lê em nikarin ku kincên hatine ji gumrigê bigrin. Yên ku dixwaze ji me re alikariyê bikin, bila bê peran tu tiştek neşînin. Ji ber ku tiştên din nakevin destên me."



Foto: Gunilla Granström

Li gor Ekrem Mayî, kampa Dîyarbekirê ji kampên Mêrdîn û Muşê baştir e. Di nexweşxana kampa Dîyarbekirê de, 6 doxtor û 12 hemşîre kar dikin. Ji bilî vê jî, hin penaber diçin ba doxtorên privat, doxtor wan bê pere kontrol dikin û derman didin wan.

Ji bo ku penaber xwedî kar bin, esnafên Dîyarbekirê bêyî ku ji wan perên pêşin bigrin, mal didin wan. Penaberên ku mal digrin li cadeyên Dîyarbekirê malên xwe difroşin û bi pişt re jî, perên esnafan bi şûn de didin. Dema havîn dibe, hin penaber diçin gundan û li wir kar û bar dikin. Gava ku ji mutehîtin Dîyarbekirê re karker lazim dibe, ew tu ferqîyetekî naxin navbera penaber û rûniştivanên Dîyarbekirê. Bi dilxweşî ji penabera re kar didin. Herwiha, gava Ekrem Mayî ji xelkên Dîyarbekirê û ji alîkarîyan wan bahs dike, hundirê çavên wî dikene. Kenekî pak û delal li ser rûyê wî belav dibe:

"Alîkarîya ku xelke Dîyarbekirê ji me re kir, di dîroka Kurda de, bê nimûne ye. Me li Dîyarbekirê welatparestîyeke pak û delal dît."

"Li kampa Mardînê min bi çavên xwe dît, ku ka polîs çawan penaberan ço dikirin û ji wan re çêra dikirin. Li Dîyarbekirê tiştên wisa nabe. Heta niha polîsan destên tû penaberekî ne girtine û ne gotine, ku 'em dikin te bişînin Iraqê.' "

Iraq, ji ber du sedeman dixwaze penaber vegerin Iraqê. Yek ew e, ku penaber dibin sedema propoganda dijî Iraqê, ya dudyan penaber ne di bin kontrola Iraqê de ne. Yanê Iraq naxwaze ku kampên penaberan ji peşmergaran re bibe kaniya mirovan.

Di 1989'an, meha Hazîranê de, li kampa Mêrdînê, qasî 2000 hezar kes jardadayî bû. Ji wan 600 kes mêr, 734 jin û yên din jî zarok bûn.

Li kampa Dîyarbekirê, di 1990, meha Sibatê de, 1000 kes jardadayî bûn. Piranîya wan jin û zarok bûn. Penaberên Mêrdînê, nanên xwe ji 4-5 firûnên privat distînin. Li Dîyarbekirê jî, ji firûna beledîyê nan distînin. Tilîya kî di nav vê jardadayînê de bû, derneket meydanê. Ekrem Mayî dibêje:

"Mebesta vê jardadayînê kuştina me ne bû. Yên ku jar xistin nav nanên me, dixwestin me bitirsînin, ku em vegerin Iraqê. "

Piştî hevpeyvîna me xelas dibe, Ekrem Mayî ji Iranê re telefon vedike. Dengê wî tê me. Piştî axeftinê telefonê datîne, li me vedigere, carek din kenek delal li ser rûyê wî belav dibe.

-An îro, an sibê Kerkûk jî azad dibe!..

***Xorto***

*14 Adar 1991*

www.arsivakurdi.org

*Semîner*

# "QANÛNA LI DIJ TERORÎZMÊ"

*Hukimeta Tirk, di roja 12'ê Nîsa na 1991'ê de, bi navê "Qanûna li dij terorîzmê" qanûneke derxist. Lê, mixab in, di nav gel de, ji vê Qanûna li dij terorîzmê" re, qanûna Efûyê jî tê gotin. Ji ber ronahikirina vê qanûnê, Komîta semîneran a Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, ji Komeleya Huqûqnasên Kurd bi Av. Weysî Zeydanlıoğlu û Îbrahîm Güçlü re, di roja 27'ê Nîsanê de semînerek pêk anî. Alî Zerdeşt semînerê îdare kir.Lê, mixabin wek her demî, ji bo vê semînera han jî daxwaz gelek bûn, lê beşdar van kêm bûn. Em ji bo xwendevanên xwe yên ji Kurdistana Bakur mijara semînerê girîng û pêwîst dibînin û ji ber vê yekê jî, em dê bi kurtasî axaftinên semînerê belav bikin.*

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu** weha dest bi axaftina xwe kir:

- Navê vê qanûnê, bi resmî "Qanûna li dij terorîzmê" ye. Lê, bi zanabûn 4 nav lê hatine kirin.

1- Qanûna li dij terorîzmê; 2- Qanûna tehcîlê; 3- Qanûna infazê; 4- Qanûna efûyê...

Ji ber ku ji cezan beşek tên tehcîl kirin, hinek dikevin ber efûyê, hinek înfaz dibin û li ser navê "terorîzmê" ji hinekan re jî cezayên giran tîne.

Gelo çima ev qanûn weha tevlîhev e? Mirov dema bixwaze ji aliyê huqûqî ve qanûneke pîs derbixe, elbet dê qanûneke weha derkeve navê. Hakim jî , ji vê qanûnê tiştek fam nakin. Ji ber ku dema qanûnê amade bikin, xwestine faşîst û paşverûyan efû bikin, Kurd û hinek şoreşgerên Tirk jî ceza bikin. Di qanûna bingehiya Tirkiyê de maddeyek heye, ku parlemento nikare ji bo kesên sîyasî efû derbixe. Ev Qanûna li dij terorîzmê, di dema adamdekirinê de gelek caran hat guhartin. Hem di komisyonê de, hem jî, di parlementoyê de hat guhartin. Di dawî de, ev qanûn bû wek lastîk; kî bixwaze û bi hêz be, dê bi aliyê xwe bikşîne.

**Av. İbrahîn Güçlü:** Ev qanûn bi mentiqeke weha hatiye çêkirin ku mirov nikare ji nav derbike. Naveroka Qanûna li dij terorîzmê çi ye? Ji xala yekê heta 22-an çi dibêjin? Divê kesên huqûqnas, vê qanûnê û yên dewletên Ewropî ku di derheqê terorîzmê de hene, wan bidin ba hevdu û muqayesa wan bikin. Tirkan, vê qanûna di şertekî gelek taybetî de derxistin. Tirk ji 200 salî ve û bi taybetî ji dema avakirina Komara Tirkiyê ve heta niha dixwazin bibin Ewropî. Lê, rastiyekî din jî heye û li dij vê daxwaz û hewldanê ku ew jî karekter û edetên Tirkan in, ku nikarin bibin Ewropî. Ji salan ve ye, ku li Tirkiye sîstema pirpartî û parlementerî, parastina mafên mirovan û hwd.. qebûl dikin. Lê dîsan, ew nikarin van prensîban li Tirkiyê bi cîh bikin.


Li Tirkiyê, tecrûba 12 Îlonê heye. Piştî demekî Ewropiyan ji nîzama 12 'ê Îlonê re gotin; "na." Êdî Turgut Özal bû evîndarê Ewropiyan. Ji bo Civata Bazara Ewropê hewlda. Li pêş Tirkiyê demokrasî, mafên mirovî û serbestbûna partiya komunîst bûn dîwar û ketin nav Tirkiyê û Ewropiyan. Li Tirkiyê krîza aborî çêbû. Tirkiyê dest bi derxistina qerarname û qanûnên nû kir. Ji Ewropiyan re dibêjin; " va ye me demokrasiyê anî. Va ye me partiya Komunîst serbest kir û qanûnên 141, 142 û 1 63-an ji navê rakir. Demokrasî hat." Niha Ewropî jî dibêjin:

"Demokrasî hatiye Tirkiyê. Girtî hatine berdan. Kesên polîtîk bi awayekî azad dikarin vegerin welêt..."

Lê, bi rastî, di vê Qanûna li dij terorîzmê de, weha madde hene, ku ji yên 141, 142 û 163-an gelek xirabtir û girantir ceza tînin.

Niha li Tirkiyê sergêjiyek heye Serokkomar tişekî û serokwezîr jî tiştekî din dibêje...

Muxalefet ji xwe bi salan e, ku efûyeke dixwest. Lê, T. Özal digot; "em li dij efûyê ne." Û paşê wî got; "em efû dernayînin, lê em qanûna tehcîlê dertînin." Li vir ferqek heye; ew kesên ku niha ji girtîxanan tên berdan, paşê heger dîsan sûcekî bikin, yê nû jî dikin ser yê kevin û dê bi salan wan bavêjin girtîxanan. Bi navê terorê, dixwazin kevneperestû û antîdemokratiya xwe veşêrin û Ewropiyan



bixapînin. Ji ber ku qanûnên Ewropiyan jî, li dij terorê hene. Her kes terorê mehkûm dike. Lê, dema ji bo berjewendiyên wan be, ew bi xwe dest bi terorê dikin. Bi vê qanûnê terorîzma dewletê hatiye organîze kirin. Ka em binhêrin di vê qanûnê de terorê çawan tarîf dikin:

.."Çi bi nivîs û çi bi devkî, tehdît, tirsandin, cebîr, şîddet,welat parvekirin..." hemû dibin wesîteyên terorê. Li gor vê tarîfa han çakûçek, kêrek, derzîyek, nameyek, belavokek, kovarek... dikare bibe wesîteyê terorîzmê. Kî dikare ceza bide? Polîs, leşker, sawcî, hakim...

Li gor vê qanûnê, partiyek rabe bêje; "ez dixwazim di riya demokrasiyê de, vê sazûmanê biguhêrim," ev sûc e û ew partî jî, dibe partiyeke terorîst. Niha li hinek herêman hakim dibêjin, "li gor vê qanûnê, ew Kurdên ku bi 141, 142 û 163-an hatine cezakirin nahêne berdan."

Herweha li gor xala sisêyan a vê qanûnê malbat û komele jî dikevin nav rêxistinên terorîst. Ne bi tenê berpirsiyarên wan, herweha endamên wan jî dibin terorîst. Mesela li çiya şivanekî bigrin, dikarin bêjin armanca wî û van rêxistinan yek e, an jî nêzî armanca van rêxistinên terorîst e û ji ber vê yekê jî, ew dibe terorîst. Li gor xala 3 ya qanûna cezayê maddeya 131'ê dikarin kesekî bigrin û bêjin; "ev li ser navê dewletekî casûsî dike.". Bi kurtasî, li gor vê qanûna nû hemû Kurd terorîst in.

Sûcê 141'ê dikarin bixin ya 146-an. Ji ber ku tarîfa wan herdu xalan yek in. Ji aliyekî de, bi vê qanûna nû re, qanûna 2932-an ku axaftina zimanê kurdî qedexe dikir jî, ji navê rabû. Lê, dîsan li gor xala 8-an a vê qanûna nû, di mîtîng, an di cîhê resmî de, bi kurdî

www.arsivakurd.org

axaftin, an bi kurdî pankart nivîsandin ji 2 salan heta 5 salan ceza heye. Mesela sendîqeyek salona xwe ji bo civînek, an kongreyek bide komeleyek û paşê dewlet wê komelê terorîst elan bike, divê ew sendîqe jî, ji ber dayîna salona xwe bêt girtin.

Di warê çapemeniyê de jî, ev qanûn ji berê gelek xirabtir e. Mesela heger rojnameyek belavoka rêxistinek an komeleyeke belav bike û paşê dewlet jî wê rêxistinê an komelê terorîst qebûl bike, wê çaxê rojname jî dikeve statûya terorîstiyê. Polîs an leşker bavêjin ser komeleyek an gundek û li wan tade û zilm bikin, rojname jî navê wan zilmkaran binivîse, cezayên giran ji bo rojnamê û rojnamevanan heye.

Dîsan li gor xala 15-an a vê Qanûna li dij terorîzmê, kesên êşkencekar nayên mahkeme kirin. Kesên muxbîr tên xelat kirin. Dewlet, dema pêwîstî bibîne, divê fîzyonomî û kîmlika muxbîran biguhêre. Ji wan re kar bibîne an wan bişêne derê welêt.

Berî vê qanûnê heger daxwaz hebûya, gelek avûqat dikaribûn bikevin mehkemeya kesek, an rêxistinek. Niha bi vê qanûnê, ji 3 avûqatan zêdetir ne mumkun e, ku bikaribin bikevin mehkemê. Dîsan Berî girtî bi serê xwe û awayekî azad dikaribû bi avûqatê xwe re bipeyîve. Lê, Niha nikare bi serê xwe û awayekî azad bi avûqatê xwe re bipeyîve. Pêwîst e, ku dema girtî bi avûqatê xwe re bipeyîve, li ba wan berpirsiyarekî dewletê jî hebe.

**Av. Weysî Zeydanlıoğlu:** Qanûn bi xwe tevlihev e. Beşa 5-an demdemî (muwaqat) ye. Xala 23-an ji bo ew qanûnên ku ji navê hatine rakirin e. Bi vê qanûna nû re, ev xal hatin rakirin:

140,141,142 û 163. Ev herseyên pêşîn ji qanûnên İtalî yên faşîst hatibûn girtin. Lê, niha ev hersê madde ji navê rabûn. Ew kesên ku bi van xalan hatibûn cezakirin dikevin ber efûyê. Di nav van xalan de, ew kesên ku ji hemwelatiya Tirkiyê jî hatibûn avêtin jî hebûn. Herweha ew jî dikevin ber efûyê.

141 û 142 berê ji bo Kurdan bikar daniyan. 141 ji bo rêxistinî û 142 jî propogandayê bû. 163 jî, ji bo kesên dîndar, şerîatvanan bû. 2932 jî qedexekirina axaftina kurdî bû. Ew jî niha ji navê rabû.

Mirov dikare mesela tehcîlê bike 2 beş. Heta 8'ê nîsanê cezayê îdamê ku dane û 10 sal jê razane, ew kes derdikevin der. Yên muhebetê heger 8 sal cezayê xwe razabin ,ew jî derdikevin an jî herin dê bên berdan. Yên ku 10 sal ceza xwarine divê 1/5 razin û paşê derdikevin. Ji ber van maddeyan gelek girtî ji girtîxanan derketin. Û navê efûyê jî, ji vir tê.

Heger ev girtiyên berdayî dîsan sûcek bikin, divê, ew hem dê zecayê xwe yê kevin û hem jî, yê nû li ser hevdu bikşînin.

Ew keşên ku cezayê xwe nekişandine dîsan eynî sîstem ji bo wan jî dom dike û dê bê bikaranîn. Ango hakim dê li gor van hersê xalan 10, 8 û 1/5 sal tetbîk bikin.



## Maddeyên îstîsna

Di Qanûna li dij terorîzmê de, madeyên îstîsna hene. Ew kesên ku memûr, polîs û leşkeran kuştine û li gor maddeya 125-an li dij dewletê serîhildane û li dij dewletê çek hildane û cezayên wan îdam in, ew li derê vê qanûnê mane. Tatbîqata îstîsnayî jî, divê ew 20 sal razin û paşê dikarin ji vê qanûnê îstîfade bikin.

Ev qanûn dîyar e, ku bi teref hatiye derxistin. Bûyera bajarê Meraşê mînakeke berbiçav e. Divê bûyerê de faşîst bi maddeya 450'î û çep jî bi maddeya 146-an hatin mehkeme kirin û ceza xwarin. Niha bi vê qanûnê re faşîst hemû hatin berdan û çep jî, di hundir de man. Divê çep 10 salên din jî, di girtixanê de cezayên xwe bikşînin.

Di maddeya 5-an de hukmek danîne. Yên ku ji hemwelatiyê hatine avêtin û ew li der in, heger ew vegerin dê heta 2 salan di sînoran de, ji wan re problem dernexînin. Lê, ev jî ne zelal e, ku ev 2 sal ji bo sînor e, an ji bo wextê ye.

Ji bo yên negirtî ango ji bo yên firar, berê gotin; "divê ew di nav 2 mehan de vegerin û teslîm bibin." Lê paşê guhartin. Ji bo van kesan wext tune. Mirov dikare di nav 5 salan de jî here.

Ew kesên ku dixwazin vegerin û cezayên wan dîyar bûne, divê bizanibin bi kîjan madeyan ceza xwarine. Ew madde dikevin ber efûyê an na. Pêwîst e, her kes bizanibe bi kîjan made ceza xwariye, an bi kîjan maddeyî ji wî/wê re ceza dihat xwestin. Baştirîn li welêt bi wesîta avûqatekî li dosya xwe binhêrin. Dîsa divê her kes baş fêr bibe, ku mehkema wî/ wê li kû ye. Dosya li kû ye, di kîjan mehkeme de ye. Di dema rewşa awerte (orfî îdare) de daweyên hinek kesan li çend bajaran hebû. Niha rewşa awerte rabûye. Divê dosya li cîheyekî li mahkemeyên sivîl, edlî be..

Di van salên dawî de piraniya Kurdan bi madeyên 168 û 171'ê ceza dikirin an dixwestin. Cezayê 168'î 8 sal û yê 171'ê jî 8-15 sal in. Yên ku qasî 2 salan razane, dikarin herin teslîm bibin û ew dê bên berdan. Û yên ku 10 sal ceza girtine û hîç ranezane, divê 5 sal razin û paşê derkevin.

Rewşa yên ku hîç nehatine girtin , dosyayên wan venebûne, îfade li ser hene, lê sawcî tahqîqat venekiriye, divê ji aliyê avûqatekî ve baş fêr bibin.. Sawcî dikare ji nû ve dawe veke.

Ew kesên ku berî 12 Îlonê daweyên wan hebûne û ceza nedane, di ser de, bi kêmasî 10 sal derbas bûye, daweyên weha dikevin ber wextê (mururî zeman) û êdî dawe bi xwe tê girtin. Kes nikare ceza bide.

**Av. İbrahim Güçlü:** Li hundirê welat bi têra xwe ev qanûn tê teşhîr kirin. Lê, divê li derê welêt jî huqûqnasên Kurd di qada navnetewî de vê qanûna baş teşhîr bikin. Divê huqûqnasên Kurd vê qanûnê wergêrînin zimanê Ewropiyan û belav bikin. Bi huqûqnasên Ewropî, sazgehên huqûqî û mirovî re têkilî dênin û durûtiya demokrasiya Tirkiyê bidin dîyar kirin.

Bi pirs û bersivan dawiya semînerê hat.

*Amadekar: M. Xarpêtî*

www.arsivakurd.org

*Gaveke pêşketî û pozîtîv:*

# KONFERANSA STOCKHOLMÊ

*Nivîs: **Amed Tîgrîs***
*Foto: **Serko Amîn***



**" Ev stemkariya ku îro li ser Kurdan heye, di bingehê xwe de, li ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji bêyî pirsa Kurdan li Rojhilata Navîn aştî ne mumkun e."**

Serokê Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê berêz, CH. Hermansson bi van gotinên jorîn konferansa Stockholmê vedikir.

Komîta Parastina Mafên Kurdan li Swêdê, di 15-17 'ê meha Adarê ya 1991'ê de, li bajarê Stockholmê bi 200 nûnerî ve Konferansa Parastina Mafên Kurd pêk anî.

Ji her çar perçeyên Kurdistanê, Yekîtiya Sovyetê, Avustralyayê heta Ewropê û Amerîkayê nûnerên partî, rêxistinên demokratîk û şexsîyetên Kurd yên serbixwe beşdarê Konferansê bûn. Ji derê Kurdan gelek prof., polîtîkvan, zanyar û rewşenbîrên demokrat û dostên Kurdan di Konferansa Stockholmê de beşdar bûn. Dîtinên xwe anîn zimên, pêşnîyarî anîn, alîkari û piştgiriya xwe dan dîyar kirin.

Konferans ji çapemeniya Kurdan û ya cîhanê re vekirî bû. Ji 50 kesî bêtir rojnamevan û nûçehîgan temaşe û guhdariya konferansê kirin û li tevahiya cîhanê nûçeyên konferansê belav kirin.

Serokê Komîta Mafê Kurdan yê Mirovî li Swêdê C H Hermansson, di axatina xwe ya vekirina Konferansê de, behsa rewşa Kurdistanê û Kurdan a îroyîn kir. C H. Hermansson:

- Ev stemkariya ku îro li ser Kurdan heye, di bingehê xwe de li ser aştiya cîhanê ye. Divê pirsa Kurdan di nav aştiyê de bêt çareser kirin. Ji derî pirsa Kurdan li Rojhilata Navîn aştî ne mumkun e.

Par, dema me dest bi hewldana amadekirina vê konferansê kir, em nedizanibûn dê rewşa Kurdan weha zû bêt guhartin. Îro têkoşîna Kurdan êdî mêweyên xwe dide. Ez hêvîdar im, ku dê konferans di vî warî de biryarên berbiçav bigre.

Piştî pêkhatina dîwanê, wezîra Macir û Penaberan a Swêdê Maj-Lis Lööw heqê axaftinê girt. Di axaftina Maj-Lis Lööw de baş dîyar bû, ku dewleta Swêdê di polîtîka xwe ya di derheqê Kurdan de tû guhartin çênekiriye. Wê di axaftina xwe de Pirsa Kurd wek pirseke penaberî û mafê mirovî da dîyar kirin.

- Hukimeta me gelek li ser Kurdan radiweste û di vî warî de xebat jî kirîye. Swêd, li herêmê piştgiriya demokrasiyê dike. Em li her derî piştgiriya mafê Kurdan dikin; ew êş û jana ku li ser Kurdan heye, em baş pê dizanin. Hinek Kurd hatin Swêdê. Lê, em nizanin, ku çend Kurd li Swêdê hene. Bi texmînî qasî 10 hezar Kurd îro li Swêdê dijîn...

## "Gelê Kurd serokekî bi hêz dixwaze"

Dîwanê mafê axaftinê da **Prof. David McDowall.** David McDowall, ji Londonê hatibû û li ser perspektîva polîtîa Kurd peyîvî. Wî , rewşa Kurdan a dema Osmanî û ya niha bi mînakên dîrokî û berçav da berhevdu. Bi kurtî weha digot:

- Em di demekî gelek girîng de dijîn. Niha gelê Kurd li Kurdistana Iraqê rabûye ser lingan. Serîhildaye.



Berî çend rojan jî Turgut Özal, bi Kurdan re civînek çêkir. Ev jî dîyar dike, ku Özal dixwaze îdeolojî û polîtîka kemalîst li Tirkiyê bişkîne. ERNK jî li Parîsê daxuyanî da ku Tirkiye bixwaze bi PKKê re têkiliyan dêne, ew amade ne û dikarin çek bidin rawestandin. Ev tiştekî baş e.

Berî şer hinekan digot; " dibe, ku Kurdistaneke serbixwe çêbe." Tirkiye ji vê yekê tirsiya, ku İraq perçe bibe. Tirkiye ji Şîîyan jî ditirse, ku li İraqê ew bêne ser îktîdarê. Ji ber van sedeman Tirkiye hewl dide ku zimanê kurdî serbest bike. Lê, bi tenê zimanê axaftinê. Heger kovar, rojname û pirtûkên kurdî dîsan qedexe bin, ev ne tiştek e. Armanc dîsan xapandina Kurdan e. Ji bo pêşveçûna ziman û kultura kurdî, divê pêwendî di nav hukimet û Kurdan de hebin. Lê, ew Kurdan asîmîle dikin û dikujin.

İraq dibêje " belê Kurd hene," lê ji aliyê din ve, wan dikuje. Wek Bush dibêje; " divê li Rojhilata Navîn aştiyek hebe." lê divê Kurd jî di nav vê program û plana aştiyê de bin. Ji derî Kurdan li Rojhilata navîn aştî û demokrasiyeke rastîn nabe.

Di sedsala 18-an de Osmanî kesên din ji der ve danî Kurdistanê. Ji aliyê din ve, Kurdan di navbera Osmanî û Iranê de dikirin tampon. Abdulhamîd digotin: " Em îslam in." Kurdan bi îslamiyê dixapandin. Mustafa Kemal vê polîtîka Osmanî dewir girt. Wî dît, ku Yewnanî û Areb dixwazin Osmanî hilweşînin, berê xwe da Kurdan û ji wan alîkarî xwest. Gelê Kurd bû qurbana Komara Tirk. Herweha li İranê jî Kurdan kirin qurban. Bûyera Simko sîyaseta İranê dide dîyar kirin. İro ji li İranê rejima îslamî heye û dîsan dixwazin Kurdan ji navê rabikin. Problema Kurdan ne ya îslamî ye, ya netewî

ye.

Wek tê zanîn, İraq ji 3 wîlayetan çêbûbû: Basra, Bexda û Kurdistan. Çi bû, dewleta merkezî çêkirin û di dawî de Saddam Kurdan kuşt û Kurdistanê wêran kir. Kurdan di nav 3 dewletan de kuştin, girtin û rakirin. Ji Ş. Seîd re gotin; " paşverû ye." Giş derew bû. Niha jî dibêjin " İsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîka Kurdan bi kar tînin. İran jî PDK-I bi kar tîne. İro jî, ji bo ava Firad, Suriye PKKê bi kar tîne." Rast e. Ev dewlet hemû ji bo kara xwe dixebitin, kara Kurdan têde tune.

Kurd bi civata navnetewî bawer nakin. Mustafa Kemal wan xapan. İngilîstanê 1920 de got "em dê li İraqê pişta Kurdan bikin." Nekir.

Di dema Osmanî de herêma Kurdistanê ji aliyê aborî û civakî ve bi paş ve hiştin. Giraniya xwe dan ser pêşvebirina rojava, ango herêma Tirkan. İro jî weha ye. Hemû industrî û kompleksên wê li herêma Tirkan e. Bi ser re jî, hemû heyînên Kurdistanê dikşînin hêla xwe. Polîtîka Osmaniyan, ew bûn, ku dubendî dixistin nav eşîrên Kurdan. Wan berdidan hevdu. Osmaniya Alayên Hamîdiyê pêk dianîn. İro jî parazgerên gundan (köykorucusu) pêk anîne.

Gelê Kurd dixwaze serokekî wan yê bi hêz hebe. Hebûna eşîretan ji doza Kurdan re probleman derdixe. Dîn jî probleman derdixe. Kesên dîndar ji xwe re bi kar tînin. Sunî û Şîî bi hevdu bawer nakin. Wan li dij hevdu bi kar tînin.

Dewlemendên Kurd û xwedî ax bi dewletên re ne. Ev ji berê ve weha ye. Mesela, Kamuran İnan bi xwe xwedî ax e û mirovê dewleta Tirk e. Ji % 80 gundiyên Kurd bê ax in. Ew, li hember xwedî ax in. Hukimet pişta xwedî erd dike. Şoreşa PKKê û yên din bi maf e û li hemberê axayan e.

Di bajaran de hestên netewetiyê pêşketî ye. Di dema Osmanî de jî weha bû. Xwendevan û ronakbîrên Kurd li Stanbolê xebat dikirin.

Wî, sedemên cudabûn û têkçûna Kurdan îdeolojiyê didît û weha digot:

# PLATFORMA MORAL Û ŞÊWRÊ

Konferansa Stockholmê bi nûçeyên xweş vebû. Dema li Kurdistana Başûr hêzên pêşmêrge, di Bereyî yekgirtî de, bi gelê Kurd re dibûn yek û gav bi gav axa Kurdistanê ji rejîma Saddamê xwînrêj azad dikir, pêk hat. Ev serfirazî û pêşketin ji Kurdên nûner û kesên amadekarê Konferansê re bû moraleke bilind û xurt. Vê rewşa ha pirsa Kurdan li cîhanê aktuel kir û anî rojevê.

Konferans di vê demê de bû platforma hevdîtina hêz û kesên Kurd. Li ser rewş, polîtîka û statûya Kurdistana Başûr, di nav Kurdan de gotûbêj, şewir, dîtin û daxwaz germ û geş bûn. Konferans ji Kurdan re bû platforma moral û şêwrê. Di bingehê xwe de, konferan ji nav çar dîwarên salonê derkete der.

Di dema civîna Konferansê de, rizgarkirina Kurdistana Başûr li seran serê cîhanê olan da û di çapemeniya cîhanê de rêza yekemîn girt. Ji ber vê yekê Konferans di bin sîya wan bûyerên ku li Kurdistana Başûr dibûn, de ma. Ma ji xwe armanca Konferansê jî, ev bû ku pirsa Kurd di raya giştî û çapemeniya cîhanê de aktuel bibe û bikeve rojevê. Dîsan ji ber van bûyerên Kurdistanê, gelek kesên polîtîkvan û ronakbîrên Kurd nikaribûn beşdarê Konferansê bibin. Herweha ji aliyê beşdarbûniyê ve jî sewiya Konferansê nizm bû. Dîsan mirov di vê mijarê de didît, ku pîvan û prensîbên komîtê, di derheqê hilbijartina nûneran de, kêmasî û çewtiyan derdixistin navê. Ev prensîb di roja dawî de, hîn jî sist bû.

Di Konferanseke weha de, li ser navê gelek rexistinên Kurdan cuda cuda axaftin, carek din belavbûna Kurdan da dîyar kirin. Û ji ber vê yekê jî, eynî tişt dihatin tekrar kirin.

Di Konferansê de, bêdengiya Kurdên Rojhilat bala mirov dikişand.

Di Konferansa Stockholmê de, bi daxwaz û însîyatîva hêzên Kurdistana Bakur û hinek nûneran, çarçova daxwaz û pêşnîyariyên Konferansa Stockholmê, ji yên berî firehtir û pêşketî bû. Konferans ji çarçova mafê mirovî û kulturî derket. Di nav xalên (nuqtên) deklarasyonê de mafê çarenûsî cîhê xwe girt. Ev yek, ji bo rojên pêş, di platformê weha de, divê bêt parastin û daxwaza dewleteke Kurd bêt kirin.

Divê em ji bîr nekin, ku her platformeke navnetewî, ji bo standina mafê neteweyê Kurd, geveke pêşketî ye. Em Kurd divê gavan bavêjin...

**Amed Tîgrîs**

## "İdeolojîyê şer xist nav Kurdan"

- Problema îdeolojiyê ji bo Kurdan gelek xirab bû. İdelojiyê, şer xist nav hêzên Kurdan. Divê mirov bikaribe rexne li hevdu bigre, lê, bi awayekî demokratîk. Ne ku hevdu bikuje, an bi hevdu re kar neke. Kurdan di sala 1918-an de, li ser serxwebûn û otonomiyê bi hevdu nekirin. Bi hevdu ketin. Hinek li dij M. Kemal û hinek jî li gel wî cîh girtin. Ew rewş û dîtin îro jî berdewam e. Gelo dê bikaribin dewleteke serbixwe çêbikin? Ji ber ku



pêwendiyên wan bi Sûnî, Şîî û Cuhîyan ve heye. Kurdên Îraqê mumkun e, ku otonomiyê bi dest bixin. Problem ew e, ku dema dewleta Îraqê dîsa bi hêz bibe, dê otonomiyê ji navê rabike. Bi baweriya min, dê li Tirkiyê mesela Kurd li pêş bikeve. Îro gelê Kurd layîqê pişgiriya navnetewî ye.

Ez nikarim ji gelê Kurd re polîtîka û stratejiyek pêşkeş bikim. Ew bi xwe biryara xwe dide. Lê, ez dikarim ji Amerîka û dewletên din re bêjim, "pirsa Kurd di nav pirsên Rojhilata Navîn de bigrin destê xwe." Heger welatên Rojava, aştiyeke nû dixwazin, pêwîst e, pirsa Kurd jî bigrin rojevê. Bila nebêjin " dê Tirkiye sil (tûre) bibe, an biqehre."

## "Azadiya Kurdan bi pêşketina edebîyata kurdî ve girêdayî ye"

Profesor Joyce Blau, (Paris) li ser perspektîva kultura kurdî axaft. J. Blau, di axaftina xwe de, got ku Kurd ji berî ve li ser axa xwe ne. Kurd ji dema Medan ve heta niha li ser axa xwe jîyane. Med bapîrên wan in. Kurdan heta niha gelek mîrîtî û dewletên herêmî damezrandine. Mesela



serokê dewleta Eyûbiyan ji Şeddadiyan bû. Şaddadî Kurd bûn.

- Di sedsala 17-an de di medreseyên kurdî de muzîk, edebîyat, stran û kultura kurdî gelek pêşketibû. Ahmedê Xanî bi eserên xwe yên hêja hestên kurdayetiyê bi hêz kir. Ziman û kultura kurdî gelek kevin û dewlemend e.

Di sedsala 7-an de Areb û di sedsala 11-an de Tirk hatin herêma Kurdistanê û êrîş anîn ser Kurdan.

1924-an de M. Kemal kurdî qedexe kir. Tirkî kire zimanê resmî. Şovenîzma Tirk bû polîtîka dewletê. Navê Kurd û Kurdistanê qedexe bû. Navê Kurdistanê bû "Rojhilat."

Profesor J. Blau, li ser alfabe û zaravayên kurdî rawesta. Li Kurdistana Başûr û Sovyetê behsa pêşveçûna edebîyata kurdî kir. Di van çend salên dawî de, li Ewropa çawan ziman û edebîyata Kurdî gulveda. J. Blau, azadiya Kurdan bi pêşketina ziman û edebîyata kurdî ve girêda.

## "Kurd bi serkevin, dê xencerên xwe bikşînin!"

Profesor Johan Galtung (Stockholm) li ser rewşa Kurdan û krîza Xalîcê axaft. Johan Galtung, bi kurtasî digot ku:

- Problem ne ya Kurda e; ya dewletên ku Kurdan din nav xwe de parkirine û yên ku ji wan re alîkariyê dikin e.

Divê li Rojhilata Navîn hemû Areb Îsraîl qebûl bikin. Îsraîl jî Filîstîniyan qebûl bikin. Pirsa petrol û avê bêt hel kirin. Av girîng e. Bi qasî petrolê girîng e. Li Rojhilata Navîn aştiyeke fereh bêt pêk anîn. Bazareke hevbeş çêbibe. Îsraîl jî di nav de be.

Kurd di nav 5 împaratoriyan de hatine parvekirin. Sucê me Ewropayîyan jî divê yekê de heye. Bi taybetî Îngilîstan. Îro Kurd ne bi tenê bê dewlet in, hinek gelên din jî hene. Wek li Swêdê Samer, Filîstin, li Amerîka sorik (îndîaner) ûwh... Îro Kurd bibin xwedî dewlet, sibê yên din dibin. Ji ber vê yekê, çima Kurd bibin dewlet? Kurd hemû dewletan nas dikin, lê ew Kurdan nas nakin!

Dibêjin Kurd şervan in. Lê metodên din jî hene. Belkî Kurd li Gandiyekî bigerin. Belkî jî Gandiyekî rabe... Ewropayî li ser petrolê radiwestin. îhtîyaciya cîhanê bi petrolê heye. Divê xêra petrolê li Kurdan jî bêt parkirin. Sê tiştên girîng hene. Petrol, av û



dewlet. Divê mirov wan bi parve bike. Di herşêyan de heqê Kurdan jî heye. Divê di konferansa Rojhilata Navîn de, li ser van parvekirina hersê tiştan rawestin. Niha hinek dibêjin "heger Kurd bi serkevin, dê xencerên xwe bikşînin. Heyfa (tola) xwe bigrin." Raste heyf girtin heye, lê ku mirov eynî metodî bi kar bîne.

Ewropayî dema neteweyên bê dewlet dibînin û dibêjin " ev sîstemeke klasîk e." Wek yê ku pereyê wî hebe û bêje "pere ne tişt e." Kurd dixwazin dewleteke çêbikin, ku ev aparat di destê Ewropayiyan de bi xwe heye. Lê, Ewropî dixwazin dewletên super çêbikin.

## Divê Swêd alîkariya însanî bike!

**H. Zebarî** ( Bereyê Kurdistana Îraqê): Nûnerê bereyê (cepheyê) Kurdisatana Îraqê Hoşyar Zebarî, di derheqê kirinên Saddam de, bi hejmar mînakan da û di derheqê rewşa Kurdistanê ya nû û çalakiyên pêşmerge de, bi kurtasî van agahdariyan da Konferansê:

- Niha li Kurdistana Îraqê û Îraqê serhildana gel heye. Kurd, Areb, Asûrî û Tirk bi hevdu re, li dij rejîma Saddam têdikoşin. Piraniya axa Kurdistanê hatiye rizgar kirin. Ji Xaniqîn heta Silêmaniyê, Zaxo û Dihokê ketine destê pêşmêrgeyên Bereyê Kurdistanê. Kurd di nav muxelefeta Îraqê de hêzeke girîng in. Em dixwazin demokrasî bêt Îraqê û ji bo Kurdan jî otononiya rasteqîn pêk bê. Çareserkirna meselê helkirina pirsa netewî ye. Heta mesele Kurd li Îraqê

hel nebe, aştî nayê Iraq û herêmê. Em wek Bere dixwazin civata navnetewî bi awakî aştî meseleyê bigre destê xwe û hel bike. Bere, ji Swêdê daxwaz dike ku ew piştgiriya însanî ji bo Kurdistana Iraqê bike. Saddam û rejîma xwe dikarin hemû gelên Iraqê bikujin.

## "Programa TEVGERê ya dûr û nêz heye"

Li ser navê TEVGERê S. Dîcle axaft. Nûnerê TEVGERê, ji dîrok û cografiya Kurdistana Bakur destpêkir û behsa dema Osmanî û Kurdan kir. Di dema Osmanî de polîtîka şovenîst a ku Kurdan kuşt, talan kir, koçbar, asîmîle, ziman û edebiyata wan çawan qedexe dikir. Mustafa Kemal vê polîtîka Osmanî dewr girt û hîn tûjtir û barbartir li ser Kurdan bikar anî. Wî, behsa di wexteke hewaqas zor de, dîsan di navbera 1970 û 1980' î de hestên kurdayetiyê çawan pêşket û hêzên Kurd çawan xwe bi organîze kiribû, kir. Bi taybetî piştî 1980'î dewleta Tirk bi awakî vekirî çawan Kurdistanê dagîr û talan kir. Nûnerê TEVGERê, di axaftina xwe de:

- Ji ber vê rastiyê TEVGER armancên dûr û dirêj ên miletê Kurd û yên acîl ên dema nêzîk tevî hev nake. Di armancên dûr û dirêj de, li pêş me serxwebûn heye. Lê, di yên nêz de bi kurtasî em dikarin weha bêjin: Divê hebûna miletê Kurd bê qebûl kirin. Qanûnên fevqalade û Walîtiya herêmê bê rakirin. Ordî ji Kurdistanê vekişe. gundên valakirî û şewtandî bên avakirin. Efûya giştî derkeve. Divê pirsa Kurd di konferansa navnetewî ya Rojhilata Navîn de cîh bigre. Kurd jî wek terefekî di konferansê de beşdar bibin.

## "Divê bûyera Qasimlo bê zelalkirin."

Li ser navê PDK-Iranê K. Dawidî axaft. Dawidî, di axaftina xwe de, behsa kirinên zilm û zordestiya rejîma Islamî ku di nav 12 salan de çawan li ser gelê Kurd kirîye anî zimên û di van 12 de salan de, çawan têkoşîn û berxwedanan dane. Di nav 12 salan de rejîma Islamî 50.000 Kurd kuştine. Wî, li Rojhilata Navîn Konferanseke navnetewî pêşnîyar kir û got ku:

- Daxwazeke me yê din jî, ji Konferansa Stockholmê heye. Ew jî, Konferans ji bo kuştina Qasimlo rejîma



*CH. Hermansson, Mahmud Osman û Thomas Hammarberg*

Islamî protesto bike û ji bo dîtina qatilê wî, daxwaza zelalkirina bûyera kuştina Qasimlo ji dewleta Avusturyayê bike. Dawidî di axaftina xwe de Piştgiriya serhildana Kurdistana Iraqê kir.

## Mistek ji çanda Kurdî

Komîtê, êvarê programeke kulturî pêşkeşî nûner û mêvanan kir. Helbestvan Şêrko Bêkes çend helbestên xwe bi kurdî xwend û paşê wan wergêrandin îngilîzî. Nûnerê Awistraliyayê nivîskar Şahîn B. Soreklî bi kurdî û îngilîzî du helbest pêşkêş kir.

Koma Dîlan bi lîstikên xwe şevê geş kir. Şivan û Gulîstanê jî, reng dan konferans û şevê.

## "Zordestî sist û çewsandin sivik bûye"

Kemal Ahmed li ser navê Tevgera Nîştîmaniya Neteweyê Kurd li Suriyê axaftinek kir. Nûnerê Kurdên Kurdistana Suriyê Kemal Ahmed, behsa zordestî û stemkariya 1962 û ya ku piştê wê li ser Kurdan hebûn kir. Behsa koçkirina Kurdan û ji deststendina axa Kurdan kir. Lê, li ser rewşa niha jî weha berdewam kir:

- Lê, di van salên dawî de hinekî zordestî hatiye sistkirin û ew çewsandina berê sivik bûye. Wek numûne, girtîyên Kurdên sîyasî di zindanan de nemane. Pencereke demokratî ji miletê me re hatiye vekirin. Cara pêşî di dîroka Suriyê de tê dîtin, ku hinek nûnerên Kurd diçin parlementoya welêt.

Tevgera Kurd xebata xwe ya demokratî - aştî didomîne. Çi li der û çi li hundirê parlementoyê, bi cîhkirina daxwaz û mafên gelê Kurd, wek:

* Naskirina meşrûtîyeta tevgera Kurd
* Ew dezgehên ku li herêma Kurd heye divê rengên xwe yên demokratîk bigrin.
* Gelê Kurd bibe xwediyê mafê xwe yên çandî, sîyasî û civakî
* Hilanîna hin sîyaset û planên ku bîhna şoveniyê ji wan tên.....

## "Divê pirsa Kurd here Koma Netewan"

Prosefor Şakirê Miho li ser navê Kurdên Sovyetê axaftineke Kurt kir. Ji bo Konferansê çend pêşniyarên pratîk pêşkêşî Konferansê kir:

- Ev Konferans sembolîk e. dijberiyên (konflîk) herêmê ne yên dewletên biçûk in, yên dewletên mezin in. Dema di herêm û cîhanê de dijberî hebin aştî çênabe.

Du riyên pirsa Kurd hene: yek bi rengeke aştî. Ya din jî wek Helebçe jenosîd e. pirsa Kurd bi metoda Helebçê nayê hel kirin.

Ev Konferans divê rêçek bihêle. Sê tişt bikevin rê:

1- Divê di Koma Netewan (FN) de wek Filistîyan nûnerê Kurdan hebe.

2- Divê Komîta Swêdê, ji konferanseke netewî re fotomateryalek be. Wek 1963-an pirsa Kurd bibe Koma Neteweyan.

3- Bi argumentan agahdarî bidin dewletên mezin ku pirsa Kurd bigrin rojevê.

## "Divê hevkariyeke rast û durust were pêşkêşkirin."

Nûnerê PKK Maşallah Öztürk, berî ku dest bi axaftina xwe bike, rexne li Komîta amadekar girt, ku çima li ser navê PKKê gazî wan nekirine. Di axaftina xwe de mînak ji serhildan û berxwedanên Kurdan da. Sedemên tekçûna û serneketina wan anî zimên. "Lê, ev çend salên dawî ku li Kurdistana Bakur ew şerê ku têye dayîn rewş û çarenûsiya gelê Kurd bi rengekî cuda da dîyar kirin. Ev jî, ji tecrûbeyên dîrokiyên me tên." Di derheqê konferansê de jî bi kurtasî van tiştan got:

- Pirsa Kurdan ne pirseke çandî ye, Ne pirseke koma biçûk ya mirovan e. ne pirsa çend kesên di zîndanan de ne. Yanî ne pirsa mafê mirovî ye. Pirsa Kurdan, pirsa azadiya 25 milyon Kurd û serxwebûna welatê wan e. Em dibêjin hinek bi çavên ticaret û bazirganiyê xwe nêzikê pirsa Kurd dikin. Bila her kes bizanibe ku rizgariya Kurdan, divê bi îrada Kurdan be. Piştgiriya Kurdan, piştgiriya têkoşîna serxwebûn û azadiya Kurdan e. Prensîbên demokratiya rast jî, ji bo me ev e. Pirsa vê civînê, pirsa hevkariyeke rast e. Divê hevkariyeke rast û durust bê pêşkêşkirin.

## "Di peymana Sewrê de dewleta Kurd jî hebû"

Îsmet Şerîf Wanli, rexne li pêşnîyara deklarasyonê girt, ku tê de mafê çarenûsiya Kurdan cîh negirtiye û di şûna wê de mafê mirovî heye.

- Di peymana Sewrê benda 64-an de: " Heger Kurd doza dewleteke bikin divê em li dij dernekevin."

- Min çav li deklarasyonê gerand, mafê mirovî girtî ye. Pirsa Kurdan ne pirsa mirovî ye, pirsa netewî ye. Me di Konferansa Lozanê de jî, vê yeke da dîyar kirin. Divê mafê netewî bikeve deklarasyona vê konferansê.

## "Li her perçeyî taybetiyên xwe yên cuda hene"

Şêx Îzzedîn, li ser navê xwe, Komela û Hîzbî Demokratî Kurd Rêxirabî Şoreşger axaft. Behsa kevneperestî û nîjadperetiya rejîma îslamî kir. Got ku:

- Li her perçeyê Kurdistanê taybetiyên xwe yên cuda hene Ji bo Konferansê pêşnîyariyên me hene. Divê ji bo Kurdan konferanseke navnetewî pêk bê. Li her perçeyî Kurd heqê xwe bigrin. Ji Konferansê re dua dikim û serkeftin dixwazim.

## "Bi navê Kurdistanê welatek heye"

Li ser navê 14 (1) rêxistinên Kurdistana Bakur Î Delen axaftineke kurt kir. Wî di axaftina xwe de, ji dema Lozanê heta niha ew zilm û zordestiya ku liser Neteweyê Kurd heye anî zimên û pêşnîyariyeke 8 xalî pêşkêşî konferansê kir:

1- Kurd ne wek mînorîtet, divê wek netewe bên qebûl kirin û ev bikeve deklarasyonê.

2- Di platformên çareserkirina pirsa Rojhilata Navîn de, pêwîst e, ku Kurd jî bên temsîl kirin.

3- Divê komîsyoneke navnetewî bê damezrandin, ku ka kî wan çekên kîmyewî çêdike, difroşe û bikartîne. Rejîma Îraqê li hember Kurdan çekên kîmyewî bikaranî, divê Îraq û ew fîrmayên ku çekên kîmyewî çêkirne û firotine, tazmînata wê bidin Kurdan.

4- Di biryara Konferansa Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê de kêmkirina çekan, divê Kurdistana Bakur jî bigire nav xwe.

5- Ji bo temsîliya çavdêrî ya Yekîtiya Netewan û ji bo nûneriya daîmiya gelê Kurd di muessên navnetewî de, bila xebat bê kirin.

6- Bila ordiya Tirk ji Kurdistanê vekişe û îdara ewlekarî li Kurdistanê bê rakirin.

7- Ew çekên ku ji bo şerê Xalîcê, di riya NATO re çûne Tirkiyê, bila bi şûn ve bê şandin.

8- Ji bo birêvebirin û taqîbkirina biryaran, bila komîteyeke çavdêr pêk bê û di vê komîtê de Kurd jî hebûn.

(1) Kawa, Rizgarîvanên Neteweyên Kurdistanê, Tevgera Rizgariya Kurdistanê (TEVGER), Tevgera Sosyalîsta Kurdistanê, Partiya Karkerên Kurdistanê (KIP), RIZGARÎ, Platporma Demokratik ya Welatparêz û Şoreşger a Kurdistanê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Partiya Demokrata Kurdistana Tirkiyê û Têkoşîna Sosyalîst.

## "Yekgirtî û serketî bin!"

Asbjörn Eide (Oslo): Di derheqê Kurd û mafê çarenûs de ya girîng ew e, ku xelk bi xwe biryar bide. Ev otonomî, federasyon an serxebûn e. Mafê çarenûs li ser daxwaziya gel, azadiya gel e.

Li Kurdistanê gelek faktor hene, ku mafê çarenûs bêt stendin. Neteweyê Kurd yek netewe ye. Divê ev yek li ser qanûn û prensibên netewî be. Heger dewletek çêbikin çawan dikarin vî mafî bigrin? Encama mafê çarenûs wek welateke serbixwe raste rast bi dewletê ve girêdayî ye. Ev mutlaq nîne. Heqê her neteweyî ye, ku çarenûsiya xwe bi destê xwe bigre. Ev heqê Kurdan e jî. Di peymana Sewrê de jî, her çiqas ne vekirî bû jî, ev tişt hebû.



www.arsivakurd.org

## "Sîstema kevin û ya nû"

Profesor Richar Falk (Stockholm): Niha dem hatiye ku Kurd mafê xwe yê çarenûsî bigrin û biparêzin. Doza Kurdan li Ewropa û DYA baş nehatiye fam kirin. Filistînî gelek hindik in, lê her kes baş dizane doz û rewsa wan çi ye. Di bin zordariya Saddam de xelkê Ewropî baş ji rewşa Kurdan agahdar bûn. Armanc û encama vê konferansê divê agahdariyeke baş bidin Ewropiyan, çapemenî û sîyasetan.

Bûyera Xalîcê pirsa Kurdan guhart. Bush bi xwe got ku, " divê mirov li Rojhilata Navîn rêzgirtinê bide mafê mirovan. Ev nîzama cîhanê ya nû ye." Lê, gelo armanca wî çi ye? Gelo xelkê herêmê ji bo kara xwe bi kar bîne?

Di Şerê Cîhanêyê Yekemîn de, armanc, parvekirina Kurdistanê bû. Petrol hebû. Peymana Sewr û Lozanê bidin ba hevdu; di Sewrê de mafê Kurdan hebû, lê, di Lozanê de rabû. Û welatekî nû - Tirkiye hat çêkirin. Niha jî, piştî şerê Xalîce çi polîtîka tên çêkirin? Du rojan berê Kamuran İnan digotin, " dawiya welatê mezin li herêmê tên û yên biçûk dest pê dikin." Ev girîng e. Hesabê Saddam têkçû. Gelo dê niha di herêmê de, rola Tirkiyê, Suriyê û İranê çi bin?

Ez du tiştên nîzama kevin bêjim. Rewşek hat afirandin di navbera netewe û dewletan de. Bi taybetî ya gelê Kurd. Ev jî ax e. Erd û netewe probleman çêdikin. Gelek kes baş nizane nîzama dewlet û netewan çi ye. Di polîtîka kevin de, dewlet dihatin zanîn. Lê, trajedya Kurd bûbû esîr û eserê dewletê. Dibêjin "Tirkiye dewletek e û temsîlê neteweyekî dike." Ji ber vê yekê dema mirov behsa Kurdan bike nabe. Lê, li gor qanûnnên navnetewî dewlet hene. Niha jî dibêjin" dewlet û netewe ne yek in." Me dît, neteweyên ku dewletên wan tunin, çi tên serê wîan.. Pêwîst e, ew xwedî dewlet bin.

Sîstema kevin û ya nû çi ne?

# Deklarasyon

Zordariya ku li ser ji 20 milyon Kurdî bêtir heye, divê ji aliyê civaka cîhanê ve êdî neyê qebûl kirin. Ev tehdîdek e, li ser aştî û edlayiya Rojhilata Navîn êrîş û destdirêjkirinên li ser standartên mafên mirovyî ye, ku bi peymanên navnetewî hatine tespît kirin.

Destdirêjkirinên li ser mafên mirovayî li Kurdistanê gelek salan pêk hatin û niha jî sîstematîk û bi berfirehî dom dikin: Girtinên sîyasî, êşkence, cezayên giran ên piştî mehkemekirinên xapînok û ne li rê yan jî qet bê mahkeme, "wendabûn", cezayên mahkemên fewqelade, şerê kîmyewî, valakirin û wêrankirina waran, xwarin û wesîtên jîyanê, înkara mafê ziman, edebîyat, muzîk û hebûna dîroka xwe, rewşa dijwar û nemirovayî ya li kampên penaberan!..

Gelê Kurd tû caran jîyana demokrasiyê nedît. Xerabtirîn xwedî îdarekirinek bi qîmet nebû para wî. İraqê - welatê ku li ser kaxezê soza awayek otonomiyê ji bo wan da - di riya zordarî û pêşkêşkirina karmendên xwe yên hefsarkêş re, ev peyman binpê kir.

İran, İrak, Suriya, Tirkiye û Sovyet hemûyan di demên cihê cîhê de, bi zanabûn hewldan ku di riya teşebûsa guhartina mîzana demografîk a herêmên Kurd re şexsiyeta netewî ya Kurd bibişêfin.

Heta ku ev bê edealetî dom bike, dê tû aştiyeke rastîn li Rojhilata navîn peyda nebe.

Konferans;

Daxwaz dike, ku hukimetên İran, İraq, Suriye, Tirkiye û Sovyetê Beyana Navnetewî ya mafên Mirovî, herweha peymanên mafên mirovayî qebûl bikin û wan li Kurdistanê û herêmên din ên ku gelê Kurd lê dijîn, bi her awayî bi cîh bînin.

Konferans, bi taybetî ji van her pênc hukimetan daxwaz dike ku:

- Di demekî kin de koçkirina Kurdan û wêrankirina avayî, talankirina mal û hebûnên wan rawestînin;
- Bi carekê de girtiyên Kurd yên sîyasî berdin, êşkence û cînayetan rawestînin;
- Riya vegera penaberên sîyasî yên Kurd vekin û hemû mafên wan ên hemwelatiyê garantî bikin;
- hemû dezgehên di nav hêzên polîs, emnîyet û eskeriyê de belav bikin, ku ew ji bo zordariya li ser gelê Kurd hatiye bikaranîn.;
- Sîstemên xwe yên dadgehî û qanûnî li gor standartên navnetewî yên mafên mirovayî reforme bikin;
- Zerara qurbanên îhlalkirinên derbasbûyî yên mafên mirovayî tazmîn bikin;
-Mafê ziman û kultura kurdî, herweha mafê çapemenî û weşanê bi kurdî qebûl bikin û mafê zarok û ciwanên Kurd hene bi ziman, xwe hîn bibin û bixwînin;
- Rê li bergirtina pêwendiyên navbera Kurdan li ser tixûbên navnetewî bisekinin û dest bi hêsakirinê bikin;
- Daxwaz dike ku her ev hukimet mafê çarenûsiya gelê Kurd qebûl bikin, hewla guftûgoyeke li ser bi destxistina vî mafk bikin ku bi awayekî ku têkiliyên aştîdar, dualî û dilovanî di navbera Kurdan û civakên cîran de peyda bibin.
- Bangî hemû hukimetan dike ku îhlalên Kurdan li wan welatên ku ew lê dijîn ji ber kişandine û dikêşin, di Konseya Mafên Mirovayî ya Neteweyên Yekbûyî de berpêş bikin;
- Bangî hemû hukimetan dike ku bi xurtî bixebitin ji bo bicîhanîna peymana normên navnetewî ya li ser bikaranîna çekên kîmyewî;
- Bangî hemû hukimetan dike, ku doza Kurd - mafên mirovayî yên kesên Kurd û herweha mafê çarenûsî ya gelê Kurd - di insîyatîfa aştiya Rojhilata Navîn a piştî şerê Xalîcê de bikin xwedî par;
- Bangî Sekreterê Giştî dike ku lê bikole û pêşnîyar bike ku gelê Kurd û civakên din yên bê dewlet çawan çêtirîn dikarin di karûbarên Neteweyên Yekbûyî de bên temsîl kirin;
- Daxwaz ji hemû hukimetan dike ku pêwendiyên li gel penaberên Kurd li ser bingehekî însanî bin û mafên penaberiya wan jî, bi qasî yên pênaberên grûbên din bin, ciddiyeta zordariya li ser Kurdan a ku li welatên wan ê eslî bi ser wan de tê, li ber çav bigrin;
- Bangî Komîsyona Bilind a Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Mafên Mirovayî (UNHCR) dike, ku beşdariyek mezin bide parastin û alîkariya penaberên Kurd ên Rojhilata Navîn, bi taybetî yên Tirkiye, İraq, İranê, bangî hemû hukimetan dike, ku di vê meselê de piştgiriya UNHCRê bikin.

Berî krîzê sîstem bi hevdu re keti bûn hemberiyê. Dema fêda DYA tê de hebe çek didin Kurdan. Çawan İran û İraqê berhev dan. Saetên Kissinger ên tarî hene, ku çi anî serê Kurdan.

Niha di vê navê de Tirkiye çima vê rolê dilîze? Gelo dixwaze İraq ji navê rabe, an bi rastî ber bi guhartinên nû ve diçe?

Ji bo Kurd û Filistîniyan dibe ku dewletên ne otonom derkevin holê...

www.arsivakurd.org

## "Aştî di mala min de nîne"

**Dr. Mahmûd Osman:** sîyaseta DYA ev e, ku pirsa Kurd di nav dewletên herêmê de hel bike. Her dema ku me pêwendî bi DYA dadanî, wan digot:

" Belê, belê, em we fam dikin, lê îhtiyaciyên me hene. Em ji ber vê yekê nikarin." Îranê di dema Şah de bi Tirkiyê re nedixwest, ku pirsa Kurd bê rojevê.

Piştî krîzê em carek din çûn Amerika. Dîsan gotin:

" Bes bi Saddam re promlemên me hene."

Çendek berê jî, em çûn konferansa Amerika, Madam Mitterand jî li gel me bû. Dîsan bi me re pêwendî danenîn. Bi tenê me pêwendî bi berpirsiyarê Mafên Mirovan re danî, lê ew jî paşê nehiştin.

Gelek caran em çûn FN. Gotin:

"Ev pirsa hundir e û divê dewlet wê bînin rojevê."

Ji me re gotin; "dewletên ku têkiliyên wan zêde bi wan dewletên herêmê ve tune, bila ew pirsê bînin FN. Gotin baştir ew e, ku hûn herin İzlandê. Ew dewleteke biçûk e û ji bo vê pirsê gelek di cîh de ye. Em çûn İzlandê û me wan dît. Gotin "baş e." Paşê em çûn Newyorkê, gotin " nabe. Amerîka gotiye hûn nikarin."

Em çûn ba sekreterê FN. Me derdê xwe jê re got:

- Bi hezaran penaberên me li İran û Tirkiyê hene. Pirçî ne. Tazî ne û perîşan in. Ji wan re alîkarî bikin". Wî got ; "Rast e. qanûnên FN û navnetewî hene. Em nikarin.

Em rabûn çûn rêxistina Koma Penaberan. Me ji wan re jî got; " wek Filistiniya, wek Afganistaniyan ji penaberên me re jî alîkari bikin. Statuya penaberiyê bidine wan."

" Gotin; "na Tirkiye nahêle."

Baweriya min bi Tirkiyê tune. Lê, dibe ku qezenca wan hebe û ber bi me bên.

Belê, rewşa niha hêviyê dide me. Lê, pereyê me tune. Niha piştî rewşa li welêt hinek sempatîzanî çêbû. Niha pirsa me bû pirsa navnetewî. Piştî rewşa nû, em çûn Fransê. Wan ne raste rast lê, gotin "belê." Her weha Moskova jî, em çûn û me bersivên pozîtîv girt. Me biryar da ku em pirsê bibin FNê. Parlementoya Fransê biryar girt ku pirsê bibe FNê. Ji serokê Fransê Mitterand pirsîn:

- Gelo li derî pirsa Kurd aştî li Rojhilata Navîn çêdibe?

Wî got:

- Na. Aştî li mala min bi xwe çênabe. Bi jina min bimîne nahêle!

## "İngiliztanê di derheqê Kurdan de polîtîka xwe guhartiye"

Parlementera Partiya Karkerê İngilistanê, Ann Civyd behsa zilm û zordestiya li ser Kurdan kir û di derheqê polîtîka İngilîztanê ya niha de weha digot, an soz didan:

- Niha di polîtîka İngiliztanê ya nû de, di derheqê Kurdan de guhartin çêbûne. Di vî warî de hemû partiyên İngiliztanê bi hevdu re ne. Ez bawer im, ku İngiliztan dê li ser Amerîka jî tesîreke pozîtiv bike. Partiya me ji bo Kurdan dest bi xebatên baş kiriye....

## Pêşkêşkirina raporên Komekî

Komîta konferansê ji berê ve biryar girti bû, ku hinek kes û komikên xebatê li ser rewşa Kurdan raporan pêşkeşî Konferansê bikin. Li ser rewşa Kurdistana İraqê Viola Furubjelke û Omer Şêxmûs; ya Tirkiyê Maria Leissner, Şerefxan Cizîrî, Eşref Okumuş û Anders Utas; ya İranê Bo Utas; ya Kurdên Sovyetê Cemşîd Heyderî û li ser Kurdên mahacir jî Birgit Amman, Keya İzol, Omer Şêxmûs û Olof G. Tandberg raporên xwe pêşkêş kirin.

## Deklarasyon û qanûnên navnetewî

Thomas Hammarberg li ser deklarasyona dawî agahdarî da. Ji nûneran daxwaz kir, ku deklarasyonê weha formile bikin, ku li gor qanûnên navnetewî be. Û di organên navnetewî de bên qebûl kirin û avuqat jî, wê bibin Koma Neteweyan.

## Komên xebatê pêk hatin

Roja paşî, ji bo pêşniyarî û daxwazên nûneran xebatên komekî pêk anîn. Xebatên komekî weha hatin dabeşkirin:

1- Koma rêxistên demokratîk li Ewropa;
2- Koma rêxistinên navnetewî li der;
3- Koma weşan û çapemeniyê...

Her kom cuda civiya. Di nav xwe de biryar, daxwaz û pêşnîyaran gotûbêj kirin. Û di dawî de, her koma xebatê rapora xwe pêşkêşî Konferansê kir.

## Gotûbêj li ser deklarasyonê

Nûneran li ser pêşnama (taslaxa) deklarasyonê dîtinên xwe anîn zimên. Xala li ser bêtir gotûbêj bû, xala ku "parastiana mafê Kurdan ê mirovî" bû. Bi taybetî nûnerên rêxistinên Kurd yên polîtîk giraniaya xwe danîn û di şûna gotina "mafê mirovî" de "mafê çarenûsî" kirin xala daxuyaniyê (deklarasyonê). Xweza ev jî gaveke pêşketî bû. Taybetiya Konferansa Stockholmê ji xwe yek jî, ev bû û ya din jî mirov giraniya partî û rêxistinên Kurd bi awayekî vekirî didît.

Nûnerên Konferansê piştî van guhartinan bi yek dengî deklarasyonê qebûl kirin û dawiya konferansê hat.

Piştî konferansê, di eynî cîh de, Kurdan di nav xwe de civîneke taybetî çêkir. Di vê civînê de, li ser pêwestiya pêkanîna kongreke netewî rawestan û pirsa kongreya netewî gotûbêj kirin. ❑



www.arsivakurdi.org

# NEWROZÊ Û JEWBIYAYENI

H. Hiljen

Newrozi di tarix û mîtolojîdê kurdan di wahêrê cayêdo gird û maneyêdo zaf hera û mihêm a. ma kiştê ra Newrozî ze hewn ra weriştişê tabîatî û amiyayişê wesarî û kişta bînê ra zî ze rojêda jewbiyayeni, zilmî ver serewerzanayeni û serkewteni qebûl kenê. Ma ewro vêşêrî nê maneyê Newrozî ê peyenî vejenê vernî.

Goreyê mîtolojîdê kurdan, bi hezarana serrî verê ney dîktatorêdo zaf zalim estbiyo. Nameyê nê dîktatorî Dehak biyo. Rojê doşiyandê ci ser o ku lî vijênê. Hekîmê welatî heme se kenê se nêkenê nêşenê derdê ney rê çareyê bivînê. Rojê hekîmê ci rê vano, ki ti roj mezgê di qeçka nê dirbetanê xo sawê dirbetê to do rihatî be. Nê qisanê nê hekîmî ser ra eskerê ci şinê sûk û dewan ra her roj di qeçkan anê, cikenê û mezgê înan vejenê û sawenê kulandê Dehakî ra. May û piyê qeçkan bermenê, fîxan kenê laberê qe pere nêkeno. Eskerê Dehakî fina zî qeçkan arêkerdişî domnenê. Xeber û tesîrê nê zilmî seranserê welatê Medya ra vilo beno. Diha winî beno ki şar nêşeno nê zilmî banco.

Wexto bi namedê Kawaya asinkarêdo kurd estbiyo. Rojê sire yeno qeçandê Kaway ser. Kawa nê wazeno bi rihateya qeçanê xo teslîmê merdimandê Dehakî kero. Bi zilm û zordarey da Dehakî ya xo ra verîna pirr biyo. Hêrsanê xo çakûçtê xo ser ra keno teber. Her ki şino çakûçê xo pêtêrî dano piro. Roja ki sire yeno qeçandê ci ser keyla kîn û nefretê ci bena pirri. Kawa qerarê xo dano ki bê serewezanayişî çarena çiniyo. Bi kurdanê bînan a zî mişewreyê xo keno. Pêro piya qisanê xo kenê jew, qerar danê ki êrişê dizida Dehakî bikerê. Xebara serewezanayişî kurdan miyan di tavilê vila bena û bena semedê kêfweşey û heyecanî.

Cinî, camêrdî, qeçî, pirî, keyney, veyvî û xortî heme piya xo hadire kenê. Kawa zompê (balyozê) xo gêno û şaneno eynan vernî. Qerardarey û sermiyaneya Kaway cesaretê şarî vêsêrî keno. Kawa beno ze adirê îsyanî û ver a dizida Dehakiya gefî weno, zompê xo hêl keno û şino. Şar zî ze sêl şaneno Kaway dimi. Bi no awaya resenê qonaxdê Dehakî û text û tacê ci vila kenê. Dehakî kişenê, eskeranê ci tayini kişenê tayini zî teslîm gênê. Ney dima heme vazdanê keyandê xo, çiyayê xo yê newey û xasekî danê xo ra vijênê kuçan govendi gênê û kay kenê, tayn zî vijênê gir û koyan ser û adir wekenê ki xebera Dehakî ra reyayişî biresnê dew û sûkandê kurdan ê bînan. Mijdiyana kiştişdê Dehakî tavilê şarî miyan di vila bena. Kêf, şayî û veyveyê kurdan bi heftana rameno. Na roja vistişê Dehakî bena roja azadîda kurdan. A roji ra tepiya 21-dê Adari kurdan miyan di ze ROJA JEWBIYAYENI, SEREWERDARDENI, SERKEWTENI Û AZADEY yena qebûl kerdiş.

Hergi serri, him welat di, him zî teberdê welatî di bi sehezarana kurdî Newrozî pîroz kenê. Ewro pîrozkerdişê Newrozi her kurdê rê biyo şert û wezîfeyêdo mabendê xo û dişmenî di sînorê ronanê.

Kurdan miyan di, bê Newrozi, çîna çiniyo ki bi milyonana kurdan bi eynî rih û heyecana vejo dişmenî ver. Hergi serri partî, grûbî, federasyonî, komelî şexsî û dezgeyê ma yê bînî jû fini piya û bol finî zî ciya ciya Newrozi pîroz kenê; labirê heme zî eynî tema anê ziwan. Na tama zî jewbiyayiş û dişmenî ver werzanayişê kurdan a. Ki ma kurdî bişê ewro jewbiyayena xo biresnê sewiyeyêdo siyasî qandê serkewtenda ma ti astengî nêmanenê. Bi a min a, dersa ki ma ewro mîtolojîdê Newrozi ra bigîrê na ya. Kam ki samîmî yo û wazeno Newrozi goreyê manadê ci yê tarîxî pîroz bikero ganî kurdan miyan di winî gamanî berzo ki ê gamî bibê semedê dostaney, birayey, embazey. E ki mabeyndê kurdan di toximê dişmeney bikerê ganî heqê înan ê pîroz kerdişê Newrozî çinê bo.

Dewleta Tirkêya, no çend serrî yo heme metodê xo yê barbarey ceribnay labirê nêşa tesîrê Newrozi kurdan miyan di bişikino. Noqor bi awayêdo resmî ya Nwerozi bi efsanedê tirkan ê faşîst ê Ergenekoniya girêdê û ze roşanê tirkan qebûl kerdi û heme dezgandê xo rê emir da ki Newrozi pîroz kerê. Goreyê efsanedê Ergenekoniya, vanê tirkî Asyada Ortî di asê manenê. Vergê ray misneno înan û ê zî wijara vijênê û dinya ra vila benê. Goreyê efsanedê Vergdê Sipî -Bozkurt Destani- zî tirkê faşîst îdia kenê ki tirkî vergî ra biyê. Yanê vanê kalik û pîrikê tirkan verg o. Qondê coy sembolê faşîstandê tirkan verg o. Hetta, resmê vergî ze çiyêdo muqades û ze rozet kenê yaxedê xo ya. Newroza ma zî berd bi na efsaneda faşîstan girê day. Labirê ê yê fina xo xapênenê. Rihê Newrozi winî kurdan miyan di ca giroto ki,

# NECO'YRÊ NEHEQEY MEKERÊ!

Lejwan Büyükkaya

Berbang amor 70'di birarê mi Necmettîn Büyükkaya'y sero nûşteyênda Koyo Berz'î neşrbî. Esasti kes raşteya ci vajo nûşte şeklen birardê mi seroya, labrê kişta teyesteyinra (içerik), vernîra heta peynî propagakerdena fikr û vînayişê Koyo'y û ê embazandê ci meselada Dimilîyan seroya û qet eleqayê ci bi birardê mina çinîya. Ina tenya waşto tayê fikranê xu birardê mirê malkerê û birayê mi propagandada fikrandê xudi xurê aletkerê. Çimkî, çîyo ki Koyo vano ê êki ci mûsnenê nê qissan û bi ey danê vaten, bê esl û estariyê. Labrê êvê bi nê buxtanîya xu kenê gunakarî û kewnê bar û mesûleteyênda gird bin. Bi jew qissayêna xu kenê sûckar:

Meqala Koyo'y qasto bi munasebetdê 7 serrandê şehîdbiyayenda birardê mi qalkerdena ciya. Labrê kes senî destpeykeno ki biwano, hema fahmbeno ki nîyetê Koyo'y xirabo; o niyo û çînao. Vano: "Qandê vîrîardena ey, ez wazena tay çiyanê zahf muhîman binûşna. " Bahdo Koyo tunikda xudi ju temayêda tersî virazeno û ze jû sirrênda Neco'yêda muhîm îfşakeno û wina vano: "Ez texmîn kena, bolê şima nêzanê, o çiyo ki Neco'yo rehmetî cira tersayê, çiçîbi. "Dima jî werzeno tayê çiyê ki dûrîra nezdî elaqeyê ci bi birardê mina çinyo şaneno pêmiyan, piya zeliqneno û pînekeno.

Zeki ez do cêrdi jî qalbikera, tayê qisseyên ki Koyo'yo birardê mirê malkeno û wazeno îna hewnayiştê xuyê siyasîrê malzemekero, çimeyê ci eza. Ê qissey mi tayê "dostan"rê vatibî. Ya raydi, ya jî Koyo'y hetekti tadeyayî, viryayê, tahrîfbiyê û bi qelemda Koyo'ya ameyê nûşten. Xura sebebo ki çimeyê ci eza, qandê raştkerden û raşteydîyarkerdenda ci ezo nê nûştey nûşnena.

Sifte ma berê çiyan pêmiyanşanayen û piyapînekerdenda Koyo'y ser.

Gerçî Koyo weçînayenda metoddê meqale nûşteyinda xudi serbesto. Labrê çiyo ki oyo şaneno pêmiyan, herjew bi seredê xuya reyê amî (efkarê umumî) nezdîra eleqeder keno. Koyo bi zanayen an bi nêzanayen nê mewzûyandê muhîmandi malûmatanê çewtan vilabikero, wextana bena bêmesûletey ê se bikerê zî nêşenê nê rihî orte ra werzanê. Xo ra heta nika heme çiyê ma; tarîxê ma, kulturê ma, folklorê ma, ziwanê ma heme ze ê xo qebûl kerdê û talan kerdê. Hetta estişê ma zî înkar kerdê. Hewna bi awayêdo resmîya qebûlkerdenda ma ser ra çend rojî nêravêrdî bî, noqor vatî Newrozi malê tirkan a. Na mesela korfamey û bêemeleya dewleta tirkan nîşan dana.

Newroza emserî him welat di him zî tebera bi awayêdo zaf girda amê pîrozkerdeni. Dewleta Tirkiya emser zî fina ê dildanê xo yê barbarî misnay şardê ma û bi hezarana kurdî qandê pîrozkerdişdê Newrozî tepiştî, pa îşkence kerd, eştî zîndana û tayn zî şehîd kerdî. Kiştê ra vanê pîrozkerdişê Newrozi serbest o, kişta bîni ra zî ê ki pîroz kenê esker û polîsanê xo ramanê ci ser û erzenê zîndanan. No zî îspat keno ki mexsedê dewletda tirki serbest pîrozkerdena Newrozi niyo, mexsedê înan xo rê malkerdiş û firnayişê manedê Newrozi yo. Nê dek û dolabanê înan ma verîna zanê. Labirê ez hêvî kena ki nê hedîsey, çimanê ê ki bi di qisandê Ozalî ya bî serxoşî, akarê ki vêşî bi dewletda tirkiya ya paştiya xo girê nêdê.

Rihê Newrozi; jewbiyayiş û zilmî ver o, serewerzanayiş o. Zilmo ki ewro bi ma beno diha niyancêno. Senî ki kurdî bi hezarana serî verê ney bî jew û zalimeya Dehakî orte ra wedarnay û hunerê jewbiyayişî îsbat kerdî gerek ma zî nê mîtalojîdê xo ra dersanê erciyayan bigîrê û platformê Newrozi, ê heray û welatperwerey vejê sewiyeyêdo siyasî.

Heta ki partî û grûbê cihar heme parçandê welatdê xo nêrê pê ser û xo organîze nêkerê ne dinya goştareya ma keno, ne zî ma şenê qarşidê dişmenandê xo ya xo organîze bikerê. Hedîseyê Kurdistana Iraqî ê peyinan zî fina îspat kerd ki bi qisan û wahdandê dewletandê emperyalîstan û dewletandê kolonyalîstana bawer nêbeno. Ki ma verî-verî xo jew nêkerê, paştiya xo bi çend peywendiyandê dîplomatîk ya girêdê ma do tim wina destan bin di bê.

Ki ma wazenê layiqê Newrozi û Kawadi asinkarî û zey miletandê bînan azad bê, bê jewbiyayeni û sere werzanayeni raynada ma çiniya. Bi na bawerey a Newrozê şima pîroz bo!

♦

û lazimo cirê mudaxele bibo. Xura zeki ez do cêrdi jî vaja, çiyo ki birardê mi sero vano, kişta teyesteyinra jî çewto, tahrîfkerdeo, cora jî lazimo cirê mudaxele bibo. Qandê ki wendox bizano Koyo'y çiçî piya pîne kerdo û şanao pêmiyan û çiçî çewt vato û tehrîfkerdo, ez wazena meqaleya ci bi kilmeya biyara pêser.

Sifte bi munasebetda vîrîardenda 7 serandê şehîdbiyayiştê Neco'yra wazeno qalê mezîyetandê ciyê berzî ê şûrişgerey û zanayenda ci bikero. Dima vano, Neco'yo rehmetî çiyêra bo tersayê. Bê ki sifte raşteraşt vajo, o çî çiçî bi, qissanê xu temada tersî sero beno ano û bê ki vajo ey sevato, şino na perserda bîn ser -tebî no mabeyndi îma keno ki terê Neco'y jî xura eynî çibî- û ay sero fikranê xu vano.

Qandê ki ez wendoxî bi edebîyatdê Koyo'ya sersem nêkera û qandê ki wendox weş fahmbikero na persa bîn çiçîya û o yo sevano, kes şeno vajo, Koyo'yo wazeno hena vajo: Ewro tayê merdimî werîştê vanê Zazay bi ziwan, kultur, tarîx, erd û kameyda (huwîyetda) xuya milletê teşkîlkenê. Ew bi no awaya milletandê çorşmedê xura -Kurdî jî daxîlabiryenê. Lazimo ki, Zazay jî ze milletênda musteqîl heq û hiqûqdê xurê wahîr bivijîyo. Koyo bi edebiyatdê xuya hewar hewar keno û vano nê merdiman gamî ravey berdî, êyê jahr û axûyan rijnenê. Jahr û axûy resay vilikan, rîçeyandê daran. Şewate qilaya, dûnî xu resna azmînî. Ek kes tedbîrî nêyero, nê do kê ma biveşnê, Dimilîyan û Kurdan pêra cikerê, abirnê. Koyo witiyadê meseleyênda ki aya esta û munaqaşaya ci bena sero fikranê xu beyan keno û merdimê ki wayirê fikrandê corînanê înarê xeberî dano. Tebî no mabeyndi Necoy'y jî nê qissan û fikrandê xudi xurê keno embaz.

Dima Koyo mesela tersî Necoy'y hetekti çiçî bî akano û Neco'y dano vaten. Goya cira neqlen tayê cumleyan rêzkeno û vano Neco'y verê ney des-diwês serrî hena vato: "Ez tay meselan ra bol tersena û nêwazena ê meseley ma miyan di peydabê." "Ê meseley bol gird û çetinîyê. Ê meseley, meseleyê pê ra abirnayenda zeravandê Kurdî yê." "Ez tersena ki dişmenî, bi şeytaneya, bi fêsateya, merdimanê xo ma miyan fînê û ma viradê pê. Ez tersena Kurdan mîyan di didiyey, hîrêyey peyda bo û nîfaq înan mîyan kewo. Ez tersena Kurdî bi xo ganandê pê kewê." Koyo nê goya qissandê Necoy rê kommentarê (yorum) jî virazeno û vnao Neco'y heqê ci bi ki bitersê û nê qissey û tersê ci raşt vijyay.

Îşte qisseyê ki çimeyê ci eza labrê kokra tahrîfbiyê, nêyê. Ez do gamna tepiya ageyra nîna ser û raşteya ci binûşna. Bi musadedê wendoxîya ez verî wazena peynîya meqalada Koyo'y biyara.

Dima Koyo hendê vîstê Neco'yra fek veradano û o bixu senî hewneno na meselara û çereyê ci senî vîneno ey sero fikrnaê xu rêz keno. Persrê tarîf û nameyê jî ronano: Lehçe. Labrê koyo'yê ma zano na "lehçe"ya ma winî zeydê ê şarîya niya, bol proplemina, cirê programê, karkerdenê lazimo. Koyo "qolan weşarneno", vano: "Hetan ki nê meseley gird, gurr û vilay nêbiyê, ma qolan weşarnê û nê meselan ver di vinderê. "Qolan weşarneno, hema hewna jî tersê ci ci pîzediro û cumleya ay peynîdi tersê xu hena ano ziwan: "Tîrî finê tîrkuwanî ra bivijiyo fina pey di ca nêkewna û do hedefê xo bivîno." Nê hurdina cumleyandê Koyo'yra jî weş bellî beno ki, no derd û ters esas ê Koyo'y û aqildarandê ciyo. labrê nêwetanê nay eşkere vajê, kenê malê Neco'y û gunayê ci kenê xu mil.

Ney tepiya Koyo bi hewt maddandê qerrasana fikrê xu halkerdenda persda lehçer sero pêpeyfîneno. Dimlîyanrê sankî otonomîyê wazeno. tenekna sero vêşîkerdê kesî do bivatê otonomiya ki Kurdî Saddam'ra wazenê jî, xu ra hendêno. Xulasa vano wa Dimilî serbestbo, bêro nûşten, qissekerden, kesferq nêfîno lehçeyan miyan, qiymetê ci zey pê bizano û wesaîre... Yanî bi vatenêna programê xu yê na perser sero îlan keno. Neyra jî bellî beno ki, esas amacê nûştey Neco niyo, zewmbî çînao. labrê Koyo'yê ma nêşermayeno û wazeno nê programdê xurê jî Neco'y bikero wertax û hena vano: " Neco yê rehmetî verê ney des diwês serri veror no talûke ferq kerdbî û qandê çareserkerdenda ci jî girweyayê û fikiryayê. " ya sitar! Mayê Koyo'yra mûsenê ki, serrandê çorşmedê cuntaya 80'di tenya hena fikirkerdena nêmendo, eynî wextdi "girweyayo" jî.

Peynîdi jî herhalde wazeno berzo ningandê tayê partîyan. Meqala xu hena qedîneno û vano ma Kurdan wextaki Neco hepistibi cirê wahîrey nêkerd, paştî nêvijyay, eger ma bikerê belkî jî nêkişiyayê, şehîdnêbiyayê.

Meqala Koyo'y mi rakerd çimandê wendoxî ver. Zek aseno meqala şeklen Neco'y seroya. esas niyetê ci, kiştêra tayê çiyan Neco'yrê malkerdena û kiştêra jî aletkerdena Neco'y qandê tayê fikr û vînayişandê xu meselada Dimlîyanan Dimlîyerseroyo. Çiyo ki ez do neka sero vindera, Neco'y sevato se nêvato, oyo û qet zewmbîna çiyê niyo. Nêwazena kesîdi bikewa polemîkan. Xura na jew teberdê çerçewedê nê nûştey di jî manena.

Wendoxo erciyaye, ez torê temînat dana ki, Koyo Berz birayê mi weş nêslasneno. Qandê coya jî oyo nêzano sevano! Raşteya nê girwî zek ez do neka şimarê vaja, hinîya.

Ma heme pey zanê ki, ziwanê Zazayan û persa Zazayan, aya nê serrandê bahdoyinandi minaqaşa bena. No xisûsti hewnayişê merdimandê ma pêra abiryeno. Tayê bêveng manenê, tayê gorê fikr û rayda xu xurê çiyê vanê, kar û girweyê kenê. Fina ma heme pey zanê ki, Zazayina Neco'y jî kişta herkesîra ameyê û yena zanayeni. Kê ci sero çiyê nûşnao, Zazayina ci jî zikr kerda. Hetta kê bi amacê muxtelîfanabo jî şexsîyetê muhîmî ê Zazayan amordo, nameyê Neco'y jî ci miyandi ravêrnao. No mabeyndi pêseroktê (dergi) Piya'ydi mulaqatênda Neco'y ki bi kaliktê ciya virazîyabî û meselandê polîtîkayra dûrîbî neşr bîbî. Çiyêndo tabiî yo ki, çeno çorşmedê an merdimandê Necoy miyandi jî hewesê an sempatiyê persda Zazayanrê bibo. Atmosferêndo henayindi tayê embazî û dostên ki zanayê ez birayê neco'ya, kewtîbî meraqê û jew fin ameyê mira meselada Zazayan û

ziwandê ci sero hewnayişê Neco'y perskerdê. No meraqdi raşteya ci mi heq dayê înan jî. labrê cewabê nê meraqî dayiş bol çetinbi. Lazimbi mi qisseyê xu weçînayê, objektîfbiyayê, bol bi dîqqetbiyayê. Çimkî mesela Dimlîyan qonaxêndo nazîkra ravêrdê û minaqaşaya ci biyê. Mi nêwaştê neco semedo ki elaqayê ci pey çinyo, bikewa nê minaqaşayan miyan. Tek vaten an kelîmeyênda mina şaş biyê bêhumeteya şexsdê Neco'y û hem jî biyê bêmesûleteyê qarşidê şardê maya. Xura zewmbî jî mi xurê kerdbi ze edetê ki, ma heta ki xatira û materyalanê Neco'y pêrkin piya neşrnêkerê, lazimo teyesteyinda ci sero jî bêveng bimanê. Bi no temkîna cayê an di cayandê mi hebinê nê embazan û dostanrê bi emeleyênda samîmîya çiyo ki ameyê mi vîrî û zanayê, qalkerd. Kaşka mi nêkerdê. işte malûmato ki mi no xisûsti dao tayê "embaz" û "dostan", şiyo gir biyo biyo û resao Koyo'y û bi awayêndo çewt û tahrîfkerdeya nûştedê ci di vijîyao.

çiyo ki mi ê "embazan" û "dostan"rê qalkerdo û vato tenya nê cêrîniyê:

Şarê ma, însanê ma, Neco'y bi mucadele û fikrandê ciya weş silasneno. Însanî hewna êyê weşiyê. Tarîx tezeo û ortediro. Zazay miletnayê an nê, Zazakî ziwano an lehçeyo; merdim nûşeno Neco'y bifîno na munaqaşer miyan. Hendo ki ez şahîda ciya bi nê mefhûmana nezdîyê nêbîyo. Neslo newe jî, wexta ki biwazo Neco'y bislasno, verê hemî çî, odo xurê bixu nûşteyê Neco'yê ki do neşr bê îna sero bigirweyo. Zewmbî jî çiyo ki meraq kenê, temayê ki geyrenê ci, bi tehqîqatandê xuya do bivînê û cira fikrê bivejê.

Kurmanckî'yêda mukemmel zanayê û qissey kerdê. Bi o babeta jî Zazakî'rê hakîmbi. Hewna serrandê 71-72'di, wexta ki qampta Dr. Şivanî 'dibî, Kurmanckî'ya paralel Zazakî sero jî xeptiyabi. Not û defterê ciyê ki ê rojanra mendê, ney nîşan danê. Birrê Zazakî qerekterdê xeptîyayenênda werdî gramer û qissebendî (ferheng) seroya. Sebebo ki alfaba Erebî jî zanayê, şao ê eseranra jî îstîfade bikero. Not û destnûşteyandê cira bellî beno ki Dimlîyan û Dimlî sero meraqêdê ci esto, tayê eserî-çimey wendê, waşto tayê materyala arêkero. Şehîd bi tepiya, ez mûsaya ki, ê serrandê bahdoyinandi jî hewesê xuyê Dimlîyer berdewam kerdo û qissebendênda Dimlî sero girweyao.

Mektûb û notê xu fin fin bi Zazakîya nûştê. Embazekê ki cirê mektûbê Zazakî riştê, qandê ki îna teşwîqbikero, kiştа gramerîra raştkerdê û ey tepiya înarê kopyayênda ci peydi riştê. Nê not û mektûbên ki eza qalkena, tayê cira mewcûdiyê. Nûştayê Zazakî ê Tirêj bi heskerden û meraqêna wendê, kinarandê cidi tayê îlawey an notî ronayê.

Neco'y kameyeya (huwiyeta) xuya Zazayin daîm weş û zînde tepiştê. Xatirayenda werdîya, labrê hinî mi hafizadi ca girota. Serra 79 di ma piya tay lîderandê Kurdistanê Iraqê hetektibî. Weş yeno mi vîrî, wexta ki îna cirêxîtabkerdê, vatê: "Birayê mao Dimlî."

Jew xatirayênda mi esta ki ez bol muhîm vînena an aya mirê winî yena. Persa Zazayan bî aktuel tepiya eza winî ci sero dişmişbena. Ez ewro vana kaşma ma bişayê hewna vêşî sero piya qissey bikerdê. A jî naya û ressena serrandê 72-73. O wextidi bi giraneya Swêd'di mendê. Jew fin tayê çiyê xu ki tebera nêakerdê û nêvatê, winî ze babetdê sirrî an derd û kulandê xu mirê akerdê. Ey eşkera nûvatê, labrê hurfina ki bi no babeta midi qissey kerdê, mi xurê winî îdraq kerdê ki, zek o yo problemanê partîda xu mirê qalkeno. Nînara jew jî bol weş yeno mi vîrî. Na mesela Zazayanbî. Ey wina vatê: "Mesela Zazayan jî esta û bi seredê xu meseleyêna. Hem jî meseleyênda girda. Roj bêro ado biteqo. Labrê keso nêwazeno nezdîbo û munaqaşa bikero. Hetta mira winî aseno ki tayê embazî herçend eşkera nêvanê jî, nêwazenê bi Zazakî'ya bêro nûşten. Wexta ki kes qalkeno, vnê "Çi Zazakîya çi halo, cira fek veradê!" Zek êyê tersenê û fikiryenê ki ek Zazakî bêro nûşten do xu peynîdi tayê problemanê bîna jî biyaro. Bi nê motîfandê (gerekçe) eften-pufteniya peydieştiş û fetisnayişê mesela metodênda raşt niya."

Ey dima, serda 75'di ageyra welatî. Aya tepiya heta rojda şehîdkewtenda xu qalê na mesela kerdo nêkerdo ez nêzana. Ma destidi ewro belgeyê çinya. Xura nê qissandê cira jî aseno ki verê ney davîstê serrî tenya îşaretê problemer kerdo, labrê tarîfê ci an fikrandê xu ci sero nêvato.

Ê serran miyandi mesela Dimlîyan zek eza vana aktuel nêbî. Qandê coya ma kesî no xusûsti temayulêndê Neco'y nêaşnawito. Kam ki vajo cirê neheqey keno. Îcab nêkeno kes spekulasyona jî bikero û vajo ewro weşbiyayê eydo hena an hena bikerdê an bivatê. Labrê kes nay şeno rehateya vajo ki, Kurdistan'o ki Neco'y qandê ci lejkerdê, ê Kurdistan'îdi cayêndo şerefin ê Dimlîyan jî estbi.

Îşte wendoxên ercîyayey, qisseyên minê ki mi no xusûsti Neco'y sero vatê, hendayênê, nê veşî û ne kemî. Teqdîr ê wendoxîyo. wa xurê nînan û çiyo ki Koyo'y neqlkerdo, bido pêver, cira netîceyê bi vejo ew ro hesaba bireso qeneatê.

Peynîdi wazena Koyo Berzî û aqildarandê cirê çend qissey vaja: heme kar û girweyê cemaatanrê metodênda edeb û ûsilî jî lazima. Eger emeleya şima bi raşteyda fikrandê şima yena, aha şimarê tarîx, aha ziwan, aha kultur. Virazê tehqîqatanê xu û rafînê çiman ver. Çîyo ki şima wazenê vajê, bi argumentanê şûrişî nêvato, înanrê malmekerê û dima jî xu medê taldadê nê qissandê xu. Ne birayê mi û ne jî nê merdimanra kesî mekerê nê girwan miyan.

Gulan 1991

**No yazî, werê ci senî nişto mayê winî neşirkenê. Yanê ma dest bi herfê da ci ya zî nênayo. Him kişta raştniştişê ci ya û him zî kişta manedê ci ya wêrê ci mesûlê ci yo.**
**Berbang**



www.arsivakurdi.org

## چاپکراوی نوێ

# (خەرمانە)

گۆڤارێکی وەرزی ئەدەبی رۆشنبیرییە. ژمارەی یەکەمی لە سوێد لە مانگی کانوونی دووەمی ١٩٩١ دەرچووە.
(خەرمانە) لەسەر وتارەکەیدا رێبازی خۆی بەم جۆرە دەست نیشان کردووە: «ئەرکی ئەم گۆڤارە بیر روون کردنەوەیە، لە تەم و مژی شەرە ئایدیۆلۆژیای بێ سەروبەر و دۆگمای لەسەردەم بەجێ ماو.» پاشان دەنووسێ: «بوار دروستکردنە بۆ سەرهەڵدانی روانگەی جیا جیا، لە بری دیکتاتۆریەتی یەک بیرو یەک شێوە بیرکردنەوە».
بابەتەکانی گۆڤاری «خەرمانە» لێکۆڵینەوەی ئەدەبی، چیرۆک، شیعر ، رەخنەی سیاسی‌یە. لە بەرگێکی قەشەنگ و جوان‌دا چاپکراوە. لە باری دەرهێنانی هونەریشەوە هەنکاوێکی نوێ‌یە لە بواری رۆژنامەگەری کوردی‌دا لە دەرەوەی وڵات.




# خەزال

چیرۆکێکی فۆلکلۆری کوردییە، لە کۆکردنەوەی کاک کازمی سەوزەچی‌یە. ئەمە دووەم بەرهەمی فۆلکلۆری‌یە کە کاک کازم بە چاپی گەیاندوە. وەک لە پێشەکی نامیلکەکەدا نووسراوە، رووداوی خەزاڵ لە زۆربەی ناوچەکانی کوردستان باوە و دەماودەم دەگێردرێتەوە. بێگومان کۆکردنەوە و بڵاوکردنەوەی کە لە پوری نەتەوایەتیمان و رزگارکردنیان لە ون بوون و لەناوچوون، ئەرکێکی نیشتمانی گەورەیە. بەڵام لە ئامادەکردنی میراتی کولتوری و چیرۆکی فۆلکلوری، پێویستە ئامادەکەر هەندی مەرج هەیە لەبەرچاوی بگرێ وەک: ئەو دەقەی لە کێ گوێ لێبووە، یاخود ئەو کەسەی بۆی گێراوەتەوە، تەمەنی چەندە... ئەگەریش بنەمای چیرۆکەکە فۆلکلۆری‌یە و نووسەر دایرێشتۆتەوە، پەنجەی بۆ رابکێشێ.



# کۆچەر
# گۆڤارێکی رۆشنبیری ئەدەبی منداڵانە

**بانگەوازێکی خۆلی گۆڤاری «کۆچەر»ی منداڵان**

**دڵسۆزان... دایک و باوکی منداڵانی کورد لە ئاوارەیی!**
**جگەرگۆشەکانی کوردەواری لەهەر جێگایەک هەن!**

دیارە دەزانن لە مێژووی رۆژنامەگەری کوردی «کرمانجی خوارو» گۆڤاری «کۆچەر» سێیەم مۆمی هەڵگیرساوی ژیانی منالی کوردە، دەستەخوشکی هەردوو گۆڤارە جوانەمەرگکراوەکەی «گروگاڵ»ی کۆماری مەهاباد (١٩٤٦) و گۆڤاری «ئەستێرە»ی کوردستانی عێراقی (١٩٧٥) لە پێناوی ئەوەی منداڵی کوردیش خاوەن گۆڤارێک بن بە زمانەکەی خۆیان. بێگومان دوژمنە سەرسەختەکانی گەلەکەمان رێگای دەرچوونی هیچ جۆرە رۆژنامە و گۆڤارێکی تایبەت بە منداڵانیان بە زمانی کوردی نەداوە و ئەوەندەش بۆیان کرابێ بەریان لە بڵاوبوونەوەی ئەدەبیاتی منداڵان گرتوە، سەرباری ئەوەی منداڵی تورک و فارس و عەرەب لەو چەند وڵاتەی کوردستانیان بە زۆردارەکی بەسەردا بەش کراوە، خاوەنی چەندین رۆژنامە و گۆڤاری رۆژانە و هەفتانە و مانگانەی رەنگاورەنگن، هەر بۆیەش لە دایکبوونی گۆڤاری «کۆچەر» لە ساڵی ١٩٨٨-١٩٨٩ سەرەتایەکە بۆ بەدیهێنانی ئەو خۆزگەیەی منداڵی کورد کە دوژمنان پێی رەوا نابینن.

ئێمەش لێرەوە کۆمەڵێ هونەرمەند و نووسەرین دەستی خۆمان خستۆتە ژێر پەیامی بەردەوام بوونی گۆڤارەکە لە پێناوی ئەوەی «کۆچەر» ببێتە هەوڵدانێکی گەرم و گوڕ و منداڵی کورد لە هامێزی بگرێ و هەست بکات، گوڤاری تایبەتی بە خۆی و بە زمانی شیرینی کوردی هەیە، بەو هیوایەی لە دەرەوەی کوردستان «کۆچەر» دەستی منداڵان بگرێ بۆ چاکتر فێربوونی زمانی کوردی و لەبیر نەکردن و نەپچران لە کولتوری کوردەواری...

گۆڤاری «کۆچەر» بە هاوکاری و پشتگیری مادی و مەعنەوی تێکرای دڵسۆزانی منداڵ و وشەی کوردی بەرەو پێشەوە دەچێ و گەشە دەکات... ئومێدەوارین هەموو هونەرمەندان و نووسەرانی شارەزا و خاوەن قەڵەم لە بواری ئەدەبیات و رۆشنبیری منداڵان، لە نزیکەوە بۆ نووسین و نیگار و را و پێشنیارەکانیان دەستمان بگرن و بە دەنگمانەوە بێن، بۆ ئەوەی گۆڤارەکە لە ئاستی پەیامە پیرۆزەکەی بێت و مەبەستی ئامانج داری بپێکی و زۆربەی منداڵانی کورد بە هاورێی خۆیانی بزانن.

ئیتر چاوەروانی هیمەت و پشتگیری دڵسۆزانین

گۆڤاری کۆچەر

سەرنج: هەر کەسێک بیەوێ گۆڤاری «کۆچەر»ی بە بەردەوامی پێ بگات، دەبێ لە پێشەوە ئابوونەی ساڵانەی بدات کە بۆ ناو سوید (١٥٠) کرۆنە و دەرەوەی سوید (٥٠) مارکی ئەڵمانی یان (٣٥) دۆلاری ئەمریکی‌یە.

و چاکی شێخی حیسامەدینی ! هەتا تفەنگچییەکانی ئیمام پیوەر نەبوون و خاوەنی ماڵی خۆمانین، فەرمانی سەربڕینی چەند باڵندەی رەوەکی و ماڵەکی بۆ ئەو نەوەو نەتیجە جوان و نازدارانەت بدە. بەڵکو ئێمەی کوڕ و بووکەکانیشت لە سۆنگەی ئەواندا، پاش عومرێک بۆ جارێکیش بێ، بە ئۆخەژنی تێرزگمان لەگۆشتی سوورکراوە بئاخنین و... هێشتا قسەکەی تەواو نەبوو، بەدوایدا برایەکی دیکەمان ترسی شکاو هەڵیدایە:

– کچێ دایە گیان! شەڕ قوونی لەدەرکێ ناوە، ئەو شەڕ فرۆشانە، لە چەشنی ئاغا و ژاندارمەو ئەم کاروبارانە نییە. وەک دەبیسرێ، بەهەر شوێنێک وەردەبن خاپووری دەکەن! من لێم ڕوونە، کاتێک گبووشە ترک و چالی کوێر گەیشتنە ئێرە چت لەدەست نایە. تاکو خاوەنی ماڵی خۆمانین بەقسەی کاکم بکەی باشترە، کچێ دایە بەدانی چینچکێک گۆشت بەهەریەک لە ئێمە خێری دنیاو قیامەتت دەگاتێ. دەی فەرمان بدە! تاکو دەست بەجێ فەرمان بەران کلیلی دەروازەی بەهێشتت بۆ لەگەرنی پەلەوەرە بە خەزو بەزەکانت بکەنەوە.

ماڵتانە، یەک بەیەک قسەمان بۆ کردو هەرچی شێرو ڕێوی دەمان زانی بۆمان هێنایەوە، ئەوە خۆشەویستەکانیمان لە باوەشی هاویشت و شانۆمان بۆ سازکردو یەک بەیەک بەردێنی سپییەوە لەپێشی خۆمان کرد بە ورچ، مەیموون و .. سەمامان کردو منداڵەکانمان بیچ بیچە خانمیان دەرینا، بەڵکوو دڵی نەرم بێ و فەرمانی سەربڕین دەربخا. بەڵام دڵ دڵ نەبوو، ئەگەر لەناکاو هەستایە سەرپێ و بەپەلە چووە مدبەقی، قولچاخی هەڵکێشاو شەنە بەدەست گەڕایەوە و زریکاندی و گوتی:

چاوی خۆتان خورد کەنەوە! ئەوە پێتان دەڵێم! بێتوو هەر کەسێک دەست بۆلای پەلەوەرەکانم درێژ بکا، لەگەڵ دارو دەستە چڵکن و ورەکانی ئیمامی هەر لەو حەسارەی خۆمان بەشەنەی چاوەکانی لەبەری دەستی دەنێم و دەی کەم بەپەندی عالەمێ..! ئای لەبەر منالەورکان، چۆن دەیانهەوێ بەدووقسان هەڵمخەڵەتێنن؟! پێیان وایە کەمم کوێرەوەری بەو ماڵەوە کێشاوە... ئەنگۆ هەر قوونەبانی ئەوەتان بێ، بەیانییەک زوو سەر لەبن لێفە بێننە دەر، جا ئەوجار وەرن قسان بکەن! پەحـاا!!

کاکم دەستی بەڕدێنیدا هێناو لەولامدا بەسەبرایەک پێ گوت:

– دایە گیان « ئەوەی لەشەڕدا نەبێ شێرە» با شەڕ بێتە بن دەرکەت، ئەوکات پەژیوانی سوودی نییە.

دایکم توند تر لەپێشوو گوڕاندی:

– بڕۆن حەیا بتان گرێ! ئێستا قەڵەو قوتەی ئیمام بەهیچ شوێنێک دیار نین، بزانم بۆچی وا دەتان هەوێ دەم دەماڵی من رۆکەن، بیبڕنەوە. پێتان وایە بەربووە!

لەترسی شەنەی دایکم، منالە ورکە هەریەک بۆلایەک خۆیان شاردەوەو گەورەکانیش بەبێ دەسکەوت قونە دزەیان بۆ کرد. بەڵام هێشتا چەند رۆژ لە کۆبوونەوەی بنەماڵەییمان رانەبردبوو، لەپڕ هاوار گەیشتێ و گوتیان:

– ئەها بۆر کەڵەکانی ئیمام تفەنگ بەدەست پێوەر بوون! ئیدی لەترسان هەر بابایە دەستی ژن و منداڵی خۆی گرت و رای کرد.

دایکیشم کەدیتی نابابە! ئەو بۆرکەڵانە گاڵتەیان لەتەک ناکرێ. ناچار غیرەتی وەلانا و بەدەم چۆمی دا خۆی دزییەوەو باڵندە باڵ رەنگینەکانی بەجێهێشت. بەدوای ئەودا بۆرکەڵەکان بەماڵ و حاڵەکەی وەربوون، ئەوەی بۆ هەڵگرتن دەبوو، هەڵیان گرت، ئەوەی بۆ خواردن دەشیا خواردیان. ماباقیش هەرچی بوو سووتاندیان و خاپووریان کرد. دەسکی شەنەکەشیان شکاندوو لە نێوەراستی حەوشەی ماڵێ فڕێیانداو ڕۆیشتن...

جا براله چتان لێ وەگێڕم، ئەوەی براکەم بە دایکمی گوتبوو، «ئەوەی لەشەڕدا نەبێ شێرە» لە دایکم وەراست گەڕا. دایکم لەترسی گبووشە ترک و چالی کوێری تفەنگچی ئیمامی وای بۆ دەرباز ببوو، کەس بەسەرو شوێنی نەدەزانی. ئەوەی راستی بێ، ئەوە ماوەی چەند ساڵە کون بەکون بە شوێن دایکمدا دەگەڕێم لە شوێنێک بیدۆزمەوەو هەر ئەوەندەی پێ بڵێم «ماڵی خۆ نەخۆری بۆ چەکمە سۆری» ئەدی خاتوون ئێستا بەشەنە چاوی کێ دەردێنی...

کش بۆولای، ئیدی یەک بە خۆیان قارو قیژیان دادەنایەوەو دایکمان شەنە بەدەست لەماڵ بەهانایانەوە دەردەپەڕی. جا ئەو فەقیرەی کشە بۆولای گوتبوو چۆن لەدەست دایکم ڕزگاری دەهات، خوا بۆ خۆی دەزانێ و بەس..

هەر بەو حاڵە ئەگەر یەکێک لەئەندامانی بنە ماڵە، دڵ و دەروونێکی قایم و بەهێزی بایە و وێرابای و گوتبای:

– کچێ دایە گیان! وەرە بیکە بەسەدەقە و بەلا گێڕەوەی گوێلک و پالاغ و ئەم هەزارە زیلە کەسک و سوورانەت، بۆ ئیمڕۆ کانە فروجێکمان بۆ سەر ببڕە و با ئێمەش وەک عالەمی دەخوای، چێژی گۆشتی باڵندەیەک بکەین و ئەگەر لە قیامەت لێیان پرسین تامی گۆشتی پەلەوەر چ جۆرە بتوانیین وەلامێک بدەینەوە.

باوەڕتان بێ، هێشتا قسەکە بەتەواوی لەزاری داخوازکار نەدەهاتە دەرێ، دایکم ئەگەر لەبەر نان کردنێ بایە ئارداوی هەرای دەکردە سەری و شەنە بەدەست هەڕەشەی چاو دەرهێنانی لێ دەکردو لەپرتەو بۆڵەی دوایەش هەر مەپرسن.

بەکورتی سیاسەتی بەڕێوەبەری ئابووری دایکم ببوو بە دیکتاتۆری. ناچار ئەندامانی بنەماڵە بۆ چارەسەرکردنی ئەم تەنگ و چەڵەمەیە، شەوێک لەدەوری چرای تۆڕ کۆبوونەوەمان پێک هێنا و دووکەڵی سیغارمان بەبادا. ئەوەی ڕاستی بێ لە هەموو باریکەوە دواین، بەلام نەمان وێرا دەق و دۆغر باسی گۆشتی باڵندەکان بکەین. تاکوو لە مابەینی قسساندا برایەکی قۆشمەمان چاوی نوقاندو ڕوو بەدیوار بە گوێی دایکمی گەیاند:

– کچێ دایە! بۆ هێندەت توند گرتووە؟ پێم نالێی بۆ کێتەو چی لێ دەکەی؟ ئاخر هەر ئەوەنییە، هەر بینا ڕۆژێک ملهوڕێکت لێ وەدی هات، بێجگە لەوەی گشت پەلەوەرە باڵ ڕەنگینەکانی لێ خواردی و سەرباقیش لەماڵەکەشتی ڕەپێنای! جا ئەو کات هەر لە چۆکی خۆت بدەو هاوار کە! ئای قازەکانم! وای قەلەموونە چاو سوور و باڕۆکە سەر بەکلاوەکانم...!

هەر کە برام لە قسەکانی بۆوە، دایکم گورج لێی هەستایە سەرچۆکان و بەدەنگی بەرز بەسەریدا چریکاندی و گوتی:

– کێ؟ ئەمن؟! هەی بەرەڵلای ترسەنۆک! ئەتۆ هەر ئەوەندە بوێرە ڕوو لەمن کەو قسان بکە جا پاشان ... بەخولای باشت لێ حاڵی بووم، کە چ نیازێکت لەسەردایە... جا هەرکەسێک پیاوەو تۆسقاڵێک غیرەتی هەیە، هەر تەنیا قامکێک بۆلای مریشکە قوولەو باڕۆکەکانم و ... ڕا دەدێرێ، جا بزانە چۆن هەردووک چاوی خەیانەتکاری لەپێش چاوی عالەمێک بەشەنەی دەردێنم..!

سەرتان نائێشێنم، لەژێر باری دیکتاتۆری ئابووری دایکمدا چاخ بەتوندی دەوری خۆی دەپێوا. ئێمە برایانی سوێند خۆر، یەکێتی بنەماڵەی خۆمان هەر پاراستبوو. ڕدێنمان سپی ببوو، لەبەر ئەوەو نەتیجەی دایکم ماڵەکەمان وەک هێلانەزەرگەتەی لێهاتبوو. مەیدان داری و گرمەو هەڕەشەی دایکیشم هەر پایە دار بوو.کەس نەیدەوێرا لەبەرامبەریدا بڵێ لەل. وەرق دەگەڕا، ڕەنگی وڵات بزڕکا، لەو لای ڕا حەزرەتی ئیمام بەکۆڵێک عەمامەو ڕیش و عەباوە سەری وەدەرناو حوکمڕانی وڵاتی خستە ژێر ڕکێفی خۆی. ئەم ئاڵوگۆڕیەی وڵات دایکیشمی ڕاچڵەکاندو زەنگی مەترسی لەبن گوێی زرینگاندنەوە، بەتایبەت دارو دەستەی ئیمام لەو ناوچەیەی دایکم لێی دەژیا پێشتر زۆربەیان پێستەو ڕیخۆڵەو هێلکە کڕبوون. کاتی خۆی لەسەر کڕین و فرۆشی هێلکان لەگەڵ دایکم زۆریان چەقەببوو، جا بۆیە دایکیشم ترسی هێلکە کڕە تفەنگ بەدەستەکان هەڵی گرتبوو، بە دائیم لەبەر خۆیەوە ڕادەژاو لەبن لێواندا دەیگوت:

– بەشای نەخشبەند! «گبووشە ترک» و «چالی کوێر» هەر دەستیان بگاتە ئێرە قەت تاقە پەلەوەرێکم پێ ناهێڵن و لەساجی عەلیم دادەنێن. هووو خوایە لەحاست ماڵی من چاویان کوێرکە! هووو!

بەدوای زەبرو زەنگی دارو دەستەی ئیمام، ئێمە ئەندامانی بنەماڵە دیسان کۆبوونەوەمان پێکهێنا، برا گەورەی ماڵی، بەر لە هەموومان دەستی بەردێنی سپی خۆیدا هێنا و پاش یەک دوو مژ سیغارو وردە کۆکەی خڵتەی دار، بێدەنگی شکاندو بەڕیایی لەبەر دایکم دەستی کرد بە پێ هەڵگوتنی شان و باهوی دایکم، زۆری سوپاس لێکرد، کەپاش مەرگی باوکم نەیهێشتبوو، بێ باوکیمان پێوە دیاربێ، ئەوجار بە سپایی و بەبێ خیشکە باری قسانی کێشایە سەر باڵندەکان و ئەلحەق زۆریشی بەدەنگ و ڕەنگی ئەواندا خوێندو لە کۆتاییدا بە دەنگێکی نزم و لەسەرەخۆ ڕوو بەدایکم گوتی:

– دایە گیان ! ئەی لەجێی باب و باپیرانم ! وەرەبیکە بە خاتری ئەو ڕیشە سپییانەی کورەکانت

چیرۆک

# بەشەنەی چاویان دەردێنم

سیامەند

ماڵی ئێمە لە ئاوایی لە قەراخ چۆمێکی بەرین و قووڵ هەڵکەوتووە. دەم چۆم و دەوران پشتی ماڵی ئێمە، لەبەر سوورەبی، جەگەن، سێ سوو، قامیش و قەوزە ئەوەندە چۆغرە، دەکرێ بڵێم بە هەزاران باڵندەی ماڵەکی و رەوەکی تێدا دەژی. هەڵبەت لەو نیعمەتە خوا داوە، ماڵی ئێمەش بێ بەهرە نییە. جگە لە قازو مراوییەکانمان، کە سەربەست و ئازاد لەنێو ئاوێدا خول دەخۆن. لە هەزاریش زیاتر مریشک و کەڵەشێر و عەلی شیشەکانمان لە دەم چۆمی خەریکی چینەواری بونەوەراتی هەردی و ئاوین. فەرمانڕەوای ئەم باڵندە بێ زمانانە بێجگە لەخوا تەنیا دایکمەو ئەگەر پێتان سەیر نەبێ هەموشیان بەدڵ و بەگیان لە دایکم ئیتاعە دەکەن...!

بەڵێ، باوکم لەگەڵ مردووی ئێوە خوا عافوی کا. پاش خۆی سەروەت و سامانێکی ئاوا بەنرخی بۆ بەجێ هێشتین. ئێمە، نێرینەکانیش، بڕیارماندا تا ئەو کاتەی دەچینە ژێر خاک، ماڵ بەش نەکەین و ئەو ماڵە کەسک و سوورە بە حاڵەتی خۆی بێڵینەوە. بە مشاورەو رای گشتی دایکیشمان کرد بەجێگری باوکمان. ئەو هەڵبژاردنە بەڕای من کارێکی بەجێ بوو، لەبەر ئەوەی چونکە دایکم شێرە ژنێکی کەلاو بەغیرەت بوو بەئەندازەی سەری نووکی دەرزی ترسی دەگیاندا نەبوو.! هەر کەس نەیدەوێرا بەلایەکی چاوێدا تەماشای پەلەوەرەکان بکا. ئاغا، ژاندرمە، کوێخاو گزیر بەرۆح لە دایکم تۆقیبوون. بەو حیسابە هەڵبژاردنی دایکم بۆ ئەو مەقامە کارێکی بەجێ بوو. بەڵام مخابن هیچ شتێک سەد تا سەد باش لەسەر رووی کورەی هەردی دەست ناکەوێ. تەنانەت زێڕو ئەڵماسی خاڵیش بە زەحمەت دەست دەکەوێ. جاچ بگا بەدایکم کە بە هەردووک دەستان بە ماڵەکەیەوە نووسابوو، لە قودرەتی خۆی کەڵکی وەردەگرتوو، تەنانەت لەدڵی نەدەبزوە کەمێ گۆشتی مریشکی مردووش دەرخواردی کەس بدا. ئەگەر هاتباو کەسێک لە رۆحی خۆی خۆش بایەو بە دایکمی گوتبایە:

– ئەی پیرێژن! بۆکوێی دەبەی؟ هیچ دەزانی ئەو ماڵە رەنگینەی بەهەزار زەحمەت وەسەریەکت ناوە و تەنانەت دڵت نایە پڕبەسکی خۆی لێ بخۆی، هەر بینا رۆژێک هات و زاڵمێکت لێ پەیدابوو، لەبەر چاوی خۆت تەواوی ئەو پەلەوەرە باڵ رەنگینانەی لێ قووت دای.

بەدوای ئەو قسەیەدا، دایکم ئاوری دەگرت و وەک بەبری مێ چەپ و چیڕ دەبوو بەهەڕەشەوە وەڵامی دەدایەوە.

– کێ!؟ چت گوت؟ جا ئەوە پێت دەڵێم. کێ پیاوە و بڕە غیرەتێکی هەیە، بابێ! وەڵڵاهی و بیللاهی ناهێڵم بگاتە بەر دەرگای حەوشەم، بەشەنەی چاوی دەردێنم.

لەلایەکی دیکەوە، دایکم بێجگە لەوەی، لەرادەبەدەر هۆگری پەلەوەرەکانی بوو، زمانی ئەوانیشی بەپاراوی دەزانی و هەردووک لا باش لەیەک حاڵی دەبوون. چونکە بە هەردوو دوویەکی دایکم دەستەی مریشک و کەڵەشێر، قازو مراوی، عەلی شیش و ... هەرکام بە جیاواز بۆ دان خواردن و سەرژمێری سەریان لە حەوشەی ماڵی دەنایەوە. ساڵی بەقەد دەودووی ئاغای زیاتریش دایکم دانەوێڵەی بەشان و باهووی ئێمە رەحمەل هاتووی دەرخواردی ئەوان دەدا. ئەو خوا پێداوانە ئەوەندە تێر و تەسەل بوون، هەموو لەبەر قەڵەویان چاویان سووربیبوو، لەئەوەی دایکم پشت ئەستووری دەکردن غللوور ببوون و ئیتر کەڵەگایان لە پیاو دەکردە هیچ، هەر نەتدەوێرا بەسپایەک پێیان بڵێی

لە شیعری فارسی‌یەوە[1]

# خەمپەرست

شیعری: فروغ فرخ زاد
وەرگێرانی: فەرهاد پیربالْ

خۆزیا وەکو پایز بوومایە، خۆزیا وەکو پایز بوومایە
خۆزیا وەکو پایز: خامۆش، مەلوول بوومایە
زەرد هەلْگەڕایە یەک یەک گەلاْی حەزەکانم
سارد داهاتایە خۆرەتاوی چاوەکانم
پڕ ئازار بووایە ئاسمانی سینەم
لافاوە خەمێک، لە ناکاو هاتبا چنگی لە گیانم گیربکردایە
فرمێسکەکانم باران ئاسا بەسەر داوێنم داباریبنایە.

چەنێک جوان بوو، ئاه، ئەگەر پایز بوومایە!
کێویلە، پڕجۆش، پڕ ڕەنگ بوومایە!
لە چاوەکانما: شاعیرێک بە شیعری ئاسمانی‌ی خۆی،
لە خرۆشانا بوو.
لە تەنیشتما: عاشقێک دڵی
لەناو گڕی دەردێک شاراوە، لە هەلاْیسانا بوو.
منیش نەغمەم
نالەی سروەی باڵشکاو ئاسا
عەتری خەفەتی دەپڕژاندە سەر دڵە ماندووەکان.

بەرامبەرم:
ڕوخساری تاڵی زستانی گەنجێتیم
ڕابردووشم:
غەوغای هاوینی ئەوینێکی ناوەخت
سینەشم، ئەوەتا:
مەنزڵگای خەفەت، نسکۆ، بەدگومانی.

خۆزیا وەکو پایز بوومایە، خۆزیا وەکو پایز بوومایە!

١٩٩٠/١٢/٢٥

١- فروغ فرخ زاد، برگزیده‌ء أشعار، سازمان کتابهای جیبی، چاپ اول- ١٣٤٣، ص ٦٧-٦٨

به تاسه و شەوق و خورپەی زۆرەوە هەر خۆی ئەکوتێ،
بۆناو لاپەڕەو دێڕی پڕ خوێنی مرۆڤایەتی...

-٥-

لوورەی رەشەبا کپ ئەبێتەوە
هاڕەی پەنجەرە و دەرگاش دوایی دێت
بە تەنیا گڤەی تەمەنم نەبێ،
جارجار ئەمهێنێ و جارجار بەرەودوا گرمۆڵەم ئەکا
- ئۆف رۆڵەگیان:
لەم تەمەنەی پا بەندی نەهامەتیە.
لەم گەرداوە بێ ئامانەی
بێ سەروشوێن، هەر ئەمهێنێ و ئەمباتەوە.
ئێستا هەرچی خەم و یادگارێکت هەیە،
وەک پەیکەری عەشقێکی زۆر گەورە و پیرۆز
ئەیخەمەسەر دەفەی شانم،
شارە و شار و وڵاتە و وڵات ئەگێڕم...
لەگشت شار و وڵاتێکا، پڕ بەسۆزی دایکایەتی و،
پڕ بە ناخم ئەقیژێنم:
- هۆ کچەکەی ناوزریان و بەستەڵەکم،
هۆ دلارام: وەرە بە دەنگی دەنگمەوە...
سەیرم کە چۆن بووم بە کانیی کلْپە...
خۆ قرچەی دڵ بەرتاشە بەردیش بکەوێ،
ئەیسووتێنێ...
ئەی دڵی من، کە چنگێ ئەشک و کسپەیە
چۆن بەرگەی بێ تۆیی ئەگرێ...
بەڵام هەیهو... هەزار هەیهو...
قیژە و هاوار و ناڵەناڵ،
هەر لە دنیای ناخی خۆمدا سەدای هەیە...
هەر لە دنیای ناخی خۆمدا سەدای هەیە...

مانگی ١٢ی ١٩٨٩

* ئەم دێڕەم لەم بەیتە فۆلکلۆرە وەرگرتووە:
وەک مەڕەکێوی بیرە بیرە خۆم
هەر شەو لە شاخێ مەنزڵ گیرە خۆم
** و *** مەبەست لە (شێخ نوری شێخ ساڵح)ی شاعیرە کە باپیری جوانەمەرگە.

www.arsivakurdi.org

بەرەو رووم دێت...؟
بۆنی گوڵاوی ئەبەدی ئەپرژێنێ بەسەر خۆم و،
براکانمانا،
ئەوە کێیە...؟
پیرەهات و دەستی نازی بەسەر شان و لاگەردنی،
بەهێ رەنگی شێرەبووکدا هێنا و وتی:
- سەرهەڵبڕە، بەبێ شەرم تێر بڕوانە بۆ ئەم چاو و،
ریشە سپیەم...
سەرسام مەبە
رۆڵە ئەمڕۆ دووباوەش گڕ، یەکیان جەرگ و،
یەکیان بڕبڕەی سوتاندم،
هەرچەند رێگاکەم دووریش بوو، بەڵام چیبکەم،
ئەم کسپەیە کە مەندکێنشی لای تۆی کردم...

بووک لێی عەیان بوو- ئەو پیرە جوانە هەر کاکە (شێخ)ە**
بوو بە دنیایەک شەوق و روناکی و تریقانەوە،
دەستی ئاڵاندە پرچ و گەردنی خاکەکەی زەڵێ...
خاکیش وەک ئەوەی لە ئاهەنگدابێ، شاگەشکە ببوو،
ئەیوت:
سەیرم کەن ئەمڕۆ شاگوڵی گوڵزاری (نوری)***
لەسەرسنگی من خەو ئەیباتەوە...
سەیرکەن ئەمڕۆ خەرمانی شێخان گڕی گرتووە و،
چراخانەکەی بەرمن کەوتوو...

-٤-
لەو کاتەوە هەرچی خەڵک و خواو رێبوارە،
هەرچی درەخت و روبارە،
هەموو شەوێ گوێیان لێیە،
پیرە دێت و بە دەنگێکی پڕ لە سۆزە و سوتانەوە،
ئەچریکێنێ:
دلارامی من:
گوڵێکی مەنگە وا بەسەر دەستی وردە شەپۆلی،
دەریا هەڵچوەکەی ئینسانیەتەوە هەر لەنجە ئەکات...
سۆزی گریاوی ئەڵڵاوەیسی‌یە
ئاوارەکانی ئەم دنیا رەشە، هەر ئەیڵێنەوە...
نزمای ناو خەونی کچانی نامۆ، ون بووەکانە
گشت زەردەپەرێنک ئەبێ بە چەپکە تیشکێکی سوور و،
خۆی لە گەردن و سنگ و بەرۆکی ئاسمان هەڵئەسوێ...
مێژووی کوردستانێکی شەهیدکراوە و،

سۆنە و مراوی گۆم و چەمەکان کەوتنە فڕین و قریشکە و ناڵە،
شاخ و کێو و شیو تەزووی ساردوسر
بە گیانیاندا هات،
- دیسان هاتەوە، باڵندەی جارچی
- ئەبێ چی بێ...؟ خوایە چی بێ...؟
چی قەومابێ...؟
هەواڵی خەمێکی نوێ و کۆستێکی تازەی هێنابێ...؟
- ئەبێ وابێ...؟
قەلی جارچی زریکاندی:
- پەلکەکانتان مەهۆننەوە، با هەر وابێ،
هەڵوەشاوە و پەرێشان بێ...
هەر هەنگاوێکتان بە دە بێ...
بۆ گۆڕستانەکەی (زەڵێ) ئاسک ئاسا قەڵەمبازدەن،
شینە پەلکانە بگێڕن...
کۆستە... کۆستە،
دیسان کۆستە،
هەموو ڕۆژێ باڵای کۆستێک،
دێت و یەخەمان پێ ئەگرێ...

-٣-

بەدەم هاواری قەلی جارچییەوە،
ڕەیحانە کێوی و بنە دەوەنیش، شوێن پێیان هەڵگرت،
تا لەگەڵ دەستەی درەخت و مەل و پێشمەرگەکانا، بگەنەسەر گلکۆ...
هاوبەشی بکەن لە کۆستی تازە و ماتەمی نوێدا،
شەهیدەکانی ناوسنگی خاکیش ئەو ڕۆژە هەموو،
وەک پاسەوانی باخێکی بەردار
بە بەرگی سپی و ڕەنگاوڕەنگەوە
بەو دەورانەدا ئەڵقەیان بەستبوو،
هەمووشیان دەستی ڕێز و شکۆیان
بۆ شۆخە بووکی ئەخستە سەرسنگ...

بووکی شەرمن و میهرەبان،
مامزێکی شپرزە بوو،
لە ڕەوەکەی بەجێ مابوو،
بە چواردەورا چاویەگێڕا...
سەرسام مابوو...
- ئەوە هەموو براکانمن، بۆ پێشوازی و بەخێرهاتن،
کۆشی خاکیان جێهێشتووە؟
- ئەی ئەو پیرە نورانییەی وەک تیرۆژێک،


www.arsivakurdi.org

نە قۆشمەو پێکەنینەکەی...
ئاڵۆزانی پەلکی درەخت بە دەم گڤەی رەشەباوە،
هەندێ جاریم وەبیر دەێنێ
لە ناوەختا و زۆر ئاڵۆزاو، لەگەڵ گڤەی رەشەبادا،
دزە دزە و بە نهێنی،
خۆی لە عەبا ئالاندووە،
ئەیکا بە ماڵا و شپرزە،
ئەڵێ کارەکەم پیرۆزە...
هۆکچەکەی ناو زریان و بە ستەڵەکم:
هەرچی درنجی سەردەمە، خۆیان لێمان مەلاس داوە،
هەناسەی ئاگراویان،
پەلکەزێڕینەی ئومێدمان ئەسوتێنێ،
کاری پیرۆز...؟ بەم ناوەختە...؟
هەستە بڕۆین، ماڵە و ماڵ و دەرگا و دەرگا،
بابتگێرم،
لە چاو هەستی بەدکردار بە دوورت کەم...
هەستە بڕۆین... هەستە بڕۆین...

-٢-

رەشەبایە...
گڤەی تەمەن...
وەک خەزانی ساڵانەی پیرە درەختێ،
هەر بەرەو دواوە ئەمهێنێ،
بەرەو رۆژێ، ئۆف لەو رۆژە...
ریشەی عومرم بە یەکجاری لەبن دەرهات
بیست و چواری گەلاوێژە، ساڵیش ساڵی نەهاتییە...
ئەو شەفەقە
تازە هەتاو شانەی تیشکی ئەخستەسەر،
پەلک و لاجانی کێوەکان،
چناری باڵازراڤیش...
سەردەمان و عەیامێکە،
دەستەخۆشکی بەژنی هەڵچوی خەم و مەینەتی،
ئەم خاکەن...
ئەو بەیانییە ئەیانەویست کەزی سەوزو،
ماوییان دابهێنن .

لەپڕ شیریخەی باڵی قەلەرەش، سەرجەم؛
ئەو ناوەی هێنایە لەرزین...
پەڵە چناریش شپرزە بوون و، بە یەکا هاتن...

# کولیـــل

نەجیبە ئەحمەد «ژووان»

*بۆ (دلارامی هاوڕێ و جوانەمەرگ)*

وەک مەڕەکێوی تەنیا و بێ‌ئارام بیرە بیرەمە
هەرشەو لە جێیە، شارێ، ولاتێ، مەنزل گیرەمە*......

-١-
ڕەشەبایە گڤەی تەمەن،
وەکو خەزانی منالانەی پیرە درەختێ
لەم دیو پەنجەرەی ژوورەکەمەوە بەرەودوا ئەمبا...
بەرەو ڕۆژانێ کە ئاسۆی ژینمان شینێکی کاڵ بوو،
بێ‌گەرد، بێ‌پەلە، وەک چاوی قرژاڵ،
وەک کانیاوی روون،
بەلاْم کورت وەکو هەورەبروسکە و ڕۆژانی بەهار.

لوورەی ڕەشەبا بۆنی ستەم و تەنیایی لێ‌دێت،
بەرەو دوا ئەمبا...
ئەوا ئەیبینم. کچۆڵەیەکی هەژدە ساڵانە،
بە گەردەلوولیش ئەتریقێتەوە،
ژیان لەبیر و لە دیدی ئەوا:
گۆڕەپانێکە تا چاو هەتەرکا هەرپێکەنینە،
سەرپۆشی عومر، هێشتا لۆچ لۆچ و گرێ چن نەبووەو،
لە ساوگەردنی ئەم نەئالاْوە......
لە ناکاوێکا ئەیبینمەوە پێشمەرگەیە،
کۆڵ بە کۆڵەوە...
وەک پەڵە هەور بەسەر ترۆپک و پێدەشت و هەردا،
ئەسووڕێتەوە...
شانەکانیشی کە جاران یەگجار قیت ڕاوەستابوون،
ئێستا کە لەبەر کۆڵی گرانی ئەم میللەتەدا،
خوارە و داچەکاو،
سیمای، سووتای ئەم نیشتمانەی تیا بەدی ئەکرێ

سیمای سیمای جاران نیە
ڕەنگی ڕەنگی جاران نیە
نەبزەو تریقەی ماوە،

# ئەستێرە

لە شارباژێڕی سەختەوە،
لە بناری سەگرمەوە،
کە هەر چەند میلێ دوور دەبووم
لە دڵی کوردستانەوە،
هەموو شەوێ
چراخانی
ئاسمانی سەر سلەیمانی
کانیی شلوێنی دڵی ڕۆشن دەکردمەوە،
سەرئجم هەر لای ئەو ڕووناکاییە بوو،
هەتا چاوم ماندوو دەبوو،
هەتاکوو خەو دەیبردمەوە.
***
ئێستا دوورم
بینینی ئەو چراخانەی
ئاسمانی ئاستی شارەکەم
دوورە دەسترە لە مەحاڵ،
ئێستا دوورم
لەسەر پەنگر
گوێ قولاغم بۆ یەک هەواڵ،
نەدەوێرم
زەنگ بۆ ناسیاوێ لێبدەم،
نەدەوێرم
نامەیەکی چاو فرمێسکاوی بنێرم،
ئێستا شەوان
لەم وڵاتە سەر بە تەمومژ گیراوە،
هەر کاتێ ئاسمان ساماڵ بێ
هەموو ئازای لەشم چاوە،
نوقمی ئاسمانی بەرینم
چاوی ماندووم
دەگێرم بۆ ئەستێرەیەکی گەشاوە
تا لە ئاوێنەی چاویدا
سلەیمانی و
داروبەردی هەموو کوردستان ببینم.

١٦ی مارتی ١٩٩٠.

شلوێ: لیل
ئازا: ئەندام
دالیت: داربەست بۆ مێو

بەیار: زەویی نەکێڵراو

# ماڵئاوایـــــی

بەر لە ئەوەی
وەک ئەستێرەی کشاو لە چاوت بزر بم
مێوی دەست و پەنجەت بێنە
لە داڵێتی ئەستۆمەوەی بئاڵێنە،
کانیی ڕەوانی کوێستانی دەمت بێنە
باوەک ساوایەکی برسی
تێر بێمژم.
با بارانی قژی خاوت
میوانی زێدە ئازیزی
بەیاری سنگی تینووم بێ،
با پشکۆی گەشاوەی گۆنات
بۆ ڕێگەی دۆزەخ تێشووم بێ
با وەکوو دوو
ڕەشماری دڵدار و دڵبەر
لێک بئاڵێین،
با دوو بە دوو
بەستەی قەرەجانە بڵێین
دەرگای ناخت ئاواڵەکە
با ڕۆمانی خەمەکانت
بۆ دوایین جار
بخوێنمەوە،
بریا دوای ئەم کۆچە سەختەم
دەمتوانی ورشە بۆ چاوت
بهێنمەوە.
وا من دەڕۆم
بە چیای دژواری مەرگا هەڵدەگەڕێم،
ڕێی سامناکی ئەوین دەگرم،
شوێن هەنگاوی خۆر دەکەوم،
لەبەر بەهەشتی ئامێزت
لە دۆزەخی نامۆییدا
دەژیم، دەمرم.

٢٤ی ئەپریلی ١٩٩٠.



www.arsivakurdi.org

# چوار پارچە شیعر

حەمە سەعید حەسەن

## چاوەڕوانی

من درەختێکی ڕەوتەنیم،
خۆڵی ڕێگای ئاوارەییم لێنیشتووە
چاوەڕوانی بارانێکم بمشواتەوە.
لمی تینووی کەناری دەریای ئەوینم،
خۆری دووری داخی کردووم،
چاوەروانی ئەسپی شەپۆلێکی یاخیم
بە ئامێزی قووڵی دەریام شادکاتەوە،
چاوەروانم
کەی پەڕەسێلکەی گلێنەم،
کالانەی چاوم جێ دێلێ و
دەفڕێتەوە بۆ ئەو وڵاتە وێرانە،
گوێسەبانەی خانووی گوندێکی ڕاگوێزراو
دەکاتەوە بە هێلانە!

٨ی تەمموزی ١٩٩٠

## خەون

چەند ساڵێکە
مەلی تەریوی ژیانم
لەسەر لقی درەختێکی قژ تەزیوی
ئەوپەڕی باکووری دنیا هەڵکورماوە،
بەلاّم ڕەگی گوڵە هێرۆی خەوەکانم،
هێشتا شەوێ،
دەست و پەنجەی
لە داوێنی
زیندە هەڵپرووکاوەکەم بەرنەداوە.

٢٢ فیبریوەری ١٩٩١

کورد به ئاستی رامیاریی جیهانی‌یه‌وه، چونکه به بۆچوونی من گشت ولاتێکی جیهان له دوو لایه‌نی فره (له‌بیرکردنه‌وه‌دا) جیاواز پێک دێت:

١- ئۆرگانی ده‌وڵه‌ت.

٢- مرۆڤی ئاسایی.

جا ره‌نگاوی کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه له‌سه‌ر ئۆرگانه ده‌وڵه‌تی‌یه‌کان ئه‌وه بوو که ره‌خنه‌یان له رژێمی عێراق گرت له‌به‌ر ئه‌و کاره نامرۆڤانه‌ی که به‌رامبه‌ر به هاولاتیانی خۆی ئه‌نجامی داوه و بگره هه‌ندێ ده‌وڵه‌ت گومانداریيان نیشاندا که کاره‌که کاری عێراق بێت، و هه‌نده‌کی دی به درۆ و پروپاگه‌نده‌یه‌کی ئیمپریالیزمییان له خامه‌دا که بۆ زراندنی نێوی (رژێمی پێشکه‌وتووخوازی) عێراق وه‌دیدهێنراوه و ئه‌ڵبه‌ته ئاشکرایه که به‌رژه‌وه‌ندی ئابووریی فه‌رمانده‌ری ئه‌و جۆره ره‌وشته‌یه، بۆیه نالێم ئه‌و کاره‌ساته ته‌وژمێکی رامیاریی جیهانی به دۆزی رامیاریی کورد به‌خشی و ئه‌گه‌ر بهاتایه و (سه‌دام) ئه‌و که‌تنه‌ی (کوێتی) به‌سه‌رخۆیدا نه‌هێنایه ئۆرگانه رامیارییه به‌رزه‌ده‌سته‌کانی جیهان ئاماده بوون له‌به‌ر به‌رژه‌وه‌ندی خۆیان به ره‌خنه‌ی سه‌رزاره‌کی پرسڤی چه‌ندین کاره‌ساتی وه‌ک هه‌ڵه‌بجه بده‌نه‌وه، به‌لام ده‌توانم بلێم که رووداوی کوێت و گۆرانی ستراتیژیه‌تی هه‌ندێ له ولاتانی جیهانی به‌رزه‌ده‌ست بارستاییه‌کی رامیاریی به کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه به‌خشی.

کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه بۆ لایه‌نی دووه‌می ولاتانی جیهان، فره دڵته‌زێنتر بوو، چونکه وێنه‌ی هه‌ڵه‌بجه چاره‌نووسی مرۆڤی به مرۆڤ نیشاندا و مرۆڤی هاژاند، ئه‌و هاژاندنه‌ی (مرۆڤی ئاسایی) جیهان ره‌نگ و روویه‌کی ده‌رخشانی به دۆزی کورد دا و لێره‌دا ده‌توانم باسی دوو خاڵ بکه‌م.

١- مرۆڤی کۆتایی سه‌ده‌ی بیسته‌م و به تایبه‌تی مرۆڤی جیهانی یه‌که‌م به‌وه‌رگرتنی زانیاری له رێی ئۆرگانه زانیاری به‌خشه‌کانه‌وه و به‌تایبه‌تی له رێی ته‌له‌فزیۆنه‌وه راهاتووه.

کورد ساڵه‌های ساڵ باسی دۆز و گۆرانی (کێشه‌ی) کوردی کردووه به‌لام بێ‌وێنه‌ی به‌هێز بووه. واته بێ به‌ڵگه‌ی به‌هێز بووه. واته بێ ئه‌و زمانه بووه که مرۆڤی جیهانی یه‌که‌م تێی ده‌گات.

کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه ئه‌و وێنه و به‌ڵگه و زمانه‌ی به کوردی هه‌نده‌ران‌دا و ئه‌وانیش پۆزه‌تیڤانه ئه‌و به‌ڵگه‌یه‌یان به‌کار هاورد، کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه بووه پردێکی فره گرنگ بۆ راگه‌یاندنی کێشه‌ی نه‌ته‌وه‌که‌مان وه‌ک نه‌ته‌وه‌یه‌ک و گورزانی کوردستان وه‌ک خاکێک. به مرۆڤی جیهان نیشاندانی فیلمی هه‌ڵه‌بجه کێشه‌ی مرۆڤی کوردی به مرۆڤایه‌تی گه‌یاند و گشت هه‌نگاوه جیهانیه‌کانی که پاش ئه‌و کاره‌ساته روویان‌دا و رووده‌ده‌ن و له ئامێزگرتنی کێشه‌ی مرۆڤی کورد له‌لایه‌ن چه‌ندین رێکخراوی مرۆڤپه‌روه‌ری جیهانی‌یه‌وه ئه‌نجامی ئه‌و وێنه دڵته‌زێنه‌ی هه‌ڵه‌بجه بوون و ده‌بن.

٢- پارچه پارچه‌کردنی کوردستان و په‌یوه‌ندی هه‌ر پارچه‌یه‌ک به بنکه‌یه‌کی باژێرینی جیاوازه‌وه و داگیرکردنی کوردستان له‌لایه‌ن چه‌ندین کولتووری جیاوازه‌وه به شێوه‌یه‌کی ناراسته‌وخۆ کاریان له سیستمی بیر و سایکۆلۆژیه‌تی مرۆڤی کورد کردووه.

کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه و رووداني له دوابه‌شی سه‌ده‌ی بیسته‌مدا راچڵه‌کینێکی به‌هێزی به کوردی هه‌نده‌ران به‌خشی و پێی به‌سه‌ر گشت سنوور و باژێر و کولتووره‌کانا و ئه‌و دیواره‌ی که چه‌ندین ساڵه دوژمانی کورد به یارمه‌تی رۆژهه‌لات و رۆژئاوا بته‌وی ده‌که‌ن وێنه‌ی شه‌هیدانی چاوزه‌قی سه‌ر شه‌قامه‌کانی هه‌ڵه‌بجه‌شمان رووخاندنی و کوردی هه‌نده‌رانی پتر لێک نێزیک کرده‌وه.

ئه‌و نێزیک بوونه‌وه و ئه‌و هاوده‌نگییه‌ی رۆژی هه‌ڵه‌بجه تینێکی نوێی به دۆزی کورددا و روخسارێکی کاراتری به شێوه‌ی راگه‌یاندنی کێشه‌ی کورددا له جیهانی ده‌ره‌وه.

کاره‌ساتی هه‌ڵه‌بجه به ئازادیی نه‌گه‌یاندین به‌لام (هه‌رچه‌نده جێی درێغا و داخه) له روانگه‌ی ستراتیژیه‌تی کوردییه‌وه هه‌نگاوێکی گه‌وره‌ی به کورد نا به‌ره‌و ئازادی و ره‌نج و کۆشش و خوێنی گشت شه‌هیدانی نه‌ته‌وه‌ی کورد و کوردستانی له‌یه‌ک وێنه‌دا کۆکرده‌وه و پێشکه‌شی مێژووی مرۆڤایه‌تی کرد.



www.arsivakurdi.org

ولاّتانه و نرخی نەوت بەرز ناکاتەوە. ئەمە جگە لەوەی عێراق بازارێکی چاکی چەک فرۆشتنە بۆ ئەوان.

بۆ ئەوەی خۆشیان لە باسکردنی کوشتن و لەناوبردنی کورد بدزنەوە، ئەوە دەکەنە بەڵگە، کە مەسەلەی کورد لە عێراق و وڵاتانی دیکەی داگیرکەری کوردستاندا، مەسەلەیەکی ناوخۆیی‌یە، بەڵام بۆ فەلەستینییەکان مەسەلەیەکی ناوخۆیی نییە و لەبەر ئەوەی نەبادا ئەو فەلەستینییانە بە بەرد سەری سەربازی ئیسرائیلی بشکێنن ئامادەن لە کۆنفرانسێکی فراوانی لەمەڕ رۆژهەڵاتی ناوەراستدا مەسەلەکەیان باس بکەن و چارەسەری بۆ بدۆزنەوە. هەر بۆیە دەتوانم بڵێم کارەساتی هەڵەبجە کارێکی ئەوتۆی نەکردۆتە سەر بیروڕای گشتی سەبارەت بە کێشەی کورد. چونکە من پێم وایە بیروڕای گشتی یەکسانە بە بیروڕای وڵاتە زلهێزەکان و لە سەرووی هەموویانەوە ئەمریکا. ئەگەر هەندێ جاریش هۆیەکانی راگەیاندن باسی کارەساتی هەڵەبجەیان کردبێ، ئەوە لەبەر هۆی تایبەتی و بەرژەوەندی خودی ئەو وڵاتانە بووە. راستی ئەم قسەیە زیندووکردنەوە و زیندە باسکردنەوەی کارەساتی هەڵەبجە دەسەلمێنێ لە پاش داگیرکردنی کوێت لەلایەن عێراقەوە. تەنانەت لە وڵاتێکی وەکو سوێددا کە کۆمیتەیەکی تێدا دامەزراوە بە ناوی کۆمیتەی سوێدی بۆ پاراستنی مافەکانی مرۆڤی کورد، خۆپیشاندانی دووەم ساڵرۆژی هەڵەبجە پاش داگیرکردنی کوێت لە تەلەفزیۆندا پیشان درا.

جا ئەگەر بڵێم: کورد خۆی بۆ خۆی شتێک نەکات کەس هیچی بۆ ناکات. قسەیەکی تازەم نەکردووە.

هەر سەبارەت بە کارەساتی هەڵەبجە ناوی یەکێتی سۆڤیەت و وڵاتانی دیکەی بەرەی (سۆسیالیستی) ناهێنم، چونکە ئەوان هەمیشە لە ئاستی لەناوبردنی گەلی کورد خۆیان گێل و بێدەنگ کردووە. ئەمە لەوەی کە ئەمڕۆکە لە بواری پەیوەندی سەنگی نێونەتەوەیی‌دا قورساییەکی ئەوتۆیان نییە.

سولێمانە و کوشتاری قارنێ و قەڵاتان و کوشتنی رێبەرە پایە بەرزەکانی کورد هەموویان لە کاتی خۆیاندا هەڵەبجەیەک بوون.

بەڵام ئیتر لە سەرەتای سەدەی ٢١دا بۆ یەکەمین جار بەکارهێنانی چەکی کیمیایی لە جیهاندا لەسەر نەتەوەیەکی ژێردەست و خەڵکێکی هەژار و لێقەوماو، قەت لەبیر و ویژدانی مرۆڤایەتی ناچێتەوە.

هەڵەبجە بۆ دۆست و دوژمنی کورد و مرۆڤایەتی دووپاتکردەوە کە دوژمنانی کورد، سەدام حوسێن و دامودەزگایەکەی هەر دوژمنی پێشمەرگە و هێزە سیاسیە نیشتمانپەروەرەکان نین، بەڵکو دوژمنی هەموو کوردێکن کە لەسەر خاکی کوردستان دەژین و بە کوردی قسە دەکەن.

کارەساتی هەڵەبجە پیشانی‌دا کە دوژمنانی کورد دەربەستی هیچ چەشنە یاسا و دیارکراوێکی نێونەتەوەیی نین و بۆ سەرکوتکردنی نەتەوەکەمان لە هەموو چەشنە ناپیاوێیەک سڵ ناکەنەوە.

دیارە و بە بڕوای من، کورد نەیتوانی بە باشی لەو کارەساتە کەڵک وەرگرێ و بیروڕای گشتی جیهانی بۆ مەسەلەی کورد و چارەڕەشی ئەو نەتەوەیە رابکێشێ. بە تایبەتی ئەو کورد و رێکخراوانەی کە سەر بە مۆسکۆ و لایەنگرانی بوون. بە راستی بە لاسایی‌کردنەوەی سیاسەتی سۆڤیەت و دەوروبەری، ئەو کارەساتەیان دەپشت گوێ‌دا.

بەڵام ئیتر ناکرێ ئەوە لەبیر بەرینەوە، کە بۆ جیهان دەرکەوت کە کورد سەرکوت دەکرێ و دوژمنی هەرەشەی نەمان و تواندنەوەی لێدەکات.

لەزۆر وڵاتی دەرەوە رێکخراو و کورد و کۆمەڵەی مرۆڤدۆست بۆ پشتیوانی مەسەلەی کورد پێکهاتن ئێستاش هەر درێژەی هەیە. بە تایبەتی هێرشی عێراق بۆسەر کوێت و شکانی لە مەیدانی شەڕدا ئەو جارەش نیشانی‌دا کە دوژمنانی کورد، دوژمنانی ئازادی و هەموو یاسا نێونەتەوەیی‌یەکانن.

## کرمانج

دیارە کارەساتی هەڵەبجە، دڵتەزێن بوو و ویژدانی هەموو کەسێکی مرۆڤ دۆستی وەلەرز خست. بەڵام دەبێ ئەوە بزانین، کە ئەو کارە ناحەزانەی دوژمن نە یەکەم جار و نە دواجاریش دەبێت. من پێم وایە دەرسیمی شەهید و سەرای

## ئەنداز حەوێزی:

ئەز نالێم کە کارەساتی هەڵەبجە بەو ئاستە رامیارییە ئارەزووکراوەی گەیاندین کە باش وەدی‌نەهاتنی بەندەکانی کۆنگرەی لۆزان کورد هەوڵی بۆ داوە، واتە گەیاندنی دۆزی



www.arsivakurdi.org

## مامۆستا ڕەحیم

ئەوەی ڕاستی بێ ڕووداوی هەڵەبجە کاریگەریەکی زۆری لەسەر بیروڕای گشتی جیهانی، سەبارەت بەو بارە نالەبارەی کورد تێیدا دەژی هەبووە. دەتوانم بڵێم بە ئەندازەی جمهوری مهاباد کاریگەری هەبووە. ئەگەرچی تاکو ئێستا خەڵکێکی زۆر ئاوارە و زیندانی کراوە و لەژێر ئەشکەنجەدا گیانیان بەخت کردووە. نموونەی وەک قەلاتان و قارنێ و (٥٩) لاوی مهابادیش هەبووە. بەلام هیچکام لەم ڕووداوە دڵتەزێنانە بە ئەندازەی کوشتاری بە کۆمەڵی شاری هەڵەبجە، بە هۆی چەکی کیمیایی‌یەوە دڵ و ویژدانی ئینسانەکانی وەژان نەخست.

## کاک کەریم:

پێم وایە ڕووداوی هەڵەبجە، بۆ گەلی کورد، ڕووداوێکی لەبیر نەچوویە. هەرچەند بە دەیان و بە سەدان جار لە مێژووی کورد دا، ڕووداوی گورچکبڕ هاتۆتەپێش. بەلام هیچکاتێک کوشتاری بە کۆمەڵی شاری هەڵەبجە و کۆرپەکانی لەبیر ناکرێن و ئەم شێوەی کوشتارە نیشانەی بێ دەسەلاتی و بێ کەسی کورد دەگەیەنێ. ئیمڕۆ دەمانەوێ لەم خۆپیشاندانەدا دەنگی لاوازیمان، کە لە گەرووی بێ دەسەلاتیمانەوە دێتەر دەر، بە گوێی ئینسانە خاوەن ویژدانەکانی سەر ئەم جیهانە ڕابگەیەنین. لەم دنیایەدا ئینسانی باش زۆرن، کە ڕووداوێکی وا دڵتەزێن کار لە ویژدانیان دەکا. دەکرێ بڵێم ڕووداوی هەڵەبجە، تابلۆیەکی دیکە بوو، لە تراژیدی کورد کە بندەستی کوردی تێدا بە جیهان نیشان درا.

## پرشنگ میراو

هەڵەبجە- هیرۆشیمای دووەم- تاوانێکی گەورەیە و فاشیستەکانی بەغدا لە ١٦ی ئاداری ١٩٨٨ پێی هەڵسان. بە جارێ (٥) هەزار کوردی بێ‌تاوانی تێدا شەهید بوو و بە هەزارانیش بریندار و دەربەدەر و ماڵوێران بوون.

ئەگەرچی وڵاتانی جیهان پڕ بە پێستی خۆی لێی نەدوان، بەلام کەم یان زۆر هەڵەبجە دەنگی کوردی بە جیهان گەیاند.

ئەمەی ئیمڕۆ لە کوردستاندا دەیبینین بەرهەمی تۆڵەی خوێنی ئەو هەموو شەهیدانەیە، داری ڕزگاری و سەربەخۆیی دەهێننە بەرهەم و پێی دەگەیێن.

## محەمەد گۆمەیی

لەسەرەتادا دەبێ بڵێم، کارەساتی هەڵەبجە، یەکەم کارەسات نییە، کە بەسەر گەلی کورد هاتووە. لە مێژووی دوور و نزیکی کورد دا، بە سەدان جار کارەساتی وا دڵتەزێن ڕووی داوە، بەلام گرنگی لێرەدایە. ئەم ڕووداوە دڵتەزێنەی هەڵەبجە، ڕک و کینەی دوژمنە ڕەگەزپەرستەکانی کوردی، بۆ گشت جیهان ڕوونکردەوە. هەرچەند کارەساتەکانی دیکەی کوردستان، لە ئاستی بیروڕای جیهانیدا بوون بە قوربانی. بەلام ئەم کارەساتە کەمێک جیاوازی لەگەڵ قوربانییەکانی پێشوو هەیە. دەکرێ بڵێم ئەوە دوو ساڵە لە دەرەوەی وڵات دەژیم. ئەوەی لەو ماوەیەدا بینیومە و بیستومە، ئەم کارەساتە کاریگەرییەکی پتەوی لەسەر ویژدانی خاوێنی ئەو کەسانە هەبووە کە مرۆڤانە بیردەکەنەوە. ئەو مرۆڤ دۆستانە توانیویانە سەبارەت بە حەقخوازی کوردی چەوساوە بۆ هاوولاتیانی خۆیان بدوێن و داوا ڕەواکانی ئێمەیان بۆ ڕوون بکەنەوە. بەلام ئەوەندەشمان لەبیر نەچێ! ئەبێت ئەو دەوڵەتانەی کە لە سوودی خۆیان دەگەڕێن و یارمەتی ڕژێمە چەوسێنەرەکانی کوردستان دەدەن، لە گەلانی ئازادیخواز جیابکەینەوە.

## فەهمی کاکەیی

حەق وابوو ئەم پرسیارە بەم شێوەیە بایە: تا چ ڕادەیەک کارەساتی هەڵەبجە کاری کردە سەر پەیوەندییە ئابووریەکانی وڵاتانی لەگەڵ عێراقدا هاوپەیوەند؟

ئەگەر لەهەر کێشە و گرفتێکدا چەندە بچوک بێت یان گەورە مەسەلەی ئابووری ڕەچاو بکەین، ئەودەم ڕەنگدانەوەی ئەو کێشەیە سەبارەت بە ڕای گشتی بۆمان ڕوون دەبێتەوە. گومانی تێدا نییە کە کوردستان کوێت نییە بۆ ئەمریکا و وڵاتانی ڕۆژئاوا، هەربۆیە نە تەنیا هەڵەبجە؛ بگرە هەموو کوردستانیش لەگەڵ زەویدا تەخت بکرێت، بە خراپە کار ناکاتە سەر باری ئابووری ئەو

# لە یادی هەڵەبجەدا

ئامادەکردنی
سیامەندی شێخ ئاغایایی




لە ڕۆژی ١٩٩١/٣/١٦دا خۆپیشاندانێک لەلایەن خوشک و برایانی کورد و سوێدی‌یەوە، بە بۆنەی سێیەمین ساڵڕۆژی تێپەڕبوون بەسەر ڕووداوە دڵتەزێنەکەی هەڵەبجەدا بە بەشداری نزیک لە سێ هەزار کەس، لە شاری ستۆکهۆلم پێکهات.

خۆپیشاندەران زووتر لە کاتی دیاریکراو لە باخچەی پاشادا کۆبوونەوە، خۆپیشانەران بە دروشمی «بروخێ رژێمی دیکتاتۆری سەدام» و «سەدام خوێنڕێژ و پیاوکوژە و نابود بن داگیرکەرانی دیکتاتۆری کوردستان» بەرەو سەفارەتی عێراق وەڕێ کەوتن.

خۆپیشاندەران لەپێش سەفارەتی عێراق ڕق و بێزاری خۆیان دەربری و ئاڵای عێراقیان ئاگر تێبەردا و دەستەیەکی دلبریندار و خزم و کەس کوژراو، ویستیان سەفارەتی عێراق داگیر بکەن. بەڵام لەبەر ڕێزگرتن لە ڕژێمی سوێد، لە هەڵوێستەکەیان پەشیمان بوونەوە. لە کوتایی‌دا خۆپیشاندەرەکان بە سروودی نەتەوایەتی «ئەی ڕەقیب» بڵاوەیان بە خۆپیشاندانەکە هێنا.

پەیامنێری (بەربانگ)، لە کاتی خۆپیشاندانەکا، لەگەڵ جەند خوشک و برای کورد، سەبارەت بە بەکارهێنانی چەکی کیمیایی لەلایەن ڕژێمی عێراقەوە، لە دژی دانیشتوانی شاری هەڵەبجە، لە مانگی مارسی ١٩٨٨دا، پەیوەندی گرت و پرسیاری: کاریگەری ڕووداوی هەڵەبجە، لەسەر بیروڕای گشتی، سەبارەت بە کێشەی کورد لێ دووپاتکردنەوە.

وەڵامدەران بە شێوەی خوارەوە بیروڕای خۆیان دەربری:

٢٥ نیسان: سەرۆکی دەستەی نوێنەرایەتی بەرەی کوردستانی عێراق، جەلال تالەبانی لەگفتوگۆی لەگەڵ سەدامدا رازیە و بە پۆزێتیڤی دادەنێ و دەڵێ:«ئێمە بۆ عێراقێکی دیموکراتی و کوردستانێکی ئۆتۆنۆمی تێدەکۆشین. ئێمە لە عێراقدا دەوڵەتێکی سەربەخۆ ناخوازین. ئۆتۆنۆمی ئێمە لەچوارچێوەی پەیمانی ١١ ئاداری ١٩٧٠ دایە و ئێمە لەسەر پرنسیپی بنگەیی رێکەوتووین. دەبێ لە ئێستاوە پەنابەرانی کورد بگەڕێنەوە ماڵەکانیان».

سەعدون حەمادی بە ناوی حکومەتی عێراقەوە گوتی:«جەلال تالەبانی راست دەکا... لە عێراقدا لاپەڕەیەکی نوێ هەڵدەدرێتەوە،ئەویش دیموکراسی‌یە».

– لەندەن:(مەلبەندی کوردی)- سەربەست ئارام دەڵێ:« ئێمە بڕوامان بەسەدام نییە، چونکە ئەوە ٢٣ ساڵە کورد ئازار لە دەست سەدام دەکێشن، پەیمان لەگەڵ ئەو ناکرێ.».

– هوشیار زێباری: «شتێکی باشە، بەلام سەدام جێگای بڕوا نییە. سەدام تەنیا ماوە و دەیەوێ مناوەرەیەک بکا.»

٢٦ نیسان: جەلال تالەبانی لە کوردستاندا رایگەیاند:«هێشتا ناکۆکی هەیە لەنێوان بەرە و حکومەتدا. بۆ رێکەوتن گەلێک دوورین، تەنیا لەسەر چەند پرنسیپێک رێکەوتووین.».

– تەلەفزیۆنی CNN رایگەیاند کە لە عێراقدا ٧٠ هەزار سەربازی یەمەنی و سودانی و فەلەستینی هەیە. ئەوان لە دژی کورد و شیعە بە چالاکی شەڕیان کردووە.

– رۆژنامەکانی ئەورووپا و سوێدی لەسەر گفتوگۆی نێوان کورد و سەدام دواوون و هەموویان لەو بڕوایەن کە باوەڕ بە رژێمی سەدام ناکرێ. هەموویان وێنەی (راموسانی) سەدام و جەلالیان بلاوکردۆتەوە. وێنەی ئەو رامۆسان و یەکتر لە ئامێز گرتنەیان پێ سەیر دێ؟ و دەنووسن دیسان سەدام دەیەوێ کورد فریوبدا. جێی پێ تەنگ بووە، بۆیە پێویستی بە کورد هەیە. بەلام پاش ماوەیەک دیسان دەست بە قڕکردنی کورد دەکاتەوە.

٢٧ نیسان: پۆلیس و لەشکری عێراق زاخۆیان بەجێهێشت، بەلام خەڵکی دەبێژن کە رژێم هەندێ سیخوری تیا بەجێهێشتووە».

بەپێی دەنگوباسی ئەمرۆ ژیان لە زاخۆدا لەگەڕانەوە دایە بۆ سەر باری ئاسایی خۆی. بەلام ئائێستا کارەبا و ئاو لەشاردا نییە. دوکانەکان کراونەتەوە، بەلام خواردەمەنی و شتومەک کەمە.

– ئەمرۆ سەرۆکی لەشکری ئەمریکا لە ناوچەکەدا، بانگی بەرپرسیاری پێشمەرگەی کردۆتە زاخۆ و لەگەڵیان دواوە لە بارەی ئەوەی کە چالاکی لە ناوچەکەدا نەکەن لەبەر سەلامەتی ئاوارەکان.

– ئەمرۆ سەرۆک کۆماری ئێران رەفسنجانی لەگەڵ حافز ئەسەد لە شام کۆبووەتەوە و لەسەر مەسەلەی کورد و عێراق گفتوگۆیان کردووە. دوایی کۆبوونەوەکە، رەفسنجانی و ئەسەد رایانگەیاند کە: هەردووکیان پارچەبوونی عێراق ناخوازن».

– فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوێد لەگەڵ کۆمیتەی سوێدی بۆ مافی مرۆڤی کورد و کۆمیتەی رێکخراوە سیاسیەکان کۆبوونەوەیەکیان لە باخچەی پاشادا کرد. سەدان کەس بەشداری کۆبوونەوەکەیان کرد.

– نوێنەرانی رێکخراوی منداڵان بپارێزە و خاجی سووری سوێد و رۆژنامەنووسەکانی سوێد لە کۆبوونەوەکەدا لەسەر باری کورد دوان و پشتگیری خۆیان بۆ کورد نیشاندا.

– هونەرمەندانی کورد و چەند سرودێکی شۆرشگێڕیان پێشکەش بە بەشدارانی کۆبوونەوە کرد. هەروەها چەند بەیانێک لەوێدا بڵاوکرایەوە.

٢٨ نیسان: وەزیرەکانی دەرەوەی بازاری هاوبەشی ئەورووپایی بەیەک دەنگ بڕیارێکیان وەرگرت لەبارەی رەوانەکردنی هێزی پۆلیس لەلایەن کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان لە شوێنی لەشکری هاوپەیمانەکان بۆ کوردستان.

– ئەگەر بەغدا بە گوێرەی بڕیاری ژمارە ٦٨٨ی رێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان، هێزی پۆلیس قەبوول نەکا یاخود کێشە دەرخا چۆن دەبێ؟

بە گوێرەی دەنگوباس، رژێمی بەغدا نەرمی پیشان داوە، بەرامبەر پەنابەرانی کورد و گەڕانەوەیان.

– هێزی هاوپەیمانەکان سنووری ناوچەی ئەمنی فراوان دەکەن.

– پێشمەرگە رێگا لە گەڕانەوەی پەنابەران دەگرن.

– هێزەکانی عێراق هێدی هێدی ناوچەی دیاریکراو بۆ پەنابەران بەجێ دەهێڵن.

– ئەمریکا و ئینگلستان هەندێ شەریکەتی چەکسازی سەدامیان لە ئوردن ئاشکرا کردووە.



Foto: Gunilla Granström

سەدام بە ناوی خواردەمەنییەوە چەند شەریکەتی ئوردونی دامەزراندوە. لەسەر داخوازی ئەو شەریکەتانە لە چین و کۆریا کەرستەی چەک دەکڕێ بۆ ئوردون دێت. چونکە عێراق ئابلوقەی رێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکانی لەسەررە و ناتوانی راستەوخۆ چەک بکڕێ و بفرۆشێ.

www.arsivakurdi.org

– له ئێران و لەندەن نوێنەرانی شیعەکان هێرشیان بردۆتە سەر گفتوگۆی کورد و رژێم و ئاشکرایان کردوە:( که ئەوان وەک ئۆپۆزیسیۆنی عێراقی دووجار لەگەڵ کورد دانیشتوون و دیاریان کردووە، کە لەگەڵ سەدام دانیشتن نابێ. پەیمان نابێ. چونکە مرۆڤ ناتوانێ بروا بە سەدام بکا. ئێستا سەرۆکی کوردان چوونەتە بەغدا لەگەڵ سەدام رونیشن. سەدام لە تەنگاویدایە. بۆیە دەیەوێ لەگەڵ کورد گفتوگۆ بکا و رێک‌بکەوێ تاگرانی شەر بخاتە سەر شیعەکان. کاتی راپەرینی شیعەکانی دامرکاند، دیسان دەگەرێتەوە سەر کورد).

ئەمرۆ چەند رۆژە جەلال تالەبانی و نوێنەرانی بەرە لە بەغدا لەگەڵ رژێمدا گفتوگۆ دەکەن. ئەمرۆ چاویان بە سەدام کەوت. بەڵام هیچ ئاگاداریەک لەم رووەوەدا نییە. واپێ دەچێت، کورد دەیانەوێ پەیمانی ١١ ئاداری ١٩٧٠ فراوان تر بکەن و کەرکووکیش بخەنە چوارچێوەی ئۆتۆنۆمییەوە.

٢٣ نیسان: هەرچەند ئەمریکا کامپ ئامادە دەکا و داوا لە کوردەکان دەکا بگەرێنەوە، ئاسایشیان مسۆگەرە، بەڵام کوردەکان بروا ناکەن، چونکە هەندێ پۆلیسی عێراق لە زاخۆ دان. کوردەکان دەڵێن ئەوانە پۆلیس نین، بەڵکو سەربازی سەدام حوسێنن، جلی پۆلیسیان لەبەر کردووە.

– عێراق بە نامەیەکی رەسمی داخوازی لە کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان کرد کە لەشکری ئەمریکا لە کوردستان دەربچێ و بەزووترین کاتیش لە شوێنی ئەوان هێزەکانی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان جێی خۆیان بگرن.

– سەفارەتی سۆڤیەت لە ئەنکەرا، نامەیەکی‌دا رۆژنامەی جمهوریەت، تێدا **رایگەیاندکە ئەوان دژی دەست تێوەردانی ئەمریکا رادەوەستن. ئەمریکا دەبێ لەشکری خۆی لە عێراق بکێشێتەوە و هێزی کۆمەڵە نەتەوە یەکگرتووەکان بێنە جێگای‌ئەوان.**

– دەستەی نوێنەرایەتی کورد لە بەغدا درێژە بە گفتوگۆیان دەدەن. بەپێی بەرپرسیاری بەرە لە لەندەن، گفتوگۆ بەرەوپێش دەروا. هەروەها نوێنەری بەرە رایگەیاند کە «خەباتی چەکداری چارەسەری مەسەلەی وان ناکا».

– هەندێ دەزگای ئەورووپا رایانگەیاندوە کە بەرامبەر سەلامەتی دەستەی نوێنەرانی کورد لە بەغدا، سەدام چوار پیاوی گرنگی خۆی لە هەولێر داناوە وەک رەهین.

– وەزیری دەرەوەی ئەمریکا بۆ چارەسەرکردنی ئاشتییانەی کێشەی عارەب و ئیسرائیل، گەرایەوە رۆژهەڵاتی نێوەراست.

– هیلمۆت کۆل بریاری دا کە هێزی لەشکری رەوانە بکا بۆ یارمەتی پەنابەرانی کورد لە ئێران.

٢٤ نیسان: دەستەی کورد بە سەرۆکایەتی جەلال تالەبانی لە بەغدا رایگەیاندوە کە لەگەڵ سەدام لەسەر چەند پرنسیپێک رێکەوتوون. هەروەها تەلەفزیۆن چاوپێکەوتنی دەستەی نوێنەرانی بەرە و سەدام حوسێن و ماچ و مووچەکەیان بە جیهان پیشاندا. جەلال تالەبانی لە چاوپێکەوتنێکی رۆژنامەنووسی لەبەغدا، رایگەیاند کە لەگەڵ سەدام حوسێندا لەسەر زۆر لایەنی گفتوگۆکەیان رێکەوتووە. لەوانە: دامەزراندنی رژێمێکی دیموکراتی، ئازادی چاپەمەنی، ئازادی فرە پارتی و ئۆتۆنۆمی. لەسەر ئەم خالە بنەرەتییانە گفتوگۆ بەردەوام دەبێت. لە کۆتاییدا پەیمانەکە لەلایەن مەسعود بارزانی‌یەوە مۆر دەکرێ.

– نوێنەری عێراق لە کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان عەبدولئەمیر ئەنباری گوتی:« سنوور و چوارچێوەی ئۆتۆنۆمی زۆر فرە و دیموکراتیە، وەک سەربەخۆیی وایە.) لە لایەکی ترەوە کوردە پەنابەرەکان نارازییان لەو پەیمانە نیشاندا.

– سەرۆکی ناتۆ گوتی: «ئامانجی ئێمە رزگارکردنی مرۆڤە. ئێمە کاری خۆمان درێژەپێدەدەین تا هێزی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان دەگەنە ئێرە.»

– پەنابەران بروا بە سەدام ناکەن و دەڵێن: «لە جیاتی ئەوەی خۆبدەینە دەست سەدام، لەو چیایانە بمرین باشترە.»

– وەزیری دەرەوەی تورکیا م. سونگار دیاری کرد کە تورکیا پێشنیاری ئەمریکای کردووە کە ئەو پەنابەرانەی لە سەرووی هێلی ٣٦ هاتۆنەتە تورکیا بگەرێنەوە شوێنەکانی خۆمان. ئەوانی تریش بۆ کەمپەکان برۆن. ئەمریکا ئەو پێشنیارەی بەجێ دێت و لەگەڵ تورکیا رێکەوت.

– ماوەیەک لەمەوبەر وەزیری دەرەوەی عێراق تاریق عەزیز دەیخواست سەر لە تورکیا بدات، بەڵام تورکیا رەزامەندی پیشان نەدەدا، بەڵام ئێستا واپێ دەچێ تورکیا ئامادەبێت بۆ پێشوازی تاریق عەزیز، بەڵام دەیەوێ بیخاتە دوای هاتنی هاشمی رەفسنجانی. وا دەردەکەوێ هاتنی رەفسنجانی بۆ تورکیا پەیوەندی بە مەسەلەی کوردەوە هەیە. تورکیا نیازی هەیە لەگەڵ ئێران و عێراق و سوریا کۆبوونەوەیەک پێکبهێنێ بۆ بەستنی پەیمانێک لە نێوخۆیاندا.

– ئەمرۆ ئەنجومەنی ئەورووپا دەربارەی ژێنوسایدی کورد لەلایەن عێراقەوە بە توندی نارەزایی دەربری. هەروەها سوپاسی ئێران و تورکیای کرد کە هالیکاری پەنابەرانی کورد دەکەن. هەروەها رەخنەی لە سیاسەتی تورکیا گرت دەرهەق بە پەنابەرە کوردەکان، چونکە تورکیا ئەو کەسانەی لە وڵاتانی ئەورووپا وەدین بە پەنابەر وەری دەگرێ، بەڵام ئەوانەی لە وڵاتانی ئاسیا و ئەفریقا دێن بە پەنابەر وەرناگرێ. ئەنجومەنی ناوبراو داوای کرد کە مەسەلەی ئۆتۆنۆمی کورد لە تورکیاشدا بێتە رۆژەڤ و قسەی لەسەر بکرێ. بەڵام تورکیا مەسەلەی ئۆتۆنۆمی لە رۆژەڤ دەرخست.

www.arsivakurdi.org

– ئەڵمانیا پشتگیری بڕیاری بووشی کرد.
– تورکیا بڕیاری بووشی لە شوێنی خۆی زانی.
– بازاڕی هاوبەش بڕیاری‌دا، دەستەیەک ڕەوانەی سنووری عێراق و تورکیا بکات.
– وەزیری کاروباری لۆکسمبرگ لە بانگەوازێکدا داوای کرد: هەموو دەوڵەتەکان پێویستە یارمەتی کوردەکانی کوردستانی عێراق بدەن».

١٨ نیسان: پەرلەمانی ئەورووپا بڕیاری‌دا کە پێویستە مافی کولتووری کورد لەهەر چوار پارچەی کوردستان دابین بکرێ. پێویستە تورکیا، ئێران، عێراق، سووریا لەگەڵ کورد لەم ڕووەوە دانیشن. لە کۆنفرانسی ڕۆژهەڵاتی نێوەڕاستدا، دەبێ مەسەلەی کورد بێتە ڕۆژەڤی.
– یارمەتی دەری وەزیری دەرەوەی ئینگلستان سەری لە دیاربەکردا، بۆ ئەوەی بزانێ پێویستی پەنابەرانی کورد چییە.
– تەلەفزیۆنی سوێد، کەنالی (٢) دادگایەکی بۆ موحاکەمەکردنی سەدام حوسێن ڕێکخست.

١٩ نیسان: ڕۆژنامەنووسی کورد تاهیر هەورامی کە لە کاتی ڕاپەڕینەکەی کوردستانی عێراق لە ناوچەی بادینان بوو، فیلم و وێنەی خەڵکی ڕاپەڕیوی گرتبوو، لە تەلەفزیۆنی سوێد بەشێک لە فیلمەکە نیشان درا.
– فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوێد، بانگەوازێکی بۆ ڕێکخراو و کەسان و کۆمەڵەکانی کورد بڵاوکردەوە و داوای لێکردن کە بە چالاکی بەشداری هەموو جۆرە خەباتێکی پشتگیری بکەن و ڕێکی بخەن.
٢٠ نیسان: نوێنەرانی بەرەی کوردستان لە بەغدان:
بەپێی ڕاگەیاندنی بەرپرسیاری پارتی دیموکراتی کوردستان لە شام و لەندەنەوە، دەستەی نوێنەرایەتی بەرەی کوردستانی عێراق لەسەر داخوازی حکومەتی عێراق و سەدام حوسێن بۆ گفتوگۆ ڕوویان کردۆتە بەغدا. دەستەیەکە بە سەرۆکایەتی **جەلال تاڵەبانی**- سکرتێری گشتی یەکێتی نیشتمانی کوردستان **سامی عەبدولڕەحمان** سکرتێری پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان، **ڕەسول مامەند** سکرتێری پارتی سۆسیالیستی کوردستان و **نێچیروان** بارزانی ئەندامی سەرکردایەتی پارتی دیموکراتی کوردستان بەشداری گفتوگۆیەکەیان کرد.
بە گوێرەی دەنگوباسەکە، دەستەیەکە گفتوگۆ لەگەڵ حکومەتی عێراق دەکەن لە بارەی چارەسەرکردنی کێشەی کورد لەسەر بناغەی بەیاننامەی ئاداری ١٩٧٠.
– مردن و پەریشانی پەنابەرانی کورد لە سنووری تورکیا و ئێران بەردەوامە.
– لەشکری ئەمریکا گەیشتۆتە کوردستان بۆ یارمەتی کوردە ئاوارەکان.
– تورکیا پرۆتێستی بڕیاری پەرلەمانی ئەورووپای کرد. وەک دەزانرێ پەرلەمانی ئەورووپا دوو بڕیاری دەربارەی کورد وەرگرتووە، یەک: **دەبێ مافی کولتووری کورد لە هەموو پارچەکانی کوردستان دابین بکرێ. دووەم: مەسەلەی کورد بخرێتە ڕۆژەڤی کۆنفرانسی ڕۆژهەڵاتی نێوەڕاستەوە.**
– تورکیا ڕایگەیاند: لە قانوونی ئێمەدا، هەڵبژاردن ئازادە. هەموو وەک یەک مافیان هەیە. بەڵام شوێنی ئەوانەی دەیانەوێ وڵاتمان بەش بکەن نییە. وڵاتی ئێمە یەکە و بەش ناکرێ. ئێمە دەستی یارمەتیمان بۆ هەزاران پەنابەر ڕاکێشاوە.
– فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوێد، کۆبوونەوەیەکی لە باخچەی شا (کونگ ترێدس گۆردن) بۆ پشتگیری پەنابەرانی کورد ڕێکخست. نزیکەی ٥٠٠ کەس بەشداری تێداکرد. داوای یارمەتی لە حکومەت و خەڵکی سوێد کرا بۆ یارمەتی پەنابەران. هەندێک لە بەشداربووەکانی کۆبوونەوەکە دژی چوونی دەستەی نوێنەرایەتی کورد بۆ بەغدا پرۆتێستیان کرد و بانگیان دەکرد: (جەلال، مەسعود لەگەڵ سەدامی فاشیست دامەنیشن).

٢١ نیسان: لەشکری تورک تەقەیان لە پەنابەرانی کورد کردەوە و، یەکێکیان کوشتەوە و ٥ کەسیشیان بریندار کردوە.
– لەشکری ئەمریکا ڕایگەیاند کە، کوردەکان بڕوا بە سەدام ناکەن و بۆ شوێنەکانیان ناگەڕێنەوە.
– عەلی ئەکبەر ولایەتی، وەزیری دەرەوەی ئێران، دژی سازکردنی کامپ لە نزیک سنووری ئێران- عێراق قسەی کرد و دژی پارچە کردنی عێراق دوا.
– بەپێی ڕاگەیاندنی ئاژانسەکان، شیعەکانی خوارووی دەستیان کردۆتە شەڕی پارتیزانی دژی لەشکری عێراق، بەڵام کوردەکان لەگەڵ ڕژێمی بەغدا گفتوگۆ دەکەن.

٢٢ نیسان: ئەمریکا و هاوپەیمانەکانی شوێنی کامپەکانیان دیارکرد. ٥ کلم بۆ ناوەوەی عێراق و ٢ کم لە سەرەوەی زاخۆ.
– هەلیکۆپتەری ئەمریکا ڕۆژی ٤٠ جار هاتووچۆی سلۆپی دەکا بۆ ڕاگوێزانی شتومەک بۆ دامەزراندنی کامپەکان.
– ٦٠ ڕۆژنامەنووس بە هەلیکۆپتەر ڕوویانکردە شوێنی کامپەکان.
– بە گوێرەی دەنگوباسی BBC پۆلیسەکانی عێراق زاخۆیان بەجێهێشت. زاخۆ پێش شەڕ ژمارەی ٢٠٠ هەزار کەس بوو، ئێستا تەنیا ١٠ هەزار کەسی تێدایە. (ئەوانیش عارەب و ئاسووری و تورکمانن).
– دیک چینی وەزیری بەرگری ئەمریکا ڕایگەیاند کە لەشکری عێراق هاریکاری لەشکری ئەمریکا دەکەن و ئیمکانیاتیان بۆ پێک دەهێنن.
– بەپێی BBC دەستەیەک لە نوێنەرانی کورد چاوپێکەوتنیان لەگەڵ بەرپرسیارانی وەزارەتی دەرەوەی ئەمریکا و ئینگلیز لە بارەی مەسەلەی کوردەوە کردووە.

www.arsivakurd.org

هەموویان داوای ئەوەیان کرد کە زۆرتر یارمەتی بە پەنابەران بکرێت،و مەسەلەی کورد وەک مەسەلەیەکی نەتەوەیی و سیاسی باسی لێوە بکرێت. دەبێ بێتە رۆژەڤی ئۆرگانێکی نێونەتەوەییەوە و کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکانیش لەو رووەوە دەبێ دەست پێشخەری بکات.

لە کۆبوونەوەکەدا هونەرمەند ناسری رەزازی چەند سروودێکی شۆرشگێری پێشکەش کرد. شێرکۆ بێکەسی شاعیریش چەند هەڵبەستێکی خوێندەوە.

١٥ نیسان: لە ئەنجومەنی گشتی ئینگلستان گفتوگۆ لەسەر ناوچەی ئەمنی کرا و گوتیان: ئەو ناوچە ئەمنیە، بەو واتەیە نییە، کە ئێمە دەمانەوێ کوردستانێکی سەربەخۆ دروست بکەین یا بخوازین. ئەوە بۆ پاراستنی پەنابەرەکانە. ئێمە یەکێتی خاکی عێراق دەخوازین. بۆیە ئێمە پێشنیاری خۆمان بۆ ناوچەی ئەمنی بۆ پەنابەران دەخەینە بەردەم کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان. ئەگەر سەدام چ جار هێرش بکاتە سەر هەرێمەکە، پێویستە هێز دژی بەکار بهێنرێت.

وەزیرەکانی دەرەوەی بازاری هاوبەشی ئەوروپا پشتگیریان لە پێشنیاری ئینگلستان کرد.

- ئەڵمانیا رایگەیاند کە دەبێ سەدام بدرێتە دادگای نێونەتەوەیی بە تاوانی پێشلکردنی مافی مرۆڤ. سەدام گوناهباری هەڵگیرسێنەری شەرە. فەرەنسا و بەلجیکا و ئینگلستان پشتگیریان لە پێشنیاری ئەڵمانیا کرد.

- جەلال تالەبانی بانگەوازێکی دا: «پێشمەرگەکانی چووبوونە ئێران پێویستە بگەرێنەوە کوردستان. ئێمە ئێستا گەلەک بە هێزین. ئێمە هێرشێکی گەورە دەبەینە سەر سلێمانی و دەتوانن هەندێک لە شارەکانی تریش بگرینەوە.

- تەلەفزیۆنی سوێد، کەناڵی (١) چاوپێکەوتنێکی لەگەڵ تۆماس هامبەربێری، سکرتێری گشتی کۆمەڵەی (مندڵان بپارێز)ن کرد، کە رەخنەی لە دەوڵەتە هاوپەیمانەکان گرت کە ئەوان دووروویی دەکەن.

ئەوان ئێستا لە پەیوەندی ئاشتی دەگەرێن، ئایە کوشتنی دوو ملیۆن کورد لە دەرەوەی ئاشتی دایە؟ تۆماس داوای هالیکاری لە سوێد و جیهان کرد بۆ کورد. هەروەها بیلال گورگی ئەندامی کۆمیتەی سوێدی بۆ مافی مرۆڤی کورد، بانگەوازێکی لە داریۆی مەرحەبا (رادیۆی سوێد بە زمانی تورکی) بلاوکردووە کە تێیدا هاتووە:

١- دەبێ کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان ناوچەیەکی ئەمنی بۆ پەنابەرانی کورد ئامادە بکات.

٢- ئێران و تورکیا سنووری خۆیان بۆ پەنابەران بکەنەوە.

٣- کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان چارەسەرێکی بنچینەیی و هەمیشەیی بۆ مەسەلەی کورد بدۆزێتەوە.

٤- مەسەلەی کورد بێتە رۆژەڤی مەسەلەکانی رۆژهەلاتی نێوەراست.

١٦ نیسان: مەسەلەی پەنابەرانی کورد و هەڵوێستی رای گشتی جیهان و ئەمریکا کارێکی مەزنی کردووە سەر سەرۆکی ئەمریکا **بووش**. بۆ ئەوەی هەڵوێستی بگۆرێ و لەنیوەشەوی‌دا بە تەلەفۆن پەیوەندی بە سەرۆک وەزیرانی ئینگلستان **جۆن مێجەر** و سەرۆکی فەرەنسا **فرانسۆ میتران** و سەرۆکی تورکیا **تورگات ئۆزال** و راوێژکاری ئەڵمانیا **هیلمۆت کۆل** و سکرتێری گشتی کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان **هەڤیر پێریس** دیکۆلیار بکا و پاشان لە تەلەفزیۆن بریارەکەی رایگەیێ بۆ پێکهێنانی ناوچەیەکی ئەمنی لە کوردستانی عێراق بۆ ئاوارە و پەنابەرانی کورد و رەوانەکردنی هێزی هاوپەیمانەکان بۆ کوردستانی عێراق و دابینکردنی ئاسایش بۆ گەرانەوەی کوردەکان بۆ شوێن و خێوەتەکانی ناوچە ئەمنی‌یەکە. بووش فەرمانی دا کە دە هەزار سەرباز و هەلیکۆپتەر و دەزگا و کەرەستەی پێویست رەوانەی کوردستان بکا، بووش بریارەکەی خۆی بەستەوە بە بریاری ئەنجوومەنی ئاسایشی نێونەتەوەیی ژمارە ٦٨٨ دەربارەی عێراق و رێگانەدان بە عێراق بۆ بەکارهێنانی فرۆکە و هەلیکۆپتەر لە هێلی ٣٦ پانی. گەر سەدام فرۆکە هەلفرێنێ، هێزە هاوپەیمانەکان بۆیان هەیە، بیخەن.

- **جۆن مێجەر** رایگەیاند: **«کارەکانی سەدام، ژینوسیدە، دەبێ سەدام بدرێتە دادگا»**.

- سەرۆک وەزیرانی تورکیا **یولدرم ئاکیولوت** لە چاوپێکەوتنێکی رۆژنامەنووسی لە لەندەن رایگەیاند: «پەنابەران پێویستییان بە هالیکاریەکی مەزن هەیە. دەبێ ئەوروپا یارمەتی بداتە تورکیا، و تائەویش بە زووترین کات بە پەنابەرانی بگەیێنێ. ئەوروپا هالیکاری ناکا و رەخنە لە تورکیا دەگرێ.» دیسان گوتی: «هالیکاری چارەسەری مەسەلەی پەنابەران ناکا، چارەسەری بنەرەتی دابینکردنی هەلومەرجی گەرانەوەیانە».

١٧ نیسان: ئەمرۆ، لەسەر بریاری **بووش**، لەشکری ئەمریکا بە هەلیکۆپتەر لەسەر سنووری عێراق و تورکیا دابەزی و دەستیان کرد بە هەڵدانی خیوەت بۆ پەنابەران.

- نوێنەری عێراق لە کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان هاتنی لەشکری ئەمریکای بۆ کوردستان پرۆتێست کرد.

- سکرتێری گشتی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان دژی بریاری بووش وای گوت: دوو نوێنەری ئێمە لە بەغدان و لەگەڵ حکومەتی بەغدا لە باری پەنابەرانی کورد رێکەوتوونە، بەلام سەرۆک بووش رابوو لە ناکاو و بریارێکی وەرگرت.

- **گۆرباچۆف** لە تۆکیو پەسنی بووشی دا، هەندێ لە رۆژنامەنووسەکان وایان لێکدایەوە کە ئەمە پشتکیری بریارەکەی بووشە.

- **جۆن مێجەر**- پشتگیری بریارەکەی بووشی کرد.

www.arsivakurdi.org




شارانەدا هەیە. نەیان هێشتین لەگەڵ خەڵکی قسە بکەین. زۆربەی خەڵکی بە کوردی قسە دەکەن. رووی موشەک و تۆپەکان لە چیاکراوە. لە سلێمانی کوشتاری بە کۆمەڵ کراوە. بە بلدۆزەر لاشەی خەڵکی لەژێر عەرد دەرێنن. بە سەدان کەس کوژراوە. لاشەی کوژراوەکان ناناسرێنەوە، عێراق دەبێژێ کە کوردەکان شاریان گرتووە، عەسکەر و کادیری پارتی بەعسیان بە کۆمەڵ کوشتاری کردووە.

لەگەڵ...... قسەم کرد، ئەوان دەیانگۆت سووچێ وان نییە. بەرێ ئەمریکا بۆمبابارانیان کردین و پاشان کورد هاتن مرۆڤەکانی ئێمەیان کوشت».

– لە ستۆکهۆلمێ، سەفارەتی عێراق ناوی ئەو کەسەی چەکی دژی کوردەکان بە کارهێنابوو، دایە حکومەتی سوێد. سوێد ئەو کەسەی لە سوێد دەرکرد و داوای چەکەکەشی لە سەفارەت کرد.

– کورد لە بەردەمی سەفارەتی کویا خۆپیشاندانیان رێکخست، چونکە کویا لە کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکاندا هەڵوێستی دژی کورد بوو.

١٢ نیسان: هەموو تەلەفزیۆنی جیهان، پەریشانی وباری دژواری پەنابەرانی کوردی لە یەکەم دەنگوباسی خۆیدا بلاودەکاتەوە. رۆژی سەدان کەس لە سەرما و لە برساندا دەمرن. تائێستا هالیکاری بە چاکی پێیان ناگات. هەتا ئێستا برسیەتی و پێ خواسی هەرەشەیان لێدەکا.

– ئەمریکا بریاریدا لە رێگای دەریا و بە فرۆکە یارمەتی پەنابەران بدات، بۆ ئەو مەبەستەش ئەمریکا ١٠٠ هەلیکۆپتەری تەرخان کرد، لە هەمان کاتدا ئەمریکا رایگەیاند کە ناوچەی ئازاد لە کوردستان پێویست نییە.

– سۆڤیەت دژی ناوچەی ئازاد دەرکەوت و گوتی: ئێمە پێشنیارێکی وەها قەبوول ناکەین، لەبەر ئەوە لە رۆژانی داهاتوودا میکانیکێکی خەراپ دروست دەکا. ئینگلستان گوتی: هەرێمی ئازاد بە ......؟

– کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان بریاریدا لە دەستەیەک ٥٠ تا ١٠٠ کەس، رەوانەی عێراق بکا بۆ ئەوەی لە باری پەنابەران لەگەڵ عێراق گفتوگۆ بکەن.

– عێراق ئەو لێبووردنەی کە بۆ کوردەکانی بلاوکردۆتەوە، بۆ حەوتوویەکی تری درێژەپێدا. بەپێی دەنگوباسی ئەوروپایی، کە لە عێراقەوە رایانگەیاندوە کەم کەس دەگەرێنەوە شوێنی خۆیان، چونکە بروایان بە لێبودرنی سەدام نییە.

– وەک دەزانرێ بازاری هاوبەشی ئەوروپا ١٨٠ ملیۆن دۆلاری بۆ پەنابەرانی کورد تەرخان کردووە، لە ٣/٢ بۆ ئێرانە.

– سوێد، یارمەتی خۆی بۆ ئەو مەبەستە لە ٤٠ ملیۆن کرۆنەوە، کردە ١٠٠ ملیۆن. فرۆکەکانی سوێد دەستیان کرد بە گەیاندنی خواردەمەنی و شتی تر بۆ پەنابەران.

– سەفارەتی عێراق، ئەو چەکە ئۆتۆماتیکەی لە دژی کوردان بەکارهاتبوو، تەسلیمی حکومەتی سوێد کرد.

١٤ نیسان: کۆمیتەی پاراستنی مافی مرۆڤی کورد لە سوێد و چەند رێکخراوی تری سوێدی کۆبوونەوەیەکیان لە ستۆکهۆلم- سێرگلس تۆری- رێکخست، نزیکەی ٤ هەزار کەس بەشداریان لەو کۆبوونەوەیەدا کرد. لەو کۆبوونەوەدا دکتۆر مەحمود عوسمان بە ناوی بەرەی کوردستانیەوە وتارێکیدا و ستێن ئەندرنسۆن وەزیری دەرەوەی سوێد بە ناوی حکومەتی سوێدیەوە وتارێکیدا، تێدا باسی تراژیدیای پەنابەرانی کوردی کرد و گوتی:« **مەسەلەی کورد، تەنیا مەسەلەی پەنابەری نییە. مەسەلەیەکی سیاسی یە. پێویستە لە تەک مەسەلەکانی تری رۆژهەلاتی نێوەراستدا مەسەلەی کورد چارەسەر بکرێ. پێویستە سەدام و رژێمەکەی دەست لە دەستەلات هەلگرن. مەسەلەی کورد، مەسەلەی دیموکراتی یە. پێویستە کوردەکانی کوردستانی عێراق لە نێو عێراقدا خۆیان ئیدارەی خۆیان بکەن.** ئێستا لە نێوان وەزیرەکانی دەرەوەی سوێد و فەرەنسا و ئیتالیا و ئەسپانیا بۆ مەسەلەی کورد خەبات و هەوڵدان هەیە». هەروەها لە کۆبوونەوەکەدا، سەرۆکی پارتی گەل (فۆلک پارتی) - **بێنگ ڤێستبێری**- و سەرۆکی پارتی چەپ - **لارش ڤارنر**- ، نوێنەری پارتی سەنتەر و ئەندامی پەرلەمانی ئەو پارتە، سەرۆکی کۆمیتەی ئاشتی و سەرۆکی کۆمیتەی پاراستنی مافی مرۆڤی کورد، سکرتێری گشتی مندالان بپارێزە (رێدا بارنن) تۆماس **هامەربێری** قسەیان کرد.



www.arsivakurd.org

ئازاد لە کوردستان بۆ کوردەکان دابین بکرێ، بەڵام سۆڤیەت و چین و کۆیا دژی ئەو پرۆژەیەن و دەبێژن کە، ئەوان ناتوانن دەست بخەنە کاروباری عێراقەوە».

- ئێران پشتگیری ناوچەی ئازادی کرد، بەڵام نەک تەنیا بۆ کورد، بەڵکو بۆ شیعەکانی خوارووی عێراقیش.

- تورکیا لە بارەی ناوچە والادا، بووینە، لە سنووری عێراقیشدا نزیکەی ۲۰۰.. هەزار کەس چاوەڕوانی دەربازبوونن. باری پەنابەران گەلەک خراپە. هەندێک خواردن و جل و بەرگیان پێگەیشتووە. لە برسان و سەرمادا دەمرن. لە برسان پەلاماری ماشینی خواردن دەدەن، عەسکەری تورک دوێنێ سێ کەسیان لە پەنابەران کوشتووە

سەردانی ئەوانیش کرا.

۱۱ نیسان: هیچ یارمەتی نەگەیشتۆتە ئەو کوردانەی کە لە کوردستانی تورکیا و لەسەر سنووری کوردستانی تورکیا و ئەوانەی لە کوردستانی عێراقن.

- تەلەفزیۆن دەها وێنەی دڵتەزێنی منداڵ و گەوران پیشان دەدەن. کوردە برسیبەکان چۆن پەلاماری خواردن دەدەن. سەرما، سەهۆڵ و باران چۆن دەباری و خەڵکەکە لە چ بارێکدان.

- بەپێی دەنگوباسی گەیشتوو، ژمارەی پەنابەرانی سنووری تورکیا گەیشتۆتە ٤٠٠.. هەزار کەس.

- بۆ جاری یەکەم دەزگای ڕاگەیاندنی جیهانی گەیشتۆتە ئێران و وێنەی پەنابەرانی کوردی پیشان دەدات. باری ئەوانیش لەوانەی تورکیا و سەرسنوور خەراپترە.

- هێزەکانی سەدام ئەوڕۆش هەلیکۆپتەری لە دژی کورد لە کەرکووک و سلێمانی بەکارهێناوە و، ئەمریکایش خۆی بێدەنگ کردووە.

- وەزیری کاروباری دەرەوەی عێراق **تاریق عەزیز** تورکیا و ئێرانی گوناهبارکرد و گوتی: **تورک ناهێڵن کورد لە تورکیادا بە کوردی قسەبکەن و لە ئێراندا بوونی کورد قەبوول ناکەن، بەڵام ئێمە ئۆتۆنۆمییان داوەتە کوردان.** دیسانیش هەر دوو دەوڵەت لە سەر ئێمە چی‌دەکەن» دیسان **تاریق عەزیز** خواستی نیشاندا لەگەڵ تورکیا لە بارەی کوردەوە دانیشێ. تورکیا بیر لەو داخوازییە دەکاتەوە.

- لە ڕێگای بەغداوە، بۆ جاری یەکەم بیست ڕۆژنامەنووس ڕوویان کردۆتە کوردستان. ڕۆژنامەنووسی تورک عەلی حەیدەر ئەمەی بە BBC ڕایگەیاند:

- ئێمە ۲۰. ڕۆژنامەنووسی بێگانە لەژێر چاودێری هێزەکانی سەدام سەرمان لە کەرکووک و سلێمانیدا. هەموو شوێنێک وێران بووە. هێزەکانی عێراق بە تەواوی دەستیان بەسەر ئەو ناوچانەدا گرتۆتەوە. عەسکەر لە خەتی تر لەو




بۆچوونی خۆی گۆڕی و گوتی ئەگەر عێراق هێرشی ئاوارەکانی کورد نەکا، پێویست ناکا. بۆری نەوتی کەرکووک کە بە تورکیا دا تێدەپەڕێ، ئەوڕۆ دەستی بەکار کرد.

- عێراق ڕایگەیاند، کە ئەوان دەتوانن لەگەڵ تورکیا هاوکاری بکەن دەربارەی پەنابەرانی کورد. جگەلەوە، عێراق دەخوازێ پەیوەندی ئابووری خۆی لەگەڵ تورکیا، درێژە پێ بدات.

**تاریق عەزیز** لە چاوپێکەوتنێکی تەلەفزیۆنی گوتی: «ئەوەی بەسەر کوردەکاندا هاتووە، خەتای ئەمریکا و ڕۆژاوا و «تورگات ئۆزاڵ»ە. ئەوان کوردەکانیان فریودا و بەگژی ئێمەیان وەنان».

دوای شەڕی کەنداو، بۆ یەکەم جار ڕۆژنامەنووسەکانی بێگانە چوونە بەغدا، ژیانی بەغدایان ئاسایی دیت و ڕایانگەیاند کە دەچنە کەرکووک و سلێمانی. تورکیا بە ڕەسمی ڕایگەیاند کە هەتا ۷. هەزار کورد دەربازی تورکیا

و گەلەکیشان بریندار کردووە. لە کوردستانی باکووردا، خەڵکی کورد فیداکاری دەکەن بۆ کۆکردنەوەی خواردەمەنی و جل و بەرگ، بەڵام عەسکەر و جاش دەیانگرن و شتەکانیش بە پارە دەفرۆشنەوە بە پەنابەران.

ئەو یارمەتییانەی لە ئەورووپاوە دەگاتە تورکیا، تورکەکان بە ئەنقەست دوای دەخەن. ڕۆژنامەنووسەکانی تورک بۆخۆیان لەم ڕووەوە ئاگاداری بڵاودەکەنەوە.

- کوردەکان لەبەردەم پارلەمانی سوێددا کۆبوونەوەیەکیان ڕێکخست. جگە لە پارتی سۆسیال دیموکرات، هەموو پارتەکانی تری پەرلەمان بەشداری کۆبوونەوەکەیان کرد و تیایدا وتاری پشتگیریان خوێندەوە. بەشدارانی کۆبوونەوەکە بە گوڵی سوورەوە چوونە سەرگۆڕی ئۆلۆف پالمە و هەروەها سەری ئەو کوردانەیاندا کە لە نان خواردن مانیان گرتبووە. لەبەر ئەوەی لە ستۆکهۆلم بە سەدان کورد مانیان گرتووە،

کورد کۆبوونەوە و خۆپیشاندانێکی ماتەمینی بۆ شەهیدانی کورد پێکهێنا. خۆپیشاندانەکە لە ساتی یەکی پاش نیوەڕۆ لە هوملەگوردن دەستی پێکرد، کاتژمێری ٢ی پاش نیوەڕۆ گەیشتە باخی مەلیک، نزیکەی ٤٠٠٠ کەسی بەشداری تێداکرد. لە کۆبوونەوەکەدا نوێنەری پارتی سەوزەکان و ئەندامی پەرلەمان **پێر گاردۆن**، لە پارتی چەپ (ئەندامی پەرلەمان) **بریت**، گۆرانی بێژی بەناوبانگی سوێد **لیل لینفۆش** و قەشەیەکی سوێدی قسەیان کرد. ئارتیسی بەناوبانگی سوێد، **یۆستا ئێکمان** کۆبوونەوەکەی بەڕێوە دەبرد.

– مەسعود بارزانی و جەلال تالەبانی لە کوردستانەوە بروسکەیان بۆ حکومەتی سوێد، ڕەوانە کردبوو داخوازی یارمەتی و پشتگیریان تێدا کردبوو.

– بەپێی دەنگوباسی ئاژانسی دونیا نزیکەی نیو ملیۆن کورد لە سنوورەوە بەرەو ئێران پەڕینەوە. ١٥٠ هەزار کەسیش بەرەو تورکیا پەڕینەوە ٣٠٠/٠٠٠ هەزار کەسیش لەسەر سنووری تورکیادا چاوەڕوانن، لەشکری تورک ڕێگایان لێگرتوون. تورکەکان چەک بەکاردەهێنن بۆ وەستانی شاڵاوی خەڵکی ڕاکردوو لەدەست ڕژێمی بەغدا.

– وەزیری دەرەوەی ئەمریکا، **جێمس بێکەر** بۆ سەردانی پەنابەرانی کورد سەری لە تورکیا دەدا.

٨ نیسان: وەزیری دەرەوەی ئەمریکا، **بێکەر** بە فڕۆکەی هەلیکۆپتەر گەیشتووتە قەزای هەکاری (چلی) تا باری کوردەکان بەسەر بکاتەوە. بێکەر لە گەڕانەوەی بۆ دیاربەکر کۆنگرەیەکی ڕۆژنامەنووسی گرت و گوتی:– ئەوە فەلاکەتە، تورکیا و ئەمریکا ناتوانن دەرهەقی باری پەنابەرایەتی کورد بێن.

– لە برۆکسل، ئەندامانی بازاڕی هاوبەش کۆبوونەوە، ئینگلیستان پێشنیارێکی لەچوار خاڵ پێشکەش کرد:

١– لە باکووری عێراقدا، ناوچەیەک بۆ گوردە ئاوارەکان دیاریبکرێ، ئاوارەکان لەوێ بژین و نەچنە ئێران و تورکیا.

٢– بازاڕی هاوبەش ١٨٠ ملیۆن دۆلار یارمەتی بۆ ئاوارەکان ڕەوانە بکا.

٣– دژی ڕژێمی عێراق، ئابلووقەی چەک درێژەی هەبێ.

٤– ئۆرگانەکانی یەکێتی ئەورووپای ڕۆژئاوا دەربارەی ئەو مەسەلەیە. کۆبێتەوە و ڕێکخراوی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان دەستەیەک ڕەوانە بکاتە هەرێمی پەنابەرەکان. لەبەر دواخستنی یارمەتی ڕەخنەیان لە سکرتێری ڕێکخراوی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان گرت.

– سوێد ٤٠ ملیۆن کرۆنی تەرخان کرد بۆ پەنابەرانی کورد.

– ڕۆژنامەنووسی کورد فەردا ئۆزان، خۆی گەیاندبووە نەخۆشخانەیەکی سووریا لە نزیک سنووری کوردستان، چاوپێکەوتنی لەگەڵ بریندارەکانی کوردستانی عێراق کردبوو و وێنەی گرتبوون و لە تەلەفیزیۆنی سوێدیشدا بڵاوکراوەیەوە.

٩ نیسان: پێشنیاری ئینگلیستان کە لایەن ئەندامانی بازاڕی هاوبەش پەسندکرابوو خرایە بەردەم ڕێکخراوی کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان، بەڵام سۆڤیەت و چین پێی ڕازی نەبوون و عێراقیش پرۆتێستی کرد.

– ڕۆژنامەنووسەکانی ناوچەکە دەڵێن: ئەو یارمەتیبەی کە بۆ کوردەکان ڕەوانەی تورکیا کراوە، تائێستا پێیان نەگەیشتووە. تورکەکان بە ئەنقەست یارمەتی‌یەکە دوادەخەن. یاخود بە پارەپێیان دەفرۆشن. ئەو شەو تەلەفزیۆن ئەوەی پیشاندا کە کوردەکان لەبرسان، ڕەگی داروگیا دەخۆن. لەشکری تورک سێ کەسی کوشتوە و بە سەدانیشی بریندار کردوە.

– مەسعود بارزانی بانگەوازی جیهانی کرد، کە حکومەتی سەدام دوای گرتنی کەرکووک، گوندی قەرەهەنجیر کە دانیشتوانی ٣ هەزار کەس بوون لە ماوەی چەند سەعاتێکدا کوشتوە. ئەو بانگەوازە لە ڕۆژنامەکانی **ئەفتۆن بلادت وئێکسپرێس**– ی سوێد بڵاوکرایەوە.

– هەتا ئێستا ملیۆنێک کەس خۆیان گەیاندۆتە ئێران و ٢٥٠ هەزار کەس لە سنووری تورکیا پەڕینەوە و نزیکەی ملیۆنێک لەسەر شاخەکانی سەرسنوور لەژێر باران و لەنێو بەفر و بە برسیەتی چاوەڕوانی چارەنووسی ڕەشی خۆیان دەکەن.

– بەپێی ڕاگەیاندنی، پەیامنێرانی BBC، کوردەکانی تورکیا بە هەموو جۆرێک یارمەتی کۆدەکەنەوە بۆ ئاوارەکان، بەڵام لەشکری تورک هەرەشەیان لێدەکەن و دەیانگرن و شتەکانیش بە پارە دەفرۆشنە ئاوارەکان.

– کوردەکانی ستوکهۆلم ئەمڕۆ خۆپیشاندانی خۆیان لەبەردەم سەفارەتی ئەمریکا درێژەپێدا.

حکومەتی سوێد، بەکار هێنانی چەک لە لایەن پیاوەکانی سەفارەتی عێراق لە ڕۆژی ٧ی نیسان بە شتێکی دژی قانوون لە قەڵەم درا. داوای لە سەفارەت کرد لە ماوەی ٤٨ سەعات، ناوی کەسەی چەکی بەکارهێنا، دەبێ ناوی بدرێتە سوێد و چەکەکەش بداتە حکومەتی سوێد. سەفارەتی عێراق حاشا لە بەکارهێنانی چەک دەکا، بەڵکو دەیخاتە ئەستۆی کوردەکان.

١٠ نیسان: حکومەتی فینلەندا، بڕیاریدا، لە ئەوەی کە چەکی بەکارهێنا لە پیاوانی سەفارەتی عێراق، بوو لە فینلەندا دەریکا.

– قسەکەرێکی کۆشکی سپی ڕایگەیاند، کە حکومەتی ئەمریکا، عێراقی ئاگادار کردووە، کە فڕۆکەکانی لە سەرووی خەتی ٣٦ (پانی) نەفرێ و لە دژی پەنابەرانی کورد بەکار نەهێنێ. ئەو ناوچەیە تا ٣٠ کم خوارووی هەولێر دەگرێتەوە.

ئینگلیزەکان هەوڵدەدەن کە ئەمریکا ڕازی بکەن لەسەر ئەوەی ناوچەیەکی

www.arsivakurdi.org

٤ نیسان: ژمارەیەک لە کوردەکان سەفارەتی عێراقیان لە بەلچیکا داگیرکرد، نوێنەرانی عێراقیان گرت و ئالای عێراقیان هێناخوارێ و ئالای کوردستانیان بەرز کردەوە.
- کوردەکان لە لەندەن خۆپیشاندان و کۆبوونەوەیان کرد و سەریان لە سەرۆک وەزیرانی پێشووی بەریتانیا مارگریت تاتشەردا و داوای پشتگیریان لێکرد.
- لە ئەلمانیا دژی سەفارەتی عێراق خۆپیشاندان کرا. سەفارەت خۆپیشاندەرەکانی گوللەباران کرد. کەس نەکوژرا، بەلام زۆر کورد لەلایەن پۆلیسەوە گیران.
- لە ئەمریکا، لەبەردەمی کۆشکی سپیدا، خۆپیشاندانکرا دژی ئەو بێ دەنگی و بە تەنگەوە نەهاتنەی کە کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان و ئەمریکا هەیان بوو.
- دەولەتی فەرەنسا، مەسەلەی کوردی هێنا بۆ کۆمەلەی نەتەوەیەکگوتووەکان. تورکیا و سوێد پشتگیری ئەو پێشنیارەیان کرد.
بەلام ئەنجوومەنی ئاسایشدا، پێشنیارەکەی رەتکردەوە.چونکە سۆڤیەت و چین، و کوبا و هیند و زامبابۆی دژ بوون.
بووش رایگەیاند کە ئەوان ناتوانن تیکەلی کاری عێراق بکەن، چونکە ئەو شتێکی ناوەخۆیە.
- لە سوێدەوە رۆژنامەنووسی کورد ئەشرەف ئۆکمووس و وێنەگر جۆرج کریستانس. لە کاتی رزگاربوونی شارەکانی کوردستان، بە نهێنی خۆیان گەیاندبووە کوردستان و بە گەرانەوەیان بۆ سوێد، لە رۆژنامەی **ئافتۆنبلادت** ریپۆرتاژیان لەسەر باری کوردستان بلاو کردەوە. لەلاپەرەکانی یەکەمی رۆژنامەکەدا، وێنەی مندال و ژن و خەلکی لێقەوماوی کوردیان بلاوکردەوە. زنجیرەی وتارەکان لە ژمارەکانی سێ رۆژا درێژەی هەبوو.

٥ نیسان: فەرەنسا پێشنیاری خۆی خستەوە بەردەم ئەنجوومەنی ئاسایش. تاوانی حکومەتی عێراق بەرامبەر خەلکی سیڤل و کوشتاری بە کۆمەلی کوردان ناوەرۆکی نامەی فەرەنسا بوو. لە ئەنجوومەندا بە زۆریەی دەنگ دژی عێراق بریارێک وەرگیرا. لە دەنگدان بۆ بریارەکە لە ١٥ دەولەتان، کۆبا و یەمەن و زمبابۆی دژ دەنگیاندا، چین و هیندستان بێ دەنگ بوون.
بۆ جاری یەکەم مەسەلەی کورد هاتە ئەنجوومەنی ئاسایشی نێودەولەتان و بریاری لەسەر وەرگیرا.
- لە جنێڤ و بێرن (سویسرا) کوردەکان خۆپیشاندانیان لە بەردەم نوێنەرایەتی رێکخراوی کۆمەلە نەتەوەیەکگرتووەکان کرد.



- پارتی گەل- (فۆلک پارتی) سوێد پێشنیاری کرد پەرلەمانی سوێد، مەسەلەی کورد بخاتە بەردەم رێکخراوی کۆمەلە نەتەوەیەکگرتووەکان .
- لە ئەمریکا، لە کۆشکی سپی و دەرەوەی، دژی بریاری بووش رەخنەگر پەیدا بوون، و رەخنەیان لە هەلوێستی بووش گرت. بووش تەنگاو بوو. بریاریدا کە ٦٠. ملیۆن کرۆن یارمەتی بدا و خواردن و دەرمان و جل و بەرگ رەوانە بکا.
- لە سوێددا، (ستۆکهۆلم، ئۆپسالا، یۆتۆبۆری، شارەکانی تر مانگرتن و خۆپیشاندان بەردەوام بوو.
- ناتۆ لە برۆکسل کۆبوونەوەی کرد، و رژێمی سەدامی مەحکوم کرد و داوای لە رێکخراوی کۆمەلە نەتەوەیەکگرتووەکان کرد کە کوشتاری بە کۆمەلی خەلک راگرێ.
- کوردەکان لە هێلسنکی- فینلاندە- خۆپیشاندانێکیان دژی سەفارەتی عێراق، کوردێک ویستی ئالای عێراق کرد دابەزێنی، پیاوەکانی سەفارەت چەند گوللەیان تەقاند.
- ئەندامانی کورد لە پەلەمانی تورکیا- ئەحمەد محەمەد تورک، محەمەد عەلی ئەرێن و وەزیری پێشوو شەرەفەددین ئەلچی، روویان کردە نیویۆرک لەبەردەم بارەگای رێکخراوی کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان بۆ سێ رۆژ لە خواردن مانیان گرت دژی بێ دەنگی جیهان لە تراژیدیای کورد. هەروەها پەرلەمتاری حیزبی HEP لە تورکیا، لە ئەنکرا مانیان گرت.

٧ نیسان: پاپا لە فاتیکان بانگەوازی جیهانی کرد کە یارمەتی کوردان بدەن و پرۆتێستی کرد لە کوشتنی کوردان.
- لە بەرەبەیانی ٧ ی نیسان نزیکەی ٤٠. کورد لە ستۆکهۆلم پەلاماری سەفارەتی عێراقیاندا، ئاگریان بەردا خانووەکە. پۆلیسی سوێد ٣٤ کەسیی گرتن و ئەوانی داوەتە دادگا.
کۆمیتەی سوێدی بۆ پاراستنی مافی

www.arsivakurdi.org

٣١ ئادار: بەپێی دەنگوباسەکان، هێزەکانی سەدام بە یارمەتی فڕۆکە لە کوردستان بەرەوپێش دەچێ. کەرکووکی گرتووە و بەرەو شارەکانی تر دەڕوا. بەپێی دەنگوباسی CNN لە شارەکانی کەرکووک و سلێمانی و هەولێر دار لەسەر بەرد نەماوە. سەدام کە ئەو چەکانەی نەیتوانی بوو، دژی هێزی هاوپەیمانەکان بەکاربهێنێ، دژی کورد بەکاردەهێنێ. خەڵکی شارەکان، شار بەجێدەهێڵن.




١ نیسان: پەیامی بەرەی کوردستان بۆ ڕێکخراوەکانیان لە ئەوروپادا، ڕایگەیاندووە، کە خەڵکی لەبەر پەلامار و هێرشی سەدام، ماڵ و حاڵیان بەجێ دەهێڵن و بەرەو سنوورەکانی سووریا و تورکیا و ئێران ڕادەکەن.

نزیکەی ٢ ملیۆن کەس بە چیاکەوتوون. بۆ ڕزگارکردنی خەڵک و دوورخستنەوەیان لە مردن، پێشمەرگە هەندێ شارەکانی بەجێهێشتوە. بەڵام لە دەرەوەی شارەکاندا شەڕ بەردەوامە. بۆ موبیلەزەکردنی ڕای گشتی ئەوروپا و جیهانی، پێویستە کوردەکان هەموو توانای خۆیان بخەنەکار.

هەر لە هەمان شەودا، واتە لەشەوی ٣/٣١ لەسەر ٤/١ نزیکەی ١٥٠ کەس لە بەردەمی سەفارەتی ئەمریکا کۆبوونەوە. لە ڕۆژی دواییدا هێزەکانی بەرە و فیدراسیۆن، کۆبوونەوەیەکی لەبەردەم سەفارەتی ئەمریکا پێکهێنا نزیکەی ٧٠٠ کەس بەشداری تێداکرد.

٢ نیسان: لە سەرانسەری ئەوروپا کوردەکان خۆپیشاندان و کۆبوونەوەیان ڕێکخست. کۆمەڵەی ژنان لە ستۆکهۆڵم مان گرتنی لەبەردەم سەفارەتی ئەمریکا ڕێکخستن. کۆمەڵەی ژنان و فیدراسیۆن و کەسانی تر ڕۆژانە لە بەردەمی سەفارەتی ئەمریکا خۆپیشاندان و مانگرتنیان درێژەپێدەدات. بەڵام «بووش» لە جێژنی مەسیحدا، خەریکی ڕاوەماسی بوو کە پەیامنێری CNN لێی پرسی کە کوشتاری بە کۆمەڵی کوردان دەکەن، گوتی: **پەیوەندیمان پێوەنییە. ئەوە کارێکی ناوخۆی عێراقە، ئێمە تێکەڵی نابین.**

– ڕادیۆ و تەلەفزیۆن و ڕۆژنامەی سوێد، ڕووداو و دەنگوباسی کوردانیان کردە پێش خەبەر.

٣ نیسان: فیدراسیۆن خۆپیشاندانێکی ڕێکخستۆتە دژی سەفارەتی عێراق لە ستۆکهۆڵمدا لە خۆپیشاندانەکەدا سەرووی هەزار کەس بەشدارییان کرد، هەندێ لاو لەبەردەم سەفارەت ویستیان پەلاماری سەفارەت بدەن، بەڵام پۆلیس ڕاوی نان و سەکی تێبەردان، زۆر کەس بریندار بوون. لە هەمان کاتدا مانگرتن لەبەردەمی سەفارەتی ئەمریکا بەردەوامە. سەدان سوێدی و هەزاران کورد سەردانی مانگرتووەکانیان دەکرد گوڵیان پێشکەش دەکردن و پشتگیری خۆیان نیشان دەدا.

– لە پراگ دژی سەفارەتی عێراق خۆپیشاندانێک ڕوویدا.



www.arsivakurd.org

و گوتی: دوای شەڕ، ئەز دیموکراتی ڕاست دەرکەوتەوە لە عێراقدا، برا کوردەکانمان لەو دیموکراتییەدا، مافی ئۆتۆنۆمی خۆیان دابین دەکەن.

– پەرلەمانی بەلچیکا، بڕیاری‌دا، مەسەلەی کورد بباتە کۆمەڵەی نەتەوەییەکگرتووەکان و بەلچیکا ڕێی لە ئەندام بوونی تورکیا لە بازاری هاوبەشی ئەوروپاییدا گرت.

١٦ ئادار: لە مێژووی کورددا، ڕۆژی خەم و ماتەمینە، ڕۆژی کوشتاری بە کۆمەڵی خەڵکی هەڵەبجەیە، ئەورۆ دوای سێ ساڵ هەڵەبجە ڕزگار کرا کەوتە دەستی هێزەکانی کورد دایە. (لە کوردستان و لە سەرانسەری ئەوروپادا، کورد یادە دڵتەزێنەکەی هەڵەبجەی کردووە، کۆبوونەوە و خۆپیشاندان بۆ ئەم یادی کرا). لەم ڕۆژەدا، لە ستوکهۆلم نزیکەی ٣٥٠٠ کەس بەشداری خۆپیشاندانەکەی هەڵەبجەی کرد، لە خۆپیشاندانەکەدا نوێنەری بەرەی کوردستان دکتۆر مەحموود عوسمان وتارێکی لەسەر باری ئێستای کوردستان و هەڵوێستی ڕژێمی سەدام حوسێن خوێندەوە. دەزگای ڕاگەیاندن و تەلەفزیۆن، و ڕادیۆ و ڕۆژنامەکانی سوێد، گرنگییەکی تایبەتیان بۆ بڵاوکردنەوەی دەنگوباسی و ئەو ڕووداوە تەرخان کرد.

١٧ ئادار: زاخۆ و هەندێ شارۆچکەی تری ناوچەی بادینان لە لایەن پێشمەرگەوە ڕزگارکرا.

١٧ ئادار: مەسعوود بارزانی چاوپێکەوتنی لەگەڵ ڕۆژنامە نووسەکانی ئەوروپادا کرد، کە ڕۆژنامەنووسەکان زۆربەیان لە ڕێگای سووریا و تورکیا و ئێرانەوە گەیشتبوونە کوردستان.

– نوێنەری هێزە سیاسیە بەشداربووەکانی کۆنفرانسی ستۆکهۆلم لە ئێوارەی ١٧ ئاداردا کۆبوونەوەیەکی تایبەتیان کرد و ڕاگەیاندنێکیان دەرکرد. (بڕوانە: بەریانگ ژمارە ٧٠).



١٨ ئاداری: هێزی پێشمەرگە هێرشی بردە سەر موسڵ. شەڕ لە دەوری موسڵ و کەکووک‌دا هێشتا بەردەوامە.

– مەسعوود بارزانی سەری لە شاری سلێمانی‌دا و، پێشوازیەکی گەرمی لێکرا.

١٩ ئاداری: ئاگادارێک لە شامەوە ڕایگەیاند کە جەلال تالەبانی و هەندێ لە نوێنەرانی هێزە ئۆپۆزیسۆنەکانی عێراقی دەگەڕێنەوە کوردستان و، نیازیان هەیە حکومەت ڕایگەنێن.

٢٠ ئاداری: شاری کەرکووک لە لەشکری عێراق ڕزگارکرا. جەلال تالەبانی گەیشتوە کوردستان.

٢١ ئادار: جەلال تالەبانی لە شاری زاخۆ لە خۆپیشاندانێکی گەلەری‌دا وتاری‌دا.

٢٢ ئادار: هێزەکانی سەدام، توانیان، ڕاپەڕینی شیعەکانی خوارووی عێراق، تا ڕادەیەک دابمرکێننەوە، هەموو شارە ڕاپەڕیوەکانی خوارووی عێراق ڕامالێ.

– کوردەکان خۆ ئامادە دەکەن بۆ بەرگری هێرشەکانی سەدام.

– سەرۆک کۆماری تورکیا ئەمڕۆ لە سۆڤیەت گەڕایەوە و ڕوویکردە ئەمریکا.

٢٣ ئادار: شەڕ لە نێوان هێزەکانی پێشمەرگە و سەدام بەردەوامە، بەڵام تائێستا ٩٠٪ خاکی کوردستان هەر لەژێردەستی پێشمەرگە دایە.

تورگات ئۆزۆل لە کامپ دێڤید لەسەر مەسەلەکانی ڕۆژهەڵاتی نێوەڕاستدا کۆبوونەوە دەکات.

٢٤ ئادار: دوای چاوپێکەوتنی جۆرج بووش لەگەڵ تورگات ئۆزۆل. چاوپێکەوتنێکی ڕۆژنامەگەریان کرد، بووش گوتی: ئێمە دەست ناخەینە کاروباری ناوخۆی عێراق.

– پەیامنێری CNN پرسیارێکی وای لە تورگات ئۆزاڵ کرد: ئێوە عێراقێکی بێ‌سەدام دەخوازن؟

ئۆزاڵ: ئێمە تێکەڵی باری ناوخۆی عێراق ناکەین. چاپەمەنی دونیا ڕایگەیاند کە ئۆزاڵ نامەی سەدامی بۆ بووش بردووە لە بارەی بەکارهێنانی فڕۆکە و هەلیکۆپتەر دژی کوردان. بووش و ئۆزاڵ پێکهاتن لەسەر پێشنیارەکەی سەدام.

٣٠ ئادار: سەدام فڕۆکە و هەلیکۆپتەر لەگەڵ تۆپی دوورهاوێژی دژی کوردان بەکارهێنا. سەدام چەکی کیمیایی (فۆسفۆری) و ناپاڵم دژی کورد بەکارهێنا. شەڕێکی دژوار لە نێوان هێزەکانی پێشمەرگە و سەدام بەردەوامە. ئەمریکا و هاوپەیمانەکانی لە بەکارهێنانی چەکی کیمیایی و فڕۆکە دژی کوردان بێ دەنگن، بەڵکو بە ساتەلیت تەماشای دەکەن.

www.arsivakurd.org

# ڕۆژ ژمێری ڕووداوەکان

**لە ڕۆژی ١٩٩١/٢/٢٦ لەشکری عێراق، بە تایبەتی- حەرەسی جمهوری- شکستی هێنا، لە کوێت وەدەرنرا و ئەمریکا و هاوپەیمانەکانی سەرکەوتنیان وەدەست هێنا. هاوکات ڕاپەرینی بەرفراوانی خەلک لە کوردستان و باشووری عێراق دژی ڕژێم، دەستی پێکرد. منیش ویستم ڕووداوەکانی ڕۆژ تۆمار بکەم، بێ ئەوەی لەسەریان بدوێم. با خوێنەران خۆیان ڕووداوەکان هەڵسەنگێنن.**

١١ ئاداری ١٩٩١- سەرۆک کۆماری تورکیا تورگات ئۆززۆل لە فڕۆکەدا بەرەو مۆسکو بە ڕۆژنامەنووسەکانی ڕاگەیاند کە «لەو حەوتووەدا جەلال تالەبانی و نوێنەری مەسعود بارزانی هاتونەتە تورکیا. ئەو دەنگوباسە وەک تەقینەوەی بۆمبایەک بوو بۆ ناحەزان. دژایەتی و ڕەخنە گیرا لە پێوەندی تورکیا و کورد.

کوردەکانی عێراق زۆر ناوچەی کوردستانییان خستە ژێر دەستی خۆ. لەوانە شاری سلێمانی و هەولێر و دەوروبەریان.


١٢ ئادار: بەپێی ڕاگەیاندنەکان، گەلی کورد بەگشتی لە کوردستانی باشوور، لە دژی ڕژێم ڕاپەریوی. لە باشووری عێراقیشدا، شیعەکان لە شارەکانی بەسرە و نەجەف و کەربەلا دژی ڕژێم هەڵستان.

١٣ ئادار: بەرەی کوردستانی عێراق بە سەرۆکایەتی مەسعود بارزانی سەرکردایەتی ڕاپەرینەکەی کوردستانی کرد.

١٤ ئادار: ڕاپەرینەکەی کورد و شیعە لە باکوور و باشوور پەرەی سەند. چەند شار و شارۆچکەی تریش کەوتۆتە دەست پێشمەرگە.

١٥ ئادار: خانەقین و هەڵەبجە و هەندێ ناوچەی تر کەوتنە دەست پێشمەرگە.

١٥-١٧ ئادار: کۆنفرانسی کورد لە ستۆکهۆلم سلاوی ئاراستەی پێشمەرگە و شۆرشی کوردستان کرد.



١٦ ئادار: پێشمەرگە دەوری کەرکووک و زاخۆی گرت. لەشکری سەددام لە کوردستان بە چەکەوە خۆیان دایە دەستی پێشمەرگە. فڕۆکەکەکانی سەدام هێزەکانی پێشمەرگە و شارەکانی بۆمباران کرد.

- ئەمریکا فڕۆکەیەکی عێراقی خستەخوارێ.

- فەرماندەی هێزی هاوپەیمانەکان لە کەنداو، عێراقی ئاگادارکرد کە هەڵسانی هەر فڕۆکەیەک دژی پەیمانی ئاگربەستە و ئەمریکا دەیخاتەخوارێ.

هێزەکانی ئەمریکا، لە خواروی عێراقەوە بە ٥٠ کم نزیکی بەغدا بوونەوە، عێراق لە ترسان هەلیکۆپتەری ڕاگرتووە.

- لە دوای شەری کەنداو، بۆ یەکەم جار سەدام لە تەلەفزیۆندا پیشاندراوە و لە وتارەکەیدا لەسەر مەسەلەی کورد بە فراوانی قسەی کرد



www.arsivakurd.org

بهێننە گۆڕێ وەکو ئەو دەزگایانەی کە لە سەرەوەدا باسیان کرا.

٢- حکومەتەکان دەبێ گوشاریان بخرێتە سەر بۆ ئەوەی کە بە روونی بیروڕای خۆیان لەمەڕ پێشێلکرانی مافە ئینسانییەکانی گەلی کورد دەرببڕن. دەبێ بە لێبراوانە داوا لە حکومەتەکان بکرێ کە لە پێوەندییەکانی دوولایەنەی خۆیاندا لەگەڵ ئەو حکومەتانەی کە راستەوخۆ بەرپرسی ئەو پێشێلکرانانەن ئەو بیروڕایە بهێننە گۆڕێ.

٣- دەبێ بە لێبراوانە داوا لە حکومەتەکان بکرێ کە یارمەتی نەکەن بۆ چەک لێ شەتەک دانی هێزەکانی ئەمنیەتی و نیزامی کە بۆ سەرکوتکردنی ناوچە کوردییەکان دەکار دەکرێن و لە جیاتیان کار بکەن بۆ چەک داماڵین لە ناوچەکەدا.

٤- ئەو حکومەتانەی کە دەستیان دەڕوا بۆ ئەوەی کە هەلی وتوێژ لە نێوان کوردەکان و دەوڵەتە گۆڕینەکاندا پێک‌بهێنن دەبێ دنە بدرێن بۆ ئەوەی کە کارێکی ئەوتۆ بکەن.

٥- دەبێ تکا لە حکومەتەکان بکرێ کە پەنابەرانی کورد بە ئاوایەکی ئینسانی وەربگرن و پارێزگاری ئەوتۆیان لێ‌بکرێن کە ئەوان حەوجێیان پێ‌یەتی.

٦- دەبێ داوا لە حکومەتەکان بکرێ کە یارمەتی ئینسانی بەو ناوچە کوردییانەی بکەن کە لەوێدا نیازێکی ئەوتۆ لە گۆڕێ دایە.

## دەستپێشکەرییەکانی نادەوڵەتی

١- نوێنەرانی پارلەمانی دەورێکی گەورەیان هەیە لە راکێشانی سەرنج بۆ سەر باری گەلی کورد. ئەوان دەتوانن لە پارلەمانەکانی خۆیاندا، لە دەزگاکانی هاوبەشی نێوان پارلەمانەکاندا و بە رێگەی پێوەندی راستەوخۆ لەگەڵ حکومەتەکان یان بیروڕای گشتی دا دەست بەکار بن.

٢- رێکخراوە نادەوڵەتییەکانیش لەو بارەیەوە دەورێکی مەزنیان هەیە. ئەوان دەتوانن روو لە حکومەتەکان و داو و دەزگا نێو نەتەوایەتییەکان بنێن. ئەوانیش دەبێ دنە بدرێن کە دەورێکی چالاکانە ببین لە شان وەبەردان، بارهێنان و یارمەتیدانی وەدیهاتنی مافە ئینسانییەکانی کورد دا.

٣- ناردنی دەستەی نوێنەرایەتی پارلەمانی یان رێکخراوە نادەوڵەتییەکان بۆ ناوچە کوردییەکان لە رابردوودا زۆر گرنگ بووە و دەبێ لە داهاتووش‌دا ئەو جۆرە سەفەرانە رێک بخرێن. زۆر گرینگە کە ئەو جۆرە میسیۆنانە باش رێک‌بخرێن و لێوەشاوە بن.

٤- دەبێ ئامرازە راگەیەنەرە گشتییە کان هان بدرێن بۆ ئەوەی مەیلێکی زیادتر بدەنە سەر کێشەی کورد. بۆ ئەو مەبەستە دەبێ ئەو رێکخراوانەی کە لە باری مافە ئینسانییەکان لە ناوچە کوردییەکان دەکۆڵنەوە زانیاری باوەڕپێکراو بدەن بە ئامرازە راگەیەنەرە گشتییەکان.

## پەیوەست

ئەندامانی شەبەکەی نارەسمی بۆ پشتیوانی لە مافە ئینسیانییەکانی گەلی کورد:

### نورویژ

کۆمیتەی پشتیوانی لە کوردان

SLIDARITY COMMETTEE FOR THE KURDS
BOX 1878 VIKA
N- 0124 OSLO
NORWAY
TEL. + 472 182758

### هۆلەند

کۆمیتەی کوردستانی- هۆلەند

NETHERLANDS KURDISTAN SOCIETY
C/O MOSES HOUSE
WATERLOOPLEIN 205
NL- 1011 PG
AMSTERDAM
TEL. + 31 20 62 21 305
FAX. + 31 20 63 86 366

### سوێد

کۆمیتەی سوێدی بۆ پاراستنی مافە ئینسانییەکانی گەلی کورد:

SWEDISH COMMITTEE FOR HUMAN RIGHTS OF THE KURDISH PEOPLE
BOX 27320
S- 102 54 STOCKHOLM
SWEDEN
TEL. + 46 86 65 01 45
FAX. + 46 86 61 42 91

### ئاڵمان

دەستپێشکەری بۆ مافە ئینسانییەکان لە کوردستان

INITIVE FOR HUMAN RIGHTS IN KURDISTAN
P.O BOX 10 45 51
D- 2800 BREMEN
GERMANY
TEL.+ 49 421 70 39 32
FAX+ 49 421 70 38 85

دەرمانی نێونەتەوایەتی

MEDICO INTERNATIONAL
OBERMAINANLAGE7
O-6000 FRANKFURT AM MAIN1
GERMANY
TEL.± 49 69 499 00 41
FAX. + 49 69 43 60 02

کۆمەڵەی گەلانی هەڕەشەلێکراو

SOCIETY FOR THREATENED PEOPLES
POSTFACH2024
D-3400 GOTTINGEN
GERMANY
TEL.+ 49 551 55 822/23

### سوێس

BODS/MODS/MADS
MARGUERITE REUT
POSTFACH 85 53
CH/ 3001 BERN
SWITZERLAND
TEL. 41 31 25 39 30

### بریتانیانی مەزن:

یارمەتی دەرمانی و پزیشکی نێونەتەوایەتی

INTERNATIONAL MEDICAL RE+ LIEF
98, EVERSHOLT ST.
LONDON N.W.1.
GREAT BRITAIN

www.arsivakurdi.org

فەرهەنگی بە مافی منداڵان و مافی ژنانیشەوە، گرنگن.

٧- لەبەر ئەوەی کە لە چوارچێوەی داو دەزگا جیاوازەکانی نێونەتەواتییدا شێوەی کار و جووڵانەوەی دامەزراو هەن لەوانەیە نەکرێ کە پێشێلکرانی مافی کوردان لە هەموو کوردستاندا بە یەکجار بهێندرێتە گۆڕێ، جار جار لەوانەیە کە بۆچوون بە پێی هەر وڵاتەی پێویست بێ. لەگەڵ ئەوەشدا، تەنانەت بەم حاڵی بەرتەنگییەشەوە پێویستە کە لەهەموو دەرفەتێک کەلک وەربگیردرێ کە لەبەردەم دەزگایەکی نێونەتەوایەتی ئەوتۆدا باسی پێشێلکردنی مافی کوردان و مەحکوم بکرێ.

٨- حکومەتەکان لە هەموو جیهاندا نیشانە داکراوێکی گرنگن بۆ کارکردن لە سەریان سەبارەت مافە ئینسیانییەکانی کورد. ئەوان دەتوانن شوێن لەسەر داودەزگاکانی نێو حکومەتان بکەن. گروپەکانی دیکە کە دەکرێ کاریان لەسەر بکرێ بریتین لە ئەندامانی پارلەمان، دەزگا پارلەمانییاکان، هەروەها ڕێکخراوە نادەوڵەتییەکان و ئامرازی ڕاگەیەنەرە گشتییەکان.

## ڕێکخستن و هاوسەنگ کردنی کار

١- ئەو کۆمیتە و دەستانەی کە لە وڵاتە جیاوازەکاندا لە پێناو مافە ئینسانییەکانی گەلی کورد دا کار دەکەن. دەبێ تێبکۆشن بۆ گۆڕینەوەی زانیاری لەگەڵ یەکتر و کردەوە و کارەکانی خۆیان ڕێک بخەن. ئەو کۆنفرانسانەی کە ڕێک دەخرێن دەبێ بە شێوەیەکی وا بن کە لەسەر بناوانی کۆنفرانسەکانی پێشووتردا ببەسترین. یارمەتییە ئینسانییەکانیش دەبێ هاوسەنگ بکرێن و ڕێک بخرێن.

٢- بۆ ئەو مەبەستە دەبێ شەبەکەیەکی نێونەتەوایەتی لە گرووپە پشتیوانەکان دابمەزرێ. هەڵبەت ئەو شەبەکەیە، کارەکان لەگەڵ ڕێکخراوە و ئەنستیتووە سەرەکییەکانی کورد ڕێک دەخا.

٣- ئەو شەبەکەیە دەبێ کار بکا بۆ جێبەجێ کردن و تەتبیق کردنی بەیاننامەی ستۆکهۆلم. دەبێ ئەندامەکانی ئاگادار بکا لەمەڕ گشت ئەو دەستپێشکەرییانەی کە لەباری نێونەتەوایەتیرا گرنگن. ئەندامەکانی ئەو شەبەکەیە دەبێ بە شێوەیەکی بەربڵاو سەبارەت بە باری مافی مرۆڤ لە کوردستان زانیاری بڵاوبکەنەوە و هانی ئەوە بدەن کە لێکۆڵینەوەی زانستی سەبارەت بە بابەت و لایەنە جیاوازەکانی کۆمەڵگای کورد بکرێ.

## نەتەوە یەکگرتووەکان

١- حکوومەتەکان دەبێ تەشویق بکرێن بۆ ئەوەی کە لەگەڵ سکرتێری گشتی نەتەوەیەکگرتووەکان ئیمکانی ئەوە بهێننە گوڕێ کە کێشەی کوردیش بهێندرێتە گۆڕێ لەووتو وێژانەی دا کە سەبارەت بە دەستپێشکەرییەکانی ئاشتی لە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا بەرێوەیە.

٢- حکومەتەکان و ڕێکخراوە نادەوڵەتییەکان کە لە جوارچێوەی کۆنفرانسی ئەورووپا بۆ ئاسایش و هاوکاری دا کەسایەتی ڕاوێژکاریان هەیە دەبێ دنە بدرێن کە لە دەزگای مافی مرۆڤدا و لە کۆمیسیۆنەکانی دیکەی سەر بەو کۆمیسیۆنەدا- پێشێلکرانی مافی کوردان لەو وڵاتانەدا کە تێیاندا دەژین بهێننە گۆڕێ. دەستپێشکەری ئەوتۆ دەبێ بکرێ بۆ ئەوەی کە بە شێوەیەکی سیستماتیک زانیاری سەبارەت پێشێلکرانی ئەو مافانە کۆبکرێتەوە و هەوڵی دەکار کرانی پێوانەکانی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان بدرێ. بە تایبەتی دەبێ لەسەر ئەو نموونانەی خوارەوە پێدابگیرێ:

– گرتنی زۆرەملی، «ون بوون و بێ سەر و شوێن چوون» و دادگەی فەرمایشی،

– ئەشکەنجە و خەراب جووڵانەوە لەگەڵ بەندییان.

– دوور خرانەوە لە ماڵ و حاڵ و وێران کرانی خانوو و نیشتگە، لە نێوبرانی ئاژەڵ و مەڕ و ماڵات و هۆی بەرپێچوون.

– بێ بەش کردن لە مافی فەرهەنگی و مافی مەدەنی، وەکو ئازادی بەیان و مافی بەکارهێنانی زمان و مووزیکی خۆماڵی.

٣- حکوومەتەکان و ڕێکخراوە نادەوڵەتییەکان دەبێ داوایان لێبکرێ کە پێوەندی بە کۆمیسارپای بەرزی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان بۆ کاروباری پەنابەرانەوە بکەن بۆ ئەوەی کە پەنابەرانی کورد بە شێوەیەکی کاریگەر پشتیوانیان لێبکرێ لە وڵاتانی وەک ئێران، عێراق و تورکیا.

## ئەنستیتووە ئورووپییەکان

١- بەردەوام بوونی پێشلکردنی مافی کوردەکان لە تورکیا دەبێ لەگەڵ کۆمیسیۆنی ئورووپایی مافی مرۆڤ بهێندرێنە گۆڕێ. تورکیا وەکو یەکێک لە ئیمزاکەرانی پەیماننامەی ئورووپا پێناودارییەکی تایبەتی بە ملەوەیە کە دەبێ چاودێری بە سەرەوە بکرێ و خۆی ناوەرۆکی ئەو پەیماننامەیە جێبەجێ بکا.

٢- داو و دەزگاکانی بنەماڵەی ئورووپا دەبێ خۆشیان سەرنج بدەنە ئەو پێشێلکرانانەی مافی مرۆڤ لە تورکیا دەکرێ و لە وتووێژەکانیاندا لەگەڵ نوێنەرانی ڕەسمی ئەو وڵاتە ئەوەیان لەگەڵ باس بکەن.

٣- باڵی پارلەمانی وڵاتانی بازاری هاوبەشی ئورووپا و شوورای ئۆرووپا هەر دووکیان کە دەبێ مەسئەلەی کورد بخەنە بەرنامەی کاری لێدوانیان. نوێنەرانی ڕێکخراوە سەرەکییەکانی کورد دەبێ بانگ بکرێن بۆ ئەوەی لەبەردەم ئەو دەزگایانەدا بیرورا و بۆچوونی خۆیان بهێننە گۆڕێ.

## حکومەتەکان

١- حکومەتەکان دەبێ بە لێبراوانە داوایان لێبکرێ کە سەرنج بدەنە هەموو لایەنەکانی کێشەی کورد، بە پێشێلکرانی مافی مرۆڤی کوردانیشەوە. ئەوان دەبێ لێبراوانە داوایان لێبکرێ کە ئەو مەسئەلانە لە ڕێکی نێونەتەوایەتیدا

www.arsivakurd.org

- ئینسانانه لەگەڵ پەنابەرانی کورد بجوڵێنەوە، بە پێی مافە ئینسانییەکانی پەسندکراوی نێونەتەوەیی و قانوونی پەنابەری؛

- پێش بە پێوەندی نێوان کوردەکان لە نێوان سنوورە نێونەتەوایەتییەکان دا نەگرن و زەمینەی ئەو پێوەندییانە خۆش بکەن؛

داوا لە حکومەتە ناوبراوەکان دەکا کە مافی دیاریکردنی چارەنووسی گەلی کورد بە دەستی خۆی بناسن و پشتی وتووێژی ئەوتۆ کە ڕێگەی وەدەستهاتنی ئەو مافە خۆش دەکەن بۆ ئەوەی کە پێوەندێکی ئاشتیانە و بە قازانجی دوولایەنە لە نێوان کورد و گەلەکانی دراوسێدا وەدی بێ؛

**کۆنفرانس** دەستە و داوێنی هەموو حکومەتەکانی جیهان دەبێ کە لە چوارچێوەی کۆمیسیۆنی مافی مرۆڤی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکاندا پێشێلکران و وەسەرپەرینی مافی مرۆڤ بهێننە گۆڕێ کە زۆر لە کوردان ڕەنجیان لێ چێشتووە و هەرواش دەیچێژن لە گشت ئەو وڵاتانەی دا کە تێیاندا دەژین؛

دەستە و داوێنی هەموو حکومەتەکانی جیهان دەبێ کە بە شێوەیەکی لێبراوانە کاربکەن بۆ چەسپاندنی پێوانە نێونەتەوایەتییەکان سەبارەت بە پاوانکرانی بەکارهێنانی چەکی کیمیایی؛

دەستە و داوێنی هەموو حکومەتەکانی جیهان دەبێ کێشەی کورد- مافە ئینسانییەکانی تاکی کورد و هەروەها مافی دیاریکردنی چارەنووسی گەلی کورد بە دەستی خۆی- لە پێوەندی لە تەک ئەو دەستپێشکەرییانەی دا کە سەبارەت بە ئاشتی لە ڕۆژهەلاتی ناوەڕاست دوا بە دوای شەری کەنداو دەکرێن بهێننە گۆڕێ؛

دەستە و داوێنی سکرتێری ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان دەبێ کە پرسی کوردیش جێ بکاتەوە ئەگەر بانگی پێکهاتنی کۆنفرانسێکی نێونەتەوایەتی سەبارەت بە ئاشتی لە ڕۆژهەلاتی ناوەڕاست دەدا؛

دەستە و داوێنی سکرتێری گشتی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان دەبێ لەوە بکۆڵێتەوە و ریشاندەری بکا کە گەلی کورد و گەلی دیکەی بێ دەوڵەت دەکرێ بە چ ڕێگەیەکی هەرە باشدا لە چوارچێوەی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکاندا نوێنەرایەتی یان هەبێ؛

**کۆنفرانس** داوا لەهەموو حکومەتەکانی جیهان دەکا کە بە شێوەیەکی ئینسانی لەگەڵ پەنابەرە کوردەکاندا بجووڵێنەوە و وەکو دەستەکانی دیکەی پەنابەران مافی پەنابەری و داڵدەیان بدەنێ- بە لەبەر چاوگرتنی توندوتیژی ئەو ڕاونانەی کە کوردەکان لە وڵاتەکانی زێدی خۆیانەوە تووشیان هاتووە؛

دەستە و داوێنی کۆمیساریای بەرزی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان بۆ کاروباری پەنابەران دەبێ پشتیوانی لێکردن و یارمەتی دانی پەنابەرانی کورد لە ڕۆژهەلاتی ناوەڕاست، بە تایبەتی لە تورکیا، عێراق و ئێران وەپێش بخا، و هەموو حکومەتەکان پشتی کۆمیساریای بەرزی ڕێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکان بۆ کاروباری پەنابەران لەو بارەیەوە بگرن.

کردەوەی کۆنکرێت بۆ بەرەوپێشبردن و پاراستنی مافە ئینسانییەکانی گەلی کورد:

لە ماوەی کۆنفرانسی نێونەتەوایەتی «ناسینی مافەکانی کوردان- ستراتیژی کردەوە لەلایەن گروپە هاوپێوەندەکاندا» لە ستۆکهۆڵم لە نێوان ١٥-١٧ی مارسی ١٩٩١دا رادەربرین و دەمەتەقە کرا کە چلۆن پشتیوانی لە خەباتی گەلی کورد بکرێ لە پێناو مافە ئینسانییەکانی ئەو گەلەدا بە مافی دیاریکردنی چارەنووسی بە دەستی خۆشییەوە.

ئەو ڕاگەیەندراوەی خوارەوە ڕووی لە هەموو دۆستان و پشتیوانانی کوردەکانە لە چوارچێوەی ئەو خەباتەدا. مەبەست ئەوەیە کە هانی هەوڵ و تێکۆشانی کۆنکرێت بدرێ بۆ پشتگیری لە مافە ئینسانییەکانی کورد. بنەماڵەی جیهانی لە مێژە کێشەی کورد و ئەو زوڵم و زۆرەی لە کوردان دەکرێ لەبیر خۆی بردۆتەوە. ئێستا کاتی ئەوە هاتووە کە ئەو کەمتەرخەمییە یەکجار و بۆ هەمیشە دوایی پێ بهێندرێ.

## پرینسیپەکان

١- خەڵکی دنیا لە هەموو جێیەک نیازیان بەوە هەیە کە سەبارەت بە کێشەی کورد زانیاریان بدرێتی و لێ بزانن، سەبارەت بە زەمینە و مەکۆی مەسئەلەکە، باری ئێستا و ئەو پرسانەی سەر بە مافی مرۆڤ کە لەو کێشەیە هەستاون.

٢- حەوجێ نێوەچوون وشان وەبەردانێکی بە گوڕ و زانایانە هەیە سەبارەت بە مافی کوردان لە ڕێکی نەتەوایەتی و نێو نەتەوایەتیدا. ئەم کارەش، پێویستی بە کۆکردنەوەی سیستماتیکی راستەقانی و زانیاری باوەڕپێکراوە سەبارەت بە باری مافی مرۆڤ لە ناوچە کوردییەکاندا.

٣- پێویستی بە پشتیوانی کۆنکرێت هەیە، چ پشتیوانی دارایی و چ یارمەتی دیکە، لە گەلی کورد لەو دۆخەیدا کە ئێستا تێیدان.

٤- گشت ئەو کردەوانەی کە بۆ هاودەردی و هاوپێوەندی لەگەڵ کورداندا دەکرێن دەبێ لەگەڵ ڕێکخراوە کوردییەکاندا ڕێک بخرێن. ئامانج و مەبەستی ئەو کارانە دەبێ پشتیوانی کردن لە کوردەکان بێ بۆ ئەوەی کە مافەکانی خۆیان وەدی بهێنن و وەدەستیان بخەن.

٥- بۆ ئەوەی کە ئەو کردەوانە کاریگەر بن و برشتیان هەبێ، دەبێ کاری پشتیوانی تا ئەوەندەی هەڵدەسوورێ، لە بنەمای پێوانە پەسندکراوەکانی نێونەتەوایەتی لە مەڕ مافی مرۆڤ بەرێوە بچن.

٦- پێوانە نێونەتەوایەتییەکان لەمەڕ مافەکانی ئابووری، کۆمەڵایەتی و



www.arsivakurd.org

# بەیاننامەی ستۆکهۆلم سەبارەت بە مافە ئینسانییەکان بۆ گەلی کورد

وەرگێرانی حەسەنی قازی

کۆنفرانسی نێونەتەوەیی «ناسینی مافەکانی کورد» لە نێوان ١٥- ١٧ی مانگی مارس ١٩٩١ لە شاری ستۆکهۆلم لەلایەن کۆمیتەی سوێدی بۆ پاراستنی مافە ئینسانییەکانی گەلی کورد ڕا پێکهات.

لە نێو ٢٤٠ کەس لە بەشدارانی ئەو کۆنفرانسە را کە لە ٢٠ ولاتەوە هاتبوون، نوێنەرایەتی پارتییە سیاسیەکان و ئەنیستیتیوە فەرهەنگییەکانی کورد و هەروەها کەسایەتی سەربەخۆی کورد لە هەندەرانیش هەبوون. کۆمیتەی هاوپێوەندی لەگەڵ گەلی کورد لە چەندین ولاتەوە لەو کۆنفرانسەدا بەشدارییان کرد. هەروەها لەو کۆنفرانسەدا نوێنەران، ئەندامانی پارلەمان و کەسانی دیکەی چەندین پارتی سیاسی ولاتانی ئۆروپایی ئامادە بوون. جگە لەمانە کاربەدەستانی ڕێکخراوە ئینسانی و سیاسییە نێونەتەواییەکان لە کۆنفرانس‌دا ئامادە بوون، هێندێکیان وەکو چاودێر. لە ئامرازی ڕاگەینەوە گشتییەکان بۆ بەشداری لە کۆنفرانسدا گێردرابۆوە.

کۆنفرانس سەبارەت بە دۆخی مافی مرۆڤ لە ناوچە کوردییەکانی ئێران، عێراق، سووریا، تورکیا و یەکێتی شوورەوی گوزاریشی پێ گەیشت و ناوەرۆکی ئەو گوزاریشانەی هەڵسەنگاند و لێکی‌دایەوە. کۆنفرانس هەروەها بە لەبەر چاوگرتنی باری ئێستای ڕۆژهەلاتی ناوەراست ڕێگە جارەی جۆربەجۆری خستە بەرباس. کۆنفرانس ئەم بەیاننامەی خوارەوەی پەسند کرد، «بەیاننامەی ستۆکهۆلم سەبارەت بە مافە ئینسانییەکان بۆ گەلی کورد».

بنەماڵەی جیهانی چی دیکە نابێ ئەو زوڵم و چەوسانەوەی کە زیاتر لە ٢٠ میلیۆن کوردی وەبەرگرتووە تەحەمول بکا. ئەو زوڵم و زۆرە هەڕەشە لە ئاشتی و ئاسایش لە ڕۆژهەلاتی ناوەراست دەکا و مافە ئینسانییەکان کە لە ڕێکی نێونەتەوایەتی دا ڕێکەوتنیان لەسەر کراوە پێشێل دەکا.

پێشێل کرانی مافە ئینسانییەکان لە کوردستان سالانی دووروودرێژە بەردەوامە و هەتا دێ شێوەیەکی سیستیماتیک و بەربلاو بە خۆیەوە دەگرێ: گرتنی زۆرەملی، ئەشکەنجە، سزادانی توندوتیژ دوای دادکەی فەرمایشی یان هەر بەبێ دادگە، «ون بوون و بێ سەروشوێن چوون»، ئیعدامی ناقانوونی، شەری کیمیایی، دوورخرانەوە لە ماڵ و حاڵ و وێران کردنی خانوو و نیشتگە، لەنێوبرانی ئاژەڵ و مەروماڵاتی کوردان و هۆی پێبەرێچوون، بێ بەش کردن لە مافی بەکارهێنانی زمان، ئەدەبیات، موزیک و خوێندن و زانیاری وەدەستهێنان لەسەر مێژووی خۆیان، هەلومەرجی زاڵمانە و نائینسانی لە ئوردوگاکانی پەنابەران.

گەلی کورد قەت لەبەر سێبەری دیموکراسی‌دا نەحەساوەتەوە، لەوەش کەمتر، مافێکی ماناداری دیاریکردنی چارەنووسی خۆی نەبووە. عێراق- ولاتێکە کە لەسەر کاغەز جۆرە ئۆتۆنۆمییەکی داوە- بە ڕێگەی زوڵم و زۆر بە دانانی بە ڕێوەبەری کارتۆنی ئەو ڕێکەوتنانەی کە سەردەمایەک خۆی دانی پێداهێناوە خستویەتە ژێر پێوە.

ئێران، عێراق، سووریا، تورکیا و یەکێتی شوورەوی هەموویان، لەسەر و بەندی جیاوازدا، بە ئانقەستە هەوڵیان داوە بۆ کزکردنی کەسایەتی نەتەوایەتی کورد بە ڕێگەی گۆڕینی پارسەنگی دیمۆگرافی لە ناوچە کوردییەکان.

تا ئەوکاتەی کە ئەو ناعەدالەتیانە بەردەوام بن، چ ئاشتییەکی ڕاستەقینە لە ڕۆژهەلاتی ناوەراستدا نابێ.

**کۆنفرانس داوا دەکا** کە حکوومەتەکانی ئێران، عێراق، سووریا، تورکیا و یەکێتی شوورەوی ڕێز لە بەیاننامەی جیهانی مافی مرۆڤ و پەیماننامەکانی دیکەی مافی مرۆڤ بگرن و ئەوان لە کوردستان و ناوچەکانی دیکەی کە دانیشتووی کوردیان هەیە بە تەواوی جێبەجێ بکەن.

*بە تایبەتی داوا دەکا کە ئەم پێنج حکوومەتە:*

– دەستبەجێ دوورخستنەوەی کوردەکان لە شوێنگەیان و کاولکردنی ماڵ و خانوویان، لە نێوبردنی ئاژەڵ و مەروماڵاتیان و هۆی بەرێچوونیان رابگرن؛

– دەستبەجێ ئەو بەندییە کوردانەی کە لەسەر بیروباوەریان گیراون بەربدەن و کۆتایی بە هەموو جۆرە ئەشکەنجە و ئیعدامێک بدەن؛

– ڕێگابدەن کە پەنابەرە سیاسییەکان لە تاراوگە ڕا بگەرێنەوە و هەموو مافێکی ڕەوای هاوولاتییان پێ بدەنەوە؛

– ئەو داو و دەزگایانەی کە لەنێو هێزی پۆلیس، هێزی ئەمنیەتی و جەیشدا بۆ ئازاردان و ڕەنجدانی گەلی کورد دەکارکراون هەڵبوەشێندرێنەوە؛

– خەساری ئەو قوربانیانەی کە لە ڕابردوودا کەوتوونە بەر زەبری پێشلکرانی مافی مرۆڤ ببژێرنەوە؛

– ڕێزی مافی زمانی کوردی و فەرهەنگی کوردی بگرن، لەوانە مافی چاپکردن و بلاوکردنەوە بە کوردی، و مافی مندالان و گەنجانی کورد کە بە زمانی خۆیان بخوێنن و پەروەردە بکرێن؛

www.arsivakurd.org

## سیاسەتی ئینگلستان لە بارەی کوردان گۆراوە



**ئان کلوید،** ئەندامی پەرلەمانی ئینگلستان نوێنەری پارتی لیبەر، باسی ئەو زوڵم و زۆرەی کرد کە بەسەر کورد دێ وباسی سیاسەتی ئینگلستانی کرد لەم رووەوە و گوتی: «ئێستا بەرامبەر بە کورد گۆرانێک لە سیاسەتی ئینگلستان‌دا هەیە. لەم بوارەدا هەموو حیزبەکان یەک رایان هەیە. لەو بروایەدام. کە ئینگلستان تەئسیرێکی پۆزێتیف دەکاتە سەر ئەمریکایش. پارتی ئێمە خەباتێکی باش بۆ کورد دەکا.»

لە کۆنفرانس دا چەند کۆمیتە یاخود گروپی کار پێکهات بۆ لێکۆلینەوەی مەسەلەی کورد لە هەموو روونێکەوە- لە پێوەندی لەگەڵ رێکخراوە دیموکراتیەکانی ئەوروپا، مەسەلەی کورد و باسی دەزگاکانی راگەیاندن، مەسەلەی کورد و کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان و رێکخراوە نێونەتەوەییەکان- گروپەکان دوای کۆبوونەوەی خۆیان، پێشنیارەکانیان خستە بەردەم کۆنفرانسی ستۆکهۆلمی ئامادە کردبوو، خرا بەردەم بەشدارانی کۆنفرانس، دوای چەند گۆرانێک و دەستکارێک دەنگی لەسەردرا.

لێرەدا دەقی بەیاننامەکە بلاْودەکەینەوە کە لەلایەن کاک حەسەنی قازی‌یەوە کراوەتە کوردی:



www.arsivakurd.org

ئەگەر دەوڵەتێک پێک بهێنن، چون دەتوانن ئەو مافە وەرگرن. ئەنجامی مافی چارەنووس، وەک وڵاتێکی سەربەخۆ راستەوخۆ بەندە بە دەوڵەتەوە. ئەوە شتێکی موتلەق نییە. مافی هەموو نەتەوەیەکە کە چارەنووسی خۆی بەدەستی خۆی بگرێ. ئەوە حەقی کوردانیشە. لە پەیمانی سێڤەریشدا، هەرچەندە زۆر ئاشکرا نییە، بەڵام هەر ئەوە گوتراوە. یەکگرتوو و سەرکەوتووین.»

## سیستێمی کۆن یا نوێ

پرۆفیسۆر **ریچارد ڤالک** (ستۆکهۆلم): «رۆژی ئەوە هاتووە کە کورد مافی چارەنووسی خۆیان وەربگرن و بیپارێزن. ئەورووپا و ئەمریکا باش لە مەسەلەی کورد حالی نەبووینە. بەڵام فەلەستینی هەندێکن، بەڵام هەرکەس باش مەسەلە و باری وان دەزانن. لە ژێر زۆرداری سەدامدا، خەڵکی ئەورووپا باش لە باری کوردان ئاگادار بوون.»

«ئامانج و ئەنجامی ئەو کۆنفرانسە، پێویستە ئاگادارێکی باش بدەنە ئەورووپاییان و چاپەمەنی و سیاسەتمەداران.»

«رووداوی کەنداو و مەسەلەی کوردی گۆری. بووش گوتی: «پێویستە مرۆڤ لە رۆژهەلاتی نێوەراستدا، رێزی مافی مرۆڤ بگرێ. ئەوە نیزامی نوێی جیهانی‌یە». ئایە مەبەست لەوە چییە؟ گەلۆ دەیەوی خەڵکی ناوچە بۆ ئامانجی خۆی بەکاربهێنێ؟ لەشەری یەکەمی جیهاندا ئامانج پارچە پارچەکردنی کوردستان بوو. نەوت هەبوو. باپەیمانەکانی سێڤەر و لۆزان بەراورد بکەین. لە سێڤەردا مافی کوردان هەبوو، بەڵام لە لۆزاندا ئەوەیان لابرد. وڵاتێکی نوێیان بە ناوی تورکیا پێکهێنا. ئێستاش دوای شەری کەنداو چ جۆرە سیاسەتێک دێتەکار؟ دە رۆژ لەمەوبەر کامەران ئینسانان (وەزیری دەوڵەتی تورکیا) دەیگوت: کۆتایی وڵاتە مەزنەکان لە ناوچەکەدا دێت، نۆرەی دەوڵەتی بچووک دەست بێدەکا» ئەوە گرنگە. حیسابی سەدام تێکچوو. گەلۆ ئێستا رۆلی تورکیا و سوریا و ئێران لە ناوچەدا چییە؟»

«من دوو نموونەی نیزامی کۆن باس دەکەم. بارێک پەیدا بوو لە نێوان نەتەوە و دەوڵەتاندا. بە تایبەتی گەلی کورد، نەتەوەیە و خاوەن خاکە، بەڵام دەوڵەتی نییە. گەلەک کەس باش نازانێ نیزامی دەوڵەت و نەتەوان چییە؟ لە سیاسەتی کۆندا دەوڵەت دەناسران. بەڵام تراژیدی کورد ئەوەیە، کە نەتەوەیەکی بێ دەوڵەتە؟ بۆیش باس ناکرێ. چونکە بە گوێرەی قانوونی نێونەتەوەیی دەوڵەت هەیە. ئێستا دەبێژن کە دەوڵەت و نەتەوە یەک نییە. ئێمە نین کە نەتەوەیەک دەوڵەتی خۆی نەبێ، هیچ تەئسیری وی نییە، بۆیە پێویستە دەوڵەتی ویش هەبێ. لە کۆتایی‌دا گوتی دەبێ کورد و فەلەستینی دەوڵەتی خۆیان هەبێ.»

## ئاشتی لە ماڵی مندا نییە

دکتۆر **مەحمود عوسمان**، سیاسەتی ئەمریکای بەرامبەر کورد، مەبەستی لابردنی ئەو کێشەیە لە نێو دەوڵەتەکانی ناوچەدا. هەر کاتێ ئێمە پەیوەندیمان



پێوەگرتوون، گوتایانە: بەلێ، بەلێ، پێویستمان هەیە، بەڵام ناتوانین. ئێران لە کاتی شادا لەگەڵ تورکیا نەیان دەخواست کە کێشەی کورد بێتە رۆژەڤی.

دوای تەنگوچەڵەمەی کەنداو ئێمە جارێکی تر چووینە ئەمریکا، دیسان گوتیان: «ئێمە کێشەمان لەگەڵ سەدام هەیە».

ماوەیەک لەمەوپێش ئێمە چووینە کۆنفرانسی ئەمریکا و مەدام میترانیش لەگەڵمان بوو. دیسان پەیوەندیان بە ئێمەوە نەگرت. تەنیا بەلێنی پەیوەندیان داینێ لەگەڵ بەرپرسیاری مافی مرۆڤ، بەڵام ئەویشیان جێبەجێ نەکرد.

زۆر جار روومان لە کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان کردووە، گوتوویانە مەسەلەی ئێوە، مەسەلەی ناوەخۆیە.

چووینە لای سکرتێری کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان و دەردی خۆمان بۆ باس کرد، باسی پەنابەرانی کوردمان لە تورکیا و ئێران بۆ کرد. داوای هالیکاریمان لێکردن» ئەویش وەلامی داینەوە: «راستە قانوونی کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان هەیە، بەڵام ئێمە ناتوانین». ئێمە روومان کردە کۆمەڵەی پەنابەران و داوامان لێکردن: «وەک فەلەستینییەکان و ئەفغانەکان ئێمەش پەنابەرمان هەیە، ئەوانیش بە پەنابەری رەسمی بناسن» گوتیان: «تورکیا قەبوول ناکا». من بروام بە تورکیا نییە، بەڵام لەوانەیە، ئێستا بەرژەوەندیان هەبێ، بۆیش روو لە ئێمە دەکەن.

باری ئێستا، هیوای لە دوایە، هەندێ لە دەوڵەتان سیمپاتیان بۆمان هەیە، ئێستا مەسەلەی ئێمە، بووەتە مەسەلەیەکی نێونەتەوەیی. دوای ئەو بارە سەرمان لە فەرەنسا دا، ئەوان راستەوخۆ نەیان گوت بەلێ، سەرمان لە مۆسکۆش‌دا، ئەوان وەلامیان پۆزێتیف بوو، ئێمە بریارماندا، ئەو مەسەلەیە بخەینە بەردەم کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان. پەرلەمانی فەرەنسا بریاری‌دا، مەسەلەی ئێمە بخەنە بەردەم کۆمەڵەی نەتەوەیەکگرتووەکان. لە سەرۆکی فەرەنسی میتران-یان پرسی: ئایە بێ چارەسەری مەسەلەی کورد، ئاشتی لە رۆژهەلاتی نێوەراستدا سەقامگیر دەبێ؟. ئەویش گوتی: نە. چونکە ئاشتی لە مالی مندا نییە.



www.arsivakurdi.org

نەتەوەیەکگرتووەکان.

٣- بە بەڵگە و ئەرگومێنت، دەوڵەتە مەزنەکان ئاگادار بکەن لە بارەی مەسەلەی کوردەوە، تا بخرێتە رۆژەڤی کۆمەڵە نەتەوەیەکگرتووەکان.

## پێویستە هاوکارێکی راست و دروست پێشکەش بکرێ

**ماڤاللا-** نوێنەری پارتی کرێکارانی کوردستان (تورکیا) بەرلەوەی دەست بە لسەکانی بکا، رەخنەی لە کۆمیتەی ئامادەکردن سوێندی گرت، کە بۆ، بە ناوی پ.ک.ک کەس بانگ نەکراوە.

لە وتارەکەی خۆیدا- باسی راپەرین و تێکۆشانی کوردانی کرد. هۆی تێکشکان و سەرنەکەوتنی خستە بەرچاو ووتی:« بەڵام لەو ساڵانەی دواییدا، لە کوردستانی باکوور ئەو شەرانەی روودەدەن، باری کوردی گۆریوە. ئەوەش لە ئەزموونی مێژوویی ئێمە دەردەکەوێ.) دەربارەی کۆنفرانسیش بە کورتی گوتی: «مەسەلەی کورد. مەسەلەی کولتوری و مەسەلەی کۆمەڵەی مرۆڤ نییە لە و مەسەلەی چەند کەسێک نییە زێندانا. واتە مەسەلەی مافی مرۆڤ نییە. مەسەلەی کورد، مەسەلەی ئازادی ٢٥ ملیون کوردە و سەربەخۆیی وڵاتەکەیانە. ئێمە دەبیژین هەندێک بە چاوی بازرگانی و لەو روانگەوە خۆیان لە مەسەلەی کورد نزیک دەکەنەوە. با هەر کەسێک بزانێ، رزگاری کورد تەنیا بە ئیرادەی کوردان دەبێ. پشتگیری کوردان، پشتگیری سەربەخۆیی و ئازادی کوردانە. مەسەلەی دیموکراتی راستیش بۆ ئێمە، هەر ئەوەیە. مەسەلەی ئەو کۆبوونەوەیەش بۆ ئێمە، مەسەلەی هاوکاری راستە، دەبێ هاوکارێکی راست و دروست پێشکەش بکرێ».

## لە پەیمانی سیڤەردا، دوڵەتی کورد هەبوو

**عیسمەت شەریف وانلی،** رەخنەی لە پێشنیاری بانگەوازی کۆتایی کۆنفرانس گرت کە مافی چارەنووسی کوردی تێدا جێی نەگرتوە، بەلکو لە شوێنی ویدا، مافی مرۆڤ هاتووە.

لە بەندی ٦٤ی پەیمانی سیڤەردا هاتووە: «ئەگەر کورد داخوازی دەوڵەتێک بکەن، نابێ ئێمە دژی بوەستین». من تەماشای دیکلەراسیۆنم کرد، باسی مافی مرۆڤی کردووە. مەسەلەی کورد، مەسەلەیەکی نەتەوەیی‌یە. ئێمە لە کۆنفرانسی لۆزانیشدا (١٩٩٠) ئەوەمان خستە بەرچاو. پێویستە مافی نەتەوەیی بخرێتە نێو دیکلەراسیۆنی کۆنفرانسەوە.

## لەهەر بەشێکدا، تایبەتی و جیاوازی خۆی هەیە

**شێخ عیزەدینی حوسێنی** بە ناوی خۆی و کۆمەڵە و حیزبی دیموکراتی کوردستان (رێبەرایەتی شۆرشگێر) دوا. باسی کۆنەپەرستی و نەژادپەرستی رژێمی ئیسلامی کرد و گوتی:«هەر بەشێکی کوردستان تایبەتی جیاوازی خۆی هەیە. بۆ کۆنفرانس پێشنیاری ئێمە هەیە. دەبێ کۆنفرانسێکی نێونەتەوەیی بۆ کوردان پێک بێ. کوردی هەر بەشێک مافی خۆیان وەرگرن و هیوای سەرکەوتنی بۆ کۆنفرانس خواست.»

## وڵاتێک هەیە بە ناوی کوردستان

بە ناوی ١٤ رێکخراوی کوردستانی باکوور* کاک دیلان وتارێکی کورتی‌دا. لە وتارەکەی‌دا باسی ئەو زولم و ستەمەی بەسەر کوردان داهاتووە لە پەیمانی لۆزانەوە تائێستا روون کردەوە، و پێشنیارێکی هەشت خالی پێشکەش کۆنفرانس کرد.

١- کورد نەک وەک کەمەنەتەوایەتی، بەلکو وەک نەتەوەیەک قبوول بکرێت و لە دیکلەراسۆندا تۆمار بکرێ.

٢- لە پلاتفۆرمی چارەسەرکردنی کێشەکانی رۆژهەلاتی نیوەراستدا، پێویستە کوردیش نوێنەرایەتی هەبێ.

٣- پێویستە کۆمیسیۆنێک پێک بێ، بۆ لێکۆلینەوەی ئەوانەی چەکی کیمیایی سازدەکەن و دەیفرۆشن و بەکار دێنن. رژێمی عێراق چەکی کیمیایی دژی کوردان بەکار هێنا. پێویستە ئەو کارخانە و دەزگایانەی چەکی کیمیایی ساز کردوە و فرۆشتویتی، تەعویزات بدەنە کوردان.

٤- لە بریاری کۆنفرانسدا لە هاوکاری ئەوروپادا بۆ لەناوبردنی چەک، پێویستە کوردستانی باکووریش بخەنە بەرچاو.

٥- خەبات بکرێ بۆ ئەوەی چاودێرێکی کورد لە رێکخراوی نەتەوەیەکگرتووەکاندا بە دایمی قبوول بکرێ.

٦- دەبێ لەشکری تورک لە کوردستان دەربچێ و ئیدارەی نیزامی لە کوردستان نەهێلدرێ.

٧- ئەو چەکانەی بۆ شەری کەنداو لەلایەن ناتۆوە بۆ تورکیا رەوانەکراوە، بکێشرێنەوە دواوە.

٨- بۆ بەرێوەبردن و تاقیب کردنی بە ئەنجام گەیاندنی بریارەکان کۆمیتەیەکی چاودێر پێک بێ، کە کوردیشی تێدا بێت.

* کاوە، رزگاریڤانێن نەتەوەیی‌ێن کوردستانێ، تەڤگەرا رزگاریا کوردستانێ (تەڤگەر) تەڤگەرا سۆسیالیستا کوردستانێ، پارتیا کارکەرێن کوردستانێ (کیپ)، رزگاری، پلاتفۆرما دیموکراتیک یا ولاتپارێز و شۆرشگەر ئا کوردستانێ، پلاتفۆرما یەکیتی یا ئالاٰ رزگاری، پارتیا دیموکراتا کوردستانا تورکیا و تێکۆشینا سۆسیالیست.

## یەککگرتوو و سەرکەوتوو بن

**ئاسیمیۆرن ئەبدە (ئۆسلۆ):** (لە بارەی کورد و مافی چارەنووسدا، گرنگ ئەوەیە خەڵک خۆی بریار بدا. ئۆتۆنۆمی، فیدرالی یان سەربەخۆیی. مافی چارەنووس لەسەر داخوازی گەل و ئازادی گەلە.

لە کوردستاندا گەلێک فاکتور هەیە کە مافی چارەنووس بێتە وەرگرتن. نەتەوەی کورد یەک نەتەوەیە. دەبێ ئەوە لەسەر قانوون و پرنسیپی نێونەتەوەیی‌دا هەبێ.

www.arsivakurd.org

## تەڤگەر بەرنامەی دوور و نزیکی هەیە

بە ناوی تەڤگەرەوە سەرهاد دجلە قسەی کرد. لەسەرەتادا باسی مێژوو و باری جوگرافیایی کوردستانی باکووری کرد و پاشان هاتە سەر مەسەلەی کورد لە سەردەمی عوسمانیەوە و سیاسەتی کوشتن و برین و تالانی و راگوێزان و تواندنەوە و قەدەغەکردنی زمان و نەدەبیاتی کورد دەست پێکراو و مستەفا کەمالیش درێژەی پێدا و تائێستاش هەر بەردەوامە). هەروەها باسی ئەوەی کرد کە هێزە کوردییەکان چ پێشکەوتنی لەنێوان سالانی ١٩٧٠-١٩٨٠ وەدەست هێنا و چۆن خزیان رێکخست. دیسان پاش سالی ١٩٨٠ چۆن دەولەتی تورک بە شێوەیەکی فراوان و ئاشکرا کوردستانی داگیر و تالان کرد لە کۆتایی وتارەکەیدا گوتی:

(لەبەر رۆشنایی ئەو راستییانەی لەسەرەوەدا باس کرا، تەڤگەر ئامانجی دوور و نزیکی گەلی کوردی دەستنیشان کردووە. لە ئامانجی دووردا، ئێمە سەربەخۆییمان لە بەردەم دایە، بەلام ئامانجی نزیک دەتوانن بە کورتی بەم جۆرە روونی کەینەوە. پێویست بوونی گەلی کورد دانی پیا بنرێ. قانوونی نیزامی ویلایەتی هەرێمی لابچێ. لەشکر لە کوردستان دەربچێ. گوندە سوتێنراو و وێرانکراوەکان ئاوەدان بکرێنەوە. لێبوردنی گشتی رابگەیندرێ. پێویستە مەسەلەی کورد لە کۆنفرانسی نێونەتەوەیی رۆژهەلاتی نێوەراستدا شوێنی خۆی بگرێ. کورد وەک لایەنەک لە کۆنفرانسدا بەشداری بکەن).

## دەبێ جنایەتی کوشتنی قاسملۆ ئاشکرا بکرێ

بە ناوی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران **کەمال داودی** قسەی کرد. داودی باسی زولم و زۆرداری رژێمی ئیسلامی ئێرانی کرد لە ماوەی ١٢ سالاندا لە کوردستان و هەروەها باسی خەباتی گەلی کوردی کرد لەو ماوەیەدا ووتی: «لە ماوەی ١٢ سالاندا رژێمی ئیسلامی ئێران پتر لە ٥٠ هەزار کوردی کوشتووە». هەروەها داوای لە کۆنفرانسی ستۆکهۆلم کرد کە پرۆتێستی رژێمی ئێران بکا لە بارەی کوشتنی دکتۆر قاسملۆوە و هەروەها داوا لە حکومەتی ئۆتریش بکا کە رووداوی کوشتنی قاسملو و تاوانبارەکان ئاشکرا بکات.

## مشتێک لە کولتووری کوردی

کۆمیتە ئێوارە پرۆگرامێکی کولتووری رێکخست و پێشکەشی نوێنەرانی کۆنفرانس و میوانەکان کرد. کاک شێرکۆ بێکەس چەند هەلبەستێکی خۆی خوێندەوە و کچێکیش بە ئینگلیزی هەلبەستەکانی شێرکۆی خوێندەوە، هەروەها شاعیر کاک شاهین بەکر کە لە ئوستورالیاوە بۆ کۆنفرانس بانگهێشتن کرابوو، دوو هەلبەستی خۆی بە کوردی و ئینگلیزی خوێندەوە. پاشان کۆما دیلان چەند هەلپەرکێیەکی پێشکەش کرد و هونەرمەندان گولستان و شوان چەند گۆرانییەکیان پێشکەش کرد.

## زۆردەستی و چەوسانەوە کەمتر بووە

**کەمال ئەحمەد** بە ناوی تەڤگەری نیشتمانی نەتەوەیی کورد لە سوریا قسەی کرد و باسی زۆردەستی لە سالی ١٩٦٢ و بە دوا کە لەسەر کورد لە سوریادا هەبوو کرد، هەروەها لەمەڕ راگوێزانی کورد دوا، باسی باری ئێستای کوردی سوریای کرد. لەو سالانەی دواییدا، زۆردەستی و چەوسانەوە کەمتر بووە لەسەر کوردان وەک نموونە: گیراوی سیاسی کورد لە زیندانەکانی سوریادا نییە، پەنجەرەیەکی دیموکراتی لە گەلەکەمان کراوەتەوە. بۆ جاری یەکەمە لە مێژووی سوریادا کە نوێنەرانی کورد بچنە پەرلەمانەوە.

تەڤگەری کورد درێژە بە خەباتی دیموکراتی خۆی دەدات. چ لە پەرلەمان و چ لە دەرەوەی پەرلەماندا خەریکی چارەکردنی مەسەلەی کوردین وەک:

- ناساندنی رەوایی تەڤگەری کورد.

پێویستە دەزگاکانی هەرێمی کوردان شێوەیەکی دیموکراتی وەرگرێ.

- گەلی کورد ببێتە خاوەنی مافی سیاسی و چاندی (کولتووری) و کۆمەلایەتی خۆی.
- لابردنی هەموو پلانێک و سیاسەتێک بۆنی شۆڤێنیزمی لێ بێ.

## کێشەی کورد دەبێ بچێتە کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکان

پرۆفیسۆر **شاکرۆی محۆی** بە ناوی کوردەکانی سۆڤیەتەوە وتارێکی کورتی دا و تێیدا چەند پێشنیارێکی پراکتیکی پێشکەش کۆنفرانس کرد.

- ئەم کۆنفرانسە نەناکۆکی و کێشەی هەرێم و ولاتانی بچوکە، بەلکو هی دەولەتانی گەورەیە. تا لە جیهان و ناوچەکەدا دژایەتی هەبێ، ئاشتی سەقامگیر نابێ.
- کێشەی کورد دوو لایەنی هەیە:

یەک بە شێوەیەکی ئاشتی، ئەوی تر وەک هەلەبجە لە رێگای ژینۆساید. کێشەی کورد بە میتۆدی هەلەبجە چارناکرێ.

- ئەم کۆنفرانسە پێویستە رێگای چەک جێبهێلێ. سێ شت بکەنە رێ:

١- پێویستە لە کۆمەلەی نەتەوەیەکگرتووەکاندا، وەک فەلستینییەکان نوێنەری کوردیش هەبێ.

٢- دەبێ کۆمیتەی سوێدی، کۆنفرانسی ستۆکهۆلم بکاتە فۆتۆمەتریالێک بۆ کۆنفرانسێکی نێونەتەوەیی، وەک سالی ١٩٦٣ مەسەلەی کورد بهێنرێتە کۆمەلەی

www.arsivakurd.org

نەگەیشتن. هەندێک لە دژی مستەفا کەمال بووە، هەندێک لەگەلیا. ئەو بارە تا ئێستاش بەردەوامە. گەلۆ دەتوانن دەوڵەتێکی سەربەخۆ پێک بهێنن؟ چونکە پەیوەندی ئەوان بە شیعە و سونی........ هەیە. کوردی عێراق دەتوانن ئۆتۆنۆمی وەدەست بهێنن، بەڵام مەسەلە ئەوەیە، کە حکومەتی عێراق بە هێز بێ، دیسان ئۆتۆنۆمی لەناودەچێ. بە بروای من مەسەلەی کورد لە تورکیادا پێش دەکەوێ. ئێستا گەلی کورد لایەقی پشتگیری نێونەتەوەیی‌یە. من ناتوانم ستراتیجی و سیاسەت بۆ گەلی کورد دابرژێنم. ئەو بە خۆی بریاری خۆی دەدا. بەڵام من دەتوانم ئەوە بە ئەمریکا و وڵاتانی تر بلێم «مەسەلەی کورد لەنێو مەسەلەکانی رۆژهەڵاتی نێوەراست بخرێتە رۆژەف» ئەگەر وڵاتانی رۆژئاوا ئاشتی یان دەوێ، پێویستە مەسەلەی کورد بخەنە بەرنامەی رۆژەوە» ئەگەر تورکیا پێی خۆش بێ یا نا.

## ئازادی کوردان بە پێشکەوتنی ئەدەبیاتی کوردیەوە گرێدراوە

**پرۆفیسۆر جویس بلۆ** (پاریس) لەسەر کولتووری کوردی دوا. لەسەرەتادا پەنجەی بۆ ئەوە راکێشا کە کورد لە کۆنەوە لە دامەزراندنی زۆر لە میرنیشن و دەوڵەتانی ناوچەکەدا رۆلی گرنگیان هەبووە. کورد سەرکردەی دەوڵەتی ئەیوبی و شەدادی بووینە. شەدادی کورد بووینە.



لە سەدەکانی ۱۷دا، قوتابخانەی ئەدەبیات و مۆسیقا و کولتووری کوردی پێشکەوتووە. زمان و کولتووری کوردی گەلەک کۆن و دەوڵەمەندە.

پاشان **جویس بلۆ** لەسەر ئەدەب و زمانی کوردی دوا و پەنجەی بۆ پێشکەوتنی زمان و ئەدەبیاتی کوردی لە سوڤیەت و کوردستانی باشووردا راکێشا. هەروەها پەنجەی بۆ ئەوە راکێشا کە لەو سالأنەی دواییدا لە ئەورووپادا، زمان و ئەدەبیاتی کوردی دەستکەوتی بەرچاوی هەیە. جویس بلۆ ئازادی کوردی بە پێشکەوتنی زمان و ئەدەبیاتی کوردی‌یەوە گرێ‌دا.

**پرۆفیسۆر جۆن گالتونگ** (ستۆکهۆلم) لەسەر باری کورد و کێشەی کەنداو دوا:

کورد لە نێوان پێنج ئیمپراتۆریەتدا دابەش کراون، ئێمەی ئەورووپایی لەم رووەوە گوناهبارین، بە تایبەتی ئینگلستان. ئێستا تەنیا کورد بێ دەوڵەت نینە، بەلکو سامەر لە سوێد، فەلەستینی، هندی سوور لە ئەمریکا... هتد. ئەگەر ئەورۆ کورد ببنە خاوەن دەوڵەت، بەیانی ئەوانی تریش دەبنێ. لەبەر ئەوەی بۆ دەبی کورد ببنە دەوڵەت؟ کورد هەموو دەوڵەتان دەناسن، بەڵام ئەوان کوردان ناس ناکەن.

دەلێن، کورد شەرخوازن، ئایە چ شێوەی تر هەیە؟ بەلکو غاندیەکی کوردیش پەیدابێ. بەلکو غاندیەک رابێ.

پاشان دێتە سەر مەسەلەی نەوت و دەلێ: پێویستە بەشی کوردیش لە خێری نەوت بدرێ. سێ شتی گرنگ هەیە: نەوت، ئاو و دەوڵەت. پێویستە ئەوە دابەش بکا... کورد بەشی لەهەر سێ‌کان دا هەیە. پێویستە لە کۆنفرانسی رۆژهەڵاتی نێوەراستدا لەسەر دابەشکردنی ئەو سێ شتانە باس بکرێ. ئێستا هەندێک دەبێژن: ئەگەر کورد سەرکەون، خەنجەری خۆیان هەلدەکێشن، تۆڵەی خۆیان دەستێنن، راستە تۆڵەسەندنەوە هەیە، بەڵام مرۆڤ ناکرێ هەمان مێتود بەکار بهێنێ.

## دەبێ سوێد هالیکاری ئینسانی بکا

هوشیار زێباری

(بەرەی کوردستانی عێراق)

نورێنەری بەرەی کوردستانی عێراق، بە کورتی و بە ئەژمار لە بارەی رەوشتی رژێمی سەدام حوسێنیەوە بەرامبەر کورد و تاوانەکانی ئەو رژێمە دوا، هەروەها باسی چالاکیەکانی پێشمەرگەی کوردستانی کرد و گوتی: (ئێستا لە کوردستانی عێراق و عێراقدا راپەرینەک



هەیە. کورد، عارەب، ئاسووری و تورک پێکەوە دژی رژێمی سەدام تێدەکۆشن زۆربەی خاکی کوردستان رزگارکراوە. لە خانەقین تا سلێمانی و زاخۆ و دهۆک لەژێر دەسەلأتی پێشمەرگەی بەرەی کوردستانی دایە کورد لەنێو ئۆپۆزیسیۆنی عێراقیدا، هێزێکی گرنگە. ئێمە داخوازی دیموکراتی بۆ عێراق و ئۆتۆنۆمی راستەقینە بۆ کورد دەکەین. بێ‌چارەسەرکردنی کێشەی نەتەوایەتی گەلی کورد، ئاشتی لە عێراق و ناوچەکەدا سەقامگیر نابێ. ئێمە وەک بەرە، داوا لە کۆمەڵگای نێونەتەوەیی دەکەین، چارەسەرێکی ئاشتیانە بۆ مەسەلەکەمان بدۆزنەوە و داوا لە سوێد دەکەین پشتگیری ئینسانی لە کوردستانی عێراق بکا. چونکە سەدام و رژێمەکەی دەتوانن هەموو گەلی عێراق بکوژن.

www.arsivakurdi.org

سێ.هێ. هارماسۆن گوتی: (پار کە ئێمە هەوڵمان‌دا، ئەو کۆنفرانسە ئامادە بکەین، نەمان دەزانی کە باری کورد بەم شێوەیە دەگۆڕێ، ئێستا خەباتی کوردان بەری گرتووە. من هیوادارم کە کۆنفرانس ئەو بارە لەبەرچاو بگرێ.) دوای هەڵبژاردنی دەستەی بەڕێوەبردنی کۆنفرانس، ڕێگادرا بە وەزیری پەنابەران مای لیس لویڤ وتاری خۆی‌بدا، لە قسەکانی مای-لیس‌دا



دەرکەوت کە لە سیاسەتی دەوڵەتی سوێد بەرامبەر کورد گۆڕانێکی ئەوتۆ نییە. ئەو مەسەلەی کوردی وەک مەسەلەی پەنابەر و مافی مرۆڤ باس کرد. (حکومەتی ئێمە لەسەر باری کوردان ئاگادارە و خەباتی بۆ دەکا. سوێد پشتگیری دیموکراسی لە هەرێم دەکا. ئێمە لە هەموو شوێنێک پشتگیری مافی کوردان دەکەین. ئەو ئێش و ئازارەی لەسەر کوردان هەیە، ئێمە باش دەزانین. هەندێک کورد هاتونەتە سوێد، بەڵام ئێمە نازانین چەند کورد لە سوێددا هەیە. واپێ دەچێت ئێستا دە هەزار کورد لە سوێددا بژین).

## گەلی کورد سەرۆکێکی بەهێز دەخوازی

نوزە هاتە سەر میوانی هێژا پرۆفیسۆر **داڤید ماکداول** کە کۆنسلی ئاشتی‌یە لە ئینگلیستاندا. ئەو لەسەر باری کورد لە کاتی عوسمانی تا ئەوڕۆ بەراورد کرد و بە کورتی گوتی:



(ئێمە لەسەر دەمێکی گرنگدا دەژین، ئێستا گەلی کورد لە کوردستانی عێراقدا ڕاپەریوە. چەند ڕۆژێک لەمەوبەر تورگات ئۆزال کۆبوونەوەی لەگەڵ کوردان کردووە. ئەوەش، ئەوە پیشان دەدا، کە ئۆزال دەیەوێ لە ڕەوتی سیاسەتی کە مالیەکان لە تورکیا، لابدا. ئێرنەکا (بەرەی ئازادیخوازی کوردستان) لە پاریس‌دا، ڕایگەیاند کە پ.پ.ک ئامادەیە ئەگەر تورکیا بخوازی پەیوەندی پێوە بکا، ئەوان چەک دانێن و ئاگر بەست بکرێ... ئەوە کارێکی باشە).

پێش شەر، هەندێک دەیانگوت: (دەبێ کە کوردستانێکی سەربەخۆ پێک بێ. تورکیا لەوە دەترسێ کە لە عێراقدا شیعە بێنە سەر حوکم. بۆیە تورکیا هەوڵ دەدا- کە زمانی کوردی سەربەست بکرێ. بەڵام تەنیا زمانی گفتوگۆ. ئەگەر ڕۆژنامە و گۆڤار و پەرتووک هەر قەدەغە بن. ئەوە هیچ ناگەینێ. ئامانج دیسان فریودانی کوردانە. بەرەوپێش چوونی زمان ، کولتوری کوردان، دەبێ پەیوەندی لە نێوان حکومەت و کورددا هەبێ، بەڵام ئەوان کورد دەتۆقێننەوە و دەکوژن).

عێراق دەبێژێ: «بەلێ کورد هەنە» بەڵام لەلایەکی ترەوە دەیانکوژێ. وەک بووش دەبێژێ: «دەبێ لە ڕۆژهەلاتی نێوەڕاستدا ئاشتی هەبێ» دەبێ کوردیش لەنێو پرۆگرام و پلانی ئاشتی‌دا شوێنیان هەبێ. بێ کوردان ئاشتی و دیموکراسی ڕاستەقینە لە ڕۆژهەلاتی نێوەڕاستدا نابێ).

(لە سەدەی ١٨دا عوسمانی، وکەسانی تر هاتنە کوردستان، لەلایەکی تر کوردەکان لە نێوان عوسمانی و ئێراندا... عەبدولحەمید دەیگوت: «ئێمە ئیسلامین» کوردەکانی بە ناوی ئیسلام فریودەدا. مستەفا کەمالیش سیاسەتی عوسمانیەکانی درێژەپێدا. مستەفا کەمال کە دیتی یونانی و عەرەب دەیانەوێ دەوڵەتی عوسمانی هەڵوەشێنن، ڕوویکردە کوردەکان و داوای هالیکاری لێکردن و بە شێوەیەک کوردەکانی کردە قوربانی تورکان. هەروەها ئێرانیش کوردەکانی کردە قوربانی سیاسەتی ئێران. ئەمرۆش لە ئێراندا، ڕژێمی ئیسلامی داخوازیەکانی کورد ڕەتدەکاتەوە... کێشەی کورد، کێشەی ئیسلام نییە، بەلکو کێشەی نەتەوایەتییە).

(گەلی کورد دەخوازی سەرۆکی بەهێزی هەبێ، بوونی عەشیرەتگەری و ئایین کێشە دەخاتە بەر مەسەلەی کورد، دەوڵەت سوود لە جیاوازی مەزهەبی وەردەگرێ... دەوڵەمەندەکانی کورد لەگەڵ دەوڵەت دان، ئەوەش هەر لە کۆنەوە وابووە. بۆ نموونە کامران ئینان (وەزیری دەوڵەتی تورکیایە) خۆی خاوەن زەویە و پیاوی دەوڵەتی تورکە.

٨٠٪ خەڵکی گوندەکانی کورد خاوەن زەوی نین، بەرنگاری خاوەن زەوییەکانن، حکومەت پشتگیری خاوەن زەوی دەکا، شۆڕشی پ.پ.ک و ئەوانی تر دژی ئاغایانە.

لە شارەکاندا هەستی نەتەوایەتی بەرەوپێش‌چووە، لەکاتی عوسمانیەکانیشدا هەرواببوو. خوێندکار و ڕۆناکبیرانی کورد لە ئەستەمبوڵ خەباتیان دەکرد).

## ئیدۆلۆژی شەری خستە نێو کوردان

(مەسەلەی ئیدۆلۆژی بۆ کوردان خەراپ بوو. ئیدۆلۆژی شەری خستە نێو هێزی کوردان. دەبوایە مرۆڤ گەر بکرابایە ڕەخنە لێک بگرێ، بەڵام بە جۆرێکی دیموکراتی، نەک یەکتر بکوژێ و لەگەڵ یەکتر کار نەکا. کورد لە ساڵی ١٩١٨وە لەسەر سەربەخۆیی و ئۆتۆنۆمی بەیەک

www.arsivakurd.org



# کۆنفرانسی ستۆکهۆلم
# هەنگاوێکی پۆزێتیڤ و پێشکەوتوو

**ئامادەکردنی: ئەحمەد تیگریس**

**«بێ چارەسەرکردنی کێشەی کورد ئاشتی لە رۆژهەلاتی نیوەراستدا سەقامگیر نابێ ئەو ستەمەی ئەورۆ لەسەر کورد هەیە، لە بناخەدا لەسەر ئاشتی جیهانییە. پێویستە کێشەی کورد بە جۆرێکی ئاشتیانە چارەسەربکرێت.». سەرۆکی کۆمیتەی پاراستنی مافی مرۆڤی کورد لە سوێد، بەرێز. سی.هۆ هەرماسۆن بەم وشانە کۆنفرانسی ستۆکهۆلمی کردەوە.**

**کۆمیتەی پاراستنی مافی مرۆڤی کورد لە سوێد، لە رۆژانی ١٥-١٧ی ئاداری ١٩٩١، بە بەشداری پتر لە ٢٠٠ نوێنەری کۆنفرانسی ستۆکهۆلمی بۆ پاراستنی مافی مرۆڤی کورد پێکهێنا.**

**لەهەر چوار پارچەی کوردستان و یەکێتی سۆڤیەت و ئوستڕالیا و ئەمریکا و ئەوروپاوە نوێنەرانی کورد و رێکخراوە کوردییەکان و کەسانی سەربەخۆی کورد بەشداری کۆنفرانسەکەیان کرد. جگە لە کوردەکان، ژمارەیەکی زۆر لە پرۆفیسۆر و زانا و سیاسەتمەدارانی بێگانە و دۆستانی کورد لە کۆنفرانسەکەدا ئامادەبوون. بۆچوون و تێروانینێک و پێشنیاری خۆیان بە کۆنفرانس راگەیاند. لە کۆنفرانس‌دا، نوێنەرانی راگەیاندن و چاپەمەنی جیهانی ئامادە بوون. پتر لە ٥٠ رۆژنامەنووس و دەزگای راگەیاندنی جیهانی دەنگوباسی کۆنفرانسییان بلاوکردەوە.**

**سەرۆکی کۆمیتەی پاراستنی مافی مرۆڤی کورد لە سوێد دا، لە وتاری کردنەوەی کۆنفرانسدا لەسەر باروودۆخی ئەمرۆی کوردستان و کورد دوا.**

## لەم ژمارەیەدا


### کرمانجی خواروو

کۆنفرانسی ستۆکهۆلم ئامادەکردنی: ئەحمەد تگریس
بەیاننامەی کۆنفرانسی ستۆکهۆلم
رۆژ ژمێری رووداوەکان
لە یادی هەڵەبجەدا
- گۆشەی ئەدەب -
چوار پارچە شیعر حەمە سەعید حەسەن
کولیل شیعر نەجیبە ئەحمەد (ژووان)
خەمبەرست شیعر فروغ فرخ
بەشەنەی چاویان دەردێنم چیرۆک سیامەند
بانگەوازی گۆڤاری کۆچەر
چاپکراوی نوێ

### کرمانجی ژووروو

کێشەی کورد، جیهان تاقی دەکاتەوە. لۆران جەنگین
پەیوەندی لەگەڵ بەغدا. لۆران جەنگین
جارێکی تر رێگای پەنابەری. خورتۆ
رۆژ بە رۆژ: ئامادەکردنی ئەحمەد تیگریس
لەبەردەم سەفارەتی ئەمریکادا خورتۆ
مێوانی نەمێوان: چاوپێکەوتن
قانوون دژی تیرۆریزم... (کۆر)
کۆنفرانسی ستۆکهۆلم.. ئامادەکردنی ئەحمەد تیگریس

### زازایی (دملی)

نەوروز و ژەوبیانینی هـ . دلژین
نەجزریی ناهەقی مەکەری. لیژوان بوبووکایا



# بـەربـانـگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە
لە سوێد

بەرپرسیار: ن. کریف
دەستەی نووسەران
ج. حەیدەری
خەبات عارف
ئا. تگریس
ل. جەنگین
پ. خۆرتۆ
سیامەند شێخ ئاغایی
دیلان دەرسیم

ئابونەی ساڵانە: ١٠٠ کرۆنی سوێدییە
بۆ دەزگاکان ٢٠٠کرۆنی سوێدییە

دەستەی نووسەران بەرپرسیار نیە لە نووسین و وتارەکانی فیدراسیۆن و لەو نووسینانەی بە ئیمزای خاوەنەکانیان بڵاودەکرێنەوە.



ناونیشان:
BERBANG
Box 45205
104 30 STOCKHOLM

تەلەفۆن:
08- 668 60 60

پۆستگیرۆ:
64 38 80-8



ژمارە ٧١ و ٧٢ ساڵ (١٠)
ئەپریل و گوڵان ١٩٩١


www.arsivakurdi.org

# فیلمی سینەمایی ...گەلە گورگ



دوای پتر لە سالێک چاوەروانی، فیلمی (سینەمایی گەلەگورگ)، کە بە هاوکاری لە گەڵ ستودیۆی سۆڤیتی(ئێدیلڤیس) دا هاتە بەرهەم، لەم رۆژانەدا گەیشتوتە ستۆکهۆلم.

ماوەی فیلمەکە ٨٠ دەقەیە، رەنگی ٣٥ملمی‌یە. لە (گەلە گورگ)ی ماموستا (حوسێن عارف)ەوە، (مەهدی ئومێد) بە ئازادی وەریگرتووە و بۆ سینەما ئامادەی کردوە وسەرپەرشتی ئەنجامدانی کارەکانی کردوە.لە ریزەچیاکانی ( تیان شیان، ئالاتای کازاخستانی سۆڤیتی) وینەی گیراوە.

بۆ کار گێرانی ئەم فیلمە (تەیفوری پهتایی) و (ئەسخەت ئەشراپۆڤ) بەشداریان کردوە. کچە ئەکتەری سینەمایی بەناوبانگی سۆڤیتی (خاتو ئانا سامۆخینە) و (مەهدی ئومێد) رۆلی سەرەکیان بینیوە و (زارینە) و (ساشا) رۆلی هەردوو منداڵەکەیان دیوە. لە رۆژی ١٩٩١/٦/١ لە Film Huset دەست بە پێشاندانی دەکرێ.

ئەوەی شایانی باسە ئەم فیلمە بەشێکە لە پرۆژەی ( سیوانە)[تریلۆگیا] کە لە ( گەلەگورگ) و (تونێل) و (ژوان لە ژێر پەلکەزێرینەدا) پێکهاتووە. هەرسێ فیلم تەواوکەری یەکن. ئێستا (مەهدی ئومێد) کار لەسەر فیلمی دووەم (تونێل) دەکا ، کە دوو سەعات دەخاینێ، بەو نیازەی لەسەرەتای سالی نوێ تەواوی کات و بەجیهان دا بلاْوبکرێتەوە. وێنەکانی ئەو فیلمە لە سۆڤیت و ئەوروپا دەگیرێت. چەند ئەکتەرێکی کوردیٰ سۆڤیتیش لە تەک ئەکتەرانی وەک (ئۆلگا کابۆ) و (ئانا سامۆخینە) و چەندانی تر بەشداری تێدا دەکەن. وێنەگری بەناوبانگ (ڤادیم ئەلیسەڤ) وێنەکانی دەگرێ.بەلام لەبەر دەسکورتی و بێ پولی کاری فیلمی دووەم راگیراوە. بەربانگ هیواداره هونەر دۆستانی کورد و دەزگاکانی کولتوری کورد لە سوێد ودەرەوەی کوردستان هەرەوەزی و یارمەتی ئەو پرۆژەیەی هونەرمەند (مەهدی ئومێد) بدەن .

بەربانگ

# بەربانگ

ژمارە ٧١ و٧٢ گۆڤاری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوید ساڵ «١٠»



www.arsivakurd.org